**ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YIL**

**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**

**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Teza Lîsansa Bilind**

# BEDÎUZEMAN SEÎDÊ KURDÎ Û PROJEYA WÎ YA MEDRESETUZEHRA


**ADİL YILDIRIMÇAKAR**

**15950001092**

**Şêwirmend**

**Alk. Doç. Dr. NESİM SÖNMEZ**


**WAN-2016**

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVESİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

# BEDİUZZEMAN SAİDİ KURDİ VE ONUN MEDRESETUZZEHRA PROJESİ


ADİL YILDIRIMÇAKAR

15950001092


Danışman

Yrd. Doç. Dr. NESİM SÖNMEZ

VAN-2016

**T.C.**
**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**
**Yaşayan Diller Enstitüsü**

**TEZ KABUL VE ONAY SAYFASI**

**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

Bu çalışma, jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü **ANABİLİM DALI YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak kabul edilmiştir.

| | | |
|---|---|---|
| **Başkan** | :Yrd. Doç. Dr.M. Zahir ERTEKİN | İmza:...................... |
| **ÜYE (Danışman)** | : Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ | İmza:...................... |
| **ÜYE** | : Yrd. Doç. Dr.Abdulhadi TİMURTAŞ | İmza:...................... |
| **ÜYE** | :............................................. | İmza:...................... |
| **ÜYE** | :............................................. | İmza:...................... |

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

18/03/2016

**Doç. Dr. VECHİ SÖNMEZ**
**EnstitüMüdürü**

**JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ**

Ev xebat ji aliyê juriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de wekî Teza Lîsansa Bilind hatiye pejirandin.

(destnîşan)

Serok :…………………………………….

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav )

(destnîşan)

Endam :…………………………………….

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(destnîşan)

Endam :…………………………………….

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku destnîşanên jorîn ên endamên hîndekariyê yên navborî ne.

Destnîşan

Doç. Dr. Vechî SÖNMEZ

Nasnavê Akademîk, Nav-PaşnavRêvebirê Enstîtûyê

(Mor)

**NAVEROK**


NAVEROK ... 2

KURTE ... 6

ÖZET ... 7

SUMMARY ... 8

KURTEBÊJE ... 11

DESTPÊK ... 12

REWŞA SIYASÎ YA SERDEMA KU SEÎDÊ KURDÎ TÊ DE JIYAYE ... 13

Rewşa Dewleta Osmanî ... 13

Rewşa Komara Tirkiyeyê ... 23

Rewşa Kurdistana Bakur ... 28

1.BEŞA YEKEM ... 39

1.1.JIYANA BEDÎUZEMAN SEÎDÊ KURDÎ ... 39

1.1.1.Gundê Wî ... 39

1.1.2.Malbata wî ... 39

1.1.3.Xwendina Seîdê Kurdî ya li Medreseyan ... 41

1.1.5. Jiyana Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya Wanê ... 46

1.1.6.Jiyana Seîdê Kurdî ya Stenbolê ... 52

1.1.6.1.Şîretên ku Seîdê Kurdî li Stenbolê ji Kurdan re Kirine ... 56

1.1.6.2.Serdema Zordestiyê û Seîdê Kurdî ... 57

1.1.6.3. Hevpeyvîna bi Şefîq Paşayê Nazirê Zabtiyeyê re ... 57

1.1.6.4.Endamtiya Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya Kulûb û Cemiyetan ... 59

1.1.6.5. Derketina Seîdê Kurdî ji Stenbolê ... 63

1.1.7.Wefata Bedîuzeman Seîdê Kurdî ... 64

1.2.BERHEMÊN BEDÎUZEMAN SEÎDÊ KURDÎ ... 65

1.2.1. Kızıl Îcaz (1989-1921) ... 65

1.2.2. Divan-ı Harbi Örfi ve Said-i Kurdi (Dîwana Herba Orfî) (1909-1911) ... 66

1.2.3.Hutbe-i Şamiye (Xutbeya Şamê) (1911-1911) ... 66

1.2.4.Munazerat/ Reçetet-ul Avam veya Reçetet-ul Ekrad (1911-1911) ... 66

1.2.5.Muhakemat (1911-1911) ... 70

1.2.6. Nutuk (Nutûq) (1908-1909/1912) ... 71

1.2.7.Îşaretul Îcaz (1914-1916-1918) ... 71

1.2.8.Tarihçe-i Hayat (Dîroka Jiyana Wî) (1918-1919) ... 71
1.2.9.Nuqte (1919-1919) ... 72
1.2.10. Hakikat Çekirdekleri l.ll. (Dendikên Heqîqetê l.ll.) (1920-1921) ... 72
1.2.11.Sunûhat (1920-1920) ... 72
1.2.12.Lemaat (1921-1921) ... 72
1.2.13.Şûaat (1921-1921) ... 72
1.2.14.Rumûz (1921-1921) ... 73
1.2.15.Tulûat (1921-1921) ... 73
1.2.16.Îşarat (1921-1921) ... 73
1.2.17. Mesneviyi Nuriye (Mesnewiya Nûriye) ( 1922-1923) ... 73
1.2.18.Sözler (Peyv) (1926-1930) ... 74
1.2.19.Mektubat(Name) (1929-1934) ... 74
1.2.20. Barla Lahikası (Lahîkayên Barlayê) (1926-1935) ... 75
1.2.21.Lemalar (Çirûsk) (1932-1936) ... 75
1.2.22.Şualar (Tîroj) (1936-1949) ... 76
1.2.23.Kastamonu Lahikası (Lahîkayên Kastamonuyê) (1936-1943) ... 76
1.2.24.Asayı Musa(Gopalê Mûsa) (1926-1944) ... 77
1.2.25. Emirdağ Lahikası (Lahîkayên Emirdaxê) (1944-1947) ... 77
1.2.26.İman ve Küfür Muvazeneleri (Daneberheva Îman û Kufrê) ... 77
1.2.27. Sikkeyi Tasdiki Ğaybi (Sikeya Tesdîqê Xeybî) ... 78
1.2.28. Tılsımlar Mecmuası (Mecmûayên Tilsiman) ... 78
2. BEŞA DUYEM ... 79
2.1. DI DERBARÊ PERWERDEYA BI ZIMANÊ ZIKMAKÎ DE FIKR Û RAMANÊN SEÎDÊ KURDÎ ... 79
2.1.1.Li Gor Seîdê Kurdî Girîngîya Zimanê Zikmakî ... 79
3.1.4.1.Xelîl Xeyalî û Elfabeya wî ya Kurdî ... 82
2.1.2.Hewcedariya Kurdan bi Perwerdebûna bi Zimanê Zikmakî ... 84
1.1.1.Di Kuliyata Rîsaleyê Nûrê de Hevokên Kurdî ... 85
1.1.2.Çalakiyên Seîdê Kurdî di Warê Zimanê Kurdî de ... 86
1.1.3.Di Rojnameyan de Gotarên Seîdê Kurdî Yên Ku Tên Zanîn ... 86
2.1.5.Gotara Bedîuzeman ya bi Kurdî û Girîngiya Wê ... 92
2.1.6. Şîret û Nesîhetên Seîdê Kurdî yên ji bo Serok, Rêber, Alim, Meşayîx û Kesayetên Kurdan re ... 94

2.1.6.1. Şîret û Nesîhetên ji Alim û Meşayixan je........................................................ 94
2.6.1.1.Şîret û Nesîhetên ji Serok û Rêberan re ........................................................... 95
2.6.1.2.Şîret û Nesîhetên ji bo Kesayetên Kurdan.......................................................... 95
3. BEŞA SÊYEM ....................................................................................................... 99
3.1. PROJEYA MEDRESETUZEHRAYÊ ................................................................. 99
3.1.1.Wateya Medresetuzehra ...................................................................................... 99
3.1.9. Armanca Medresetuzehrayê ............................................................................ 103
3.1.2.Teşebusên/Rahijên Avakirina Medresetuzehrayê ............................................. 115
3.1.2.1.Rahija Yekem.................................................................................................. 121
3.1.2.2.Rahija Duyem.................................................................................................. 122
3.1.2.3.Rahija Sêyem .................................................................................................. 122
3.1.2.4.Rahija Çarem................................................................................................... 123
3.1.3.Bername û Naveroka Medresetuzehrayê........................................................... 124
3.1.4. Di Medresetuzehrayê de Zimanê Perwerdehiyê................................................ 133
3.1.5.Beş û Binbeşên Medresetuzehrayê.................................................................... 137
3.1.6.Devera/ên Projeya Medresetuzehrayê ............................................................... 140
3.1.7.Mamosteyên Medresetuzehrayê ........................................................................ 142
3.1.8.Aboriya Medresetuzehrayê ............................................................................... 150
3.1.10.Nav û Statûya Medresetuzehrayê .................................................................... 153
ENCAM................................................................................................................... 155
PÊVEK: ................................................................................................................... 159
ÇAVKANÎ................................................................................................................ 208

**KURTE**

Bedîuzeman Seîdê Kurdî yek ji alim û mutefekirên herî girîng ê sedsala 20an e. Wî bi fikrên xwe û berhemên xwe tesîreke mezin li alema îslamê kiriye ku di cihanê de jî fikrên wî deng vedane. Yek ji fikir û ramanên wî yên girîng jî bêguman projeya wî ya Medresetuzehrayê ye. Bedîuzeman ev proje bi taybetî ji bo pirsgirêkên milletê kurd bi giştî jî ji bo pirsgirêkên rojhilatanavîn û alema îslamê fikiriye û ji bo wê bimeşîne jî gelekî mucadele kiriye.

Medresetuzehra çi ji aliyê perwerdeya xwendevanan çi ji aliyê perwerdeya civakê ve be; projeyeke zanistî, modern û xwedî îddia e. Ev proje dixwaze ji paşvemayinê, nezaniyê û nexweşiyên din ên civakê re bibe çare û milletê kurd û alema îslamê bi riya perwerdehiyê ji kêşeyên wan rizgar bike. Li aliyekî din, Medresetuzehra; ji aliyê pirzimaniya xwe, mufredata xwe, rêbaza gihandina mamosteyên xwe û fînansekirina xwe ve projeyeke cuda ye. Digel van xusûsiyetên xwe û têkoşîna Seîdê Kurdî jî ew hêj neketiye faliyetê û ji aliyê rêvebirên ve dewletê awayekî zelal nehatiye fêmkirin.

Me di vê xebata xwe de bal kişand ser projeya Medresetuzehrayê û armanc û naveroka wê pêşkêş kir. Bi vî awayî em hêvî dikin ku Medresetuzehra baş bê fêmkirin û ev proje bibe wesîle ku di derbarê Bedîuzeman û Medresetuzehrayê de dîtin û îddîayên çewt ji holê rabin.

**Peyvên Sereke:** Perwerdehî, Bedîuzeman Seîdê Kurdî, Medresetuzehra, Zimanê Zikmakî

**ÖZET**

Bediüzzaman Said-i Kurdi 20. yüzyılın en önemli âlim ve mütefekkirlerinden birisidir. O fikirleriyle İslam âlemini etkilemiş aynı şekilde dünyada da yankı uyandırmıştır. Şüphesiz ki onun önemli fikir ve projelerinden biri de Medresetuzehra Projesidir. Bediüzzaman bu projeyi özelde Kürt Milleti için genelde de Ortadoğu ve İslam Âlemi için düşünmüş ve bunu yürütmek için büyük bir mücadele vermiştir.

Medresetuzehra; ister öğrenci eğitimi ister toplumsal eğitim yönüyle olsun bilimsel, modern ve iddialı bir projedir. Bu proje gerikalmışlık, cehalet ve toplumun diğer hastalıklarına çare olmayı istemekte, Kürt Milletinin ve İslam Âleminin sorunlarından kurtulmasını amaçlamaktadır. Ayrıca Medresetuzehra çokdilliliği, müfredatı, öğretmen yetiştirme yöntemi ve kendini finanse etme yönüyle de farklı bir projedir. Bu özelliklerine rağmen bu proje; hala uygulamaya geçmemiş, yöneticler tarafından da tam olarak anlaşılmış değildir.

Biz bu çalışmamızda bu projeye dikkat çekerek adı geçen projenin amaç ve içeriğini sunduk. Böylelikle bu projenin iyice anlaşılmasını, Said-i Kurdi/Nursi ve Medresetuzehra hakkındaki yanlış görüş ve iddiaları ortadan kaldıracağına vesile olmasını ümit etmekteyiz.

**Anahtar Kelimeler:** Eğitim, Bediüzzaman Said-i Kurdi, Medresetuzehra, Anadil

**SUMMARY**

Bedîuzeman Seîdê Kurdî isone of the most important phlilosopher and deep thinker person in twenty century. He effects the Muslim world with his thouhts and aslo influeneces world-undoubtly, one of his important Project is Medresetuzehra. Bediuzeman Seîdê Kurdî this Project in specifity for Kurdish Natronand in generally fort he Middle East and İslam world. He struggled to succed this Project.

Medresetuzehra is a modern scientific and disputed Project in that both student training and social training. This Project is abut ignorance illiteracy and aslo to find a remedy for another societies and aiming overcome the problems of Kurdish Natron and İslamic world. And aslo Medresetuzehra is an advanced Project thent for Multilingual, curri culum, educated teachers method, financial to itself. Inspite of this particularities this Project is not in practice and it is not understand by goveruments.

We presented our work that to focus the interests on this Project with its purpose and content. Thus, we hope that this Project will be understad well and the wrong ideas and thoughts about Seîdê Kurdî/Nursi and Medresetuzehra will disposal soon.

**Keywords**: Education, Bediuzzaman Said-i Kurdi, the Medresetüzzehr, Native

## PÊŞGOTIN

Di dîroka mirovahiyê de sedsala 20an ji gelek aliyan ve sedsaleke cuda, xwedî bandor û bi deng û doz bû. Ewropa hê du sedsal berê bi Şoreşa Fransewî, hizra netewbûnê nas kiribû û bi vê tecrubeyê dikete nava sedsala 20an. Dewleta Osmaniyan jî ji ber ku dewleteke împaratorî bû; li ser gelek welatan û milletan hatibû pê û ji ber bayê netewatiyê li ber xwe dida. Lê çend dehsal piştî Şoreşa Fransewî, fikra netewgiriyê kete nava axa Dewleta Osmaniyan jî û Dewlet roj bi roj paş ket. Di serê sedsala 20an de Şerê Balkanan û paşê jî Şerê Cihanê yê yekem Dewleta Osmanî perçe kir û Dewlet ber bi têkçûyîne ve bir. Di vê heyamê de, hem kargêrên Dewleta Osmanî hem alim û rewşenbîrên osmaniyan ji bo vî agirî bitemirînin û rê li ber tunebûnê bigirin li çareyan digeriyan. Yek ji van alim û rewşenbîran jî Bedîuzeman Seîdê Kurdî bû.

Seîdê Kurdî/Nûrsî di dema xortaniya xwe de rewşa xirab a kurdan û Alema Îslamê dibîne û ji bo ku alîkariyê bike li hin çareyan digere. Ew di serî de li Kurdistanê, paşê li Stenbolê û Şamê digere; rewşa gel û ya Dewletê dibîne, gel, îrşad dike, bi aliman û gelê kurd re munazereyan dike û bi rayedarên dewletê re hevdîtinan pêk tîne. Heta ew bi fîîlî tevlî şêr dibe û dîl tê girtin.

Dema Seîdê Kurdî vê rewşa xirab dibîne ew ferq dike ku di Alema Îslamê de, bi taybetîjî di Kurdistanê de pirsgirêkên medresan û perwerdehiyê hene lê mixabin medrese van kêmasiyên xwe nabînin û çareser nakin. Lê ew sê nexweşiyên di nava gel de hene tesbît dike ku ew jî; feqîrtî, cehalet û îxtilaf in. Ew, ji bo pêşketina kurdan û misilmanan wekî riya xilasbûnê “perwerdehî”yê dibîne û ji bo ku vê pergalê bimeşîne Projeya Medresetuzehrayê saz dike. Herwiha ew ji bo çareseriya nexweşiyan jî; îttifaq, mihebbeta mîllî, sine’et, me’arif û xwendinê dibîne.

Medresetuzehra ew proje ye ku Seîdê Kurdî xwestiye pê milletê kurd û alema îslamê bi rêya perwerdehiyê bigihîne û îlmê dînî û îlmê fenî bi hev re bişopîne. Seîdê Kurdî ji bo ku vê projeya xwe bimeşîne çar caran serî li rêvebir û saziyên Dewleta Osmanî û Komara Tirkiyê dixe, lê ji ber hin sedeman ev daxwazên wî nayên cî û ev proje nakeve pratîkê.

Medresetuzehra ji gelek aliyan ve projeyeke hêja û pêşketî ye. Lewra bi vê projeyê ew ê miletê kurd bi zimanê xwe perwerdehiyê bibîne, di medreseyên

Kurdistanê de dê islahkirinek çêbe û bi riya perwerdehiyê kurd û gelên din dê bi hestên biratî û wekheviyê bi hev re bikaribin bijîn.

Me di vê xebata xwe de cî da projeya Medresetuzehra ya Bedîuzeman Seîdê Kurdî ku li gorî me ev proje hê jî girîngiya xwe diparêze. Me xwest em di serî de fikrên Seîdê Kurdî yên di derbarê miletê kurd de, dûre jî yên di derbarê perwerdehiya pirzimaniyê û zimanê zikmakî de bidin nasîn û çare û rêyên ku wî ji bo xilasbûna kurdan û Alema Îslamê pêşkeş kirine em parve bikin.

Xebata me ji destpêkek û sê beşan pêk tê. Di despêkê de me rewşa Dewleta Osmanî, Dewleta Tirkiyeyê û Kurdistana Bakur berepêş kir. Di beşa pêşîn a teza xwe de de me cî da jiyan û berhemên Seîdê Kurdî. Di beşa duwem de me behsa fikrên Bedîuzeman yên di derbarê zimanê zikmakî de kirin û bi nimûne û xebatan me ew fikir û xebatên Bedîûzeman pêşkeş kirin. Di beşa sêyem de jî me behsa mijara xwe ya eslî "Projeya Medresetuzehra"yê kir ku naveroka projeyê û teşebusên ji bo sazkirina projeyê me yek bi yek pêşkeş kirin. Di dawiya xebata xwe de jî me cî da daxwazname û nivîsên Bedîuzeman ên di derbarê mijarê de.

Ji bo vê xebata xwe ez dixwazim di serî de ji hevjîna xwe Zehrayê û zarokên xwe; Şuheda, Feyza, A. Arif û Nûdemê re spasiyên xwe pêşkeş bikim. Ji bo piştgirî û pêşniyarên wî ji şêwirmendê xwe Alk. Doç. Dr. Nesim Sönmez re spas dikim. Herwiha ji bo alîkariya wan ji Alk. Doç. Dr. M.Zahir Ertekin û Zafer Açar re, ji hevalên xwe yên Wanê; Fehmi Yeşilçınar, Muslih Sezer, Mehmet Bozkoyun û Ubeyt Kudat re spas dikim, mala wan ava be.

**Adil YILDIRIMÇAKAR 2016-Wan**

**KURTEBÊJE**

**b.n.:** Berhema navborî

**c.:** Cild

**cit:** Cemiyeta İttihad Teraki

**ckt:** Cemiyet Kurd Teali

**h.b.:** Heman berhem

**h. g.:** Heman gotar

**r.:** Rûpel

**hwd.:** Her wekî din

**nql.:** Neqil kirin

## DESTPÊK

Bedîuzeman Seîdê Kurdî yek ji alim û mutefekirên herî girîng ê sedsala 20an e. Wî bi fikrên xwe û berhemên xwe tesîreke mezin li Alema Îslamê kiriye ku di cihanê de jî fikrên wî deng vedane. Ew hem gelek meseleyên dînî û ilmî bi nêrîneke nû rave dike hem jî serê xwe bi meseleyên civakî re diêşîne û hin çareyan pêşniyar dike. Ji ber ku ew ferdekî ji civaka kurd e bi rewşa kurdan re zêde eleqedar bûye û hin reçete ji nexweşiyên wan ên civakî re nivîsandine. Digel pirsgirêkên Alema Îslamê, bi meseleyên civaka kurd ên dînî û mîlî re mijûl dibe û rizgariya kurdan di perwerdeyeke baş de dibîne.

Bedîuzeman hêj di dema ciwaniya xwe de şahidê gelek rûdanan dibe û di bin tesîra wan rûdanên girîng de dimîne. Ew, meşrûtiyetê, Şerê Balkanan, Şerê Cihanê yê I. dibîne. Heta bixwe jî tevlî şerê cihanê dibe û dîl tê girtin. Li aliyekî din ew rewşa xirab a Alema Îslamê, Dewleta Osmanî û miletê kurd re dibe şahid û ji bo rizgariyê li çareyan digere. Bo nimûne ew li hin bajarên Bakurê Kurdistanê digere û bala gel dikişîne ser meşrûtiyetê, diçe Şamê û Xutbeya xwe ya navdar li Mizgefta Emewiyê pêkêş dike û dîsa ew dizivire Stenbolê û bi kesên girîng re hevdîtinan dike û bala raya giştî dikişîne ser pirsgirêkan û behsa rêyên çareseriyê dike.

Seîdê Kurdî dema vê rewşa xirab a civakê dibîne bala wî zêdetir diçe ser bêperwerdehiyê û paşvemayina teknîkî. Wî ji ber ku medrese xwendiye û muderris e jî, rewşa medreseyan di cî de dibîne û hewceyiya islahkirina wan ferq dike. Ew ji bo rizgariya civakê; tifaqa 'medrese-mekteb-tekke'yê bi hev re dibîne û ji bo vê jî wekî proje Medresetuzehrayê pêşniyar dike. Dîsa ew xwestinên civaka kurd ên însanî bi referansên gerdûnî û îslamî bi hev re dide pêş xwe, ji bo ku gelê kurd re û Alema Îslamê re bibe çareseriyek projeya Medresetuzehrayê dertîne. Ev projeya Bedîuzeman "taybetiyên herêmê, demografiya wê di zemîneke sosyo-polîtîk de, aborî û girêdayiyên civakê di herêma Kurdistanê de dide ber çav ku wekî reçeteyekê ji bo kurdan ji aliyê Bedîuzeman ve hatiye amadekirin".[1] Bedîuzeman di vê xebata xwe de rû bi rû projeya Medresetuzehrayê dikemilîne.

Medresetuzehra di nav alim û rewşenbîrên kurd de li gorî qîmeta xwe cî ji xwe re nedîtiye. Bedîuzeman jî weke alimekî ev xusûsiyet ji mêj ve dîtiye. Di vê

[1] Sempozyûma Munazaratê, " Önsöz", Merak Yayınları, Ankara 2012, xv

mijarê de Rohat Alakom wiha dibêje: “Belkî di vê mijarê de yên herî hindik li ser Seîdê Kurdî disekinin kurd in. Seîdê Kurdî hem kurd e, hem jî di rojeva kurdan de nîne.”[2] Mirov dibîne ku, gelê kurd hêjayekî wek Bedîuzeman Seîdê Kurdî zêde nas nakin, me jî di vê xebatê de xwest ku, hem Projeya Medresetuzehra hem jî Bedîuzeman ji layê kurdan ve bêtir bê naskirin.

Seîdê Kurdî hem kesayetiyekî dînî hem jî welatparêzek e. Ev herdu xususiyetên wî di bin bandora hevdu de mane. Îro gelek kesên fikr û ramanên wan cuda, Bedîuzeman Seîdê kurdî nêzî xwe dibînin. Lewra Bedîuzeman bandoreke mezin li ser gelê Tirkiyeyê hiştiye. Ew kesên ku dixwazin bi mezinahiya Bedîuzeman xwe mezin bikin, ew xelet nas kirine. Bi taybetî jî yên wî xelet fêm kirine, gelekî ji wan rewşenbîrên kurd in. Usûla nirxandina kesekî pêwîst e li gorî şert û mercan be. Çawa Metin Aktaş jî dibêje: “Ji bo ku mirov paşerojê binirxîne, pêwîst e dem, aborî, siyasî û çanda tê de tê jiyandin were ber bi çav kirin.”[3] Bedîuzeman ji aliyê Kurdan ve baş nehatiye naskirin, ew jî kêmasiyeke mezin e ji bo gelê kurd. Dîsa Aktaş dibêje: “Yên mîna Seîdê Kurdî di dîroka me de şopên kûr hîştine, me reda wan kir û me xwest em dîrokeke nû ava bikin. Lê me wê demê kesayetiyên wek Bedîuzeman Seîdê Kurdî bi destê desthilatdaran de berda.”[4]

Ji bo ku baştir bê fêmkirin divê em pêşî serdema ku Bedîuzeman Seîdê Kurdî tê de jiyaye nas bikin:

## REWŞA SIYASÎ YA SERDEMA KU SEÎDÊ KURDÎ TÊ DE JIYAYE

### Rewşa Dewleta Osmanî

Kurd di Mezopotamyayê de herdem di nav şerên dewletên mezin de mane. Li gorî berjewendiyên xwe di şeran de aliyên xwe kifş kirine. Di şerê Osmanî û Sefewiyan de ji ber ku Osmanî sunî bûn kurdan jî piştek dan Osmaniyan. Di serdema Yavuz Siltan Selim de, di sedsala 16an de yekitiya Kurd û Osmaniyan wek baskekî hevpar bi “sunîtiyê” çêdibe.[5]

---

[2] Rohat Alakom, “*Unutulmuşluğun Bir Öyküsü Seîdê Kurdî”*, Fırat yayınları, İstanbul, 1991, 20
[3] Metin Aktaş, “Seîdê Kurdî Kürtlerin Gandisi”, *Kovara Bîr***,** Hejmar 8, Diyarbekir, 2008, 105.
[4] Aktaş, “*h.b.*”, 105
[5] Osman Özkul, “*Munazarat Sempozyumu”*, Merak yayınları, 129.

Piştî Siltan Selim heta dawiya Osmaniyan, Kurd û Osmanî yekitiya xwe didomînin. Di serê sedsala 20an de têkiliya Kurdan û Dewleta Osmanî girîngiya xwe diparêze û ji bo ku ev têkilî û hevkarî bidome divê di rewşa Kurdan de hin guhertînên erênî pêk werin. Bedîuzeman Seîdê Kurdî yek ji wan kesan e ku dixwaze rewşa Kurdan a xirab biguhere, ber bi qenciyê ve bibe ku Dewleta Osmanî jî jê feyde bibîne. Ji bo vê, diçe Stenbolê. Dema diçe Stenbolê ji bo rewş û perweredehiya Kurdistanê daxwaznameyekê dide Derseadetê. Li aliyekî din wê demê hin serok, rêber û şêxên kurdan dijberitiya hev dikirin û di nava îxtilafê de noq bibûn. Çawa Altan Tan jî dibêje: "Bi sedan axa, beg û şêxên kurdan ji bo ku Evdilhemîdê II. meqam, mewkî û zêran bide wan, ketine rêzê, lê Bedîuzeman van hemûyan red kiriye. Wî bi tenê zanîngehek xwestiye ku tê de perwerdehî bi zimanên erebî, kurdî û tirkî bê dayîn."[6]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî li hemberî îstibdata Evdilhemîdê II. tekoşînê dike û dixwaze Dewleta Osmanî bi meşrûtiyetê bê îdarekirin û gel bi temamî di meclîsê de bê temsîl kirin. Ew, rizgariya gelê kurd bi tevahiya gelên Osmanî re dibîne û wiha dibêje: "Gelê Kurdistanê, di nav miletên Osmanî de xwedî ciyekî girîng e. Rewşa gelê Kurdistanê, digel ku ji aliyê hukûmetê ve tê zanîn jî, ez dixwazim ku hin daxwazên wan ên li ser xizmeta muqedes a ilmî, berpêş bikim."[7] Bedîuzeman bala rêvebirên Osmanî dikişîne ser gelê kurd. Ew daxwaznameyekê ji bo perwerdehiya Kurdistanê pêşniyarî meqamê Dersadetê dike, lê rêvebir bi şuphedariyê lê dinêrin. Şerîf Mardin vê rewşê wiha şîrove dike: "Ev daxwazname bi taybetî ji bo perweredehî, heq û hiqûqên kurdan hatibû dayîn lê ew jî dibe sedemên neyêniyê. Evdilhemîd jî li vê daxwaznameyê bi çavekî; heçko niyeta cudaxwaziyê têde heye dibîne. Yên piştî Evdilhemîd tên ku damezrînerên Komara Tirkiyeyê ne, ew jî wek wî, Bedîuzeman tawanbar dikin."[8]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî dema çû Stenbolê êdî Dewleta Osmanî wek mirovekî nexweşgiran bû. Li her aliyî ve bandoreke giran a dewletên Ewropayî li ser hebû. Ji bo ev bandora xeter kêm bibe di navbera salên 1839 û 1876an de di gelek awayan de "tenzîmat/vegûherîn" hatin çêkirin. Hin xwestinên Ewropayiyan ji bo

---

[6] Altan Tan, "*Değişen Ortadoğuda Kürtler*", Çira Yayınları, çapa II. İstanbul 2011, 165.
[7] Bedîuzzaman Seîdê Kurdî, "*Dersên Civakî*", Weşanên Zehrayê, Stenbol 2013, 363.
[8] Şerîf Mardîn, "*Bediüzzaman Said Nursî Olayı*", İletişim Yayınları, İstanbul, 1992, 36-37.

xeyrî misilmanan kete makezagonê. “Ev reformên hatine kirin ji bilî pirsgirêkên bi lez, ji tu tiştî re çareserî neanî. Lê belê di dîroka tirkan de vegûherîneke nû çêkir. Êdî Dewleta Osmanî wek berê rêvebiriya wê nehate domandin.”[9] Dema Tenzîmat hate îlan kirin hin civak memnûn bûn hinekan jî nerazîbûna xwe nişan dan. Ji bo xiristiyanan û kêmaran mafên baş bi dest ketibûn ku wek misilmanan gihîştibûn mafê xwe. Lê belê ji bo hin gel û komên bêdestek xweş nehatibû. Dewleta Osmanî ji bo paremayin û nexweşiyên nav xwe wisa betal jî nedisekînî ku him ji aliyê rêvebirî û sîyasî ve îlankirina meşrûtiyetê dikir û bi fermana islahatê jî, di aliyê perwerdehiyê de dibistanên nûjen vedikirin. Wek Muhendîsxaneya Behrê Hûmayun, Asakîri Mansûreyê Mihemediye, Topxaneyê Amîre, Cerxananeyî Mamûre, Mekteba Herbiye, Darul Ulûmê Hîkemiye, Mekteba Tibbiyê, Adliyeyê Şahane, Mektebî Îrfan a Adliye, Mekteba Ruştiye, Hendeshane, Muhendîsxaneya Berî Humayûn, Mekteba Îdadî, Sultanî, Darulmûallîmîn, Meketba Mulkiye, Mekteba Amele ya Zîraat, Mekteba Huqûqê û Darul Funûn hwd… Ev dibistan zêdetir bi bandora Ewropayê hatine sazkirin, ji bo ku Dewleta Osmanî bikare xwe biparêze hatine damezrandin lê li kêleka feydeyên erênî yên nêyênî jî çêbûne. Lewra ev dibistan pêşerojê, ji Komara Nû re dibin bingeh.

Çawa Bedîuzeman Seîdê Kurdî dixwast di medreseyên Kurdistanê de guherîn çêbe, di Dewleta Osmanî de jî daxwazên guherînan hebûn. Hinek ji wan kesan wekî; Ziya Gokalp dixwestin medrese bi navê “Medrseyên Kuliye” bêne guherandin. Celal Nurî jî, wek rêvebirekî Îttihadiyan, dixwest ew bi navê “Darul Funûn” bên vekirin. Musa Kazım Efendî dixwest bernameyên medreseyan tevî bên îptalkirin, ji nû ve bên damezirandin. Ji bo medreseyan bi merasîmekê di sala 1910an de li Medreseya Fatihê bernameyek tê xwendin. Li gorî vê bernameyê; “perwerdehiya mederseyan dibe 12 sal, rojê sê danan ders, ji bilî dersên klasîk, osmanî, farisî, dersên fen û matematîkê bên dayin, ji bilî medreseyan di ciyên taybet de jî dikarin dersên nûjen bên dan.”[10] Wê bernameyê pêşniyarî Siltan Reşat dikin da ku bikeve fermiyetê. Ji ber van rûdanan Bedîuzeman jî dixwaze dibistanên wek wan li Kurdistanê jî vebe lê belê li gorî wî ji ber nêrîna dijî Ewropayê di Kurdistanê de

[9] Mary F. Weld, “*Bediüzzaman Said Nursî Entelektüel Biyografisi”*, İletişim Yayınları, Stenbol 2006, 54-55.
[10] Murat Akgündüz, “*Münazaratın Yazıldığı Dönemde Osmanlı Medreseleri*” Munazarat Sempozyumu I, Merak Yayınları, Anakara 2012, 496.

dibe ku dijberî çêbe. Çimkî naverok û bernameyên wan bi mantiqa sekulerîzmê bû. Lewma wî dixwest yek; bi navê "medreseyê" vebin, ya din jî naverok û bernameyên wan bi çand û xwestinên gelê Kurd re hemaheng be. Çawa Ubeyt A. Kudat jî dibêje: "Hewldanên osmaniyan yên ji bo guherîn û nûjeniya dibistanan, modelên xwe ji Ewropayiyan mînak digirtin. Di mederseyan de, zanistên dînî dihatin xwendin lêbelê di derbarê nûjeniyê de û ilmên zanîstî de rewşa van medresan xerab bibû. Roj hat, di navbera mekteb û mederseyan de dijbertî çêbû. Bedîuzeman jî rewşa neyînî tesbît kir û wek alternatîfekê modeleke nû mutala/hizir kir."[11]

Mary F.Weld rewşa serdema Tenzîmatê baş xwendiye ku piştî îlana tenzîmatê wiha şîrove dike: "*Piştî îlana reforman, serdeçûna Ewropayiyan hetanî dawiya hilweşina Dewleta Osmanî berdewam kir. Pişt re hin mirovên ku li derve perwerde bûne, komeke entelektuel û nivîskar derkete holê. Ew mirov ji rêvebiriya osmaniyan re wek alternatîf derketine holê. Fikr û ramanên nû yên nûjen, derbarê azadiyê de, ji bo makezagoneke nû anîne ziman. Lêbelê ew kom ne yekrû bûn, di nav wan de komên cuda hebûn. Bi taybetî di nav koma "Yenî osmanlılar/osmaniyên nû de Namık Kemal bi fikr û ramanên xwe rih û xîmê Dewleta Osmanî vedijand. Mirov dibîne ku ew fikr û raman û argumanên Namik Kemal di berhemên Seîdê Nûrsî yên pêşîn de xwe nîşan dide.*"[12]

Mirov dibîne ku di hindir de di navbera seltenet û muxalefetê tekoşîneke mezin heye. Entellektuelên Osmanî li hemberî seltenetê bi gotinen nû yên wekî; "azadî, wekhevî, maf û qanûn… hwd. di nava gel de gelek nav û deng didin û ev sloganên wan xweşî gel diçe. Lêbelê ew gotinên wan seltenetê di zorê de dihêle. Di 23yê Kanûnê ya 1876an de makezagona nû ya bi navê "Qanûna Esasî" tête îlan kirin. Piştî îlankirinê salek şûn de Evdilhemîdê duyem, wê qanûnê ji holê radike çimkî êdî ew van makezagonan ji bo xwe xetere dibîne. Lêbelê ev rewş di hundir de muxalefetê zêde dike.

Bedîuzeman Seîdê Kurdî wek rêvebirên Îtîhad Teraqî nebû, ajandayeke wî ya veşartî tunebû. Di derbarê siltan û seltenetê de rexneyên dijwar nîşan didan. Ji bo siltan û siltanetê wiha dibêje: "*Îstibdad, zilm û zordestî ye û meşrûtiyet jî, edalet û*

[11] Ubeyt A. Kudat, "Bedîuzzaman da Üç Darü't-Talimi ve Medersetuzehra'da Dil", *Ortak Zemin*, Gazîantep, 2012, 14.
[12] Weld, "*h.b*", 54-55.

*şerîet e. Padîşah jî, heta ku ji emrê pêxember re îtaetê bike û li dû here, xelîfe ye û em ê jî jê re îtaetê bikin. Eger na, yên zilimkar ku padîşah be jî, heydûd e*."[13] Di serdema Evdilhemîdê duyem de li ser rewşenbîran gelek metirsî hebûn, lê hin kes vê rewşê napejirînin. Sedemên wê wiha şîrove dikin ku Evdilhemîd mirovekî dîndar bû û li hemberî Ewropayiyan tekoşîn dikir. Di derbarê îstibdada Evdilhemîdê duyem de Hüseyîn Çelik wiha dibêje: "*Ev alîgirên me yên dîndar, ji ber ku ji dema serdema Evdilhemîd re "serdema îstibdatê" tê gotin qet xweşa wan naçe. Lê bi tenê di vê mijarê de Bedîuzeman wisa nafikire, herwekî; Mehmet Akîf (1873-1936), İsmail Hakkı İzmiri (1869-1946), Ruşen Ferit Kam (1864-1944),Babanzade Ahmet Naim Efendi (1872-1934),Filibeli Ahmet Hilmi Efendi (1865-1914) hwd… Îslamîstên serdema nûjen jî, li hemberî îstibdata Evdilhemîd tekoşînê dikin."*[14]

Di dema dawî ya Dewleta Osmanî de gelek miletên din, ji osmaniyan veqetiyan, li çareya serê xwe nihêrîn. Lê gelê kurd yekîtiya dewlet û xelîfetiyê xirab nekirin û pêşeroja xwe bi osmaniyan re didîtin. Bedîuzeman Seîdê Kurdî, standina heq û hiqûqên kurdan, di nav tevahiya osmaniyan de didît; lê dixwest her qewmek bi nasname û zimanê xwe û bi kesayetiya xwe ya netewî ve derkeve pêş û ew heqên fitrî bên mihefeze kirin.

Bedîuzeman Seîdê Kurdî di sala 1911an de dizivire Kurdistanê, di nava eşîrên kurdan de digere û mizgîniya meşrûtiyetê dide wan. Dixwaze pêşiyê kurd yekitiya xwe saz bikin, paşê jî wek netewekî misilman, jiyana xwe bi osmaniyan re berdewam bikin. Lê Dewleta Osmaniyan wek Bedîuzeman Seîdê Kurdî nedifikirî, îxtilafên di navbera eşîrên kurdan de wek derfeteke nerênî bikar dianî, yekitiya kurdan xira dikir û hêza wan dişkand. Çawa Metîn Aktaş jî dibêje: "Dewleta Osmanî ji bo ku bikare hêza desthilatdariya xwe zêde bike, bi organîzasyonên nerênî, îxtilafên di navbera kurdan de zêde dikirin."[15]

Di dema Siltan Evdilhemîdê duyem de di nava osmaniyan de rêxistinên cuda yên bi pergal li hemberî wî, wekî muxalefeteke nû dertên. "Ji bo dijbertîbûna azadiyê ya Evdilhemid, xwendevanên Mekteba Tibiyeyê ji vê çûyinê re nerazîbûna xwe nîşan didin. Di sala 1889an de bi dizî ve cemiyetek tête damezirandin. Ev

---

[13] Seîdê Kurdî, "Dîwana Herba Urfî*", Dersên Civakî,* 151.
[14] Hüseyin Çelik, "Bediüzzaman Ufku Görebilen Birisiydi" *Munazarat Sempozyûmu I*, Merak Yayınları, Ankara, 2012, 58.
[15] Aktaş, "*h.g.",* 107.

cemiyet geş dibe, mezin dibe ku têde cure cure karmend û fermandar hebûne. Ev hereket, li Ewropayê bi navê jon tirk/tirkên ciwan dihate zanîn. Armanca tevan ew bû ku li pêş dijberitiya Evdilhemîd a derbarê azadiyê de bisekinin. Di nava vê tevgerê de komên biçûk jî hebûn ku yek ji wan dîndar bû û serokê dîndaran jî Mizancı Murad bû. Di pêşiyê de bawerî li Siltan anîbû û ji bo reforman, terka muxelefetê kiribû. Li aliyekî din li Makedonyayê hereketeke bi navê Cemiyeta Îttahadî bi serokatiya Ahmet Rıza hate damezirandin. Di vê tevgerê de dîsa karmend, entelektuel, fermandar û niviskar hebûn û bi serdaçûna wan di 24ê Tîrmehê ya 1908an de Meşrûtiyet hate îlankirin.

Di navbera Bedîuzeman û Cemiyeta Îttihad Terakiyê de, ji ber dijbertiya Evdilhemîd, di serî de nêzikiyek çêbûbû. Lê belê paşê hevdu rind nas dikin û dûrî hev diçin."[16] Hin kes derbarê têkiliya Bedîuzeman û Partiya Îttihad Terakiyê de Bedîuzzaman rexne dikin, lewra di navbera vê partiyê û fikrên Bedîuzeman de dijberî heye, çawa dibe hin xebatên wan bi hev re çêdibin. Ji Bedîuzeman tê pirsîn: "*Te li Selanîkê bi Cemiyeta Îttihad Terakiyê re tifaq kiribû, tu çima jê qetiyayî?*" Bedîuzeman di rojnameya Volkanê de wiha bersîvê dide: "*Ez cuda nebûm, ew jî me cuda bûn. Ez bi Niyazî beg, Enver beg, re tifaq im, lewra hinek ji me veqetiyan û ketine riya lîqê têde noq bûn.*"[17]

Mirov dema li berhem û kesayetiya Bedîuzeman mêze dike dibîne ku ew mutedîl û musbet hereket dike. Tiştên ku di hişê wî de rûniştine qebûl kiriye. Têkiliya Bedîuzeman û ya Cemiyeta Îttihad Terakiyê berdewam kiriye.[18] Mary F. Weld, têkiliya wan wiha dîtiye: "*Bedîuzeman Seîdê Kurdî bi fikra osmanitiyê, têkiliya wî bi Cemiyeta Îttihad Terakiyê re hebû, lewra endamên her milletî di nav milletê Osmanî de hebû û li gorî wî divê ew millet bigîhîjin heq û hiqûqên xwe hemû hemwelatî wekhev bijîn. Ji bo vê yekê jî Bedîuzeman ji bo wan berdewamiya Dewleta Osmanî xwestiye.*"[19] Sedemeke din jî ew bû ku, di derbarê perwerdehiyê de fikrên Bedîuzeman û yên Cemiyeta Îttihad Terakiyê dişibîn hev.[20]

---

[16] Weld, "*h.b.*", 58.
[17] Bedîuzeman Seîdê Kurdî, "Maqaleyên Bedîuzeman", 416.
[18] Weld, "*h.b.*", 57-58.
[19] Weld, *h.b.*, 83.
[20] Weld, *h.b.*, 88.

Dijbertiya Evdilhemîdê II û alîkariya Îttihadiyan tiştên şexsî nebûn, çawa Bahaeddin Sağlam jî dibêje ku, "*Bedîuzeman dixwest di aliyê rêveberiyê de osmanî derbasî rêveberiya meşrûtiyetê bin û fikr û ramanên Îttihadiyan ên derbarê azadî û meşrûtiyetê dieciband.*"[21] Bedîuzeman xilasbûna osmaniyan di meşrûtiyetê de didît. Ji bo rewşa gelê kurd ku Dewleta Osmanî agahdar bibe, daxwaznameyekê dide Evdilhemîdê II û têkiliyên xwe bi Îttihad Terakiyê re jî çêdike. Ji bo ku heq û hiqûqên gelê kurd bête dayîn, di derbarê meşrûtiyet û azadiyê de eşîrên kurd perwerde dike ji bo ku ew bo wan mafên netewî bêne amade kirin. Ji bo bandorê bide ser Alema Îslamê, wî li nav saziyên osmaniyan û gelên kurd de cî digirt û xebatên civakî, çandî û sîyasî bi rê ve dibirin. Lewra rewşa osmaniyan wê demê baş nebû, pirsgirêkên mezin hebûn. Di civaka osmaniyan de tevliheviyên civakî, çandî û siyasî hebûn ku hinekan destek didan guherînan, hinekan jî nerazîbûna xwe nîşan didan. Di osmaniyan de du komên balkêş hebûn ku wan guherîn û nûjenî dixwestin. Koma yekem derdorên Îttihad Terakiyê bûn ku fikr û ramanên wan di bin bandora ewropayiyan de bûn; xweyî fikrên pozîtîvîst, materyalîst bûn û di jiyana wan de van îdeolojiyan xwe nîşan dida. Koma duyem, kesên dîndar û muhafazakar bûn; wan jî guherînek dixwestin ku koka wê di rabirdûyê de be û wisa bête çêkirin.[22]

Armanca hatina Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya paytextê osmaniyan ew bû ku ji bo pirsgirêkên kurdan çareseriyan bibîne û ji bo projeya Medresetuzehrayê jî, destekê ji Siltên bigre.

Dema meşrûtiyeta duyem tê îlankirin, ji aliyê azadiyê ve gelek pêşveçûn çêdibin. Di aliyê çapemeniyê de, di navbera salên "1908-1909an de, 353 rojname û kovar"[23] derdikevin. Di çapameniyê de li ser milet, dîn û azadî û gelek tiştên din de, bi rihetî gengeşî tête kirin. Ne ku di çapemeniyê tenê de, di Meclîsê de jî mebûsên "sosyalîst, ermenî, yahûdî û yên din"[24]di nava Îttihad Terakiyê de siyaset dikirin. Lê dema Evdilhemîdê II ji desthilatdariyê ket, hat dîtin ku qesta Îttihadiyan ya esil ne azadî, heq û hiqûqê gel bû. Rûyên wan yê esil ji aliyê milet ve hate dîtin. Dema rûyê Îttihadiyan ê rastîn dertê holê, navbera wan û Bedîuzeman Seîdê Kurdî xirab dibe.

---

[21]Bahaeddin Sağlam , "*Kürtlerin Reçetesi Münazarat*", Klmn Yayınları, İstanbul, 2013, 10.
[22] Osman Tekin, "Medresetüzzehra Projesi*" Ortak Zemin*, Gaziantep, hejmar 7, Nîsan-Gulan, , 2012, 8.
[23] Taş, "*h.b.*", 82.
[24] Taş, "*h.b.*", 82.

Bedîuzeman Seîdê Kurdî di derbarê Îttihadiyan de wiha dibêje: "*We dîn êşand, we zirar da xîretullahê, we şerîet bêqîmet kir û dawiya vê kirinê baş nîn*e."[25] Êdî rêya Bedîuzeman Seîdê Kurdî û Îttihadiyan ji hev vediqete. Desthilatdariya Îttihad Terakiyê di navbera salê 1908-1918an de berdewam dike, lê rêvebiriyeke bi serkeftî nayîne şûnê. Di nava gel de êdî serhildanên lokal çêdibin ku yek ji wan hedîseyan di 31ê Adara 1909an de çêdibe û gelek kes têne tawanbarkirin. Bi taybetî hinek kesên dîndar têne girtin, hînek kes jî tên darvekirin. Bedîuzeman jî tê tawanbarkirin lê paşê bera'et dike. Piştre di qada Siltan Ehmed de axaftinekê ji girseyeke mezin re dike û wiha dibêje: "*Ji bo zaliman bîjî dojeh! Ji bo zaliman bîjî dojeh!*" Ew û gel tev dimeşin. Ji bo xeletiyên desthilatdaran û yên Îttihadiyan Bedîuzeman gel hişyar dike û dibêje. "*Hîsiyata Ewropayê li Stenbolê nayê, kincên hinekan li bejn û bala hinekan nayê.*"[26] Metirsiyên Partiya Îttihad Terakiyê zilm û zordariya wan him li ser dîndaran him jî ser gelê Kurd çêdibe, ji bo van nebaşiyan Bedûzeman jî wiha dibêje: "*Ez gotinên Îttihadiyan yên di derbarê azadiyê de bê wate dibînim û mayîna li zîndanê ji ber zilma we ewletir e*."[27] Fikrê Bedîuzeman Seîdê Kurdî yê derbarê Îttihat Terakiyê de di vê hevokê de gelek zelal têtê xuya kirin.

Di sala 1911an de şerê Balkanan derdikeve û gelek cî û war ji destê Dewleta Osmanî derdikevin. Desthilatdarên wê demê Jontirk bûn ku ew bi almanan re bi dizîka peymanekê çêdikin. Di 2yê Tebaxa sala 1914an de, rojek şûn de hemberî îngiliz, ûris û fransewiyan bi navê tifaqa sisêyan (Awusturya, Almanya û Dewleta Osmanî) dikevin Şerê Cihanê yê yekem. Rêvebiriya şerê bereya Qafkasê Enver Paşa dike, bi hezaran kes li navçeya Sariqamişê bê şer sirê dibin û kareseteke mezin tê serê wan. Di wê demê de Bedîuzeman Seîdê Kurdî fermandarê dilxwazên alayiyên kurd bûye. Bedîuzeman Seîdê Kurdî di 3yê Adara 1916an de li Bedlîsê dîl dikeve destê Ûris."[28]

Di navbera 1918-1922an de, "bi rêvebiriyên CÎTê (Cemiyeta Îttihad Terakî), Dewleta Osmanî bi mutefîkên xwe (Awusturya, Macarîstan, Almanya) bi Dewletên Îxtilaf re (Ûris, Îngilîstan, Fransa) dikeve Şerê Cîhanê yê yekem. Ev karesat dibe sedema hilweşandina Dewleta Osmanî û ew bi dawî dibe. Piştî van neyêniyan rewşa

[25] Said Nursi, "*Tarihçe-i Hayat"*, Envar Yayınları, İstanbul, 2011, 50.
[26] Bedîuzeman Seîdê Kurdî, "Dîwana Herba Orfî", *Dersên Civakî,* 152
[27] Said Nursi ,"*İçtimai Reçeteler"*, 42.
[28] Weld, "*h.b."*, 157-158.

Dewleta Osmanî ya muterekeya 30ê Çiriya 1918an, Peymana Mondrosê tête destnîşan kirin. Dema paşayê osmaniyan vê peymanê dibihîzin, dijberî wê derdikevin û peymanê weke teslimbûne dibînin û napejirînin. Serok û rêvebirên CÎTê firar dikin û diçin Berlînê.

Piştî Mondrosê, di nava gelên misilman de xemgînî û di nav xeyrî misilmanan de jî kêfxweşiyeke mezin çêdibe. Dewletên Îxtilafê di navbera xwe de bi hev re peymanên bi dizî çêkiribûn, ji ber vê yekê cî û warên Dewleta Osmanî bindest kirin. Lê di nav ûris de di sala 1917an Îhtîlala Bolşevîk çêbû. Ûris li nav welatê osmanî vekişiya û vegeriya nav xwe û di derbarê paymalkirina Dewleta Osmanî de ji mafê xwe bihurî û şûna wî Îtaliya girt. yewnaniyan, herêma Egeyê û Îzmîr dagir kirin; firansewiyan di 1919an de Başûr û Bakurê Rojhilat dagir kirin û ketine Stenbolê. Îngilîzan Tengava Çanaqaleyê û ciyên stratejîk dagir kirin. Wekî din li gorî lihevhatinê pêwist bû, li Rojhilata Navîn dewleteke kurdan û li Bakur û Rojhilatê Anadoluyê jî dewleteke ermeniyan bihata damezirandin û li herêma Behra Reş jî dewleteke pontosan çêbibûya. Li aliyekî din qesta yewnaniyan ew bû ku, cardin Stenbol bixin bin destê xwe. Bi alikariya Emrîka, îngilîz û firansewiyan, yewaniyan Îzmir dagir kirin. Li hemberî wan dewletên bihêz, hêzên Osmanî ên wisa rêkûpêk tunebûn. Bi dijîtiya milîsan û dilxwazan şer berdewam dikir. Ji wan dilxwazan yek jî Seîdê Kurdî bû. Dema îngîlizan Stenbol dagir kirin, Seîdê Kurdî daxuyaniyeke bi navê "Xutuwatê Site" bi alîkariya Eşref Edîp, di 16ê Adara 1920an de belav kir. Piştî dagiriya ser Stenbolê, Siltanê Osmanî, bi mecbûrî "Meclîsa Mebûsan" fesih kir.[29]

Di salên paş de Seîdê Nûrsî di derbarê vê rewşê de, di Meclîsa Enqereyê de fikrên xwe wiha beyan dike: "*Alema kufrê, bi timamê wasitayên/amûrên xwe ve bi medeniyet, funûn û misyoneriya xwe ve êrîşî Alema Îslamê dike. Di aliyê maddî de serketî ye, lê belê di aliyê dînê de serkeftina wan çênebûye*."[30]

Di 23yê Nîsana 1920an de, li Enqereyê bi fermî Meclîsa Gel a Tirk vedibe, êdî hukmê Dewleta Osmanî betal dibe. Di 24ê Tîrmeha 1923an de, di navbera Tirkiye û dewletên Ewropî de lihevhatin çêdibin û li nava dewletên navnetewî de jî dewletbûna Tirkiyeyê tête naskirin. Bedîuzeman Seîdê Kurdî, gazî, rêveber, zana û rewşenbîrên Osmanî dike û dixwaze bi xelet neyê fêmkirin. Lewra texmîn dike ku

[29] Weld," *h.b.*", 181-182.
[30] Said Nursi, "*Tarihçe-i Hayat*", Sözler Yayınevi, İstanbul, 2004, 132.

hin gotinên wî xweşa hin kesan neçe, lê dibêje ez ê wekî kurdewariya xwe rasterast bibêjim belkî ji we tehl jî were lê ji we re wek reçeteyekê ye: "*Fêkiya çiya tehl be jî, derman e, îfadeyên min, ji jîr û zîrekan re xîtab e. Îşaret bes e. Ji ber ku mekteba edeba min, ew çiyayên bilind ên Kurdistanê ne*."[31]

Bedîuzeman di nêrîn û jiyana xwe de jî, car caran xwe wiha nîşan daye û daye naskirin: "*Ez, ji aliyêkî mensûbê misilmantiyê, aliyekî mearifê misilmaniyê, aliyekî alim, aliyekî telebe, aliyekî osmanîtî, aliyekî xîlafetiyê, aliyekî îttîhada Muhemmedî û aliyekî jî kurdîtiyê ve girêdayî me. Mîna van gelên ku wesfên wan di hev de derbas dibin wisa bi hev ve girêdayî ne.*[32]

Bedîuzaman xwestiye ku pirsgirêkên Dewleta Osmanî bi reçeteyeke îslamî çareser bike û heq û hiqûqên kurdan jî di nav vê çarçova îslamî û osmanîtiyê de bi rêvebiriya meşrûtiyetê bê çareser kirin. Bi taybetî piştî misilmantî û osmaniyantiyê kurdîniya xwe aniye ziman. Bedîuzeman pêşveçûn û xilasiya osmaniyan di parastina misilmantiyê de dîtiye û wiha gotiye: "*Tiştê ku jiyanê dide vê dewletê, dînê wê, ji ber ku îslam e, her yek osmaniyek, bi bilindkirina wê heşmet û qudreta îslamê berpirsiyar e û her mumîn jî, bi î'laya kelîmetullahê ve wezîfedar e*."[33]

Bedîuzeman ji bo rewşa dewletê ya nerênî, wekî alimekî ji bo xeletiyên wan padişah û rêvebirên osmaniyan hişyar bike, nêrînên xwe wekî xewnekê tîne ziman: Min di alema manayê de padîşah dît û jê re got: "Tu zikata 'umrê xwe, di pîşeya 'Umerê Sanî de serf bike..."[34] Lewra Umerê duyem di serdema Emewiyan de bi rêya seltenetê tê, lê bi edaletî rêvebiriyê dike. Bedîuzzaman dixwaze padişahê osmaniyan jî rûyê xwe ji luks û şetafetê badin û wekî Umerê duyem ji xelqê re xizmetê bikin. Dixwaze di qesra osmaniyan de ku wek sembola wê luksê ye, perwerdehî bê dayîn: "*Yildiza (Qesra Sitêrkê) ku nefret jê tê kirin, ji bo ku tu li ber dilê mirovan şîrîn bikî, pêwist e tu wê bikî mîna Darulfunûnê/Zanîngehê û divê tu wan ilmên Îslamî zindî bikî û divê tu Şêxulîslamîtî û Xîlafetê bilind bikî heta meqamê wê yê eslî.*"[35]

[31] Bedîuzeman Seîdê Kurdî, "Maqaleyên Bedîuzeman", *Dersên Civakî*, 388.
[32] Bedîuzemanê Seîdê Kurdî, "Maqaleyên Bediuzeman", Fîhresteya Armanc û Bernameya Wan Fikrên Bediuzzeman Seîdê Kurdî ye, *Rojnameya Volkanê*, Hejmar: 83-84, 2,3, 24 Adar 1909.
[33] "*H.b.*", 2,3.
[34] "*H.g.*", 392.
[35] "*H.g.*", 392

Bedîuzeman rewşa xetere ya osmaniyan dibîne û dixwaze edalet bête tetbîq kirin û bi meşrûtiyeta meşrû pirsgirêk bêne çareserkirin.

Dewleta Osmanî ji serdema Tenzîmatê û heta îro berê xwe daye Ewropayê û jiyaneke sekûler û ecnebî mînak girtiye. Hinek serdemên girîng di dewra osmaniyan a dawiyê de çêdibin lêbelê bi îlankirina Komara Nû re ev jî ji holê radibin û serdemeke nû, rewşeke nû dide destpêkirin. Ew serdemên giring jî ev in:

1. Fermana Tenzîmatê /Gulxane Hattê Humayûn (3yê Mijdara 1839an): Reformên heq û hiqûqên kêmaran têne dayîn (Xiristîyan û Cihû).

2. Fermana Islahatê (1856): Fermana Tenzîmatê memnûniyeteke fireh neanî û bi bandora dewletên Ewropî, ji bo heq û hiqûqên kêmaran hate îlan kirin.

3. Meşrûtiyeta I. (23 Kanûn 1876): Di derbarê azadiyê de hin tiştên baş çêbûn. Du meclîs hatin damezrandin; "Meclîsa Mebûsan û Meclîsa Ayanan."

4. Meşrûtiyeta II. (1908) hate îlan kirin, jixwe Bedîuzeman Seîdê Kurdî jî, ji bo ku ev fikr bê qebûlkirin, di nava eşîrên kurdan de danasîna meşrûtiyetê kiribû.

Êdî Dewleta Osmanî bi dawî bibû, di şûna wê de dewleta bi navê Tirkiye di 29ê Çiriya 1923an de hate damezirandin. Di serdema dawiya Dewleta Osmanî de çi bûyer û hedîsên kifşe hene, têkilêyên Bedîuzeman Seîdê Kurdî pê re heye, yan jî di aliyê têkildariyê de hatiye tawanbarkirin. Herwekî ji bo îlankirin û pejirandina Meşrûtiyetê xebat kiriye. Bûyera 31ê Adarê ji bo aşitî û sikunetê wek qasidekî/navçîtvan xebat kiriye. Çiqas qesta wî ji bo civatê baş be jî lê desthilatdaran ew ji bo xwe her gav tehlîke ditine. Bedîuzeman, di dema osmaniyan de bi dehan caran hatiye darizandin. Di "Dîwana Herba Orfî" de hatiye darizandin. Di dadgehê de parastineke navdar kiriye û ev parastina wî paşê ji aliyê hemnijadê wî Kurdîzade Ahmet Ramîz ve hatiye çapkirin.

**Rewşa Komara Tirkiyeyê**

Piştî hilweşandina Dewleta Osmanî, di şûnê de komareke nû wek şopgereke Ewropayî bi navê "Komara Tirkiye" di sala 29ê Çiriya 1923an de tête damezirandin. Avakirina "Komara Tirkiyeyê" bi qesteke xweş û bi beşdarbûna her cure miletan ve çêbûye, ji bo ku herkes xwe têde bibîne, bi dû'a û selewatan Meclîsa Gel tête vekirin. Lê belê di rojên dahatûyê de di navbera dewleta tirk û kurdan de nakokî çêdibe û ji bo kurdan înkar, asîmilasyon, kûştin, koçberî û talankirin dest pê dike.

Mustafa Kemal dema Meclîsê dide naskirin wiha dibêje; "Ev netew bi tenê ne tirk e, bi tenê ne çerkez e, bi tenê ne kurd e, bi tenê ne Laz e lewra hemû tevî misilman in, hemwelat in, bi hurmetî hev ve girêdayî ne; ji aliyê her cure maf, dad, civak, erdnîgarî û nijadî ve hiqûqa hev re rêzdar in."[36] Lê ev gotin di demeke kin de tê jibîrkirin. Êdî kurd ji bo "komara nû" li pêşiya yek milletiyê dibe mesele û pisrgirêk. Di derbarê van kirinên Komara Nû de Menek wiha dibêje: "*Meseleya kurd bi eslî, bi avakirina "dewleta nijadî"* re dest pê dike, lewra di tekoşîna "*Şerê Rizgariyê" de kurdên di nav sinorê Komara Tirkiyeyê de dijiyan, ji bo heq, hiqûq û nasnameyên wan gelek we'ed û peyman hatin dayin. Lê piştî damezirandina komarê, kirinên dijî daxwazên gelê kurd çêbûn û xeyalên wan şikestin.*"[37]

Komara nû dixwast kirinên xwe yên frengî bi darê zorê bi gelê kurd bide pejirandin, lêbelê gele kurd dijberî nişan dida. "*Bi damezirandina dewleta ne suriştî û sentetîk qumaşê kurd û dewletê bi hevdu negirt, kurd wek biyaniyan hatin nîşandan*."[38] Di Dewleta Osmanî de gelek gel bi reng û cudahiyê xwe ve jiyana xwe berdewam kirin lêbelê Komara Nû bi ser înkariyê hate damezrandin. Di vê mijarê de Huseyin Çelik wiha dibêje: "*Cudatiyên me yên kesane, çawa ne pirsgirêk in, pêwîst e cudatiyên gelerî û netewî jî nebin pirsgirêk*."[39]

Gelê kurd bi gelemperî dîndar bûn. Di serdema "komara tirkiyeyê" de sembolên dînî û jiyana dînî hate qedexe kirin. Bedîuzeman Seîdê Kurdî jî wek gelê kurd di çavê Komara Nû de mirovekî dijber bû û li gorî wan hereket nedikir. "*Bedîuzeman di çavên van kesan de wek sembolekî paşverû bû*."[40] Mustafa Kemal dixwest, bi destê Bedîuzeman Seîdê Kurdî ve kurdan bîne rê û bi komarê ve girê bide.

Komara Nû, bandoreke erênî li ser civaka Kurd nekir, ji bo kirinên nelêritî, gel nerazîbûna xwe nîşan da. Ji bo heq û hiqûqên Kurdan hin rêxistinan dest bi çalakiyan û serhildanan kirin. Bi serokatiya Xalit Begê Cibrî "Komela Azadiyê" hate damezirandin. Piştî serhildana Şêx Seîd a 29ê Hezîrana 1925an, gelek rêvebir û

---

[36] Taha Akyol, "*Ama Hangi Atatürk"*, Doğan Yayınları, İstanbul 2007, 109.
[37] Abdulkadir Menek, "*Bir Ulus Devlet Olarak Türkiye Cumhuriyeti*" Münazarat Konferansı, Merak Yayınları, Ankara, 2012, 144.
[38] İbrahim Akgün, "*Yeni Hal İnşa İdeali ve Kürtlere Düşen Görev*" Munazarat Sempozyumu *I*, Merak Yayınları, Ankara 2012, 409.
[39] Çelik," *h.g."*, 60
[40] Mardîn, "*h,g"*,. 10.

endamên Azadiyê jî tê de 47 kes li Diyarbekirê hatin bi dar ve kirin. Bûyera Şêx Seîd ji bo dewletê bû sedema îlankirina "Zagona Takrîrê Sukûnê." Ew zagon, ji bo tepisandina mixalîfên dîndar û kurdan bû. Gelek rojname û kovar hatin girtin, gelek nivîskar ketin zîndanan."[41] Ji bilî van bûyeran gelek bûyerên din jî hatin serê gelê kurd û rêvebirên wan. Mînakeke balkêş e, wekîlê Dêrsimê Hasan Hayrî, di Peymana Lozanê de yekitiya Kurd û Tirkan parastibu û wê parastinê bala M. Kemal kişandibû û bi daxwaza wî, Hasan Hayrî bi şal û şapikên Kurdî ve çûbû meclîsê. Di bûyera Şêx Seîd de, Hesen Hayrî, gelê Elezîzê ji bo dewletê teskîn dike. Li Diyarbekirê di "Mehkemeya/dadgeha Îstiklalê" de ji wî re tête gotin: "*Çima tu bi cil û bergê netewê Kurd beşdarî Meclisê bûyî."* [42] Ev rewş wek sûcekî ser tê ispatkirin û wî darve dikin. Fikr û ramanên serok û rêberên Komara Nû di derbarê Kurdan de baş nebû. Ji wan kesan yek jî hevalê Mustafa Kemal yê nêzîk Wezîrê Maf û Dadê, gotineke wiha ji bo gelê Kurd bi lêv dike: "Yên safî ne tirk in, di welatê tirkan de bi tenê yek mafên wan heye, ew jî mafê xizmetkariyê/xulamiyê û mafê koletiyê ye."[43]

Neyêniyên ji bo nasname û zimanê kurdan her tim berdewam bû û ji bo qedexekirina zimanê Kurdî, di 27ê Nîsanê ya 1934an de, "Zagona Îskanê" derdikeve, zimanê kurdî qedexe dibe. Di derbarê "Zagona Îskanê" de, di Mazbataya Muwakat Encumenê de wiha dinivîse: "*Armanc ew e, kurd bi lezgînî zimanê dayikê ji bîr bikin, tevî Tirkan bibin, di gundên mezin û taxan de yek ciyî de nebin niştecih*."[44] Bi destpêkirina vê zagonê, Kurd ji gundên xwe hatine dûrxistin, hatin û çûyina wan bi pismamên wan re hatiye asteng kirin. Ji welatên xwe gelek hatine dûrxistin. Di nava biyaniyan de jiyana xwe berdewam kirine. Bi lezî zimanê wan bi wan dane jibîrkirin.

Armanca pergaleke yeknijadiyê hatiye sazkirin. Yek ji wan parastvanên zagona nû, Wezîrê Karê Hundir Şükrü Kaya wiha dibêje: "*Ev zagon, axaftina yek zimanî, yekkirina ramanekî û welatekî yek hestiyar dê çêbike*."[45] Dema ev rewş berdewam dikir Bedîuzeman Seîdê kurdî li Wanê, di Çiyayê Erekê di înzivayê de bûye. Ji ber bûyera Şêx Seîd, bi hin kesên din re tête binçavkirin û berê wan didin rojavayê Tirkiyeyê.

---

[41] Menek,"*h.g.",* 145-146.
[42] Yenî Nesil Gazetesi, 3 Haziran 1989
[43] Abdulkadir Menek, "*Kürtler ve Kürt Meselesine Tarihi Süreç İçerisinde Genel Bir Bakış*" , 147 ji Engîn Ardiç nql., Sabah Gazetesî, 2 Adar2008,
[44] Menek, "*h.g.*", 145-150.
[45] Abdulkadir Menek, nql.,"*Yakın Tarîh Ansiklopedisi",* I-XI, Stenbol 1988. X, 50.

Ji bilî wan, di sala 1928an de zagoneke bi navê “Mufetişiya Ûmûmî” derdixin ku bi wê qanûnê serok û rêber, axa, şêx, seyîd, zana û gelek rewşenbîrên kurdan koçberî bajarên Rojavayê dikin. Dîsa di 27ê Îlona 1938an de, li Dêrsimê, gel bi komî têne kûştin û koçber dibin. Serokên eşîrên Dêrsimê û Seyîd Riza, bi îknakirina parêzgarê Erzinganê teslîm dibin, paşê ew û kûrê wî, bi yanzdeh kesên giregir ve li Elezîzê têne darvekirin. Seyîd Riza pêşiya dardakirina xwe wiha dibêje: “*Min bi dek û dolabên we re serederî nekir, ew ji min re bû ders; lê min jî, ji we re serî netewand, bila ew jî, ji we re bibe derd*.”[46]

Mirov çiqas dîroka gelê Kurd û rêberên wan mêze dike, gelek caran hatine xapandin û bi dijminên xwe zû bawer kirine. Ew jî her tim bûye sedema windakirina wan. Bedîuzeman Seîdê kurdî vê rewşa gelê kurd wiha tîne zimên: “*Em ku Kurd in, tên xapandin lê kesî naxapînin.*”[47]

Piştî bûyera Şêx Seîd û ya Dêrsimê gelek kesên navdar koçberî Binxetê/Rojavayê Kurdistanê dibin û jiyana xwe bi zor û zehmetî li xerîbistanê berdewam dikin. Wê demê Bedîuzeman Seîdê Kurdî jî bi kirinên xwe bala hikûmeta Enqerê dikişîne û wî vedixwînin Enqerê. Ew jî di 9ê Mijdara1922an de, diçe meclîsê û axaftinekê dike û mebûsan pîroz dike. Piştî vê xweşamediyê Bedîuzeman di nava mebûsan de di derbarê dîn de rewşsariyê dibîne, demekê tekoşînê dike û çend mebûs dest bi nimêjê dikin. Ev rewş bala M. Kemal dikişîne. Wiha dibêje: “*Ji me re seydayekî wek we leheng pêwîst e, em hez dikin ji fikr û ramanên we yên payebilind îstîfade bikin. Lê belê we pêşiyê bi nimêjê dest pê kir û cudatî xiste nava me*.” Bedîuzeman bi hîddeteke zêde, bersîva wî dide: “*Paşa paşa di Misilmantiyê de, piştî îmanê rastiya herî bilind nimêj e. Kê/kî nimêj neke xayin e, hukmê xayinê jî ji dîn derketine*.”[48] Piştî vê gengeşiyê hin mebûs endîşedar dibin ku M.Kemal tiştekî bîne serê Bedîuzzaman, lê belê ew hêrsa xwe nîşanê Bedîuzeman nade hê jê lêborînê dixwaze. M. Kemal hez dikir li nufûza Bedîuzeman Seîdê Kurdî sûd bigre, şûna Şêx Senûsî li herêma kurdan, wekî waîzê giştî wezîfedar bike, lê belê ew vê daxwaza Mustafa Kemal napejirîne. Li aliyekî din hewlên Bedîuzeman ji bo

---

[46] www.yenisafak.cam/gundem/iste-o-gizli-gorusme-2121755,15.03.2016

[47] Seîdê Kurdî, “*Dîwana Herba Urfî”*, Dersên Civakî, Weşanxana Zehra, İstanbul 2013, 159.

[48] Said Nursi, “*Emirdag Lahikasi”*, Yeni Asya Yayınları, Stenbol,2010, 333

Medresetuzehrayê li Meclîsê çêdibe û 163 mebûs destnîşan dikin lê belê medrese têne qedexekirin û ev xeyala Bedîuzeman nayê cî.

Dûre rêvebirên dewleta nû, li Ewropayê makezagonên nû anîn û medrese, tekye û zawiye girtin û cil û bergên kurdî û îslamî qedexe kirin. Yên li hemberî makezagonan rabûn wek Atifê Îskîlipî û Şêx Seîd, hatin binçavkirin û daliqandin. Herfên Erebî hatin qedexe kirin, di şûnê de herfên latînî 3yê Mijdarê ya 1928an de hatine mecbûrî kirin. Di derbarê van guherînan de Safa Mursel wiha dibêje: "*Komara Tirkiyeyê ya nû, di nava şeş tîran de hate sembolîze kirin: Berê tirên xwe dan aliyê dîndaran. Paşê bi modaya faşîstî û etnîkî, xwe qewmê necîp dibînin û înkarkirina Kurdan dest pê dike û asîmilasyon bi ser wan de tê tetbîqkirin. Komara Nû, li ser xîmê ewlehiyê hate damezirandin û çiqas muxalîf hebûn bi ser wan de çû*."[49] Di Komara Nû de tehlikeya herî girîng, dîndar û kurd bûn û bi wan re têkoşîn hate kirin. Lewra miletê kurd di wê demê de bi gelemperî "dîndar" bûn û bi du aliyan de hate tepisandin. Di derbarê vê rewşê de Mustafa Ekinci jî dibêje: "*Piştî damezirandina Komara Tirkiyeyê înkariya nasnameya kurdan, tunekirin û asîmilasyon, ev polîtikayên wiha; pirsgirêka kurd zêde ber bi nerêniyê ve bir, hetikand û mezin kir. Ev Komara Nû ku tiştên derbarî kurdan de dikir, ne zanistiyê ne jî hişmendiyê qebûl dikir. Ev polîtîkaya han bi tenê xweşa dijmênên tirk û kurdan diçû. Lewra hevpariya kurd û tirkan misilmantî bû, ev jî bi destê wan dihate berteref kirin. Ev poltîka bû sedema rewşa îro ya nebaş*."[50]

Komara Tirkiye, car caran bi polîtikayên cur be cur têkiliyên xwe bi gelê kurd re berdewam kir, lê bi sedî sed tu caran kurd weke hemwelatiyekî xwe nepejirand. Hin caran bi zanîn û nezanî polîtikayên xwe yên nerênî ji bo kurdan bi kar dianî. Evdirrehîm Zapsu di maqalêyeke bi navê Zanîngeha Wanê de wek anekdotekî wiha tîne ziman: "*Mîralay Tevfik Bey ji Waliyê Mêrdînê pirs dike, em çima li van herêman dibistanan venakin?" Walî jî; em bi nezanên wan re nikarin serederiyê bikin, ma dora xwendiyan.*"[51] Nêrîna dewletê ewqas seqet e ku

---

[49] Safa Mursel, "*Kürt Sorunu Bağlamında Kısa Bir Münazarat Analizi*", Münazarat Konferansı, Merak Yayınları, Ankara, 2012, 74.
[50] Mustafa Ekîncî, "*Münazarat Ekseninde Milliyet Fikri ve Demokras*i" Münazarat Konferansı, Merak Yayınları, Ankara, 2012., 111.
[51] Menek, "Said Nursî Hayatı Boyunca Peşinde Koştuğu İdeali Medresetül Zehra" Münazarat Sempozyomu I, Merak Yayınları, Ankara, 2012 , r. 515 nql., Ehlê-i Sünnet Dergisi, hejmar 102, Îlon 1951.

hemwelatiyên xwe ji xwe dûr dîtiye. Ji wan serkirdeyan kesekî din Mareşal Fevzi Çakmak e û wiha dibêje: “*Dibistana çi! Em bi nezanên wan re serî dernaxin, em ê çawa xwendiyên wan hel bikin*.”[52] Di navbera gelê tirk û kurd de pisrgirêkên girîng xuya nekirine, lêbelê rêvebirên dewletê; ji aliyê heq û hiqûqên gelê kurd ve, bi asoyeke erênî mêze nekirine ku ev rewşa xirab ji serê sedsala 20an heta îro berdewam dike.

**Rewşa Kurdistana Bakur**

Gelê kurd di berê de ji erdnîgariya Rojhilata Navîn de dijî û coxrafyaya ku tê de niştecî ne, jêre “Kurdistan” tê gotin. Navlêka “Kurdistanê” cara yekem di çavkaniyên misilmanan de, di serdema Selçûqiyan de, di navenda sedsala 12an de di wateya rêvebiriyê de hatiye bikaranîn. Nivîskar û berhemên wan ên ku cara ewilîn têgîna “Kurdistan” ê ya modern (di wateya îroyînde) bi kar tînin ev in: Marco Polo 1294(Seyhatnameler l.XİI) Hamdullah Mustawfî 1340 (Nuz’hat el qulûb,138) û 1347 berhema erdnîgariyê ya gelerînin”[53]

Di serdema zaroktiya Bedîuzeman Seîdê Kurdî de rewşa Kurdistanê di derbarê aborî, siyasî û perwerdehiyê de, li gorî kevneşopiya Kurdan berdewam dikir. Li welatê kurdan feodalîzm hikumferma bû. Di derbarê vê rewşê de Nihat Aktaş wiha dibêje: “*Di serdema ku Bedîuzeman Seîdê Kurdî hate dinyayê, di Dewleta Osmanî û Eyaleta Kurdistanê de feodalîzm hikumferma bû. Di aliyekî de îxtilafa navbera eşîran, di aliyên din de bi destê desthilatdariyên osmaniyan tunekirina rêvebiriya herêma Kurdan berdewam dikir*.”[54]

Netewa kurd ji aliye niştimanperweriyê ve xwedî fikrekê nebûn. Gelê kurd netewperwerî zêdetir weke eşîretperwer, axaperwer, şêxperwer û malbatperwerî difikirîn. Ew jî di pêşiya yekitiya kurdan de astengeke girîng bû. “Dema Komara tirkiyeyê ava bû, bi kurdan re hişmendiyeke milyetperweriyê hebûya, îro ew ê bi yekitiya Alema Îslamê re bimeşiya, pirsgirêkên hundirîn jî belkî dê tunebûya.”[55] Lê îro mirov dibîne di nava Rojhilata Navîn de “pirsgirêka kurd!” wek nexweşiyekê di nav me de sekiniye, ger ev nexweşî bi reçetekeyeke mirovahiyê neyê derman kirin,

---

52 Menek, “*h.g.”*, 516.
53 Mehrdad R. Izady, “*Kürtler”***,** Doz Yayınları, İstanbul, 2011, 109.
54 Aktaş,” *h.b.”*, 107.
55 Ahmet Keleş, “*İnsanlığın Tekamülü Bağlamında Bediüzzamanın Müazarat Risalesindeki Kürt ve Kürtçe Vurgusu*”, Munazarat Sempozyumu I, Merak Yayınları, Ankara, 2012, 90.

her tim pêşiyê ji bo gelê kurd paşê jî ji bo gelên derdorê dê berdewam bike. Ahmet Keleş vê kêmhişmendiya netewetiya kurdan wiha şîrove dike: "*Qewmek xwe weke miletekî nezane, ev rewş ji bo wan problem e. Dewleta kurdan ya Bakurê Îraqê derengmayineke hişmendiya netewitiyê ye*."[56] Kurd çima wek problemekî tên zanîn, lêwra her tim wek pirsgirêkeke siyasi hatine dîtin. Mirov bi çavekî siyasî li kurdan binêre, çareserî ne mumkun e. Netewa kurd ji mêj ve wek çemekî herikiye, mirov bi çavekî demkî lê mêze bike, yê her tim wek pirsgirêkekê berdewam bike. Dema mirov bi çavekî tune ûnê mêze bike, mirovê çawa vê meseleyê çareser bike. Lewra dema kok û gewde di jiyanê de hatibe rakirin, ew term bixwe xwe nas nake û xwe tiştekî din dizane, herwekî tête gotin, her dar li ser koka xwe şîn dibe. Ev nêrînên rojane, demkî û înkariyê bûye sedema ku kurd jî xwe nas nekin û ji bilî kurdîtiyê xwe tiştekî din bizanin. Bi bişaftina gelê kurd, di nav çar dewletan de hatine perçekirin û kesayetiya wan jî wek coxrafiyaya wan hatiye perçe perçe kirin. Ji ber vê yekê, di derbarê hiş, hest, orf, 'edet, kevenşopî, aborî, sîyasî û civakî de nêrînên wan ji hev cuda bûne. Ji bo wan sedemên civakî û siyasî, her qismek kurd di bin desthilatdariya kîjan dewletê de bûne wisa hatine naskirin û xwe wisa zanîne. Mînak; kurdên Tirkyeyê, kurdên Îranê, kurdên Sûriyeyê, kurdên Îraqê, kurdên Ûris û di dawiyê de kurdên dîasporayê. Lê kurd bi tenê wekî kurd nehatine zanîn.

Nêzî esrekî ye ku asimilasyona kurdên Tirkiye berdewam dike û zimanê wan ber bi tunebûnê ve diçe. Ji ber vê yekê, gelekî ji kurdan zimanê dayikê ji bîr kirine, êdî ji wan re yên "koka wan kurd" tête gotin. Ev jî di demeke nêz de bi xwe re ji holê rakirina zimên tîne.

Têkiliya kurd û tirkan a yekemîn a ku tê zanîn, di sala 1071an de bi şerê Milazgirê çêbûye. Di vê demê de desthilatdarên kurdên Merwanî li devera Diyarbekir, Farqîn û Nisêbînê niştecî bûn. Piştî Milazgirê 330 sal şûn de cara duyemîn; weke fermî di sedsala 16min de (1514) bi protokola Amasyayê peymanek di navbera Yavuz Sultan Selim û eşîretên Kurdan de çêbû."[57] Di vê herêmê de kurd di karên hundir de serbest bûn û bi nasnameya xwe, bi rihetî dijiyan. Cirm û leşker didan navendê, di karên xwe yên derveyî de girêdayî navendê bûn. Weke pergaleke

[56] Keleş, "*h.b.*", 91.
[57] Abdulkadir Menek,"*Kürtler ve Kürt Meselesine Tarihi Süreç İçerisinde Genel Bir* Bakış", Münazarat Konfeansı, 120-123.

federalîst statûya Kurdan berdewam dikir. Piştre serdema di Kanunı Sultan Süleyman de heq û hiqûqên Kurdan hatin zêdekirin. Di wê serdemê de mîrektiyên kurdan wekî Hikumatên Ekrad dihatin naskirin.

Kurdistan, di sala 1639an de, di navbera Safewî û Osmaniyan de bi peymana "Qesra Şirînê" bû du perçe."[58] Minasebeta kurd û tirkan, di serdema Yavuz Sultan Selim heta Tenzîmatê zêdeyî sêsed pêncî salî bêpirsgirêk berdewam kir. Di dawiya osmaniyan de, gengeşiya kurd û tirkan, bi serhildana Mîrê Botan, di dema Evdilhemîdê II. de çêdibe. Mîr Bedirxan, di sala 1843an de serxwebûna xwe îlan dike. Osmanî bi artêşê ve diçin ser û wî têk dibin, wî û malbata wî nefiyê Stenbolê dikin.[59]

Çawa rewşa Dewleta Osmanî nexweş bû, rewşa kurdên bakur jî wek netewên din baş nebû. Lê belê di fikr û ramana cudatiyê de kurd ji gelên din cuda difikirîn. Her miletî çareseriya xwe dinihêrî, lêbelê kurdan pêşeroja xwe bi osmaniyan ve girêdabûn.

Bedîuzeman Seîdê Kurdî, ji bo ku kurd heq û hiqûqên xwe bizanibin, piştî îlankirina Meşrûtiyetê vedigere Herêma Kurdistanê û peşiyê meşrûtiyetê bi wan dide naskirin û di derbarê rewşa dinyayê de wan agahdar dike. "*Nûrsî, piştî Meşrûtiyeta duyem li nav eşîrên kurdan digere, ji wan re Meşrûtiyetê, ku îro jê re demokrasî tê gotin dide naskirin; gilî û gazindên eşîran guhdar dike, daxwazên wan çi ne, di cî de tespît dike û digel agahiyên di derbarê wan de ên cem xwe rewşa eşîran car din teyîd dike*."[60]

Miletê kurd bi gelemperî xwediyê fikreke cudaxwaz nebûn. Çendî fikra milyetperweriyê ya ku ji Fransayê belavî dinyayê bibû, netew hildabûn bin bandora xwe jî, vê yekê bandoreke kêm gihandibû netewa kurd. Lê ji serdema Mehmûdê duyem bigre heta îlankirina Tenzîmatê, "ji bo otorîteya navendî qahîm bibe, desthilatdariya eyalet û sencaxên Kurdan têne kêm kirin. Ev rewş xweşa serok û rêvebirên eşîrên kurdan naçe. Ji bo vê sedemê hin serhildan çêdibin."[61] Ji bilî kurdên bakur, di perçeyên din de jî serhildan çêdibin. Di sala 1830an de, li Rewandizê begê

---

[58] Menek,"*h.g",120-123*
[59] Menek,"*h.g", 126-127*
[60] Mustafa Ekinci, "*h.g*", 107-108.
[61] Menek, "*h.b.*", 125.

soran, bi destê M.Reşîd Paşa, di 1837an de li Şingalê serhildana kurdên êzidî bi destê kurd Mihemed Paşa têk diçin. Welhasil çiqas serhildanên wan çêdibin, wisa jî bi destê eşîreke din tête pûçkirin.

Dema Bedîuzeman Seîdê Kurdî li Stenbolê ji bo perwerede, heq û hiqûqên Kurdan xebat dikir, hemnijadê wî Evdiselam Berzanî jî li Başûrê Kurdistanê bi serokê eşîrên kurdan re civînekê çêdike (1907). Dixwaze di Herêma Kurdistanê de zimanê kurdî bibe zimanê fermî, rêvebirên mulkî yên kurdîzan bên hilbijartin, dadgeh li gorî şerîeta îslamê bêne damezrandin û cirma dewletê ji bo îmar û dibistanên nû bête xerckirin. Ji bo van daxwazan di navbera Evdilselam Berzanî û osmaniyan de pevçûn derdikeve. Di dawiyê de Evdilselam Berzanî li parêzgeha Musilê tête darvekirin"[62]

Kurdan rizgariya xwe di rizgariya Dewleta Osmanî de didîtin. Bedîuzeman heq û hiqûqên miletê kurd di nava Dewleta Osmanî de weke "Cemahîrê Mitefîqayê Îslamiye/Yekîtiya Komarên Îslamî" didît. [63] Lewra gelên ku nufûsên wan kêm bû dê heq û hiqûqên wan ji aliyê navendê ve nehata binpêkirin û bi vê wesîleyê kurd jî layê heqê xwe ve dê ewle bibûna. Ev proje jî weke federasyonê bû ku di federasyonê de her milet di hundirê xwe de azad e, li derve girêdayî navendê ye.

Bedîuzeman Seîdê Kurdî hezkirina milî erênî didît, dixwest ji bo pêşeroja gelê xwe bixebite û wiha digot: "*Ew muhebeta milî ya ku di nav ferdan de ye, mîna wê cazîbeya cuziya di nava zerreyan de, bi wê çêbûna xwe ya encamî, dê wan esasên navendî ku aliyê me yê yekîtiyê ye, weke encam bide.*[64] Bi dîtina Bedîuzeman, dema hezkirina netewî çêbibe yekitiya gelan jî çêdibe. Dema yekitiya miletekî çêbibe wê demê şaxa şaristaniyê jî di nava wî gelî de geş dibe. Pêwîst e, bi xwendin, hezkirin û hişane hereket bikin û wisa ser bikevin. Bedîuzeman Seîdê Kurdî di gotineke xwe de wiha dibêje: "G*elî kurdan! heke beg, axa hetta qendera şêxên we jî, pişta xwe bidin qewetê(xwe bi qewetê piştrast bibînin) û şûrên wan tûj be jî, bêguman teqez dê bikevin. Hem jî musteheq in. Heke pişta xwe bidin aqil û di ciyê cebrê de muhebetê bi kar bînin, hestên wî, ger tabiê fikran bin, ew dê(bi paş de) nekevin, dibe ku bi pêş ve*

---

[62] Mesud Barzanî,"Barzani ve *Kürt Ulusal ve Özgürlük Hareketi*, Doz Yayınları, çapa yekem, İstanbul ,2003, 25.
[63] Seîdê Nursî , "Xutbeya Şamê*", Dersên Civakî*, 59.
[64] Seîdê Kurdî, "Nutuq"**,** *Dersên Civakî*, 25.

*biçin.*"[65] Yanê demên dinyayê çi dixwaze pêwîst e kurd jî wisa tevdîrên xwe bigrin. "*Bi vî awayî, wê îtîhad û ew rabiteyên ku muhebeta milî pêk tînin, dê zexim û pêt bike û ew ava şaristaniyê jî, di wan mecrayan de dê biherike û dê van hêmanên cihêrengî, bigihîne astekê û wê ahenga tereqiyê, bi newa û nexmeyeke xweş, di wan guhên hesas ên biyaniyan de şingînê bike.*"[66] Pirsgirêka gelê kurd bi sed salan e di nava xwe de yekitiya xwe çênekiriye, tehemulên hev û serokên xwe nekirine. "*Di netewa kurd de qabilyetên wisa hene dikare bi serê xwe şaristaniyan damezirîne, lê yek derdên wan heye ew jî kêşmekêşî/îxtilaf û di bin rêvebiriya yek serokatiyê de berhevnebûne.*"[67] Di van sedsalên dawîn de, ku tê zanîn, her eşîreke Kurdan bi serê xwe hereket kiriye, ew jî bûye sedemên belavbûna wan. Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji Hikumeta Osmanî dixwaze, qabiliyetên milletan derxîne pêş. Hîseke reqabetî di nav gelan de peyda bibe ku pê tereqî bikin. "*Lewra heke ev daxwaz neyê cî, wê demê îxtilafî çêdibe û dibe sedema gengeşiyê. Ew hesta reqabetê ku di hikmê keldûmana wê maşîneya pêşveçûnên şaristaniyê de ye peyde bibe û bike ku pêşbazî, di vê hêlê de dest pê bike. Heke wisa nebe, fikra adema merkeziyetê ku van rabite û mecrayan ji hev ferq bike.*"[68]

Bi tesbîta Bedîuzzaman Seîdê Kurdî, wê demê, gelê kurd di aliyê hestên netewî de kêmasiyên wan gelek hene, lewma dixwaze herkesek di tanga xwe de bi kirinên xwe derbikevin pêş û di nava fikrê milî de bipêjin. Lewra dijberitiya Bedîuzeman ji bo serxwebûn, federaliyet û tiştekî din nîne, çi dibe bila bibe lê zirar negihîje netew û dîn. Ji çareseriya rêvebiriya gelan re wiha dibêje: "*Îlahî, hêvî dikin ku nexasim piştî çil-pêncî salî, taîfeyên Ereb, mîna Komarên Hevgirtî yên Emerîkayê, hûn jî bikevin weziyeta herî bilind û bi hakimiyeta Îslamê ku ketiye esîriyê, mîna zemanê berê, di nîvê kureya erdê de hetta belkî di zaftirînê wê de muweffeq bibin.*" Lewra çiqas li ser navê Ereban dibêje lê di mizgefta Emewiyan de gazî timamî gelên misilman dike. Bi tesbîta Muhyiddin Kaya; "*Tiştên ku miletê Kurd pare ve hîştiye, kêmasiya netewiyê, meyla axatî, xweserîbûna bêfeyde, quretiya netewî ya kesan e. Lê van karekteran, di nava milyetperweriyê de mirov dikare bihelîne. Di aliyê*

---

[65] Kurdî, "Munazarat", *Dersên Civakî,* 87.
[66] Kurdî, "Nutuq*",Dersên Civakî*, 25.
[67] Sağlam, *h.b.*, 17.
[68] Kurdî, "Nutuq*",Dersên Civakî* , 25.

*dagirkeran de hatibe îstilakirin, ger exlaqên wan bi tevayî xira nebûbe dikare mafên xwe dîsa bistîne*."[69]

Rêvebirên Osmanî di serdema Îttihadiyan de, bi çavekî baş li gelê kurd mêze nedikirin. Îttihadî jî, du cure bûn: Cureyeke wan nijadperestê tirkan bûn, cureyeke wan jî lîberal bûn. "*Baskê Îttihadiyan ên nijadperest, bi çavekî wek haşereyan li gelê kurd mêze dikirin. Baskên lîberal jî kurd weke zarokan mihtacî xwedî derketinê didîtin*."[70] Bedîuzeman jî fikra"ademî merkezîyet" û muxtariyetê ji bo kurdên wê demê, ji karê zêdetir zirardar dîtiye. Li gorî wî, wê gelê Kurd, di nav dest û piyên dijminan de bipelçiqiya. Ji bo "ademî merkezî" nêrîna Bedîuzzaman Seîdê Kurdî û rexneyên wî demkî û stratejîk bû. Lewra gelên di nava osmaniyan de ji aliyê terakiyê ve weke hev nebûn, bi taybetî gelê Kurd ji aliyê hestên niştimanperweriyê ve xwedî dezavantajeke mezin bû. Rewşeke wiha dê bibûya sedema binketina gelê kurd. Bedîuzeman, fikra Prens Sebahaddîn a ademê merkeziyetê weke fikreke xweş dipejirand. Îtîraza Bedîuzzaman Seîdê Kurdî ew bû ku gelê kurd û yên wek kurdan di wê serdemê de ji bo vê pergalê ne amade bûn. "Ademê merkeziyet/tunebûna navendê bi xwe re damezirandina otonomiyan dianî lêbelê rêvebir ji aliyê hestên niştimanperweriyê ve netemam bûn, vê jî bi xwe re xetereyek dianî ku rêvebirî bikeve destê feodalîstan. Ew jî dê bibûya sedema îstilayên nû û dagirkeriyên nû."[71] Bedîuzeman jî dixwest wekî alternatîfekê, kurd jî, ji bo heq û hiqûqên xwe, bi gelên din re bi prespektifeke îslamîst di nava "Îttihada Îslamî" de wekî her netewekî xwedî heq û hiqûq bin û xwe girêdayî navendekê bikin. Ev damezrandin jî weke "Cemahira Mutefîqayê Îslamiye"[72] dihate bi nav kirin. Armanca "Yekitiya Komarên Misilmanan" ew bû ku netewên cuda xwediyê heq û hiqûq bin û bi girêdayî navendê bi hev re bijîn. Cemahirên Mutefîqayên Amerîka îro çawa bi makezagonê eyaletên cuda cuda ne, herkesek bi makezagona xwe rêvebiriya xwe dike û ji misilmanan re jî tiştekî wisa pêwîst dibîne. Wê demê ereb, kurd, tirk û hwd… dikarin bi şertên wekhevî û bi edeletê bi hev re bijîn. Lewra yekitiya yek alî her tim ser neheqiyê berdewam dike. Her gav di nava xwe de zilm û zordariyê disepîne. Pêwîst e pêşiya

[69] Kaya, *h.g.*, 270-272.
[70] Kaya, *h.g.*, 273.
[71] Kaya, *h.g.*, 275.
[72] Seîdê Nursî, *Emirdağ Lahikası*, 352.

biratiyê divê di makezagonê de wekhevî bê saz kirin. Bang û propagandaya yekitiya navbera gelan, car caran ji gelên serdest û xwedî dewlet re, xizmetê dike.

Di serdema osmaniyan de, di nav kurdan de ya herî kêm yekitî û bêperwerdehî bû. Bedîuzeman ji bo ku nexweşiyên kurdan tedawî bike, reçeta dermanên kurdan, di rojnameya Kurd Teawun û Teraqî"yê de weşandibû. Di vê gotarê de wiha dibêje: *"Ev serê panzdeh salan e ku min di nav îhtiyacên xwe de, ji xwe re, du hedef kiribûn armanc. Min ji xeynî van herduyan, tu navgîneke ayende/pêşeroja Kurdistanê temîn bike, nedît. Yekemîn, yekbûna neteweyî ye û ya dûyemîn jî ew e ku bi ilmên (zanînên) dînî û fennî lazim e, di dewr û serdema me de, Kurd li her aliyî bên tehsîlkirin*."[73] Ahmet Yıldız, li ser mijara "Munazerat"ê disekine û ji bo paremayina gelê Kurd van tesbîtan dike: "*Di nava netewa Kurd de tunebûna perwerdehiyeke nûjen, xirabûna medreseyan û kêmasiya dibistanan*."[74] Lê mirov di wê serdemê de dibîne ku di Dewleta Osmanî de gelek dibistan û zanîngeh beş bi beş vedibûn, lê di Kurdistanê de ji bo dibistan û zanîngehan dilxwestineke wisa tunebû. Di dewra osmaniyan de hin dibistan hebûn lê jimarên wan kêm bûn, yên din jî ermenan ji bo xwe vekiribûn. Medreseyên heyî jî bi ûsul û edetên berê berdewam dikirin.

Rewşa miletê Kurd, ji yên dîtir çêtir nebû. Hinekên rewşenbîr, zana û alimên Kurdan li Kurdistanê, hinekên wan li Ewropayê û hinekên wan jî di Paytextê Osmanî de ji bo heq û hiqûqên kurdan tekoşîn dikirin. Di derbarê pêşeroja gelê kurd de di navbera serok, revebir alim, zana û rewşenbîrên Kurd de fikrên cuda hebûn. Hinekan serxwebûn, hinekan otonomî dixwestin û hinekan jî rizgariya weke eyaleteke bi osmaniyan ve girêdayî didîtin. Ev cudatiya daxwazên kurdan dibû sedema îxtilafê, ew jî hêza wan dişkand. Bêsiûdiyeke gelê Kurd ew bû ku di nav dewletan de perçe perçeyî bûn. Piştre jî hêza dewletên desthilatdar ji yên kurdan xurttir bû. Hinek mîrektiyên bi serê xwe hebûn, lêbelê dema piçekî bi xwe ve bihatana desthilatdaran serê wan dipelçiqandin, yan jî îxtilaf dixistine nava wan.

Di sala 1789an de Şoreşa Fransayê çêbû û bandor da ser her aliyê dinyayê. Dewleta Osmanî jî ji wê şoreşê para xwe girt. Lewra Dewleta Osmanî jî, ji gelek

[73] Seîdê Kurdî, "Kurd Muhtacî Çi ne?", *Dersên Civakî*, 363.
[74] Ahmet Yıldız, "1910 dan Bugüne Birlikte Düşünmeye Davet Yada Bediüzzamanın Münazaratı" *Munazarat Konferansı*, Merak Yayınları, Ankara 2012, 6.

miletan pêk dihat. Piştî Îhtilala Fransayê, ji bilî gelê kurd temamê netewan serî hildan û bûne dewlet. miletê kurd jî, ji bo biratiya gelan û biratiya dînî, pêşeroja xwe bi hevpariya osmaniyan ve girêdan û ji wan cuda nebûn. Di dawiya serdema osmaniyan de, di serdema rêvebiriya Îttihad û Terakiyê de, hin nijadperestên tirk dibin sedema hişyarbûna rewşenbîrên kurd. Lêbelê dîsa jî, di vê rewşa serbestî de, gelek rojname, kovar, komel, kulûb û cemiyetên Kurd ji bo heq û hiqûqên xwe têne damezirandin. Hinek saziyên Kurdan weke; "Kurd Teavun ve Teraki Gazetesi, Kurd Teali Cemiyeti, Roja Kurd, Hetawî Kurd, Cemiyeta Hevî, Yekbûn û Xoybûn hwd…" têne demezrandin. [75] Di pêşiya îlankirina Meşrûtiyetê de, xwendevan û rewşenbîrên Kurd û Tirkan tev tekoşîn dikirin. Kengê rêvebirî kete destê partiya Îttihad û Terakiyê, rewş vegûherî û ji bo nasname, heq û hiqûqên Kurdan qedexekirinan dest pê kirin. Ji bo van sedeman, rewşenbîrên kurdan ji wan veqetiyan û ji xwe re rêyeke din şopandin. Îhsan Nûrî Dêrsimî di bîranîna xwe de ji bo nijatperestiya endamên Îttihad û Terakiyê wiha dibêje: "*Armanca Îttihad Terakiyê ew bû ku yên ne Tirk bûn wan asîmîle bikin. Ji bo wê di nava ciwanên Kurd de dijminatiyeke Tirkan geş dida*."[76] Tê xuyan polîtikayên Îttihad Terakiyê dibûn sedema hişyarî û dîtina rûyê dewletê yê eslî, hem jî dibû sedema zordarî û tunekirina gelê kurd.

Heta şerê Cîhanê yê yekem nijadperestî û dijminahiya li dijî kurdan di nav rêvebiriya Îttihad û Terakiyê de roj bi roj zêde bû. Osmaniyan dixwest mabeyna xwe û kurdan xweş bikin ku dijî dijminan bi hev re şer bikin. Di "Şerê Rizgariya de" kurdan di her cepheyê de tekoşîn kirin. "Hem di nav Artêşa Osmanî de leşkerî dikirin, hem jî li hemberî Artêşa Ûris şer dikirin. Gelê kurd, di vê serdemê de bedeleke giran dide. Dema Komara Tirkiye tête damezirandin, piştî çend salan, bi taybetî ji sala 1925an pêve di vê demwariyê de peyvên "Kurd-Kurdistanê" tên qedexe kirin, lêbelê ev peyv, ji aliyê rêvebiran ve dihatin bikaranîn û derbasî girtename/zabiteyan jî dibûn. Paşê ev peyvên nasnameya kurdan, ji aliyên rêvebiran ve nehatine bikaranîn."[77]

Gelên ku Komarê bi hev re dadimezrînin, înkariya wan tevan tête kirin û hemû weke milletê Tirk têne hesibandin. M. Kemal wiha dibêje: "*Em raste rast*

[75] Mehmet Şükrü Sekban, *Kürt Sorunu*, Kamer Yayınları, İstanbul, 1998, 26.
[76] Menek, *Münazarat Konferansı*, 134; nql. ji Dr.Nûrî Dêrsimî.
[77] Menek, *Münazarat Konferansı*, 138-139.

*milliyetperwer in û em nijadperestên Tirk in*."[78] Serokwezîr İsmet İnonü jî, di aliyê nijatperestiyê de wiha dibêje: "*Erka me ew e ku kesên di nava vî welatî de dijîn em hemû bikin Tirk.*"[79] Wezîrê Dadê yê Tirkiyeyê jî ji bo asîmîlekirina Gelê Kurd, bi ramaneke nijadperst wiha dibêje: "*Tirk di vî welatî de efendiyê yekane ne, kesên ji Tirkên xwerû nînin, di vî welatî de yek mafên wan heye, ew jî xizmetkariya Tirkan e.*"[80] Wekî ku tê dîtin piştî damezirandina Komara Tirkiyeyê heq û hiqûqênKurdan hate înkar kirin û zimanê wan hê jî wek zimanê fermî nehatiye pejirandin.

Ji ber fikrên sekûler û nîjadperestiyê pirsgirika Kurd neyêniya xwe roj bi roj zêdetir nişan da. Projeya Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya Medresetuzehrayê çareseriyeke xurt bû lêbelê nehate tetbîq kirin. "*Bedîuzeman, ji bo ku tirk û kurd li ser îtifaq bikin xaleke hevpar e. Bedîuzzaman Seîdê Kurdî qasidê aşitiyê ye, pira aşitiyê ye. Kurd û tirk di wê xalê de dikarin bên cem hev. Bi berhem û projeyên wî dikarin aşitiyekê çêbikin.*"[81]

Piştî damezirandina Dewleta Tirkiyeyê, Gelê Tirk gihîşte heq û hiqûqênxwe yên mîllî, lê Gelê Kurd ji wan mafên mîllî mehrûm man. "*Ji wan herdu milletan yek hişmendiya miletbûnê temam kir, yek jê mehrûm ma. Ji bo çareserkirinê pêwist e, kurd jî herî hindik, tirk çawa xwe tirk hîs dikin, ew jî xwe wisa kurd hîs bikin.*"[82] Yanê çareseriya kurdan bi hişyarbûna nasnameya kurdîtiyê ve girêdayî ye. "Reçete, dema nexweşî nû dest pê kir bête bi kar anîn, helbet ji bo saxkirin û tedawiyê tesîrekê dide, lê reçete di dema nexweşiyê de neyête bikaranîn û nexweşî neyê tedawî kirin nexweşî jî roj bi rojê giran dibe, êdî dibe kangren. Di serî de ji bo vê meseleyê "samimîyet" pêwîst e."[83]

Li pirsgirêka kurd bi hişekî ewlehiyê bête mêzekirin çareserî çênabe, ji bo çareyeke esasî, pêwîst e nexweşî hemû bên dîtin. Pirsgirêka Kurd; pirsgirêkeke aborî, siyasî, psîkolojîk, sosyolojîk û netewî ye, pêwîst e ev mesele bi van sernavan ve yek û yek bi hûrgilî bê analîz kirin. Çawa Tuncel jî dibêje: "*Pirsgirêka kurd bi hişekî ewlehiyê wek mantiqa "Hemîdîtiyê" were çareser kirin nabe, lewra sedsal e ev rêbaz*

---

[78] Mehmet Bayrak, *Kürt Tarihi,* Doğan Ofset, İstanbul, 2014, 28.
[79] Bayrak, *h.b.*, 28.
[80] Bayrak, *h.b.*, 28.
[81] Vehbi Karakaş,"1911 Tarihli Kürt Reçetesinin Günümüz Kürt Meselesi İle İlgisi" *MunazaratKonferansı,* Merak Yayınları, 161-162.
[82] Keleş, *h.b.*, 91.
[83] Ekinci, *h.b.*, 112.

*berdewam dike, lê tu çareserî jê derneketiye.*”[84] Îro jî car caran rahijên siyasî û sîvil çêdibin, lê hê bandora ewlehiyê, leşkeriyê ser vê pirsgirêkê berdewam dike. Ev rewş jî dibe sedema pevçûn û bêçaretiyê. “*Çawa ji bo pirsgirêkên siyasî û civakî bi hişekî mirovahî tê çareser kirin ev pirs jî, bi rêyeke makezagonî, parlemenî, dadî, hiqûqî û bi çavekî wekhevî bê çareserkirin. Di vê meselê de, “heq, hiş, marîfet, zagon û menfa'etê gelemperî, tiştên piştevaniya xwe ji hêzê hildidin çare nînin*.”[85]

Dema Bedîuzzaman Seîdê Kurdî di nava eşîrên kurdan de digeriya jê tê pirsîn “*Ev hikûmat û tirk, her bi çi awayî bibin, em nikarin rehetiyê bibînin û bi pêş ve biçin*.”[86] Gilî û gazindên xwe derbarê desthilatdaran dikin û ji rastbûn û samimiyeta wan re şuphedar in, lê Bedîuzeman vê wek astengiyek bêxîretiyê dibîne û wan wiha agahdar dike û wiha bersiva wan dide: “*Nexwe hûn, giliyê xwe, ji xwe bikin(bila şikayeta we, ji we bi xwe be). Heke hûn her qebehetê bavêjin ser hikûmet û tirkan, hûn dê zehf bên xapandin.*”[87] Lewra wekîlên we yên baş dê we bi her alî ve temsîl bikin, ji bo heq û hiqûqên xwe tekoşîn bikin û hûn wan bişînin navendê, serguhiya we li ser wan be, wê demê derdên we yên mîllî wê çareser bibe. “*Kurdno! nezaniya xwe biterikînin, bi xwendin û fezîletê di qada şaristaniyê de bilind bibin, desthilatdar xeletiyan jî bikin, wê ji wan xeletiyên xwe bizivirin*.”[88]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî jî dixwaze kurd bibin xwediyê kaniyekê û her tim serfiraz û serbilind bin, bi her mileti re dostaniya wan hebe. Li dijî dijminahiyê hezkirin di navbera wan de hebe lê dostaniyeke wekhevî, bi maf û dad ne ku dostaniyeke zelîlane û bindestî. “*Lê belê ne dostaniyeke ku we bixe zelîliyê; belkî digel muhefezekirina îzzeta millî, dirêjkirina destê aştiyê*.”[89] Îro jî ev hevoka Bedîuzeman Seîdê Kurdî nehatiye fêm kirin. Hin tirkên dîndar û yên din dema behsa biratî û wekheviya tirk û kurdan tê kirin, dibêjin, efendîtiya me û mezinahiya me qebûl bikin.”[90] Lê dostanî û biratî wekheviyê de bi biratiya rasteqîn de derbas dibe. Pêwîst e her qewmek bi nasname û xwedî maf û dadê xwe be. Bandora perwerdehiya

---

[84] Mustafa Tuncil/Safa Mursel,”Münazaratın Sivil ve Özgür Toplum Öngörüsü”, *Munazarat Sempozyumu I*, Merak Yayınları, Ankara, 2012, 292.
[85] Mustafa Tuncîl/Safa Mursel, *h.b.*, 293
[86] Seîdê Kurdî, “Munazarat*”,Dersên Civakî* , 92.
[87] Kurdî, b.n., 92-93.
[88] Levent Bilgi,”Münazaratta Kürtler Ayrılık Veya Onurlu Birliktelik” *Munazarat Sempozyumu I*, Merak Yayınları, Ankara, 2012, 309.
[89] Kurdî, “Munazarat”, *Dersên Civakî*, 105.
[90] Bilgin, *h.b.*, 312.

Kemalîzmê li ser her kesî çêbûye, bi tayebtî ew rêgezên bi navê "miliyetperestî/nijadperestî û dewletperestî"yê pir zirar daye gelê kurd, çawa Murat Çiftkaya wek îtîrafekê wiha dibêje: "*Min ji xwe re digot; "ev pirtûka Munazeratê ji bo tirkan hatiye nivîsandin, Bedîuzeman jî bi eslê xwe tirkekî Ispartayê ye û koçberî Kurdistanê bûye û fikrê wî jî tirkperestî dizanî*."[91]

Lewra nasnameya mirovan, heq, hiqûq û kesayetiya mirovan e, kesayetiya gelan e. Çawa taybetiyên kesan hene, wisa jî taybetiyên miletan jî hene. Pêwîst e ew taybetiyên gelan werin parastin ku ew netew bikaribe jiyana xwe ya netewî berdewam bike. "*Ji bo her miletî ya ku cesareta miliyeta wî tîne qadê û mihafazaya netewa wî têde hêzekî berhev dike ji bo wê hewzek heye*."[92] Tirkiye ji darbeya Îttihad û Terakiyê ya 1908an ve va sed salan zêdetir e hetanî îro çi cara bêhna wan teng dibe, çekên xwe rastî gel dikin."[93] Bi vê tesbîtê jî em dikarin bêjin ku di Komara Tirkiyeyê de hin kes û alî bi rêyeke necamêrî bi salan heqên gel binpê dikin. Lewra Gelê Kurd di jiyana xwe de nîşan daye, di nava Komara Tirkiyeyê de bijî, lê pêwîst e kêmasiyên Komara Tirkiyeyê yên di derbarê Gelê Kurd de bêne rakirin. Pirsgirêka Gelê Kurd ya ku ji sedsalî zêdetir e berdewam dike pêwîste bi rêyeke mirovane bê çareser kirin ku bi ya me çareseriyên wê jî ev in: Yekem, bi gelemperî Gelê Kurd dixwaze tev bijî lê pêwîst e, înkarî û bişafkirin miheqeq biguhere. Komara niha divê bibe komareke demokratîk û nasnameya kurdan di makezagonê de bê pejirandin. Duyem, di perwerdehiyê de, astengên pêşiya zimanê kurdî bên rakirin. Sêyem, navên gund û bajarên kurdan yên hatine guherandin, bêne vegerandin, bi lezgînî di her aliyê aboriyê de geşedan bêne çêkirin, aşitiyeke gelemperî çêbe, ji bo çareseriyeke mayînde fikr û ramanên gel bê hildan û ev mafên sereke di makezagonê de bên qebûl kirin.

91 Murat Çiftkaya,"Said-i Kurdî den Said-i Nursi' ye: Bediüzzaman ve Milliyet" *Munazarat Sempozyumu I,* Merak Yayınları, 366-367.
92 Kurdî, "Munazarat", *Dersên Civakî,* 93.
93 Altan Tan, *Değişen Ortadoğuda Kürtler*, Çira Yayınları, Stenbol, 2011, 149.

# 1. BEŞA YEKEM

## 1.1. JIYANA BEDÎUZEMAN SEÎDÊ KURDÎ

Seîdê Kurdî di sala 1877ê mîladî de li bajarê Bedlîsê, Navçeya Hîzanê û gundê Norsê/Nûrsê ji dayik bûye. Navê bavê wî Mîrze, navê diya wî jî Nûrê ye.[94]**(Pêvek:1)**

### 1.1.1.Gundê Wî

Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji gundê Norsê ye ku ew girêdayî bajarokê Spayêrtê, Spayêrt girêdayî navçeya Hîzanê ye ku Hîzan yek ji navçeyên bajarê Bedlîsê ye. Gundê Norsê, li devereke çiyayî di nav newalên kûr de ye û gundekî bi dar û daristan e. Wek tê zanîn ew ciyên ku teknolojî dereng çûbê ji aliyê teknîkê ve paşde mabe jî ji aliyê jiyana civakî de sirûştî maye. Nors jî gundekî wisa ye. Heta dema desthilatdariya Turgut Özal rêya Norsê wisa seyare ye û bi rihetî çûn-hatina wê tune. Hatin çûyina gundê Norsê bi hesp, ker û hêştiran an jî peyatî çêdibû. Piştî sala 1980yan di herêma Kurdistanê de rê hatin çêkirin. Yek ji wan gundên ku rêya wê hatiye çêkirin jî Nors e.

Li Gundê Norsê bi navdariya Seîdê Kurdî ziyaretiyên bawermendiyê û meraqdariyê sal bi salê zêde dibe. Lewra hatinên geşdaran asoya gundiyan bi aliyekî ve berfireh dike û derbarê aboriyê de him Hîzan him Xeyda him jî Nors jê feyde hildide. Di van salên dawîn de rêyên gund xweştirîn bûye, hatin çûyîn zede bûne, lê belkî ev çûn hatin di demeke dirêj de dê samimiyeta nişteciyan ya sirûştî kêm bike û ji bo gund û gundiyan bibe sedema guherîna çandê û ketina bin bandora çand û zimanê tirkî. Lewra çand û zimanê kurdî di nava gundiyan de ber bi rabûnê ve diçe.

### 1.1.2.Malbata wî

Navê bavê Seîdê Kurdî; Mîrze û navê dayika wî jî Nûrê ye. Dayika Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji gundê Bilkanê ye. Di derbarê jidayikbûna bav û dayika wî de dîrokek zelal tuneye. Di berhemên Bedîuzeman de çiqas ji aliyê şagirtên Risaleyên Nûr de "Nûriye" nivîsîbin jî Bedîuzeman ev nivîsar bi axaftineke kurdî wekî "Nûrê" sererast kiriye.[95] Xwîşk û birayên Bedîûzeman ev bûne: Duriye,

---

[94] Abdulkadir Badıllı, *Mufasal Tarîhçe-i Hayat*, Timaş Yayınları, İstanbul, berg l, 1990, 48-53.

[95] Badıllı, *h,b*,45-53.

Xanim, Evdillah, Mihemed, Evdilmecîd û Mercan. Di Risaleyên Nûr de hinek agahdarî di derbarê malbata wî de hene Bedîuzzaman Seîdê Kurdî di derbarê malabata xwe de wiha dibêje: “Lewra nesebekî min a meşhûr/binavûdeng tuneye ku ez rabirdûya wan biparêzim. Ji ber ku ez Ebu laşey/bavê netiştekî me, nesleke min jî tuneye ku dahatûya wan temîn bikim.”[96] Lewra di herêma Kurdistanê de nesebên meşhûr seyîdî, şêxîtî, begtî, axatî û mîrîtî tê zanîn. Di çanda Kurdan de yekî ku neseba wî meşhûr be di nava gel de nayê wenda kirin, lewra herkesek di gundan de bav bi bav hevdu nas dikin. Dîsa Bedîuzzaman Seîdê Kurdî di derbarê seyyîdbûnê de di sîwana hedîsa Hz. Mihemed de wiha dibêje: “Yê ku ne seyîd be û bibêje ez seyyîd im, yê ku seyîd be û bibêje, ez ne seyyîd im jî gunehkar in. Di Qur’ana Pîroz û Hedîsê de jî kêmkirin û zêdekirin qedexe ye. Heçî zêdekirine, ji ber ku ahengê xira dike û deriyê şubhê vedike bi zirartir e. Belkî nezanîn heta bi astekê ji kêmkirinê re bibe mazeret, lê zêdekirin bi zanînê çêdibe û ev ji kesên zana re jî nabe mazeret.[97] Di vê hevokê de her tişt zelal e. Seîdê Nûrsî di wereqeya xwe ya ku daye Daru’l Hîkmet’il Îslamiyeyê de wiha dibêje: “Têkiliya min bi nesleke ma’rûf/naskirî tuneye.”[98]

Bedîuzzaman Seîdê Kurdî di pirtûka xwe ya bi navê “Şûaya Çardehan” de di derbarê nesla xwe de bersiva dozgeriyê wiha dide: “*Bi hêza xwe viyanê bi tevayî red dikim. Ev layiqdîtina Mehdiyetiyê qet qebûl nakim, birayên min tev şehadetiyê dikin. Lewra ew ên ehlê wiqûf, ger Seîd Mehdîtiya xwe bîne holê şagirtên wî hemû dê bipejirînin.*” Li hemberî van gotinan Bedîuzeman di îtîraza xwe de wiha gotiye: “*Ez ne seyyîd im, Mehdî dê seyyîd be.*” û reda wan kiriye.”[99] Alim û zanyarekî rastkêş ê wekî Bedîuzeman bo çi ji Kurdiya xwe şerm/fedî bike û çima înkariya nesebê xwe bike?

Di Lahîkaya Emirdağê de Bedîuzeman wiha dibêje: “*Min ji wan re gotibû, ez xwe seyyîd nizanim. Li vê demê neseb/nifş nayên zanîn. Lewra ew şexsê mezin yê dawiya demê dê ji ehlê beytê be. Bi rastî min ji Hezretî Elî wek lawekî wî yê manewî derseke heqîqetê stand.*” Bi wateyekê, bi şagirtên Nûrê yên heqiqî re şamil

---

96 Seîdê Kurdî, “Munazarat*”, Dersên Civakî,* 139.
97 Kurdî, b.n., 46.
98 Mufit Yüksel, “Bir sülâle-i mârufeye nisbetim yoktur”, http://www.yenisafak.com/yazarlar/mufityuksel/bir-sulale-i-marufeye-nisbetim-yoktur-35509 pêwendî: 22.04. 2015
99 Yüksel, h.g., pêwendî :22.04.2015

bûye/hemêz kiriye. “*Ez jî manen ji alê beytê tême pejirandin*.”[100] Mirov bi van gotinên Bedîuzeman fêm dike ku ew ne ji aliyê nesebî ve lê ji aliyê manewî ve xwe ji ehlê beytê dibine. Di vê rewşê de lêkolîner Müfît Yüksel wiha dibêje: “Min piştî definkirina cenazeyê kekê Mustafa Sungur(Şagirtê Bedîuzeman Seîdê Kurdî) bi pismamê Bedîuzeman ew ên paşnavê wan “Okur” re sohbet kir û pirsî, wan jî bi taybetî bersiva min wiha dan: ‘Eşîretek û binemaleke me ya meşhûr tê zanîn tuneye.”[101] Di derbarê vê mijarê de, lêkolîner Abdullah Demir,[102] Abdullah Can,[103] Molla Feyzi Güzelsoy,[104] Adil Yılmayan,[105]Abdulkadîr Badıllı[106] û Hüseyin Siyabend Aytemur[107]xebatên hêja kirine.

### 1.1.3.Xwendina Seîdê Kurdî ya li Medreseyan

Bedîuzeman Seîdê Kurdî hetanî neh saliya xwe, li cem dê û bavê xwe jiyana xwe derbas kiriye. Di zaroktiya Bedîuzeman Seîdê Kurdî de li medreseyên Kurdistanê ilm, îrfan û zanistî zêde bi rewac bû. Birayê Mele Seîd ê mezin Mele Evdillah ji Mele Seîd re mînakeke nêzîk û balkêş bûye ku ilmê tehsîl bike. Bi taybetî di menzelê gundan de qisedanên ilmî yên dirêj çêdibûn. Van qisedanan him bala Seîd dikişand him jî jê re dibûn bingeh. Seîd di devera Norsê ya girêdayî Spayêrtê de li gundê Taxê li cem Mele Mihemed Emîn dest bi xwendinê kiriye. Li vê derê demeke kurt disekine û vedigere Nûrsê. Dema Mele Evdillahê birayê wî dihate serlêdana mala bavê xwe, li cem wî ders distand. Paşê derbasî gundê Pîrmisê, zozanê Şêxê Hîzanê dibe. Demekê li vê derê li bal Şêx Nûr Mihemed ders digire. Mele Seîd û xwendevanên medreseyan bi hev re derbasî nedikirin. Ji vir jî cuda dibe û dîsa derbasî medresa Norşînê dibe. Lê belê demsal havîn e, ji bo wê jî diçe Taxê, zozanê şêxan. Piştî medresa Norşînê navber dide xwendina xwe û vedigere Norsê demekê li wir dimîne.

---

[100]Yüksel, h.g.
[101]Yüksel, h.g.
[102] Abdullah Demir, “*Said-i Seîdê Nursî ’nin Seyyidliği Tartışmaları*”
[103] Abdullah Can, “*Rîsale-î Nurlarda Tahrifatlar*”, 15 Mart 2013, http://www.ilkehaber.com/yazi/said-i-kurdinin-seyyidlik-uzerinden-araplastirilmasina-cevabimizdir-6368.htm, pêwendî: 25.04.2015
[104]Molla Feyzî Güzelsoy, “*Molla Feyzi'den Prof. Ahmet Akgündüz'ün ‘Şecere’sine Muskît Cevap.l,ll*,” 25.Nîsan 2013, http://www.ilkehaber.com/haber/molla-feyziden-prof.-ahmet-akgunduzun-seceresine-muskit-cevap-1-26001.htm, pêwendî:26.04.2015
[105] Adil Yılmayan, *Di Pêncî Saliya Wefata Wî de Sempozyûma B. Seîdê Seîdê Kurdî*, Weşanxaneya Nûbihar, Stenbol, 27-44.
[106] http://mufidyuksel.com/ustadin-talebelerinden-abdulkadir-badillinin-aciklamasi.html
[107]Hüseyin Siyabend Aytemur, *“Risale-i Nur’da Yapılan Tahrifat”*, Weşanxaneya Hîvda, Stenbol 2015, 308-393.

Tê riwayet kirin ku Seîd, Hz. Mihemed (s.) di xewna xwe de dibîne. Destûrê ji bavê xwe dixwaze û diçe gundê Ewrazê. Ev gund girêdayî navçeya Miksê ye. Li Ewrazê muderîs Mele Mihemed Emîn, Bedîuzeman Seîdê Kurdî hewaleyî feqiyan dike. Ev ûsuleke medreseyan bû lê Bedîuzeman Seîdê Kurdî li hemberî vê ûsulê dertê. Ewrazê diterikîne û diçe Medresa Mîr Hesenê Welî li cem Mela Evdilkerîm Efendî ders dixwîne. Pergala vê medresê jî wek medresên din xweşa wî naçe û bi qasî mehekê li Westanê dimîne û bi rêberiya Mele Mihemed ji ser Erziromê re derbasî Bazîdê dibe.

Perwerdehiya Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya eslî û bi pergalî, li cem Şêx Mihemed Celalî dest pê dike. Sê mehan perwerde dibe. Bedîuzeman Seîdê Kurdî heta *Îzharê* bi rêberiya Muderîsan dixwîne, piştre her pirtûkê mijar bi mijar derbas dibe.

Mele Seîd li Bazîdê di kumbeta Şêx Ehmedê Xanî de dikeve înziwayê. Li Bazîdê di temenê sêzdeh û çardeh saliyê de qesta çûna Bexdayê dike û diçe Bedlîsê, ziyareta Şêx Mihemed Emînî. Li Bedlîsê derbasî Sêrtê dibe û li wir jî diçe Tiloyê. Kamûs û Okyanûsê dixwîne û ji ber dike. Mele Seîd di navbera Cizîr û Mêrdînê de diçe û tê. Di dawiyê de derbasî Wanê dibe.[108] Dema Bedîuzeman li Bazîdê ilmê tehsîl dike, jîrekiya wî bala Seydayê wî û feqiyên hevalên wî dikişîne û di nava gel de pir balkêş dibe. Di nava gelê Kurdistanê de jê re "Melayê Meşhûr", an jî "Mela Seîdê Meşhûr" tê gotin. Dema diçe Sêrtê li medreseya Mela Fethullah, bala mela Fethullah dikişîne. Ji bo jîrektiya Mela Seîd û zekaya wî bipîve, wî digre ezmûnê. Çi pirs dike, ew bersîvê dide. Ji aliyê jiberkirinê de jî wisa, Mela Fethullah heyran dimîne ku ji bo jêhatîbûna Mela Seîdê Meşhûr, Mela Fethullah wî bi navê "Bedîuzeman" bi nav dike.[109]

Tişta ku bala mirov dikişîne, di mederseyan de Mele Seîd bi çend aliyan ve rihet nebûye.

1. Ji ber çavnebariya di nav hin feqiyên medreseyan de.

2. Qurebûna hin seydayan, lewra car caran di ders dayinê de hewleyên feqiyan dikirin, lewra ev tişta di medreseyan de usulek bû. Lê belê ev jî ji Mele Seîd re giran dihat.

---

[108] Seîdê Nursî, *Tarihçe-i Hayat*, Weşanxaneya Zehra, Stenbol, 54.
[109] Badıllı, *h.b.*, 71,76,77.

3. Perwerdeyeke dûr û dirêj, zêde serf û nahîv. Ev rewş hem dema mirovan pir digirt hem jî bi zêdehî tê de hûrgilî hebûn.

Her seydayek usûleke wî hebû. Ji bo van kêmasiyan, Bedîuzeman Seîdê Kurdî di Medreseyan de zêde nemaye û bi serê xwe hereket kiriye. Serdema ku Bedîuzeman têde dijiya Medreseyên Kurdistanê yên navdar û têne zanîn ev bûn: Li Cizîrê; Medresa Sor, li Miksê; Medresa Mîr Hesenê Welî, li Wanê Şikal û Xorxor medreseyên navdar bûn. Herwiha li Hîzan/Xeyda, Bazîd, Colemêrg, Bedlîs, Norşîn, Mûş, Oxîn, Sîlvan/Farqîn, Diyarbekir, Tîllo, Musul û Zaxo medreseyên navdar hebûn.

Di herema Kurdistanê de perwerdehiya medreseyan bi zimanê erebî, farisî û kurdî berdewam dikir."[110]Bedîuzeman Seîdê Kurdî jî di van medreseyan hinekan de xwendiye. Hinek ji wan medreseyan di bin sîwana mîrekan de, hinek ji wan bi destê terîqetan, bi taybetî terîqeta Neqşîbendî de bûye. "Hinek ji van medreseyan, di bin sîwana mîran de perwerdeyên xwe berdewam dikirin ku ji wan medreseyan hinekên wan li van bajaran bûn: medreseyên Cizîra Botan, yên bajarê Bedlîsê, Amediye, Hîzanê, Miksê, Şêrwan, Derzîn, Girdikan, Hesenkêf, Mêrdîn, Amed, Farqîn, Nisêbîn, Stewr, Midyat, Palo, Gênc, Çewlik, Solxan, Egil û Bazîd."[111] Ev medrese di nav xwe de gelek beg, axa, mîr û mîrêmîran derêxistine ku wek "Hikumatên Ekrad"hatine pejirandin. Taybetiyên van medreseyan ew bûye ku çandeke bajêrî di nava xwe de hewandine. "Hinek ji wan medreseyên Neqşibendiyan bûne: 'medreseyên Şemzînan/Nehrî, medreseyên Berzan, Hîzan, Tax, Palo, Qolhîsar, Norşîn, Oxîn, Zoqeyd, Xerzan, Xizna, medresa Mela Mihyedînê Hawêlî, medreseyên Cizîrê, medreseyên Fêrsaf, Ristaq, Şêrwan, Sêrt, medreseyên Erbo, Girdikan, Erbinê, Dodan û Werqanis, medresyên Farqîn, Batman, Bişêrî, Xerzan, yên hêla Misirc û Hezro."[112] Ev medrese jî bi piranî di bin bandora terîqeta Neqşîbendiyê de bûne. Taybetiyên herdu şaxan jî ew bûn ku, xizmet ji çand û huner û perwerdehiya netewa Kurd û bi zimanê Kurdî re kirine.

Ji nava van medreseyan de yên ku Bedîuzeman Seîdê Kurdî lê xwendine ev in:

1. Medreseya Taxê- li cem Mele Mihemed Emîn

---

[110] Ahmet Demir,"Bediüzzaman Said Seîdê Nursî nin Eğitim Modelinde Kürt Dilinin Yeri ve Önemi", *Munazarat Sempozyum I,* Ankara, Merak Yayınları, 2013, 103.
[111] Şakir Epozdemir, *Medreseyên Kurdistanê,* Stenbol, Çapxane Nûbihar. 2015, 37-156.
[112] Epozdemir, *h.b.*, 37-156.

2. Medreseya Norsê- li cem birayê xwe Mele Evdillah
3. Medreseya Pîrmis
4. Medreseya Hîzan/Zozanê Şêxan- li cem Nûr Mihemed
5. Medreseya Norşîn
6. Medreseya Erwaz- Mihemed Emîn
7. Medreseya Mîr Hesenê Welî- li cem Evdilkerim
8. Medreseya Westanê- li cem Mele Mihemed
9. Medreseya Bazîdê- li cem Mele Mihemedê Celalî
10. Medreseya Tîllo

Li aliyekî din nasîna Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya zimanê Tirkî di qonaxa Tahir Paşa de çêbûye û despêka nivîsandina tirkî jî li serê çiyayê Başîtê Mihendan ji bo isbatkirina cemedê bi nameyeke tirkî bûye ku wê nameyê ji Tahir Paşa re dişîne. Ahmet Demir wiha dibêje: "*Xwendina Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya medreseyan hemû bi zimanê Kurdî bûye. Bedûzeman di vê serdemê de du pirtûk bi Kurdî nivîsîne. Di şewata qonaxa Tahir Paşa de ew pirtûk jî şewitîne û negihîştne destê me*."[113] Serdema Bedîuzeman tê de dijiya rewşa mederseyên Kurdistanê baş nebûn û hejmarên wan jî kêm bûn. "Di Herêma Kurdistanê de jimara medreseyan kêm bû. Şert û mercên kevnare, bi xêra xêrxwazan berdewam dikir û bi metodên kevn ders dihatin dayin."[114] Kêmasiyên dibistanan, kevneşopiyên medreseyan ji bo pêşeroja herêma Kurdistanê xetereyeke mezin xuya dikir. Di fikir û ramanên Bedîuzeman Seîdê Kurdî de bingeha projeya Medresetuzehrayê çêdikir. Hez dikir di herêma Kurdistanê de perwerdehiyê bi tevayî, bi pergalî çareser bike. Mela Seîd di derbarê Medreseyan de ji bo fikr û ramanê xwe bixe nava perwerdeyê, vexwendina Parêzgehê Wanê Hesen Paşa(di hinek çavkaniyan de weke Şemsî Paşa derbas dibe) jê re dibe derfetek û diçe Wanê. [115]

[113] Demir, *h.g.*, 103.
[114] Menek, *Munazarat Sempozyumu*, 501-502.
[115] Akgündüz, I, 330.

### 1.1.4.Nav û Mexlesên wî yên Bijarte

Bedîuzeman gelek nav û mexles bi kar anîne lê yên zêde tên zanîn ev ên jêrê ne ku me nivîsîne:

1- Bi tespîta Abdulkadir Badıllı; di nava gel de bi navê “Mela Seîd”, bi navkirina dema li Bazîdê buye “Melayê Meşhûr/Mela Seîd” ku wê demê ew çardeh salî bûye.(1892) [116]
2- Di Tarîxçe-î Heyata Abdurrahman amade kiriye de; di jiyana wî ya Wanê de jê re gotine “Melayê Meşhûr/Mela Seîdê Meşhûr” ku wê demê 15-16 salî bûye(1897).[117]
3- Bi tercumeya/Tarîxçe ya Müküslü Hamza de; Mela Fethullah Efendiyê Sêrtî Mela Seîdê Meşhûr ezmûn dike, hin pirsên îlmî û siyasî jê dipirse û piştî bersivên Mela Seîd ên balkêş jê re “Bedîuzeman” dibêje. Sal 1892.[118]
4- Bedîuzeman dema diçe Stenbolê; ji bilî “Mela Seîd/Mela Seîdê Meşhûr/Bedîuzeman” di nivîsar û danasîna xwe de navê Seîdê Kurdî bi kar aniye. Di navbera 1907-1926an de navê Seîdê Kurdî bi kar aniye.[119]
5- Piştî 1926an hetanî wefata xwe,1960an navê Seîdê Nursî bi kar aniye.[120]

Lê di çapên nû ên pirtûkên xwe yên berê wek; Munazarat, Xutbeya Şamê, Nûtûq, Dîwana Herba Orfî û yên din. de, sal 1950, ev nav betal nekiriye û bi vî paşnavî re di wan pirtûkan hinekan de Seîd Kurdî el Nursî jî bi kar aniye.

6- Ji wan paşnavan yek jî “Okur” e. Dewletê piştî Qanûna Paşnavan(Soyadı Kanunu-1934) ev paşnav dayê, Bedîuzeman ev paşnav hîç nepejirandiye û bikar neaniye.

---

[116] Badıllı, “Mufassal tarihçe-i Hayat, 70.
[117] Abdurrahman Nuri,”Bediuzzaman’ın Hayatı”, Kent Işıkları yayınları, 2011, İstanbul, 24-25.
[118] Badıllı, “Mufassal tarihçe-i Hayat, 139.
[119] Badıllı, b.n.,139.
[120] Badıllı, b.n., 139-140.

### 1.1.5. Jiyana Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya Wanê

Cara yekem hatina Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji bo Wanê, bi vexwendina Waliyê Wanê Hesen Paşa dibe(hin çavkanî Şemsî Paşa dibêjin). Di sala 1897an de ji Bedlîsê tê Wanê ku wê demê temenê wî 20 bûye. Navbera 18 û 22.5 salan li Wanê dimîne(di vê navberê de, diçe Stebolê û tê).[121] Mele Seîd li qonaxa Parêzgar Tahir Paşa dibe mêvan, li vê derê xebatên xwe yên îlmî dike. Dema di qonaxa Walî Tahir Paşa de dimîne êdî bi meseleyên siyasî, civakî û zanistî re, têkildar dibe û bi wesîleya Tahir Paşa rojnameyan tîne parêzgahê û roj bi rojê fikr û ramanên wî û nêrînên wî tê guherandin. Di qonaxa Tahir Paşa de, bi agahdarkirina birayê xwe Evdilmecîd, gelek êvaran munazarayên zanistî yên fenî çêdikirin. Wekî din bi alîkariya parêzgarê Wanê Hesen Paşa, Bedîuzeman Seîdê Kurdî bi wasitaya alimên pêşeng xwendevanên zîrek li Wanê berhev dibûn û wek dibistanekê, hendese, hesab, cebîr, fizîk, dîrok, erdnîgarî û hin dersên girîng bi dersên dînî re dixwendin.[122] Bedîuzeman, di van munazareyan de, nexweşî di navbera seyda û kêmasiyên medreseyan de didît û ji bo çareseriyê fikr û ramanên xwe di projeya Medresetuzehrayê de hêdîhêdî tesewwir dikir û çêdikir.

Li gorî agahiyên ku Evdirehman Nûrsî dide, Bedîuzeman Seîdê Kurdî li Wanê bi qasî panzdeh salan ders dide, li aliyekî din jî eşîretan îrşad dike û nakokiyên navbera wan, bi aşitiyê çareser dike. Wekî din jî têkiliyên wî, bi parêzgar û karmendan re berdewam dike. Bedîuzeman Seîdê Kurdî dema xwendevan bû dît ku bi metodên klasîk perwerdeyî nabe, êdî di medresan de pêwîste zanistên dînî û fenî bi hev re bêne xwendin. Ji bo van kêmasiyan pêşiyê pirtûkên erdnîgariyê, riyazat, kimya, biyolojî û felsefe bi dest dixe. Di demeke kurt de bi serê xwe hînî ilmê wan dibe. Rojekê bi mamosteyê dersa erdnîgariyê re dikeve munezarayê. Rojekê jî mamosteyê kimyayê îlzam dike. Ji van balkêşiyan paş ve ji Mela Seîd re, "Bedîuzeman" tê gotin.[123] Bedîuzeman di derbarê leqebê xwe de wiha dibêje: "Ez niha fêm dikim ku ev navê berê ku ji min re hatiye gotin, ne yê min e, lewra ev nav navekî manewî ye, ew jî yê Risaleyê Nûr e.[124] Bedîûzeman di 20 saliya xwe de li Wanê fêrî zimanê tirkî dibe. Dema li Wanê dimîne nêzikî sed pirtûkân jiber dike.[125]

---

[121] Badıllı, *h.b.*,115,116.
[122] Badıllı, *h.b.*, 116,117.
[123] Abdurrahman Nursî, *Bediüzzamanın Hayatı*, Kent Yayınları, İstanbul,2011, 38-39.
[124] Badıllı, *h.b.*, 117.
[125] Badıllı, h.b., 118-120.

Di Medreseya Xorxorê de him dersên dînî him jî dersên fenî dide. Bingeha Medresetuzehrayê di bin kela Wanê û di Medreseya Xorxorê de datîne.

Bedîuzeman Seîdê Kurdî car caran bi Waliyê Wanê Hesen Paşa re dikeve munazarayan. Yek ji wan munazarayan ev e ku; “gelo li ser çiyayê Başêtê, di meha Tîrmehê de berf û cemed heye an na?” Bedîuzeman ji bo ispatkirina berf û cemedê di meha Tîrmehê de diçe ser serê Çiyayê Başêdê, bi çavê xwe dibîne ku berf neheliyaye û cemed jî heye. Pişt re ji parêzgarê Wanê Hesen Paşa re cara yekem bi Tirkî nameyekî dinîvîse û dî nameya xwe de evha dibêje: “*Ey paşa, li serê Başêdê cemed heye. Tişta te nedîtiye înkar neke! Her tişt bi zanebûna te nîne û safsatayên te li her derê derbas nabe.*”[126]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî dema li Wanê bi perwerdehiyê re mijûl bû, di çar qonaxan de, ji alimên Kurdistanê cuda difikirî. Di jiyana xwe de ev weke pirensîb bi kar anîne. Bi tesbîtên biraziyê wî Abdurrahman Nûrsî ew prensîbên wî jî ev in:

1. Bi tu awayî, tu carî diyarî/hediye û meaş qebûl nekiriye. Dema jê tê pirsîn wiha bersîv dide: “*Roj were herkesê xweziya xwe bi min bîne. Mal û milk tu tamê nade min û ez dinyayê wek mêvanxaneyekê dibînim.*”[127]
2. Pirs li tu aliman nekiriye, lê belê her dem pirs bersivandine. “*Ez ilmên aliman înkar nakim, ji lew(ji zanebûna wan) pirsan li wan nakim, lê belê yên ji min gumanbar bin dikarin pirs bikin û pirs mafê gumanbaran e.*”[128]
3. Ji feqî û şagirtên xwe re her tim wek xwe zikat, ratip alîkarî qedexe kiriye. Sedemên vê pirensîbê jî ew e ku, xebata xwe ji bo rizaya îlahî kiriye û heysiyeta ilmê bi vî awayî nîşan daye.
4. Nezewiciye, têkiliya xwe bi tu tiştê dinyewî re çênekiriye. Lewra bi kuderê ve çûye, malê xwe bi yek destê xwe biriye.[129]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî di jiyana xwe de cî nedaye wan tiştên ku di nav civakê de tên sûîstimal/bedkarî kirin. Bo nimûne zikat di nav civakê de gelek xelet hatiye danûstandinê. Danûstandina diyariyan wek bertîl çêdibû, gelek mirovan ji bo rûmetiyê zikat û diyarî didan. Bedîuzeman Seîdê Kurdî xwe ji wan tiştên bi minet

[126] Badıllı, *h.b.*, 120.
[127] Abdurrahman Nursî, *h.b.*, r. 40.
[128] Nursî, b.n., r. 40.
[129] Nursî, b.n, r. 40.

men kiribû. Wî ji bo izeta alimtiyê, ilm û irfanê muhafaza bike hîç zikat-miaş-sedqe-ratip û hwd. qebûl nedikir.

Bedîuzeman Seîdê Kurdî dema li Wanê di medreseyê de navber dida dersan, ew di nav gel de bû. Gelek caran jî derdikete serê çiyayên devdora Wanê. Li Çiyayê Erekê, Başêta Mihendan, Zozanê Feraşînê û Beyşebabê dikete înzivayê.

Di munazereyeke ilmî de di navbera Bedîuzeman Seîdê Kurdî û Tahir Paşa de car caran di warê ilm û siyasetê de gengeşî çêdibe. Paşê Bedîuzeman qonaxa Parêzgar terk dike û diçe medreseya Xorxorê. Parêzgar dixwaze bi hêza parêzgariye Bedîuzeman di medresê de binçav bike. Dema leşker diçin û li derê medreseyê dixin Bedîuzeman derî venake, piştî israra wan Bedîuzeman deriyê Medreseyê ji hêzên parêzgar re bi du şertan vedike:

1. Di medreseyê de neyê binçavkirin, ji bo ku heysiyeta alimtiyê û ilmê lekedar nebe.
2. Çeka xwe teslîm nake.

Hêzên parêzgar van şert û mercan qebûl dikin û Bedîuzeman Seîdê Kurdî nefiyê Bedlîsê dibe û paşê derbasî Erdîşê dibe. Li wir jî qest dike cemiyetekê damezirîne, derbasî Îranê bibe ku li dijî Tahir Paşa tekoşînê bike. Tahir Paşa wan planê Bedîuzeman Seîdê Kurdî dibihîze û ji bo bizivire Wanê, hin mirovan dişîne cem wî da ku wî îkna bikin. Bedîuzeman Seîdê Kurdî tê îkna kirin. Car din tê Wanê, ew û Tahir paşa li hev tên. Bedîuzeman çûyina xwe ya Îranê feramûş dike. Xebatên Bedîuzeman yên weke xwendin û pirtûk nivîsandinê berdewam dikin, lêbelê qonaxa parêzgar dişewite. Têde hin pirtûkên Bedîuzeman, ên derbarê riyazatê, hesab û matematîkê de yên ku bi kurdî hatine nivîsîn dişewitin."[130]

Bedîuzeman li Wanê nefiyê Kastamonuyê dibe, lê belê Medresetuzehra û Wan ji fikir û ramanên wî dernakevin. Ji şagirtên xwe re nameyan dişîne û di wan nameyan yekî de wiha dinivîse: "*Ev bîst sal e, min jiyana xwe bi mijûlbûna zanistê re, li Wanê derbas kir, Wan ji bo min gelek qîmetdar e*."[131]

Bedîuzeman dema li Wanê bûye, bi alim, zanyar û rewşenbîrên derdora xwe re têkildar bûye. Di derbarê pêşerojê de hişyariyekê dide gel û serokeşîran û li ser

[130] Nursî , *h.b.*, 43.
[131] Said Nursî, "Barla Lahikası", www.yeniasya.com.tr/risaleinur/barlalahikası/#205/z, pêwendî:14.02.2016

kela Wanê wiha gazî wan dike: "*Îca dinya, ji her kesî re dibe dinyaya pêşveçûnê; tenê ji me re dibe dinyaya paşketinê, ne wisa? De vaye ez jî dê bi we re nepeyivim û berê xwe bidim vî aliyî û ez dê bi mirovên pêşerojê re bipeyivim.*"[132]*Ez xîtabî we dikim. Çi bikim, min ecele kir û ez di zivistanê de hatim; hûn ê, di bihareke beheştî de bên. Tovên ku a niha tên avêtin, dê li zemîna we kulîlkan bidin.*"[133]Gazî mixatabên piştî xwe dike û hatina xwe pêşwext dibîne lê Risalêyên Nûr wek bernameyekê pêşniyarî hemwelatiyên xwe dike. Mirov ji van gotinên Bedîuzeman fêm dike ku ji mirovên hemdemên xwe hêvîdar nîne. Ev rewşa ku gelê kurd têde ye xweşa wî naçe. Him demên berê, him jî demên ayendeyê ji rewşa wan a niha çêtir dibîne, wan bi zimanekî tûj hişyar dike û wiha gazî wan dike: "*Gelî kurdan! Heke a niha xwepêşandanekê li dar bixim, bav û kalên we yên berî du hezar salan û weledên we yên piştî du esran vexwînim vê meclîsa esra hazir ku evqas qelebalixî ye, gelo ceddên we yên berê, dê nebêjin ku hey zarokên netebitî yên mîratxwer! Gelo encama heyata me hûn in? ... Dît ku di vê xwepêşandana mezin de, wan her du aliyan jî hûn protesto kirin.*"[134]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî di nêrînên xwe yên derbarê rewşa kurdan de bi xeyal û bi metodeke monolog bixwe dibêje û bixwe jî bersîv dide. Li vir mebest numûneya di şûna Medresetuzehrayê, medreseya Xorxorê wefat kiriye kela Wanê jî wek kêlika medreseyê dibîne.

Di sala 1914an de, dema şerê Cîhanê yê Yekem dest pê kir, wê demê Bedîuzeman li Wanê bûye. Li hemberî Ûris di şêr de fermandarê milîsên kurdan bûye, lehengiyeke mezin nîşan daye. Dûre li Bedlîsê, Artêşa Ûris Bedîuzeman dîl digrin. Bi qasî du sal û nîvê di destê Artêşa Ûris de, di qampa Tîflîsê de dîl dimîne.[135]

Bedîuzeman ji dîltiyê xilas dibe, tê Setenbolê û li wir jî bi vexwandina hikumata Enqerê diçe meclîsê. Li wê derê ew û hikumat li hev nakin, careke din vedigere Wanê û diçe serê Kela Wanê. Dema diçe serê Kela Wanê dibîne ku bajarê Wanê piştî Şerê Cîhanê yê Yekem wêran bûye, gelek şagirtên wî jiyana xwe ji dest dane û Kela Wanê wek kêlikên goristanê dibîne. Xwe di welatê xwe de biyanî hîs dike û gelek xemgîn dibe.

---

[132] Seîdê Kurdî, "Munazarat*",  Dersên Civakî,* 115-116.
[133] Seîdê Kurdî, *h.b.,* 115-116.
[134] Seîdê Kurdî, *h.b.,* 115-116.
[135] Nursî , *h.b.,*  49.

Bedîuzeman Seîdê Kurdî dema ji Enqerê vedigere Wanê tayina wî bi fermî derdixin Mizgefta Norşînê lê belê ew bi fermî qebûl nake, meaş nastîne lê bi fexrî şixulê xwe berdewam dike. Di mizgeftê de bi kurdî wezên xwe dide. Carna ji bo yên kurdî nizanin tirkî jî wezan dide.[136]

Berhemên ku Bedîuzeman li Wanê nivîsîne ev in:

**Kızıl Îcaz:** Mijarên vê pirtûkê ev in: xetên destên mirovan, alametên Xwedê, işaretên Xwedê yên ser mirovan. Ev berhem bi kurdî nivisîye, lê kurdiya wê di dest me de tuneye.

**Riyaziyat û Hesab:** Di derbarê hesabê de bi kurdî hatiye nivîsandin. Ev berhem jî di dest me de tuneye. Dema Qonaxa Walî agir pêdikeve ew jî dişewite.

**Talikat:** Di 1913an de di derbarê mantiqê de hatiye nivîsîn. Burhani Gelenbevî şerh kiriye.[137] Lê me ev pirtûk bi dest nexistiye.

**Munazerat**: Di 1911an de dema nav eşîran geriyaye nivisîye.

**Muhekemat:** Di 1911an de hatiye nivîsîn û qala nêrîna Qur'anê dike.

**Îşaratul Îcaz**; Di 1913, qala muc'izeya Qur'anê dike.[138]

Abdulkadîr Badıllı di derbarê Îşaratul Îcazê de ji Hemzeyê Miksî wiha neqil dike: "*Hz. Ustad beriya nivîsandina Îşaratul Îcazê ez tev xelqeya tedrîsata wî dibûm. Kilamê Qedîm hildida destê xwe û takrîr dikir, tu pirtûkê û tu tefsîrê mêze nedikir. Bi Kurdî takrîr/şîrove dikir. Mela Hemîd jî bi Kurdî dinivîsî.*"[139]

Dema hedîsata Şêx Seîdê Paloyî derdikeve, (25 Sibat 1925) Hikumat; çiqas şêx, beg, axa û mezinên kurdan û muxalif hene nefî dike û hinek jî têne binçav kirin. Di welatên xerîb de pir îşkence, zor û zehmetiyê dikêşînin. Hinek ji wan vedigerin, qismek ji wan hetanî dawiya temenê xwe di hesreta welat de dimînin. Yek ji wan jî Bedîuzeman Seîdê Kurdî bûye. Heta wefata wî nahêlin were welêt. Diyar diyar nefî, koçberî dibe û çend caran jî tê jehrîkirin. Bedîuzeman ji bo zulma dewletê wiha dibêje: "*Ew zulma we li min kirî, Ûris jî nekir*."[140]

---

[136] Badıllı , "h.b., 515.
[137] Badıllı, *h.b.*, 130-131.
[138] Badıllı, *h.b.*, 130-131.
[139] Badıllı, *h.b.*, 302.
[140] Nursî ,"*Mektubat*", 88-89.

Kronolojiya jiyana Bedîuzeman ya Wanê:

Di 1897an de Mela Seîd bi vexwendina Hesen Paşa li Bedlîsê diçe Wanê, navbera18-22.5 salan li wir dijî, di vê navberê de diçe Stebolê û tê, bi salan li vir dimîne.

Dema Mele Seîd di qonaxa Parêzgarê Wanê de mêvan bûye, Parêzgarê Wanê Tahir Paşa nûçeyekê di derbarê misilmanan de dixwîne û nîşanê Mele Seîd dide. Di rojnameyê de, wezîrê Mêtîngeriya Îngilistanê wiha gotiye: "*Hindî ev pirtûk(Qur'ana Pîroz) di destê misilmanan de be, em nikarin bibin hakimên wan û wan bindest bikin. An em ê Quranê bitepisînin an jî em ê misilmanan jê sar bikin*." Dema Mele Seîdê Kurdî vê nûçeyê dixwîne pirr aciz dibe. Wiha dibêje: "*Ez ê timamê dinyayê re isbat bikim û nişan bidim ku Qur'an taveke manewî ye, natemire û nayê temirandin.*"[141] Ev xeber dibe sedem ku Bedîuzeman fikra xwe ya Medresetuzehrayê bixe faaliyetê, ji bo wê jî berê xwe dide Stenbolê.

- ✓ Di 1910an de, li Stenbolê vedigere Wanê.
- ✓ Di 1911an de li Wanê diçe Şamê, di Mizgefta Emewiyan de Xutbeya Şamê ya Meşhûr dide. Di wê salê de derbasî Stenbolê dibe, bi Siltan Reşat re diçe seyheta Romeliyê, li wir daxwaza Medresetuzehrayê dike. Li Stenbolê nasekine, tê Wanê, li Artemêtê li rexê Gola Wanê xîmê Medresetuzehrayê diavêje û pirtûkên xwe "Munazerat û Muhekematê" telîf dike.
- ✓ Di 1915an de di Şerê Cîhanê yê Yekem de ji bo parastina Wanê fermandariya mîlîsên kurdan dike.
- ✓ Di 1916-1917an de di destê Ûris de dîl dimîne.
- ✓ Di 1918an de ji dîltiyê xilas dibe, tê Stenbolê.
- ✓ Di 1922an de bi vexwendina Hikumatê diçe Enqerê.(10 mehan li wir dimîne.)
- ✓ Di 1923an de, Hikumeta Enqereyê pirotesto dike û vedigere Wanê.
- ✓ Di navbera 1923-1925an de, heta serhildana Şêx Seîd li Wanê dimîne. Li vir wî binçav dikin û cardin nahêlin ew vegere Wanê.

Jiyana Bedîuzeman ya piştî Wanê gelek bi meşeqat, zor û zehmet derbas dibe. Di jiyana Bedîuzeman de wekî Wanê Stenbol jî ciyekî girîng digire.

141 Nursî , "*Tarihçe-i Hayat"*, 54.

### 1.1.6.Jiyana Seîdê Kurdî ya Stenbolê

Jiyana Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya Stenbolê di sala 1907an de dest pê dike, lê belê li gorî Kovara Köprüyê ev dîrok ne misoger e. Ev wesîqaya dîroka hatina Bedîuzeman ya li Stenbolê dema bê pêşkêşkirin bi zêdeyî dê gotinên me ronî bike.[142]

Parêzgarê Wanê Tahir Paşa dema tayinê Bedlîsê dibe, di 16ê Mijdara 1907an de namayekê ji Evdilhemîdê duyem re dişîne. Di derbarê jîrektî, fikir û ramanên Bedîuzeman Seîdê Kurdî û ehlê herêma Kurdistanê de, bi çi çavî li wan mêze dike, Padişah agahdar dike û jê alikariyê dixwaze.[143]

Xwediyê pirtûkxaneya Îçtihadê Kurdîzade Ahmet Ramîzê Lîceyî hatina Bedîuzeman a Stenbolê wiha teswîr dike: "Seîdê Kurdî, di aliyê zêdebûna zekayê de di sînorê cunûtiyê de ye. Lewra cunûtiyeke wisa ye ku, ew işaret bilindahiya ruh û kamiltiya hişê wî ye."[144]

Kurdîzade Ahmet Ramîz qala sedemên hatina Bedîuzeman Seîdê Kurdî dike. Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji bo Maarifeta/perwerdeya Kurdistanê têdikoşe, lê belê Evdilhemîdê II ji Bedîuzeman re binçavî, timarxane û bertîlê layiq dibîne. Lewra Bedîûzeman du tişt ji wan dixwest: Yek di her aliyê Kurdistanê de vekirina mekteban, ya din jî avakirina medreseyan bû. Ahmet Ramîzê Kurdî, parastina Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya bi navê "Dîwana Herba Urfî" çap dike û ev pirtûk bi mijara xwe ve pir deng vedide. Di destpêka pirtûkê de di derbarê hatina wî ya Stenbolê de wiha hatiye nivîsîn: "Seîdê Nûrsî çawa hat Stenbolê ji aliyê Siltan Evdilhemîd ve hat binçavkirin û çend caran hat girtin. Jê re gotin, ger tu dev ji van daxwazan berdî, em ê meaş bidin te û rutbeyên te bilind bikin." Lê Seîdê Nûrsî bertîlên wan qebûl nekirin û wiha got: "*Ez ji bo ku li Kurdistanê dibistanan vekim hatim vir. Daxwazek min a din nîne. Ez vê dixwazim û tiştek din naxwazim.*"[145] Hatina Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya Stenbolê ji bo ziman û perwerdehiya Kurdan e, lêbelê rêvebirên Osmanî dixwazin bi dek û dolaban yan jî bi gefan wî poşman bikin û wî destevala bişînin Kurdistanê.

[142] Selim Sönmez, "Bediüzzaman Said Seîdê Nursî nin İlk Stenbol Hayatına Dair Belgeler", *Köprü Dergisi*, Bahar, jimar 86, 2004, http://www.koprudergisi.com/index.asp?Bolum=EskiSayilar&Goster=Yazi&YaziNo=598 pêwendî: 27.04.2015
[143] Sönmez, *h.b.*, j.86.
[144] Badıllı, *h.b.*, 138-139.
[145] Nursî, *Tarihçey-i Hayat*, 154.

Bedîuzeman Seîdê Kurdî dema li Kurdistanê ye, perîşanî û bê perwerdehiya kurdan dibîne û diçe Stenbolê. Ew dixwaze vê perîşaniyê bi perwerdehiyê ji nav wan rake û derdê wan derman bike. Ew rizgarbûna kurdan di perwerdeyê de û di ilmên fen û dîn, -xwendina wan a bi hev re- de dibîne. Û ew dibêje lazim e ku rêyeke wan ilm û fenan bi silamet, bi destê aliman çêbibe û kaniyeke wan jî bila medrese bin da ku alimên dîn nêzîkî fenê bin û pê çavnas bin lewra dîzgîna vîn û îradeya Kurdan di destê aliman de ye. Bedîuzeman ji bo perwerdehiya Kurdistanê li Stenbolê gelekî mucadele dike, hesreta xwe ya welêt tîne ziman lê dîsa jî doza perwerdeya Kurdistanê terk nake û wiha dibêje: "*Min terka wan çiyayên Kurdistanê yên bilind ku warên herî pir jê hez dikim kir û ji bo millet ketim tîmarxaneyê û tewqîfxaneyê û di dewra meşrûtiyetê de jî, ketim hepisxaneya bi îşkence. Lewma min cînayeteke mezin kir.*"[146]

Bedîuzeman dema li Kurdistanê dijiya di derheqê navenda xilafetê de husnê zen dikir lê belê dema tê Stenbolê têkiliyên wî bi Dewlêtê Alî re çêdibe û fikrên wî yên erênî dişkên. Fikir û ramanên xwe wiha tîne ziman:

"*Ez li çiyayên Kurdistanê mezin bûbûm. Min xeyal dikir ku navenda xîlafetê xweş e. Wexta ku berî heft heşt mehan ez hatim Derseadetê [Stenbolê] min dît ku dirûvê Stenbolê dişibihe mirovekî wehşî yê ku ji ber tirs û fikaran û ji ber jihev nefretkirina dilan, kincê medenî li xwe kiriye. Vê gavê, bi xêra îttîhada millî, di kincê mirovê medenî; lê belê nîv-medenî, nîvwehşî de xwe nîşanî me dide. Wexta berê, weke sedemê wan xirabiyên Kurdistanê, min zenn dikir û min digot qey ev lebatên Kurdistanê bi xwe nexweş ketiye, lewra ev tiştên nebaş diqewimin. Îca dema min Stenbol dît û min li nebza wê nihêrî, min baş jê fam kir, hîna nû ez têgihîştim ku ew nexweşiya dil e ku gihîştiye her aliyî. Min hewl da ku tedawî bikim, ez bi dîwanetiyê hatim mukafatkirin.*"[147]

Rohat Alakom derbarê hatina Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya Stenbolê de wiha dibêje : "*Di van salan de(1908) Seîdê Kurdî girîngiyeke mezin dida perwerdehiyê. Lewra nezanîn û cehalet ji bo netewa kurd astengiyeke mezin bû. Bedîuzeman Seîdê Kurdî di vê mijarê de bîrewer bû. Ji bo vê armancê damezrînerê Cemiyeta Neşr û*

---

[146] Kurdî, "Diwana Herba Orfî", *Dersên Civakî*, 157.
[147] Kurdî, "Nutuq", *Dersên Civakî*, 23.

*Maarîfa Kurd ev endamtiya Seîdê Kurdî nîşanê me dide, ji bo miletê Kurd hesas bûna wî nîşan dide*."[148]

Armanca Bedîuzeman Seîdê Kurdî ew e ku; ji bo Medresetuzehrayê daxwaznameyekê bide mabeyna Humayûne tê Stenbolê, lê belê ev daxwaznameya wî bi çavekî erênî nayê qebûl kirin[149]. Li Fatîhê ciyê entelektuelên Osmanî, li xana Şekercî niştecîh dibe, lewheyekê ser derê xwe darde dikê û wiha dinivîse: "*.... li vê derê de her pirs tê bersivandin, lê ez tu pirsan pirs nakim.*"[150] Piştî vê meydan xwendina Bedîuzeman Seîdê Kurdî, giliyê wî li gel rêvebirên dewletêtê kirin û sewqî timarxaneyê dikin. Dixtor dema wî muayene dikin di derbareyê tendurstiya wî de wiha dibêjin: "*Ger Seîd dîn be, di dinê de tu mirovên bi aqil tunene*."[151] Piştî vê raporê nikarin wî di timarxaneyê de bihêlin û dişînin zindanê. **(bnr. Pêvek-2)**

Bedîuzeman dixwaze rêvebiriya Osmanî di derheqê girîngiya Gelê Kurd de hişyar bike û bi taybetî di aliyê perwerdeyê de. Hin dibistan hatine vekirin lê ew jî bi zimanê tirkî perwerdeyê didin ku kurd nikarin jê îstifade bikin. Ji ber vê ew daxwaznameyekê pêşkeşî Rêvebiriya Osmanî dike. Seîdê Kurdî di Dewleta Osmanî de girîngiya Gelê Kurd û rewşa wan a xirab bi Hikumetê dide zanîn. Bedîuzeman bi tenê nexweşiyan nade, rêzê reçeteyê jî perpêş dike û ji bo nexweşiyên Gelê Kurd zanistê û ilma muqades berpêş dike. Di vê esrê de rizgariya miletê xwe di bi perweredehiyeke zimanê kurdî, dînî û zanistên fenî de dibîne. Lê ji bo kurd jî ji gelên din re bikaribin pêşbaziyê bikin û bigihîjin heqên xwe, alîkariya Hikumetê pêwîst dibîne.[152]

Abdulkadir Badıllı di derbarê vê mijarê de wiha rave dike: "*Ji bo perwerdeya herêma Şerqê gelek feyde wê çêbibûya. Gengeşiyên di nava osmaniyan de dê çareser bibûna, him jî dijberîtî îxtilafên navbera eşîran yê ji holê rabûya û Dewleta Osmanî jî dê hêz ji wan bigirta. Bi wasitaya perwerdeyê di halê hazir de ew cehalet û nezaniya wan ê ji holê rababûya, çiqas miletekî bi qabiliyet e, ew cewherê derkeve derva, encameke muezzam yê bida*."[153] Bersiva

[148] Alakom, *h.b*., 37.
[149] Badıllı, *h.b.*, 142-143.
[150] Badıllı, *h.b.*, 144.
[151] Badıllı, *h.b.*, 155.
[152] Molla Seîdê Meşhûr, "*Maqaleyên Bedîuzeman*", Dersên Civakî, 359.
[153] Badıllı, *h.b.*, 148.

daxwaznameya Bedîuzeman Seîdê Kurdî ew e ku; wî, sewqî timarxaneyê dikin.

Di sala 1944an de dema Bedîuzeman Seîdê Kurdî di zindana Denizliyê de ye, di derbarê vê mijarê de wiha dibêje: "*Çil sal berê ehlê siyasetê ji min re behişteke demî îsnad kirin û ez sewqî timarxaneyê kirim. Min ji wan re got, ew aqilbûna hûn dibêjin ez bê aqilî dizanim. Ez ji aqilekî wisan îstifa dikim.*"[154]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî piştî nameya Parêzgarê Bedlîsê çûye Stenbolê. Lewra Nezareta Zabitiye ya Stenbolê, ji Parêzgeha Wanê re namekyekê dişîne û behsa nexweşiya Bedîuzeman dike. Wisa xuya dike ku têkiliya Bedîuzeman bi zabiteyan re çêbûye. Lewra di naveroka nameyê de ji Wanê agahiyên kirinên wî, ji kengê ve li Wanê niştecî ye, di alimtiya xwe de mirovekî çawa ye û hwd… pirs dike.[155]

Di derbarê çalakiyên Bedîuzeman Seîdê Kurdî de rêvebirên Stenbolê û yên Wanê hev agahdar dikin. Di 19ê Tîrmeha 1908an de Nezareta Zabiteyê nameyeke din ji Parêzgeha Wanê re dişîne. Mirov ji naveroka nameyê fêm dike ku xwestina dûrxistina Bedîuzeman ji Stenbolê heye û di vê tezkîrê de di demeke kin de behsa vegera Mela Seîd ya Wanê heye û hin kirinên wî yên ku xweşa Stenbolê neçûne tê behs kirin. Ger ev helwest li Wanê jî dewam bike wek serokê eşîran serhildanek dibe çêbibe. Li Parêzgeha Wanê gelo endîşeyeke wan jî heye yan na? Telgrafeke din jî, ji aliyê Parêzgeha Wanê ji bo Hikumeta Stenbolê hatiye şandin. Ji vê têlgrafê tê fêmkirin ku behsa başiyên Mela Seîd hatiye kirin.[156]

Di 19ê Tîrmehê 1908an de Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji bo ku ji Stenbolê biçe Wanê biryar tê dayin. Ev biryar nayê cî û di demeke kurt de Meşrûtiyeta Duyem tê îlan kirin. Bedîuzeman dibe alîgirê Meşrûtiyetê, dest bi nivîsan dike û di vê serdemê de zêde çalak dibe. Mirov dizane ku navbera wî û Evdilhemîdê duyem tuneye. Lewra aligirên Meşrûtiyetê û Evdilhemîd dijberî hev bûn. Dema Meşrûtiyet îlan dibe Bedîuzeman Seîdê Kurdî li Stenbolê dimîne.

---

[154] Seîdê Nursî, *Şualar*, Envar Yayınları, İstanbul ,1990, 319.
[155] Sönmez, *h.b.*, j. 2,86.
[156] Sönmez, *h.b.*, j. 3,86.

Piştî îlana Meşrûtiyetê di 29ê Tebaxê 1908an de Nezareta Zabiteyê tezkîrekê ji Nezareta Hundirî re dişîne, ji bo Bedîuzeman vegere Wanê padişah du hezar quriş xercirah meaş teklîf dike, lê belê Bedîuzeman vî meaşî red dike. Evdilhemîd her tim dixwaze bi awayekî wî ji Stenbolê dûr bixe. Bedîuzeman xercirahê wek bertîl dibîne, "îstîxnaya ji nas" di temenê xwe de wek dustûrekî jiyaye.[157]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî di bûyera 31ê Adarê de tê darizandin. Wê demê li Îzmîtê bûye lê belê wî binçav dikin û tînin Stenbolê, derdixînin dadgehê û di Dîwana Herba Ûrfî de ew beraet dike. Dema zilma wan dibîne, "*ji bo zaliman bîjî dojeh*" dibêje û bêminetiya xwe nîşanê dinê dide.[158]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî piştî darizandina 31ê bûyera Adarê gotînên xwe yên dadgehê bi navê "Dîwana Herba Orfî" wek pirtûkekê diweşîne. Piştî weşandina vê pirtûkê di 18ê Îlonê 1909an de cardin tê darizandin.[159] Mirov ji van wesîqeyan fêm dike ku ev pirtûka Bedîuzeman Seîdê Kurdî bandoreke zêde çêdike û bi caran Bedîuzeman tê darizandin.

Bedîuzeman Seîdê Kurdî cardin vedigere Wanê û li hemberî Artêşa Ûris şer dike lêbelê dîl dikeve destên wan û wî dibin Sovyetîstanê. Di sala 1918an de ji destê Ûris firar dike, bi rêya Culfa, Tîflîs, Nîzhny, Tagîl, Kologrîv, Qosturma, St. Petersbûrg, Warşova, Berlîn, Wiyana û Sofyayê vedigere Stenbolê. Çawa tê Stenbolê bi emrêwakî tayinê endamtiya Darulhikmetê Îslamê dibe û bi mecbûrî qebûl dike.[160]

#### 1.1.6.1.Şîretên ku Seîdê Kurdî li Stenbolê ji Kurdan re Kirine

Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji Kurdistanê ji bo sedemên nexweşî û paşvemayîna kurdan diçe Stenbolê. Dema li Stenbolê digere, zêdeyî kurdên feqir û nezan rastî wî tên û hez dike wan ji bo maf û dadê wan hişyar bike. Ew cehalet û nezaniyên wan ji bo gelê kurd lekedar neke, hin şîret û nesîhetan li wan dike. Bedîuzeman Seîdê Kurdî wiha dibêje: "*Min ruhê xwe, bi mêvanî şand cesedê*

---

157 Sönmez, *h.b.*, j.86.
158 Sönmez, *h.b.*, j.86.
159 Sönmez, *h.b.*, j.86.
160 Abdurrahman Nursî, *Bedîuzemanın Hayatı*, 38-39.

*hemalekî û bi zimanê hemalan, xîtabî hemalan kir û min rewş ji wan re beyan kir. Ew qusûrên min, divê ku ji hemaliya min a mustear re bên bexişandin*."[161]**(bnr. Pêvek-3)**

Di van şîretan de hin gotinên Bedîuzeman xelet tên fêm kirin. Lewra Bedîuzeman di serî de hişyariyan dide xwendevanên xwe. Ew gotin, ji aliyê hin rewşenbîrên kurd ve xelet têne fêm kirin, bi taybetî ev gotina wî ya xitabî hemalan dike: "*Tirk, aqilê me ne û em jî ji wan re wek quwet in. Îca em bi hev re hîna nû dikarin bibin însanekî kamil. Em dê bi serê xwe tiştekî nekin*."[162] Lê di vir de qest ne gelê kurd hemû ye, pêwîst e mirov bi çavê hemal û nezanan li vê şîreta wî mêze bike. Çawa di gotinek pêşiyên ereban de derbas dibe ku ew dibêjin: "kellîmî nase ela qederî uqûlîhîm, yanî; bi qasî hişê mirovan bi wan re biaxivin." Ji bo ku wê demê rêvebir bi taybetî Tirk bûn, ew jî alîgirên partiya Îttihad Terakiyê bûn. Ev gotina hanê neku ji bo hemû kurdan û ji bo her demî, hatiye gotin.

### 1.1.6.2.Serdema Zordestiyê û Seîdê Kurdî

Bedîuzeman Seîdê Kurdî dema li Stenbolê mafê kurdan digere, ew bi daxwaznameya heq û hiqûqên netewa kurd, ji aliyê rêvebiriyê ve bi dîntiye tête tawanbarkirin. Ew jî bi dîyalogekê gilî û gazindên xwe dike, muameleya nexweşan jê re tê kirin, wî dişînin timarxaneyê. Lêbelê ew rêvebirên Osmanî nexweş dibîne ku ew mihtacî tedawiyê ne. Ji nûjdar re dibêje: "Dixwazim ku muayena min bi awayê muhakemeyê bibe. Bila wijdana te jî, bibe hakem."[163] Bedîuzeman ser navê nûjdar bersiva Evdilhemîd û rêvebiran dide. Dîtina wan ya derbarê netewa kurd û Kurdistanê de wek nexweşiyekê tedawî bike: "*Ez li çiyayên Kurdistanê mezin bûme. Divê hûn hal û hereketên min ên hur û tund, bi pîvanên Kurdistanê were pîvan, ne bi teraziya Stenbolê ya medenî ve*."[164]

### 1.1.6.3. Hevpeyvîna bi Şefîq Paşayê Nazirê Zabtiyeyê re

Dema li Stenbolê Bedîuzeman Seîdê Kurdî doza mafê Gelê Kurd dike, rêvebiran xwestine ku bi rêyeke nerm yan jî di aliyên aboriyê de wî îkna bikin. "*Padîşah li te silav kiriye. Ji te re miaşekî hezar qurişî jî girêdaye. Paşê dê bike bîst-*

---

[161] Kurdî, "Nutuq", *Dersên Civakî,* 27-28.
[162]Seîdê Kurdî, "Nutuq"*, Dersên Civakî,* 27-28.
[163] Kurdî, "Dîwana Herba Orfî", *Dersên Civakî,* 169.
[164] Kurdî, b.n.,169.

*sî panot*"[165] Bedîuzeman vê teklîfê wek bertîl dibîne, reda miaşê dike. Dema ji wî re teklîfa meaşê tê kirin ew xwe weke parsekekê dibînbe û nerehet dibe. "*Ez ne parsekê meaş im. Hezar panot be jî, ez nikarim qebûl bikim.*"[166] Îtiraza Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji vê teklîfê re ev e: "*Ez ji bo xwe nehatim e, ji bo gelê xwe hatim e*."[167] Lê dîsa jî tê israr kirin û Bedîuzeman Seîdê Kurdî jî dibêje,"*çima hûn perwerdehiyê bi paş ve dixin û meaş jî didin pêş. Gelo ev bi çi qaîdeyî ye? Hûn menfîeta min a şexsî, li ser menfîeta umûmî ya millet re digrin.*"[168]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî li hemberî Şefîk Paşa, wêrekiyeke mezin nîşan dide û ji xwe bawer e û bê minet e. "*Ez li çiyayên Kurdistanê yên ku warê huriyeta mutleq/azadiya bêkêmasî ye mezin bûme. Ji bo min hîddet qet bi kêr nayê.*"[169] Daxwazeke wî heye, ew jî ji bo perwerdehiya gelê Kurdistanê ye. Lewra hîç li berjiwendiyên xwe nefikiriye, pey tiştên şexsî neçûye, heye tuneye perwerdeya gelê kurd fikiriye. Bi rastî Dewleta Osmanî çiqas rêvebir û mezinên Kurdan hene û doza maf û heqê xwe kirine yan hatine tepisandinê yan jî bi menfiatên şexsî hatine ker kirin. Lê belê Bedîuzeman ne yekî wisa bû. (**bnr**. **Pêvek -4**)

Bedîuzeman dema li Stenbolê bindest bû, ji bo azadiyê wiha gazî dike:

"*Ey hurriyeta şer'î! Tu bi dengekî wisan bi dehşet, lê belê xweşik û mizgînwarî bang dikî ku kurdekî mîna min ê ku di bin tebeqeyên xefletê de razaye, hişyar dikî. Ne ji te bûya, ez û gel gişk, dê di zîndana dîltiyê de bimana*." [170]

Bedîuzeman dixwaze gelê xwe hişyar bike û ji bo çareseriya vê pirsgirêkê çar- pênc çareyan pêşniyar dike:

Deriyê wê yê pêşî, yekkirina dilan, deriyê wê yê duduyan muhebbeta millî, ê siseyan mearîf, ê çaran, keda mirovan û ê pêncan jî terka sefîhiyê ye.

Bedîuzeman Seîdê Kurdî di 8ê Tirmehê ya sala 1918an de, heta çûyina xwe ya Wanê a 25ê Nîsanê ya 1923an, li Stenbolê dimîne û jiyaneke zêde bi çalak derbas dike. Ji sala 1918an pê ve, Bedîuzeman êdî mirovekî 40 salî ye û xwe ji siyaset û jiyana civakî dûr xistiye. Berhemên wî, "Lemaat(1921), Şemme(1922), Şûle(1936-

[165] Kurdî, b.n.,174-175.
[166] Kurdî, b.n.,174-175.
[167] Kurdî, b.n.,174-175.
[168] Kurdî, "b.n.,174-175.
[169] Kurdî, "H,b.", r.174-175.
[170] Seîdê Nursî ," *Tarihçe-i Hayat, 58.*

1949), Sözler(1926-1930), Lemalar(1932-1936), Mektubat (1929-1934), Şûalar (1936-1949)"[171] di van salan de têne nivîsîn û mijarên wan jî meselên ûxrewî û îmanê ne.

Bedîuzeman Seîdê Kurdî kesayetek çalakvan bûye û di nava kulûb, cemiyet û komeleyan de cî girtiye û hin xebatên balkêş kirine. Hinek ji wan saziyan ev in:

#### 1.1.6.4.Endamtiya Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya Kulûb/Komel û Cemiyetan

Bi rastî Bedîuzeman mirovekî çalak bûye. Di ciyê xwe de nesekiniye, dema dîtiye ku di karekî de feydeya gel heye alîkariya gel kiriye. Bedîuzeman dema diçe Stenbolê têkiliyên wî bi rewşenbîrên kurdan re çêdibe û di nav komên kurdewar de cihê xwe digre. Ne ku bi tenê rewşenbîrên kurd re, têkiliyên wî ji bilî rewşenbîrên kurd, bi alim û zanayên din ên îslamî re jî hebûn. Cemil Meriç wiha dibêje: "*Eger min pêşiya ciwaniya xwe Bedîuzeman nas bikira, berhemên wî bixwendana, bi îhtimaleke mezin min ê çavên xwe wiha zû wenda nekirana*."[172] Cemil Meriç di pirtûka xwe "Jurnal"ê de behsa Bedîuzeman dike û heyraniya xwe ji bo wî wiha tîne zimên: "*Seîdê Nûrsî mirovekî wisan e, kirinên xwe û gotinên xwe kiriye yek. Mirovekî tekoşer/mucahîd e, dema ez ser wî lêkolîn dikim hirmeta min zêde dibe.*"[173] Şerif Mardin jî dibêje, "*ku Cemil Meriç nebûya min yekî mîna Bedîuzeman meraq nedikir.*"[174]

"Seîdê Kurdî li Stenbolê rastî nivîskarên kurd tê û têkiliyên wî gelekî bi rojname û kovarên kurdî re çêdibe. Têkiliyên Bedîuzeman li aliyekî polîtîkvanan re, li aliyekî jî weşanxaneyên kurd re didome û li aliyekî din jî bi îslamîst û lîberalan re diyalogên wî berdewam dike û pêwendiyên wî jî cuda cuda bûne. Ji bo wan pêwendiyan fikr û ramanên xwe di platformên cuda cuda de dianî ziman. Bi

---

[171] Badıllı, "*H.b.*", 130, 280, 354; Niyazi Beki, "*Risale-i Nur Külliyatının Telif Tarihleri*", www.sorularlarisale.com/makale/1594/ risale-nur kronolojik bilgi, pêwendî:13.02.2016.
[172] Ahmet Yıldız, "1910 dan Bugüne Birlikte Düşünmeye Davet Yada Bediüzzamanın Münazaratı" Munazarat Sempozyumu, Merak Yayınları, Ankara 2012, 3. nql.Îhsan Işık, "*Bi Cemîl Merîç re Mulaqat*", Yeni Devir, 1981
[173] Cemîl Merîç, *Jurnal*, İletîşim Yayınları, İstanbul, 1992, 5.
[174] Şerîf Mardîn, *Bediüzzaman Said Seîdê Nursî Olayı*, İletişim Yayınları, İstanbul, 1989, 8.

nasnameya xwe ya alimtiyê pirsgirêkên wan dianî ziman, bi nasnameya xwe ya kurd pirsgirêkên kurdan yên paşeroj û pêşerojê beyan dikir.”[175]

Çawa Cemalettîn Efxanî ji bo yekitiya gelên misilman tête Stenbolê û têkoşînê dike, Bedîuzzaman jî ji bo gelên misilman û kurdan dixebite û ji ber mîsyoneriya Rojavayê li çareseriyan digere. Têkiliyên Bedîuzeman Seîdê Kurdî bi gelek cemiyetên dînî û milî re çêbûye û yek ji wan Kurd Tealî Cemiyetî bû ye û rêvebîrên vê cemiyetê azadîperwer, dîndar û alim bûne. Hinek ji wan kesayetên pêşeng ên tên zanîn ev bûn: Seyyîd Evdilqadir, Celadet Bedirxan, Abdullah Cewdet, Îbrahîm Temo.

Bedîuzeman Seîdê Kurdî, dema ji esaretê rizgar dibe û tête Stenbolê, Enver Paşa dixwaze wî bike endamê Darul Hikmetê. Di Tirmeha 1918an de, bi emrê wakî dibe endamê vê rêxistinê. Bedîuzeman xêncî miaşê wazifeya din ji bo dîn û manewiyatê qebûl dike. Di 18ê Adarê 1920an de, Bedîuzeman dibe endamê cemiyeta Hilal Ehmar/Heyva Keskê.” [176]

Têkiliya wî bi “Cemiyeta Muderîsan” re jî hebû. Armanca vê cemiyetê ew bû ku ji bo heqaîqên îslamî û ji bo dîn canê xwe feda bikin. Ji bilî van cemiyetan yek ji wan cemiyetan a ku di Stenbolê de kar û xebat dikir, Cemiyeta Kurd ya Neşrî û Mearîfî bû. Armanca vê cemiyetê di sêrî de ew bû ku alikariya xwendevanên kurd yên dibistana seretayî yên Stenbolê bikin. Wî digot; “ger derfet çêbibin, di pêşerojê de ew warên piraniya wan kurd lê rûdinên, tê de dibistanên nû bên çêkirin.[177] Her çiqas wê demê projeya Medresetuzehrayê ji bo bajarên Kurdistanê yên qedîmî fikiriye, wisa jî li Stenbolê di “Cemiyeta Kurd a Neşrî û Me’arîfî” de hem ji bo Kurdistanê hem jî ji bo kurdên Stenbolê bi perwerdehiya “seretayî hetanî zanîngehê” re eleqedar bûye. Lewra kurd, bi milyonan li derveyî welêt dijîn. Xebatên Bedîuzeman yên di derbarê perwerdehiyê de nîşanê me dide ku her tim di fikr û raman û jiyana wî de projeya perwerdehiyê hebûye.

Macereya kurdewariya Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya li Stenbolê ji bo ku bê ronîkirin, pêwist e bête zanîn ku têkiliya wî ji kîjan komel û rêxistinan re hebûye, bi

[175] Muhyiddîn Zinar. *Di Pêncî Saliya Wefata Wî de Sempozyûma Bedîuzeman Seîdê Kurdî,* Wesanxaneya Nûbihar, Stenbol, 2011, 135.
[176] Badıllı, *h.b.*, 172-173.
[177] Seîdê Nursî , *“*Nutûq*”, Dersên Civakî,* 32.

çi kesan re teşrîkê mesaî kiriye, di nav kîjan komel, cemiyet, kulûb û saziyan de cih girtiye û xebitiye, bête beyan kirin.

Hin ji wan cemiyetên dînî û netewî yên ku tên zanîn ev in:

Kürt Teali Cemiyeti (Cemiyeta Kurd a Tealî),[178] Îttihad ve Terakki Partisi (Partiya Îttihad û Terakiyê), [179] Îtthadî Mûhammedî,[180] Dar-ül Hikmet (Endamtiya Darul Hikmetê) ,[181] Hilal-ı Ahmer (Endamtiya Heyva Kesk),[182] Müderrisler Cemiyeti (Cemiyeta Muderîsan)[183] û Kürt Neşr-i Maarif Cemiyeti (Cemiyeta Kurd a Neşr û Me'arîfê).[184]

Di jiyana Bedîuzeman Seîdê Kurdî de cemiyeta yekem a herî girîng "Cemiyeta Kurd Tealî ye". Bi taybetî rêvebir û damezrînerên vê cemiyetê şêx, zana, rewşenbîr û arîstokratên Kurd bûne. "Di serê sedsala bîstemîn de di nava siyaseta Stenbolê ya tevlihev de kurdên bi zorbetiya Dewleta Osmanî li Stenbolê niştecî bûne, pêşiyê têkiliyên wan bi CÎTê re hebûye, paşê hêdî hêdî rêxistin û cemiyêtên kurdan çêbûne.

Rohat Alakom ji Şevket Sureya Aydemir neqil dike ku Bedîuzeman wiha dibêje: "*Ez girêdayî heft Cemiyetan im. Pêşiyê ez kurd im û girêdayî vî navê pîroz im.*"[185]

Cemiyeta Kurd Tealî, di 17ê Kanûna 1918an de tête damezirandin. CKT bi serokatiya Seyyîd Evdilqair ve hatiye damezirandin. Seyyîd Evdilqadir çiqas ji navçeya Şemzînan girêdayî Hakkarî tê zanîn jî ew bi eslê xwe Wanî ye.[186] Di derbarê dîroka damezrandina vê Cemiyetê de hin gengeşî hebin jî, lê ya tê pejirandin 1918e ye.

Damezrîner, Rêvebir û Endamên Cemiyeta Kurd Tealiyê yên tên zanîn:

Reîs/serok, Seyyîd Evdilqadir Efendî, Katibê Umûmî, Huseyîn Şukrî Bey( Baban), Dr. Mehmed Şukrî Bey (Sekban), Muhîttîn Namî, Babanzade Hikmet Bey,

---

178 Badıllı, *h.b.*, 211-213.
179 Badıllı, *h.b.*, 219-221.
180 Badıllı, *h.b.*, 231-233.
181 Badıllı, *h.b.*, 360.
182 Badıllı, *h.b.*, 404-405.
183 Weld, *h.b.*, 189-190.
184 Weld, *h.b.*, 198.
185 Alakom, *h.b.*, 80.
186 İsmail Göldaş, *Kürdistan Teali Cemiyeti*, Doz Yayınları, İstanbul, 1991, 11-12.

Azîz Bey, Beytar Nûrî Dersimî, Alîşêr (Koçgirî), Wezîrê Behriye yê Kurd Hemdî Paşa, Mutasarrif Fanîzade Mesut, Meletyeyî Bedirxanê Xelîl, Serokê Dîwana Herbê Kurd Mustefa, Katibê Umûmî Zeynel Abdînê Edeneyî (Rewandizî), Xwediyê Rojnameya Serbestî Mewlanazade Rifat, Kurd Haqiyê Silêmanî, Fanîzade Alî(xwediyê rojnameya Ferdayê), Babanzadeyan(Mahmût, Zîhnî), Bedîuzzeman Seîdê Kurdî, Bedîrxanzadeyan(Bedirxan, Murat Remzî, M.Alî, Emin Alî), H.Abdullah Sadî, Ahmet Hamdî Paşa, Şefîk Arwasiyê Wanî, Memdûh Selimê Begê Wanî, Abdullah Cewdet, Ahmet Ramîzê Liceyî. Di vê lîsteyê de 167 kes hene lê me ew hemî negirtin lîsteyê. [187]

Seyyîd Evdilqadir di sala 1851-1925an de reîstiya Şûrayê ya Dewleta Osmanî kiriye. Seyyîd Evdilqadir piştî Komara Tirkiyeyê ji aliyê dadgeha Şerq Îstiklalê ve li Diyarbekirê dema tê daliqandin wiha dibêje: "*Hûn di warên şewitandin û şerkirinê de namdar in. We ev der jî wek Kerbelayê kir. Vê bizanibin, bi bêînsafiyê, bi şîddetê û metîngeriyê ji mirovan re şan û şeref çênabe*."[188]

Ji bilî vê lîsteyê M. Emîn Bozarslan, di Kovara Jînê de, "Hemzeyê Miksî, Xelîl Xeyalî, û Mela Seîdê Kurdî" weke endamê Cemiyeta Kurd Tealî dinivîse. Zinar Silopî dibêje ku damezrînerê Cemiyeta Kurd Tealiyê; Seîdê Kurdî, Hemzeyê Miksî, Xelîl Xeyalî"[189] wek endam nivîsiye.

Cemiyeta Kurd Tamîm Maarîf û Neşriyat:

Wezîfeya eslî ya vê cemiyetê weşanxane û perwerdeya Kurdî bûye. Damezrînerê vê cemiyetê yên têne zanîn ev in:

Bedirxanzade Emîn Alî Bey, Dr. Evdullah Cewdet, B.Mîthat Bey, Seyfullah Bey(mebûsê Erziromê), Taha Bey (mebûsê Hekkariyê), Tewfîk Bey (mebûsê Wanê), B.Kamil Bey, Mehmet Efendî (mebûs), Mîr Seyfîzade Huseyîn Avnî Bey, Mîralay Mahmut Samî Bey, M.Faik Efendî Diyarbekirî, Bedîuzeman Seîdê Kurdî, Xelîl Xeyaliyê Motkî û Kurdîzade Ahmet Ramîz.[190]

Armanca Cemiyetê; weşanxane û perwerdehiya bi zimanê kurdî bûye. Bedîuzeman di vê cemiyeta kurdewar de xebatên xwe pêk anîne.

---

[187] Göldaş, *h.b.*, 21-25.
[188] Göldaş, *h.b.*, 21.
[189] Göldaş, *h.b.*, 21.
[190] Göldaş, *h.b.*, 21.

### 1.1.6.5. Derketina Seîdê Kurdî ji Stenbolê

Di hatina Stenbolê ya cara yekem de, di derbarê Stenbolê de xeyalên Bedîuzeman dişkên. Bi taybetî ji bo projeya xwe û heq û hiqûqênKurdan li Stenbolê nagihîje tu xwestinên xwe. Dema ji Stenbolê vediqete (1910), nerazîbûna xwe tîne ziman, gazî rêvebiran dike û wiha dibêje:

"*Hey gidî Stenbola mezin! Min wekhevî û biratî li ba te, di dewra îstibdadê de, tenê li timarxaneyê û di dewra meşrûtiyetê de jî, tenê li hepisxaneyê dît. Bi xatirê te ey pîrejina ku cil û bergên bûkan li xwe kiriye! Ez ji te bêzar bûm, tu wekî hingivê jehrîn î. Heta wekî mirovekî hov î ku kincê medeniyan li xwe kiriye. Bi rûyê xwe, tu çiqas medenî yî; bi xuyê xwe jî, bi vê nîfaq û sefahet û xerezê, tu ewqas hov î. Tu eynî wekî dinyayê yî. Ez jî li hatina xwe ya dinyayê poşman bûm. Her li te difikirim, peyva riyakariyê tê hişê min. Ger ku medeniyet zemîneke wiha musaît be, ji tecawuzên heysiyetşikên re û ji îftirayên munafiqî re û ji fikra întiqamê ya bêînsaf re û ji fêlbaziyên şeytankarî re û ji bo hereketên laûbaliyane yên di dîn de; bila her kes şahid be, ciyê ku jê re dibêjin koşk û seraya seadeta medeniyetê ku warê kîn û xereza wiha ku hêlîna mar û dûpişkan e, ez konên koçerî û hovîtiyên li çiyayên Kurdistanê yên bilind ku warê azadiya bê dawî, tercîh dikim. Lewra ew azadî û fikra serbestiyeta kelamê û niyeta baş û dilê safî yê ku min li vê derê nedît, li çiyayên Kurdistanê, bi temamî hukimferma ne.*"[191]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji reng û rûyê Stenbolê, bi taybetî jî, ji rêvebirên Stenbolê memnûn namîne. Durûtî, riyakarî, bêedaletî, sefahet û rûyekî sexte dibîne, wekî hatina xwe ya dinyayê re çawa poşmaniya xwe dibêje, wisa jî ji hatina Stenbolê re poşmaniya xwe tîne ziman. Lewra Bedîuzeman Seîdê Kurdî jiyan û têkiliyên Kurdistanê dide ber hev; başbûn, ciwanmêrî, rastî, hisyet, xwedî peyman bûn, safîbûn û yekrûtiyê li Kurdistanê dibîne. Piştî dîtina mar û dûpişkên Stenbolê, jiyana hovî û fitrî a çiyayên Kurdistanê, ku azadiya bêdawî pêşkêşî mirovahiyê dike, Kurdistanê tercîhê Stenbolê dike. Hin bajaran di jiyana Bedîuzeman de cihekî girîng girtine, ji van yê herî girîng ê yekem; Wan e ku xîmê fikr û ramanên wî tê de şîn bûye û kemiliye. Duyem: Stenbol e ku jê re bûye qada tekoşîna heq û hiqûqê. Em bi taybetî ser van herdu bajêran disekinin. Ji bilî van bajaran, gelek cihên din jî hene ku

---

[191] Kurdî, "Dîwana Herba Orfî", *Dersên Civakî*, Zehra Yayınları, Stenbol, 2013, 166.

di jiyana Bedîuzeman de girîng in. Wek; Barla, Denizli, Eskişehir û yên din ku di kronolojiya jiyana Wî de hatine pêşkeşkirin.**(bnr. Pêvek-5)**

### 1.1.7.Wefata Bedîuzeman Seîdê Kurdî

Jiyana Bedîuzeman Seîdê Kurdî, ji neh saliya wî hetanî wefata wî bi xwendina ilm û irfanê ve dibore. Jiyaneke bi tekoşîn, koçberî, jehrîkirin, darizandin û bi çalakî derbas bûye. Bi umrekî temendirêj xebatên gelek hêja kirine û heta wefata xwe têkoşerî kiriye, weke alimekî mohra xwe li behra zanistê xistiye. Jiyana Bedîuzeman ya nêzî sed salî bi zanîn û tekoşînê derbas dibe. Çawa Musa Anter jî dibêje; "*Serê sed sala em tê de hetanî sala 1960an jiyana wî hemberî otorîteyên Osmanî û Komara Tirkiyeyê bi tekoşîn derbas dibe.*"[192]

"Salnameyan, 19ê Adarê ya sala 1960ê, roja şemiyê nîşan dida. Bist yekê meha Remezanê bû. Bedîuzeman Seîdê Kurdî wê rojê piştî esrê li Emirdağê derbasî Isparatyê dibe, nexweşî lê giran dibe. Dema nexweşî lê giran dibe dixwaze wî bibin bajarekî Kurdistanê û li wir defin bikin. Ji şagirtên xwe re dibêje:

- Em ê herin.

Şagirt dipirsin:

-Ustad em ê herne kuderê?

-Ûrfa, Diyarbekir… dibêje.

-Em ê herin Ûrfayê.

Şagirtên wî bi seyarekê Bedîuzeman dibin Rihayê, li wê derê 23yê Adarê wefat dike, li Dergahê Îbrahîm Xelîl tê definkirin. Bedîuzeman di jiyana xwe de yanê di navbera 1878-1960an de, rêvebiriya "monarşî, meşrûtiyet, rêvebiriya yek partiyê û rêvebiriya pirr partiyê dîtiye û di wan de jiyaye.

Bedîuzeman di sala 1925an de li Wanê, bi zora dewletê ji welatê xwe tê dûrxistin. Cardin destûr nadin vegere welatê xwe. Piştî wefata wî jî dîsa wî rihet nahêlin. Hikumat wê demê dixwaze Bedîuzeman ji Ûrfayê derxe lê gelê Ûrfayê dijberiyeke mezin nişan dide, ev rewş dibe sedemên îptal kirina biryara birina wî. Bedîuzeman, di demeke girîng a dîroka Kurdan de (23.03.1960), rojên piştî Newrozê

---

[192] Musa Anter, "*Hatıralarım"*, İstanbul, Aram Yayınları, 2011, 72.

wefat dike. Lewra hevokeke Bedîuzeman ji bo vê rojê heye û wiha dibêje: "*Mirin roja me ya newrozê ye.*"[193] Ji bo wî rojeke nû, jiyaneke nû dest pê dike. Bi gotina wî: "*Newroz bihara siltanê yê*"[194] û dîsa mirinê tunebûn napejirîne, wek terxîs dibîne.

Bi hezaran ehlê Ûrfayê îştirakê cenazê Bedîuzeman dibin û ew li dergaha Îbrahîm Xelîlulah de, di roja êvara leyletu'qedrê de tête definkirin. Lê belê Hikumat, rihetiyê di gorê de jî nadê û 12ê Tirmehê 1960an de, bedena wî ji gora wî derdixin û dibin ciyekî meçhul/nediyar. Hê niha jî ciyê gora Bedîuzeman Seîdê Kurdî wek gelek mezinên Kurdan ên din, (Seyîd Riza, Şêx Seîd) nayên zanîn. Her çiqas jiyana Bedîuzeman bi zor û zehmetiyê de jî derbas bûye di nava wan zor û zihmetiyan de tekoşînên wî berdewam bûne û bi taybetî bi qasî 6000 rûpelî pirtûk nivîsîye û bi navê "Kulliyata Risaleyên Nûr" hatiye berhev kirin.

## 1.2.BERHEMÊN BEDÎUZEMAN SEÎDÊ KURDÎ

Bedîuzeman Seîdê Kurdî pirtûkên xwe diwekîne Gelê Kurd, her berhemeke xwe wek eşîr û qebîleke Kurd. Lewra mijar û taybiyetiyên pirtûkan ji hev cuda cuda ne. "Fikra milliyetê ku bi kurdîtiyê re kelijiye, ders da ku wan her du reçeteyên ku gelek tebîet û hestên cure bi cure û muxtelîf digre nava xwe, ev berhem wiha derxist holê. Tê wê wateyê, ji ber ku her yek berhemeke min, puxteya çend qernekî û mînaka tebîetên taîfeyên kurd e û numûneya helwestên min ên têra xwe cure bi cure ne, divê kes ji wan întîzameke heqîqî hêvî neke."[195] Berhemên Bedîuzzaman bi taybetî ji bo perwerdehiya xortan û yên din e. Wî xwestiye îmana însanan xelas bike û amadeyê dinyayeke din bike, ji ber ku ev der ciyekî mêvanxane ye. Berhemên wî ev in:

### 1.2.1. Kızıl Îcaz (1989-1921)

Mijarên berhemê ev in: Danberhevên mantiqî di vê risaleyê de cih girtine. Ev berhem û berhemeke matematîkê/riyazat-hesab bi kurdî nivisîye, ya ku tê zanîn di qonaxa walî de şewitiye. Kurdiya wê di dest me de tuneye.

[193] Seîdê Nursî, Tarihçeyi Hayat, http://www.yeniasya.com/risaleinur/tarihceyihayat/ #139/z
[194] Seîdê Nursî, Sözler, http://www.yeniasya.com/risaleinur/tarihceyihayat/ #93/z
[195] Kurdî, "Munazarat",*Dersên Civakî*, 78.

### 1.2.2. Divan-ı Harbi Örfi ve Said-i Kurdi (Dîwana Herba Orfî) (1909-1911)

"Bawernameya Du Fêrgehên/Xwendingehên Mûsîbetê, yan jî Dîwana Herba Orfî û Seîdê Kurdî." Ev pirtûk parastina Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya hemberî dadgehê ye. Di serdema Evdilhemîdê duyem de, wexta bi dînitiyê, cinûniyê hatiye sucdarkirin û ew avêtine timarxaneyê, di 31ê Adarê 1908an de, di bin zorbetiyê de nivîsiye. Di vê parastinê de gotinên dîrokî, ji devê Bedîuzeman Seîdê Kurdî derketine. "*Ev hikumeta heydût, bi zimanê zilmê di zordestî û îstibdadê de, neyartî li aqil dikir. Niha jî, ji jiyanê re dijminatiyê diajo. Ger rewşa Hikumatê wiha be her bijî cinûtî û dînîtî û her bîjî mirin!" "Ji bo zaliman her bijî dojeh*"[196] Mele Seîdê Kurdî gotina xwe bi wecîzeyeke wiha dawî dike. Ew gotin û di derbarê vê pirtûkê de Yunis Îpek wiha dibêje: Li dijî rejîmên monarşîk û olîgarşîk li hemberî dîktatoran, tekoşîneke bi şanaz e, fêkiya berxwedana berhema wî ya bi navê "Dîwana Herba Orfî" di bin şert û mercên zor, zehmet de hatiye çapkirin.

Ev pirtûk cara yekemîn li Stenbolê, bi alîkariya Ehmed Ramîzê Kurdîzade, li çapxaneya "Artîn Asadoryan û Xebatkarên wî" ve hatiye çap kirin. Çapa yekem di sala 1909an de, çapa duyem jî di sala 1910an de çêbûye. Lê belê ev pirtûk gelek caran ji aliyê desthilatdaran ve hatiye qedexekirin. **(bnr. Pêvek-6)**

### 1.2.3.Hutbe-i Şamiye (Xutbeya Şamê) (1911-1911)

"Xutbeya Şamê", xutbeyek e ku Seîdê Kurdî, di sî û pênc saliya xwe de, di sala 1911an de li Şamê li ser daxwaza alimên Şamê, li Mizgefta Emewiyan îrad kiriye. Ji ber ku xwedî girîngiyeke gelek mezin e, wê hingê li Şamê, di nav hefteyekê de, du caran hatiye çapkirin.[197] **(bnr. Pêvek- 7)**

### 1.2.4.Munazerat/ Reçetet-ul Avam veya Reçetet-ul Ekrad (1911-1911)

Pirtûka Munazeratê ji aliyê Bedîuzeman Seîdê Kurdî ve wiha te binavkirin:

Munazerat;
Reçeteya Parzemîneke bi'ezemet û bextreş
Dewleteke bi nav û deng a bêsiûd

---

196 Kurdî, *Dîwana Herba Urfî*, *Dersên Civakî*, 148.
197 Seîdê Nursî , "Xutbeya Şamê*"*, *Dersên Civakî*, 37-38.

Qewmekî hejâ û bêxwedî.

Yan jî Munazerata Bedîuzeman Seîdê Kurdî [198]

Ev Berhem, dema ku Bedîuzeman Seîdê Kurdî piştî Meşrûtiyeta duyemîn (24 Tîrmeh 1908) li Kurdistanê, li bajarê Wanê bigre hetanî devera Hekkariyê bi qasî sê salan di nav eşîra Ertoşiyan, bi taybetî nav milê Gewdan û Mamxuran de ji bilî van deran, li Bedlîs, Mûş, Diyarbekir û Riha/Ûrfayê ziyaret dike ku di derbarê meşrûtiyetê dersan dide û wan dersan teşmîl dike. Lê belê pirtûka Munazeratê bi qasî çil û yek salî wenda dibe, piştî çil û yek salî şûn de dikeve destê Bedîuzeman Seîdê Kurdî (1952) û ew wiha dibêje, "camêrekî ji min re şandiye."[199]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî di vê pirtûkê de bi eşîrên kurdan re bi metodeke diyalogî, bi pirs û bersiv (155 pirs û bersiv) mesele mûnaqeşe kiriye. Mijarên Munazeratê bi taybetî di derbarê meşrûtiyet, îstibdat, azadî û Medresetuzehrayê de ne.

Ev pirtûk, di sala 1910an de li, çapxaneya Ebûziya de tê çap kirin. Bi taybetî mûxatabê Munazeratê kurd in. Ji bo vê berhemê ewil navê "Reçetet -ul Awam û Reçetet- ul Ekrad" yanê "Reçeteya Kurdan" tê binavkirin. Munazerat xebateke qada Kurdistanî ye, jiyana Gelê Kurd rûbirû rojbiroj ji aliyê Bedîuzeman Seîdê Kurdî ve bi hûrgilî bi pergal hatiye tesbîtkirin, çareseriya gelê xwe wek reçeteyekê nivîsiye.

"Pirs û bersivên di Munazeratê de di navbera Mele Seîdê Kurdî û eşîrên kurdan de çêbûye û ev jî bi zimanê kurdî ye. Mele Seîdê Kurdî, bi kurdî diaxive û bi kûrdî difikire. Ji ber vê gelo, ev berhem ewil bi kurdî hatiye nivîsîn an ne, ne diyar e. Her çiqas tête gotin ku ev berhem bi kurdî hatiye nivîsîn, lê belê di destê me de agahdariyek nîne. Mijarên vê pirtûkê kurd in. Yekemîn bi navê "Reçetetu'l Avam û Reçetet-ul Ekrad" ya tê zanîn cara yekem bi erebî nivîsiye û paşê jî ev berhem wergerandiye zimanê osmanî."[200]

Belê mirov bi misoger dibêje Bedîuzeman Seîdê Kurdî axaftina xwe di nav eşîran de bi kurdî kiriye, bi kurdî nivisiye, lewra di pirtûka xwe ya bi navê "Nutûqê" de wiha nivîsiye: "*Watedar kirina daxwaza min, îfadeya meramê qederê tirkî hindik*

---

198 Kurdî, "Munazarat", *Dersên Civakî,* 75.

199 Said Nursi, *Emirdağ Lahikası*, 110.

200 Yunus İpek,"*Munazarat'ın Kimligi*", http://www.zehra.com.tr/munazaratin-kimligi_h111272.html pêwendî: 24.04.2015.

*daye min, xet qet nedaye. Ka zimanê min, baş ji zimanê dilê min fêm nake ku jê re wergêriyeke baş bike. Jixwe, ji ciyê kûr wateyê derdixe, lewra hin heqîqet perçe dibin. Îca fam û baldariya we bila bi min re alîkarî bike.*"[201]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî; "Reçeteyên kurdan û seyqala Îslamiyetê (Mûhakemat)" bila bedelî min biaxivin. Ev her du cins fêkiyên serê çiyan car caran bayê lê dida, fêkiyê ku ketibûn binê gelî, mîna dermanan dan hev û birin çarşiya şaristaniyê. Hetta qismek, ji fêkiyên "Çiyayê Başîdê" ne[202] û qismek jî jê fêkiyên "Deşta Feraşînê" ne,[203] hinek jî jê semereya wê ya ku li "Geliyê Bêyşebabê" gihîştî ne. Ha, wextê ku min, ev herdu berhem dinivîsandin, ji ber ku dem kurt, mekan kuvî, ez gervan bûm; hiş tevlihev, wûcûd nîvnexweşî û nivîsandin bilez bû, helbet dê lihevketî be. [204]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji bo fêmkirina munazeratê wiha dibêje: "Gelî ehlê însafê, mazereta min ev e. Heke hûn qebûl bikin, ev nîşana însafê ye; heke hûn qebûl nekin, bawer bikin ez nakevim binê mineta we. Qet jî qebûl nekin. Mineta we, bila li serê çiya be. Ne ji bo ku bi we bidim ecibandin/pesend kirin; belkî min ji bo xizmeta heqqiyê/rastiyê nivîsand. Ji bo ku mirov, bikaribe li newayên vê berhemê guhdarî bike, divê mirov cesedê kurdekî li xwe bike; xeyalê kuvîtiyekê bide serê xwe. Nexwe ne xwestina guhdarîkirinê helal e; ne jî bihîstina ezmanê şirîn dibe."[205]

Bedîuzeman, bi taybetî xwendevanên Munazeratê şîret dike ku bi çi hişî bixwînin û bi çi çavî bixwînin. Her çiqas ev pirtûka Munazeratê di nav eşîrên devera Wan û Colemêrge de hatibe holê jî naveroka wî hemû gelê kurd û Kurdistan e. Mele Seîd mirovekî alim, zanyar û rewşenbîrekî kurd bûye. Wî helbet ji bo nexweşî û dermanên gelê wî bê teşxîs kirin mucadele kririye ku ev pirtûk jî reçeta nexweşiyên gelê wî ye. Seîdê Kurdî di derbarê pirtûka xwe de wiha dibêje: "*Hem jî ev pirtûk(Munazerat), bila bibe wekîlê min û bi Kurdan û yên mîna wan ên ku min ew*

[201] Kurdî, "Nutuq", *Dersên Civakî*, 14.
[202] Çiyayekî Wanê ye kû nêzî Payîzava/Gurpinarê ye, bilindahiya wî 3684 metre ye.
[203] Herêmeke li Colemêrgê ye.
[204] Kurdî, "Nutuq", *Dersên Civakî*, 14.
[205] Kurdî, "Munazarat", *Dersên Civakî,* 79.

*nedîtine re bipeyive û bersîva wan bide.” Dîsa dibêje “him jî, ji nojdarên/dixtrorên sîyasetê re, ji bo ku nexweşiye teşxîs bikin, wezîfedar e.*[206]

Ev pirtûk bi taybetî ji bo gelê kurd û gelên bindest hemûyan reçeteyek e. Ji aliyekî din ve jî ji bo sîyasetmedarên kurd nexşerêyeke girîng e. *“Munazerat bi serê xwe manîfesto ye. Ev manîfesto bi taybetî ji bo çareseriya pirsgirêkên Kurdistanê, bi gelemperî jî, ji bo aşitî û biratiya gelên rojhilata navîn çirûsk û formula rêgeheke qaîm e. Pirsgirikên kurd û yên gelên Rojhilata Navîn weke hev in. Pirsgirêkên sereke; rejîmên zorbe, binpêkirina azadiyê, îtaateke bê dawî, cehalet, cudatiya dîn û dinyayê, bi xelet danasîna bawerî û zanistiyê ye. Seîdê Kurdî çareseriya hemû derd û kulan, di pirtûka Munazeratê de aniye ziman*.”[207]

Di Munazeratê de mijara herî girîng ew e ku li ser bernameya/projeya Medresetuzehrayê sekiniye û di derbarê wê de wiha gotiye:

“ *Bi hebûna xwe jîndar nebûye, lê belê Medresetuzehra, bi giyanekî bê dawî û lijneyeke berfireh de jîndar e. Wê (Medresetuzehrayê) bi cismanî jî ava bikin*.”[208] Belê pirtûka Munazeratê bi taybetî ji bo kurd û Kurdistanê teşxîs tedawî, rê, rêbaz û çareseriyeke herî girîng e. “Mîna elmasê ye û fikra milliyetê ku bi kurdîtiyê re kelijiye, ders da ku wan her du reçeteyên ku gelek tebîet û hestên cure bi cure û muxtelîf digre nava xwe, ev berhem wiha derxist holê. Tê wê wateyê ku heryek berhemeke min, puxteya çend qernekî û mînaka tebîetên taîfeyên kurd e.”[209]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî pirsgirêkên Gelê Kurd wek reçeteyekê di vê pirtûkê de aniye ziman. “Mîlliyetperweriya erênî/musbet” a alimekî misilman ê kurd helbet yê bi derdên birayên xwe yê kurd re têkildar bibe. Ji bo çareseriyê çem û kanî, deşt û zozan çol û çiya, havîn û zivistan negotî meşiyaye em dibînin, ne wek nijatperestekî.”[210] Ev berhem ji aliyê pedegojiyê ve jî gelekî balkêş e. Bilîcî derbarê Munazeratê de wiha dibêje: “*Ev pirtûk, pedogojiyeke neteweperweriyê ye, lê muxatabê vê reçeteyê hê amade nebûye, ji bo wê bi zimanekî gelê wî hezim bike û bi dewlemendiya xwe xwendevanên xwe dixe nava metaforeke mezin û wisa dipeyive,*

---

[206] Seîdê Kurdî, “Munazarat”, *Dersên Civakî*, 80.
[207] İpek, *h.g.*, http://www.zehra.com.tr/munazaratin-kimligi_h111272.html
[208] Said Nursi, “Kastamonu Lahikası”, Tenvir Neşriyat, İstanbul, 1991, 75-76.
[209] Kurdî, “Munazarat”, *Dersên Civakî*, 78.
[210] İbrahim Özdemir, “Munazarat Nasıl Bir Eserdir”, *Münazarat Konferansı,* Merak Yayınları, Ankara 2013, 57.

*wekî din "Rîsaleyeke azadî û demokrasiyê ye."*[211] Rûpela Munazeratê ya di dawiyê de xuya dike ku, "Seî'dê el-Kurdî en-Nûrsî" hatiye nivîsandin. Ew dibêje, min ev berhema "Munazerat"ê çil sal berê nivîsiye, hinek qusûr û xeletî hene, lê belê ji bo entîqetiya wê û ji bo xatirê Medresetuzehrayê, hin rastiyên wê ji aliyê birayên min û şagirtên Seîdê Nû ve bê dîtin." [212] **(bnr. Pêvek-8)**

Pirtûka Munazeratê

1. Xeyalê Gelê Kurd û yên Seîdê Kurdî di hundirê xwe de jiyandar dike.

2. Bingeha şert û mercên projeya bernameya Medresetuzehrayê ye.

3. Perdeya îstîbdadê dirandiye.

4. Di nava gelên misliman de, erdnîgariya Kurdistanê de ji bo Netewa Kurd reçeteyeke zanistî, sîyasî, aborî, perweredhî û civakî ye.

5. Xîmê yekitî û tifaqa Gelê Kurd e.

6. Ronahiya pêşeroja Gelê Kurd e.

7. Ji aliyê Bedîuzeman Seîdê Kurdî ve hatiye pêşniyaz kirin.

8. Karekterên Gelê Kurd di xwe de dihewîne.

9. Bingeha fikr û ramanên muşrûtiyetê/parlemeniyê yên azad e.

### 1.2.5.Muhakemat (1911-1911)

Bedîuzeman Seîdê Kurdî pirtûka Muhekematê di sala 1911an de nivîsiye. Ew Muhekematê wek destpêka Îşaratul Îcazê dibîne. Ev berhem ji sê navan pêk tê:

**1-** Muhekemat

**2-** Sayakal-ul Îslamiyet.

**3-** Reçetet'ul Ûlema an jî Reçetet'ul Xewas(di navbera salên 1911-1912an de bi erebî tê çapkirin)

Bedîuzeman, Muhekematê ji bo alimên hemdemê xwe nivîsiye ku ji xwe re weke mînak bigrin. Lewra ev berhem, bi metodeke nû hatiye nivîsandin. Ew fikr û

---

[211] Mucahit Bilici, "Münazaratta Kürtlerin Özneleşmesi: Hayvaniyet, İnsaniyet, Meşrutiyet", *Munazarat Sempozyumu I,* Merak Yayınları, Ankara 2012, 11.
[212] Said Nursi, *Emirdağ Lahikası*, 111.

ramanên rojane yên ku ketine nava misilmanan, Bedîuzeman di parzûna Qur'an û sinetê re derbas dike, bi metodeke nûjen pêşkêşî alim û xewasan dike.

Mijarên Pirtûkê: Bi temamî zanistî, ilmî û irfanî ne û bi wî çavî hatiye nivîsandin. Bersîva dijberên Îslamî, di vê pirtûkê de bi zimanekî letîf û nazenîn hatiye dayin. **(bnr. Pêvek-9)**

### 1.2.6. Nutuk (Nutûq) (1908-1909/1912)

Ev pirtûk ji hin gotinên Bedîuzeman Seîdê Kurdî pêk tên û wî, di destpêka Meşrutiyeta duyem de, di derheqê azadî, maf, wekhevî û zordestiyê de, nêrînên xwe anîne ziman. Ji wan gotinan qismek jî, bi awayê nutq û xîtabetê derpêş kiriyê. Ev berhem li ser "Dewleta Osmanî û çapameniya Osmaniyan sekiniye."[213]**(bnr.Pêvek-10)**

### 1.2.7.Îşaretul Îcaz (1914-1916-1918)

Bedîuzeman Seîdê Kurdî Îşaretul Îcazê di Şerê Dinyayê yê I. de di salên pêşîn, di cepheyê de nivîsiye. Mijara pirtûkê mûcîzeyên Qur'anê ye û li ser vê wateyê sekiniye. Ew vê pirtûka xwe wek şaheserekê dibîne. Di vê pirtukê de sûreya Fatiheyê û 33 ayetên sureya Beqereyê tefsîr kiriye. Bedîuzeman dixwest tefsîrê berdewam bike lê belê rewşa dinyayê derfet nedayê. Vê tefsîrê wek dendika Rîsaleyên Nûr ciyê xwe girtiye. Ji bo şert û mercên dinyayê navber daye tefsîrê û xebata xwe li ser mijara îmanê guherandiye.**(bnr.Pêvek-11)**

### 1.2.8.Tarihçe-i Hayat (Dîroka Jiyana Wî) (1918-1919)

Ev berhem navbera 1877-1960an, jidayikbûn û wefat Bedîuzeman digre nav xwe. Çavkaniyeke herî kevn û herî baş e di derheqê jînenîgariya Bedîuzzeman Seîdê Kurdî de. Ev berhem yekem car ji aliyê Ebdurehmanê biraziyê wî ve hatiye nivîsîn. Ev qismê han, di dawiya rîsaleya Leme'atê de wek pêvek cî girtiye û di sala 1921an de hatiye çapkirin.

Cara duyem: ji aliyê Müküslü Hamza Efendi/Hemzeyê Muksî ve hatiye nivîsîn, wek pêveka Îşarat–ul Î'cazê hatiye çapkirin(1919). Hemze jî xwendevanekî muhîm ê Bedîuzzeman Seîdê Kurdî ye. Jiyana Bedîuzeman a heta 1919an bi navê

---
[213] http://www.risaletashih.com/index.php/musahhah-metinler/192-bediuzzaman-in-tercume-i-hali-mukuslu-hamza,

Bedîüzzaman Said-i Kurdî' nin Tercüme-i Halinden Bir Hülasadır/Kurteya rewşa jiyana Bedîuzeman Seîdê Kurdî ye. Cara sêyem sala 1944an şûnde bi rêbaziya Bedîuzeman ji aliyê şagirtên wî ve tête nivîsandin û wek sê cîldan; şagirtê wî Abdulkadir Badıllı, "Bediuzzamanın Mufassal Tarihçe-i Hayatı "nivîsiye.[214] **(bnr.Pêvek-12)**

### 1.2.9.Nuqte (1919-1919)

Di nav delîlên bê jimar ên tewhîdê de, li ser çar delîlên sereke yên wek Hz. Muhemmed, kaînat, Qur'an û wijdanê disekine. Îşaret û nîşandana wan a tewhîdê, yanê hebûn û yekbûna Xweda, şîrove dike. Herwiha, di dawiya vê rîsaleyê de, delîlên hêzdar û qewî yên derheqê milyaket û axiretê de jî cih girtine.**(bnr. Pêvek-13)**

### 1.2.10. Hakikat Çekirdekleri l.ll. (Dendikên Heqîqetê l.ll.) (1920-1921)

Dendikên rastiyan, ji hêla Ebdurehmanê biraziyê Bedîuzzeman Seîdê Kurdî ve hatiye berhev kirin. Hin gotinên wecîz û kurtane ne ku ji risaleyên wî cuda cuda hatine komkirin.

### 1.2.11.Sunûhat (1920-1920)

Mijarên sereke yên vê risaleyê ev in: Aqûbeta gunehan, fikra netewiyê/mîlliyetê ya neyênî/menfî, ya erênî/musbet, riziq, şehadet, edaleta mahza û edaleta îzafî, nêrîn û nêzîkatiya misilmanan a li Qur'anê, seltenet û xîlafet, medeniyeta Îslamê, siyaset û hecc.

### 1.2.12.Lemaat (1921-1921)

Mijarên vê risaleyê ev in: Xulasayên Rîsaleyên Nûrê tê de hene.

### 1.2.13.Şûaat (1921-1921)

Li ser delîlên pêxembertiya Hz. Muhemmed(s) hatiye nivîsîn û delîltiya wî ya ji hebûn û yekbûna Xwedê re, bi kitkiteyî hatine bilêvkirin.

---

[214] Badıllı ,"Mufassal Tarihçe-i Hayatı"; Yunus İpek, "www.zehra.com.tr/tarihçe-i hayat-in-kimligi_h111469.html.

### 1.2.14.Rumûz (1921-1921)

Mijarên mucîzewarî yên Qur'anê, sedemên serkeftina kafiran a li hemberî misilmanan û îttihada Îslamê, bi awayekî kurt û kûr, hatine şîrovekirin.

### 1.2.15.Tulûat (1921-1921)

Mijarên wekeî sedemên îxtilafên di navbera alimên Îslamê û çareserkirina îxtîlafan tê de hene. Nêrîna Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya li ser siyaseta Îngîliz û fetwaya wî ya li dijî Quwayê Mîlliye, rewşa Dar'ul Hîkmet'ul Îslamiyê, nirxandina/cerh û ta'dîla Hedîsan, yemessula Ezraîl, tê de cî girtine.

### 1.2.16.Îşarat (1921-1921)

Weke rîsaleyekê hatiye nivîsîn û tefsîra ayeta di derheqê sedeqe û înfaqê/alîkariyê de ye. Mijarên wekî cudahiya wehdet'ul wucûdê û panteîzmê, rewşa nefisperestan û lezetperestan, behsa zewacê di nav xwe de dihewîne û tê de hinek wecîze hene.

### 1.2.17. Mesneviyi Nuriye (Mesnewiya Nûriye) ( 1922-1923)

Ev pirtûk, ji dermanxane û daristana Rîsaleyên Nûrê, bi nêrîna Bedîuzeman Seîdê Kurdî, nexweşiyên misilmanan re şifa û merhem e.

Mijarên pirtûkê:

•Delîlên tewhîd û nubuwetê
•Ketûmiya şaristaniya Ewropayê
•Cudatiya şagirtên Qur'anê û yên felsefeyê
•Şaristaniya Îslamê an ya Rojavayê?
•Em ê çawa ji wesweseyên Şeytan xilas bibin.
•Meseleyên terîqetê û yên heqîqetê
•Himêzkirina Kelîmeya Tewhîdê
•Mahiyetên du'ayan û cureyên wê
• Di bin ronahiya Qur'anê de sofîtî, kelamgirî û felsefevanî
•Meseleya wehdet'ul wucûdê
•Çar bingehên ku mirovan digîhînin Xwedê
•Hikmetên dubare yên di Qur'anê de

•Yên siruştê/tebî’etê xwe re dikin put
•Xitabeya di Meclîsa yekem de hatiye belav kirin(1923)

### 1.2.18.Sözler (Peyv) (1926-1930)

Ev pirtûka Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji Kulliyata Rîsaleyê Nûr re bingeh e. Kulliyat li ser vê pirtûkê hatiye avakirin. Pirtûkên din, di rîsaleyê de wek çiqên darê ne. Bedîuzeman zêde girîngî daye pirtûka Sozlerê. Bi gotina wî, “ji bo nexweşiyên vê esrê dermanxane ye, şifaya dilan e, li hemberî tarîtiyê ronahî ye, ji yên rêya xwe şaşkirine re rêbaz e, mifteya Qur’anê ye, ji bo înkarkeran şûrekî wek elmasê ye.”

Hin mijarên vê berhemê:

- Wateya besmeleyê
- Hikmetên kirina nimêjê rojê bi pênc deman
- Piştî mirinê, jiyaneke nû û delîlên wê
- Danberhevkirina Qur’an û felsefeyê, wesweseyên şeytan û dermanê nexweşiya wesweseyan.
- Bi çil aliyan ve mucîzebûna Qur’anê û isbata wê.
- Bi zimanekî hêsayî şîroveya qederê
- Îxtilafa navbera mezheban, mijara îçtihadê.
- Giyan/ruh çi ye? ebediyeta giyan, qiyamet, mijarên buhiştê
- Di afirandina mirovan de rastiya “ez”ê nêrîna dîn û ya felsefeyê derbarê “ez” ê de.
- Hereketên atoman û penhanê wê
- Delîlên wehdeniyetê di alema hebûnê de

### 1.2.19.Mektubat(Name) (1929-1934)

Di vê pirtukê de Bedîuzeman Seîdê Kurdî mijarên ku li ser gengeşî çêbûne bi zimanekî hêsan bersivên hêsan dide. Ev behrem ji gelek pirsên şagirtên Rîsaleyê Nûr pêk tê.

Mijarên vê pirtûkê :

* Dojeh li ku derê ye?
* Hz. Adem çima ji buhiştê hatiye derxistin
* Welayet û Keramet çi ne?
* Fikr û ramanên Bedîuzeman Seîdê Kurdî yê di derbarê siyasetê de
* Bûyerên Cemel, Siffîn û Kerbelayê
* Tekoşîna Xilafetê û Seltanetê kengê dest pê kir?
* Mûcizeyên Hz. Muhemmed(s).
* Pirsgirêka netewîperestiyê û nijatperestiyê
* Mijara Wehabîtiyê
* Hikmetên rojiyên Remezanê
* Şîroveya rastiya xewnan
* Di Dînê Îslamê da gengeşiyên ji ser reformekirinê.
* Mijara terîqetan

#### 1.2.20. Barla Lahikası (Lahîkayên Barlayê) (1926-1935)

Dema li Wanê nefiyê Burdurê dibe li wê derê, vê pirtûkê di navbera salên 1925 û 1935an de, li Barla û Ispartayê di nefî û binçaviyê de wekî nameyan dinivîse. Van Lahîkayan di navbera Bedîuzeman û şagirtên wî de wek pirekî wezîfe dîtiye. Taybetiyên lahîkayan ew e ku wek pirs û bersivan di navbera Bedîuzeman Seîdê Kurdî û şagirtên wî de wekî muzakereyan hatiye nivîsin. Bedîuzeman van nameyan wekî meclîsên nûranî dibîne.

#### 1.2.21.Lemalar (Çirûsk) (1932-1936)

Di vê behremê de Bedîuzeman Seîdê Kurdî li ser menewiyata misilmanan sekiniye. Qur'an û sineta Pêxember wek rêber ji xwe re mînak hildaye û fikr û ramanên hemdem di Rîsaleyên Nûr de aniye holê. Nexweşiyên misilmanan yên dilan ji bo bê tedawî kirin hewl daye. Misyoneke tecdîdî di vir de nîşan daye.

Mijarên vê pirtûkê: Qiseyên Hz. Yûnus û Eyûb Pêxember, ebediyeta mirovan, pirsgirêka nevbera Sunnî û Şi'îyan, sureya Fethê, Evdilqadirê Gêlanî, meseleya wehdet'ul wucudê, sunnetê seniye, riziqên zindiyan, şeytan, avabûna dinyayê, Zulqarneyên, Yecûc Mecûc, siyaset, şagirtên Qur'anê û felsefe, îktîsat,

qina’et, îxlas, cumhûriyet, afirineriya hebûnan, tesettur, musîbetên tên serê bawermendan, parastina dadgehan, hesin û heşt cure ajal/heywan, navên ‘ezem û cewşen’ul kebir.

### 1.2.22.Şualar (Tîroj) (1936-1949)

Ev berhem, dema ku Bedîuzeman Seîdê Kurdî di girtîgehên Eskişehir, Denizli û Afyonê de bûye, nîvisiye. Behsa heqîqetên îmanê dike û nameyên wî yên ji xwendevanên xwe re şandiye û parastinên wî yên li hemberî dadgehê dihewîne.

Mijarên vê pirtûkê:

* Delîlên wehdeniyeta Xwedê, bêîmkaniya şirîktayiya ji Xwedê re
* Berfirehî tefsîra ayeta “Xwedê besî me ye û Ew çi wekîlekî delal e”
* Di nimêjê de xwendina Tehiyatê û wateya wê
* Delîlên heşrê û bandora wê ya li ser kesan û civakê
* Ji bo civanan, girtiyan û şagirtên Rîsaleyên Nûrê, nameyên wî yên di derbarê şîretên îmanê û ta’etê de.
*Parastinên Bedîuzeman Seîdê Kurdî û yên şagirtên wî, yên ku di sala 1943yê de li Denizli û yên di sala 1948an de li Afyonê ku li hemberî dadgehê xwe parastiye.
* Elametên Qiyametê yên di axiriya zeman de çêdibin û şîroveyên hedîsên di vê mijarê de.
* Tefsîra sûreya Fatiheyê û menqibeyên di heqê merîfetullahê de.
* Celcelûtiya Hz. Elî, di Qur’anê de işaretên ji bo Rîsaleyan.
* Peyva “Elehmdulîlahê” çawa feydeyan dide îmanê.

### 1.2.23.Kastamonu Lahikası (Lahîkayên Kastamonuyê) (1936-1943)

Ev Lahîka, di navbera salên 1936 û 1943an de, dema Bedîuzeman li Kastamonuyê di nefiyê de bûye nivîsiye. Li wê derê tê binçavkirin û ew jî van nameyan dinivîse. Ev nivîsên wî rastî herba dinyayê ya duyem tê.

Mijarên lahîkayan: Fitneyên axirzemanê, îcaza Qur’anê, nameyên Bedîuzeman Seîdê Kurdî û şagirtên wî.

### 1.2.24.Asayı Musa(Gopalê Mûsa) (1926-1944)

Ev pirtûk, li girtîgeha Denizliyê wekî fêkiya zîndanê Rîsaleya Meyweyê û Rîsaleya Hucetulah ul Balixa hatiye nivîsîn. Çawa ku Musa Pêxember gopalê xwe li hemberî Firawûn pêk aniye, Bedîuzzaman jî ev berhem li hemberî fen û felsefê nivîsîye û cewherên Qur'anê derxistêye qadê. Vê pirtûkê asoya mirovan di derbarê dîn de berfireh kiriye û rêya misilmanan bi tîrêjên Qur'anê ronî kiriye.

Ev berhem, di zîndana Denizliyê de wek parstinekê wezîfedar bûye û bi meseleyên îmanê, tewhîd û yekitiya Xwedê isbat dike.

Mijarên Asayê Musa ev in: Girîngiya nimêjê, mirin û jiyana qebrê, sermayeya jiyanê, nimetên ciwaniyê, yekîtiya Xwedê, teceliyên navê Xwedê, riknên îmanê, îtîrazên ji bo dubareyên Qur'anê, îman anîna bi Xwedê, Ayetul kubra, isbata yekîtiya Xwedê, rîsaleya tebî'etê, tecelliya navên Xwedê, cîlweyên Esmayê Husna, piştî mirinê jiyaneke nû, mertebeyên tewhîdê…hwd. hatiye nivîsîn.

### 1.2.25. Emirdağ Lahikası (Lahîkayên Emirdaxê) (1944-1947)

Lahîkaya Yekem: Di navbera 1944-1947an de, hinek şagirtên Rîsaleyên Nûrê û hin kesên din pirsên girîng bi nameyan li Bedîuzeman pirsîne, wî jî di van rîsaleyan de xizmeta dustûrên Rîsaleyên Nûr beyan kiriye.

Lahikaya Duyem: Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji sala 1948an heta wefata xwe, nivîsên mijarên ji hev cuda di vê de kom kiriye. Ji bo desthilatdarên di dema xwe de, pêşniyarî û hişyariyên xwe di van nameyan de aniye ziman. Dîsa nameyên ji bo şagirtên xwe nivîsîne tê de hene.

Bi qasî neh mehan, di mabeyna dadgehên Isparta, Denizli û Enqereyê de diçe tê û di dawiyê de beraat dike. Ev berhem di wê demê de tê nivîsin.

### 1.2.26.İman ve Küfür Muvazeneleri (Daneberheva Îman û Kufrê)

Bedîuzeman Seîdê Kurdî di Kuliyata Rîsaleyên Nûr de, girîngî daye hinek mijaran û car caran ev mesele di pirtûkên xwe da dubare kiriye. Ew mijarên nêzikî hev, di vê pirtûkê de berhev kiriye. Muwazeneya îman û kufrê di vê pirtûkê de hatiye kirin. Ev pirtûk, di derbarê mijarên îman û kufrê de kurteyek e.

### 1.2.27. Sikkeyi Tasdiki Gaybi (Sikeya Tesdîqê Xeybî)

Ev pirtûk, ew çavkaniyên ku Kulliyata Rîsaleyên Nûrê pala xwe dayê rave dike.  Di van mijaran de rexneyên ku hatine kirin dibersivîne. Bedîuzeman him dil him jî hiş tev dide hereket kirin ku Rîsaleyên Nûr bi van mantiqan nivîsiye. Risale li hemberî înkar û kufrê, moralê dide şagirtên Nûrê. Bedîuzeman Rîsaleyên Nûrê, wekî îşarî mazharê Qur’an dibîne. Hesabên cifr û ebcedê di vê pirtûkê de cî girtine.

### 1.2.28. Tılsımlar Mecmuası (Mecmûayên Tilsiman)

Ev berhem, derbarê dîn û îmanê de bi sedan tilsiman û keşfiyatan beyan dike. Di her perçeyeke xwe de tilsimên Qur’anê keşf dike.

# 2. BEŞA DUYEM

## 2.1. DI DERBARÊ PERWERDEYA BI ZIMANÊ ZIKMAKÎ DE FIKR Û RAMANÊN SEÎDÊ KURDÎ

Seîdê Kurdî di zaroktiya xwe de û hinekî di ciwaniya xwe de piranî zimanê xwe yê zikmakî yanî kurdî bi kar aniye û heta demekê di medresê de û di dersdan û di wezên xwe de jî zimanê xwe bi kar aniye. Ew perwerdeya bi zimanê zikmakî hem bixwe di medreseyan de dide û hem jî ji bo ku di dibistanan de perwerde bi zimanê zikmakî bê dayîn dixebite.

### 2.1.1. Li Gor Seîdê Kurdî Girîngîya Zimanê Zikmakî

Seîdê Kurdî zimanê zikmakî û perwerdeya bi wê gelekî girîng dibîne û di gelek axaftin û gotarên xwe de balê dikişîne ser giringiya ziman. Ew ji bo perwerdeya zimanê zikmakî bê kirin mucadele dike ku em ê li jêr ji van xebatên wî hin mînakan bidin.

Ji bo berdewamiya gelan; nasname, kevneşopî, hestên netewî û zimanê dayîkê pêwîst e. Lewra Bedîuzeman ji bo vê mijarê wiha dibêje: "*Ji bo berdewamiya pêşeroja/ayendeya her netewî kevneşopiyên milî û zimanê netewî hewce ye*."[215] Bi nêrîna Bedîuzeman zimanê dayikê dara fêkiyên edebiyatê ye û di perwerdehiyê de e xwîn e ku di rehên mirovan de digere û wan jiyandar dike. Qur'ana Pîroz ji bo milet û ziman wiha dibêje: "*Me hûn kirine qewm û qebîle da ku hûn (maf û hiqûqê)hev nas bikin...*"[216] cudatiya gelan, zimanan ji ayetên Xwedê tê. Di ayeteke din de, "*Ji nîşanên (qudreta ) Xwedê ye ku erd û asîman afirandine, zimanên we û rengên we ji hev cuda çêkirine…."*[217] Di ayeteke din de jî Xwedê teala wiha ferman dike: "*Xwedê bixwesta dê tev yek umet çêbikira*."[218] Li aliyekî din îro di dinyayê de mafê ziman wekî mafekî serekî tê qebûlkirin: "*Yekîtiya Gelan û Peymana Mafên Zarokan /UNICEF" ku di xalên 2,17,29,30* de derbas dibe ku; *"Mafê herkesi ye ku di dibistan*

---

[215] Kurdî, "Dîwana Herba Orfî", Dersên Civakî, 179.
[216] Sûreyê Hûcurat, 49/13
[217] Sûreyê Rûm, 30/22
[218] Sûreyê Maîde, 5/48

*û saziyan de bi zimanê dayikê perwerdehiyê bibîne.*"[219] Îro her çiqas zimanê kurdî serbest xuya bike jî di Makezagona Tirkiye yê de bingeha wê tuneye.

Îro mirov mêze dike Gelê Kurd di nava çar dewletên misilmanan de dijîn, lê kurd ji aliyên van dewletên ku gelên wan misilmanin de têne bişavtin. Ji bo înkarkirina nasname û zimanê kurdî, îtirazeke van gelan çênebûye. Di Qur'ana Pîroz de Xwedê Teala wiha dibêje: *"Me her Pêxemberek bes bi zimanê gelê wî şand da ku, ji wan re (bi zimanê wan fermanê Xwedê) bide nasîn*"[220] Ev ayetên jorê jî nişan didin ku ziman û netewên mirovan mafên îslamî û însanî ne.

"*Mora qederê ya di însan de, ziman e. Reng û rûyê însaniyetiyê jî, di rûpelê ziman de, neqş û xemla beyana xwe dide der. Zimanê zikmakî jî, ji ber ku sirûştî û fitrî ye, peyv û axaftin, bi xwe berê xwe bê gazî û vexwendin, têne hiş û bîra mirov. Wihareng ji ber ku danûstandin, tenê bi maneyê re ye, lewma hiş nakeve dudiliyê û şaş nabe ew ilm û agahiyên tên dikevin wî zimanî, mîna "nexşên li ser kevir" daîmî dimînin û her çi tişt ku bi wî zimanê netewî bixuyê, ji mirov re nas û şirîn tê.* [221]

Gelên misilman yên din çawa li nasname, nijad û zimanê xwe xwedî derdikevin, pêwîst e wisa jî ji birayên xwe yên kurd jî xwedî derkevin, înkariya heq û wekheviya wan nekin. Wê demê ew ê bi heqane bi hev re bijîn. Qedexekirina zimanê Kurdî di pêşiyê Komara nû de dest pê kir. Di derbarê vê mijarê de Ahmet Demir wiha dibêje: "*Di makezagona sala 1876an de û piştî Meşrutiyeta duyem de bilî zimanê tirkî zimanên din jî hatibûn qedexekirin*."[222]

Bedîuzeman dixwaze girîngiya gelê kurd û zimanên wan bi rêvebiran bide zanîn. Ew wiha dibêje: "*Gelê Kurdistanê, di nav miletên osmanî de, xwedî ciyekî girîng e. Hal û rewşa Gelê Kurdistanê, digel ku ji aliyê Hikumetê ve tê zanîn jî, ez dixwazim ku hin daxwazên wan ên li ser xizmeta muqaddes a ilmî, berpêş bikim*."[223] Bedîuzeman Seîdê Kurdî di vê daxwaznameya xwe de rewşa Gelê Kurd şîrove dike û hişyariyan dide rêvebirên dewletê. Girîngiya Gelê Kurd di nava Dewleta Osmanî de di aliyên rêvebiran de baş nayê zanîn. Dixwaze di vê mijarê de wan şiyar bike. Ji bo

[219] www.unicef.org/turkey/udhr/_gi17.html,12.02.216.
[220] Sûreyê Îbrahîm, 14/4
[221] Kurdî, "Dîwana Herba Urfî", *Dersên Civakî,* , 178,179.
[222] Ahmet Demir, "Bediüzzaman Said Nursi nin Eğitim Modelinde Kürt Dilinin Yeri ve Önemi", *Münazarat Sempzyomu I,* Merak Yayınları, Ankara, 2013, 110.
[223] Kurdî, QezeteyaŞerq û Kurdistanê, hejmar: 1,19 Teşrîn-î Sanî 1324, nql, ji *Dersên civakî*, Zehra Yayınları, İstanbul 2013, 363.

dibistanên ku li herêma Kurdistanê hatine vekirin spasiya xwe dike lê di van dibistanan de kêmasiya zimanê kurdî heye ku ew di derbarê vê rewşê de wiha dibêje: "*…Em ji we re spas dikin. Lê belê ji van dibistanan tenê ew zarokên ku bi zimanê tirkî dizanin, feyde dibînin. Zarokên kurdan ku bi zimanê tirkî nizanin, tenê wan medreseyên ku ciyê ilmî ne, weke ciyê kemilînan dibînin.*"[224] Lewra di Kurdistanê de hin dibistanên herêmî vebûne lê dîsa jî zarokên kurdan jê mehrûm dimînin. Bedîuzeman Seîdê Kurdî dixwaze di van dibistanan de perwerdehî bi zimanê kurdî be. Netewên berê di aliyên şaristaniyê de ji netewa kurd hindiktir bûn îro ji ber bê perwerdehiya gelê kurd, cînarên wan pêşdetir çûne. Lewra di qabiliyetên Netewa Kurd de pêşbazîtî heye. Ger di nava; "*yek jê, derdora devera Beytuşebabê, ku ev der navenda eşîrên Ertûşiyan e, ya din, di navbera Motkan, Balikan û Sasonê de; yek jî jê, li Wanê ku ev der jî, di navbera Sîpkan û Heyderan de ye, bê avakirin.*"[225] Ew jî dê wek gelên din him di warê ziman de him jî di qada şaristaniyê de cihê xwe bigrin. Lewra herêmên Bedîuzeman ku dibêje di Kurdistanê de cihên stratejîk in.

Zimanê kurdî wek zimanê erebî û tirkî nebûye zimanê fermî yê dewletê. Ji aliyê dewletê ve nedihate teşwîk kirin, bileqs hatiye qedexe kirin. Bedîuzeman ev xetereya li ser zimanê Kurdî didît û dixwest planên li ser tunekirina zimanê kurdî derxîne holê. "*Hûn dixawzin ku Neteweya Kurd ya ku bi milyonan kesên/ferdên wê hene, ev hezaran sal in neteweya xwe û zimanê xwe ji bîr nekirine û hemwelatiyên tirkan yên rastîn e û ji berê de hevalên wan yên cîhadê ne; zimanê wan rakin û bi wan bidin jibîrkirin. Paşê ev pêşniyariya we ya ku ew ji neteweyeke din tên hesibandin re hatiye kirin yan rêzikeke hovane ye yan jî sirf kêfî ye, mirov li gorî kêfa şexsan naçe û em jî naçin.*"[226]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî di derbarê zimanê dayikê de hin gotinên balkêş dibêje û zimanê dayikê diwekîne dara bihuştê ya Tûbayê. Lê belê hişyarî dide netew û rewşenbîrên kurdan. Zimanê kurdî hin şaxên wê ber bi tunebûnê ve diçin, pêwîst e cardin bê avdan û ji nûve were hêşîn kirin û di nava zimanên dinyayê û di qada şaristaniyê de cihê xwe bigre. Bedîuzeman, teceliya qederê, di zimên de dibîne. Xemsariya kurdan zimanên wan parave hîştiye. Di derbarê giringiya zimên de Bedîuzeman Seîdê Kurdî wiha dibêje:

---

224 Kurdî, *h.b.*, 363.
225 Kurdî, *h.b.*, 363.
226 Seîdê Nursî, Mektubat, Wesanxaneya Zehrayê, Stenbol, 2013, 559.

*“Hem jî zimanê we yê ku neynika çirûskên hîs û hestên mîlî ne û dara fêkiyên edebiyatê/wêjeyî ye û cihikên ava heyata perwerdehiyê ye û mêzîn û mîhenga pîvana qîmet û kemilîna we ye û ber bi aliyê wijdana her kesî ve bi awayekî rasterast rê û menfez vedike û wihareng mîna baqê tîrêjê bi bandor e ku jê re “zimanê zikmakî” tê gotin, (ku jiber îhmala we, gelek tevlihev maye û hin şaxên wê hatine tamandin) her çiqas xwediyê wê qabîliyetê ye ku bibe mezherê teceliya dareke mîna dara Tûbayê. Ji ber ku wiha hişk û perîşan bûye û ji edebiyatê ku zimanê medeniyetê ye, paşde maye, bi zarekî xemgîn, gilî û şikayeta we, li xîret û hemiyeta we dike.*”[227]

Ji bo pêşveçûna zimanê Kurdî pir kesan xîret kirine, ji wan yek jî Xelîl Xeyaliyê Motkî ye. Bedîuzeman Seîdê Kurdî di pirtûkên xwe de behsa keda vî kesî dike.

**3.1.4.1.Xelîl Xeyalî û Elfabeya wî ya Kurdî**

Bedîuzeman çima di derbarê zimanê kurdî de Xeyalî wek mînak dide û pêşniyar dike? Ji bilî wî kesên din jî hebûn. Lê Bedîuzeman û Xelîl Xeyalî di komel û saziyên kurdan de bi hev re xebat kirine. Fikr û ramanên wan nêzî hevbûn belkî ji bo van sedeman Bedîuzeman, Xelîl xeyalî wek mînakekî pêşniyarî Netewa Kurd dike.

Xelîl Xeyalî welatperwerekî Kurd bû û xebatên wî yên derbarê ziman de balkêş û hêja bûn. Yên din Bedîuzeman Seîdê Kurdî ye. Bi danasîna Malmîsanij, Xelîl Xeyalî, “Girêdayî Bedlîsê navçeya Motkan û ji eşîra Modan e. Di derbarê zimanê Kurdî de li ser gramerê xebitiye. Di sala 1900î de ferhengeke Kurdî amade kiriye. Damezrînerê Cemiyeta Kurd Tealiyê, pisporê zimanê rebî, tirkî û firansî ye. Enadamtiya Cemiyetan; Kurd Tealî, Mekteba Kurda, Hêwî. Xebatên Ziman; Ferhenga Kurdî, Elifbêya Kurmancî. Berhemên wî di kovarên Rojî kurd, Jîn û Yekbûnê de hatine weşandin. Xelîl Xeyaliyê Motkî ji bo xemsariya kurdan pêşniyarî û rexneyên xwe aniye zimên û wiha dibêje; Mela û rewşenbîrên kurdan bo çi bi kurdî nanivîsînin?

Xelîl Xeyalî di mecmûaya Kurdistanê de bi sernavê “Ziman û Nezaniya Kurdan” de kurd û gelên din wiha aniye ziman; “Ma qey ew mirov in em ne

[227] Kurdî, *“Dîwana Herba Urfî”, Dersên Civakî,* 178.

mirovin? Belê, em mirov in feqet di derheqê derdê xwe de bêxîret û bêhîmet in."[228] Mirov dibîne Xelîl Xeyalî wek hembajariyê xwe Seîdê Kurdî, ji bêtifaqî û bêxîretiya Kurdan gilîdar e. Dixwaze gelê Kurd şiyar bike. Bedîuzeman jî ji bo bêxwedîtiya zimanê kurdî balê dikîşîne ser Elîfbêya wî ya bi kurmancî:[229] **(bnr. Pêvek- 14)**

Bi danezanîna mamoste Kadrî Yıldırım: "Xelîl Xeyalî yê Motkî cem Seîdê Nûrsî ders girtiye û gelek di bin bandora wî de maye. Di dawiya sedsala 19an de li Stenbolê di sala 1909an de yekemîn alfabeya kurdî ya bi tîpên erebî bi navê Elîfbêyê Kurmancî derxistiye. Gava di sala 1910an de li taxa Çemberlîtaşê yekemîn dibistana kurdî ya bi navê "Kurd Nimûne Îptîdaisi-Meşrûtiyet" hat avakirin, di vê dibistanê de bi vê elfbayê perwerde hate kirin."[230] **(bnr. Pêvek- 15)**

Bedîuzeman Seîdê Kurdî, ji bo hînbûn û pêşdebirina zimanê Kurdî de wek mînak Xelîl Xeyalî dide ber çavan û derbarê wî de wiha dibêje;

*Va ye ez mînakeke xîret û hemiyeta netewî pêşkêşî we dikim ku ew jî Xelîl Xeyalî Efendiyê Motkiyî ye ku çawa her şaxê xîret û hemiyeta netewî de li pêş e, di warê şaxa ziman de jî, "pêşengî" bi dest xistiye. Alfabe û serf, nehwa ku bingeha zimanê me ne, çêkiriye. Heta ez dikarim bibêjim ku sed sala, hemiyetî/netewîtiyê û xîretê, fedakarî û himaya jar û belengazan, îmtîzac kirine, gihîştine hev, termên wê yê manewî çêkirine. Bi rastî jî, ji ber ku em di kana Kurdistanê de rastî cewherekî xîretê yê wiha hatine, hêvîdar im ku dê gelek cewherên wekî wî, pêşeroja/ayendeya me ronî bikin. Vaye ev camêr, nimûneyekî xîret û welatparêziyê ye, hejayî pêgirtin û lipeyçûnê ye, ji bo zimanê me yê millî/netewî yê ku hewceyê kemilîn û pêşxistinê ye, xîm û bingehek daniye. Ez li ehlê hemiyetê û xîretê tembe û salix dikim ku li dû rêça wî biçin û li ser bingeha wî ava bikin*." [231]

Zimanê dayikê çawa ji bo herkesî, her netewî heqek e wisa jî ji gelê kurd re jî heqekî fitrî ye. Pêwîst e zimanê kurdî di dibistanan de bi fermî bê xwendin û di makezagonê cihê xwe bigre. Di sala 1908an de daxwaznameya Bedîuzeman ji bo darutalîmê daye Mabeynê mebesta wê ew e ku zimanê kurdî bi destê dewletê di dibistanan de bi fermî jiyandar be. Ev projeya "darutalîm" bin sîwana Medresetuzehrayê de bi nezanî û an jî bi konetî maye. Ev projeya darutalîm pêwîst

---

[228] Malmîsanij, *h.b.*, 79, 97-115.
[229] Xelîl Xeyaliyê Motkî, *Elif Ba*, Stenbol, Hîvda îletîşim, 2007, 32.
[230] Yıldırım, *Seîdê Nursî û Ramanên Wî Yên Derbarê Ziman û Perwerdehiya Seîdê Kurdî de*, 80-81.
[231] Kurdî, "Dîwana Herba Urfî", *Dersên Civakî,* , 178,179.

e dîsa bikeve rojeva gelê kurd lewra di derbarê zimanê kurdî de dibe projeya Zehrayê girîngtir be û roj bê, jê re bibe bingeh. Ji bo pêşerojê hin xalên girîng hene: xala yekem, zimanê kurdî bibe zimanê perwerdehiyê û di makezagonê de cih bigre. Ya duyem jî ew e; pêwîst e her kurdek kurdî di jiyana rojane, ya civakî û saziyan de bi kar bine.

### 2.1.2. Hewcedariya Kurdan bi Perwerdebûna bi Zimanê Zikmakî

Bedîuzeman Seîdê Kurdî di gotara "*Kurd Mihtacî Çi ne?*" de qala aramancên xwe dike. Ji bo xilasbûna gelê Kurd û herêma Kurdistanê çi pêwîst e ser wan disekine. Ji bo nexweşî û kêmasiyan çawa tedawî bibe bi mantiqa leşkeriyê şîrove dike. Lewra Bedîuzeman Seîdê Kurdî di nava gelê Kurd de îxtilaf, nezanî û bêperwerdehiyê dibîne, dixwaze bi perwerdehiyeke dînî û nûjen ve, vê nezaniyê ji nava Kurdan rake. Çawa di leşkeriyê de disîplînek heye, ev dîsîplîn bûye sedemên pergaliyê, ancax îxtilaf û aloziyên di nava Gelê Kurd de bi pergaleke wiha çareser bibe. Çawa Bedîuzeman Seîdê Kurdî jî dibêje ya pêşeroja kurdan xilas bike "Îttihada/yekbûna netewî ye."[232] Lewra sedema îxtilaf, feqîrî û nexweşiyên din tevî nezanîn e ku tedawiya wê jî, perwerdehî ye. Dema "Alayên Hemîdî" hatin damezirandin; kirinên wan yên nebaş ji gelek aliyan ve zirar digihande Gelê Kurd. Bedîuzeman Seîdê Kurdî jî dijberîtiya xwe nîşanî vê rêxistinê dide. Lê şûnde naxwaze ev sazî bi tevayî rabe, dixwaze xeletiyên wê were islah kirin û wek leşkerên "milî/netewî"[233] di xizmeta Gelê Kurd de be. Ew disîplîn û mînakên perwerdehiyê ji bo Medresetuzehrayê wek mînak dibîne. Ji bo êrişên nezanî û leşkerî dixwaze ev alay bêne islah kirin, Gelê Kurd re wek saziyekê bi kar bîne. Bedîuzeman van îhtiyacên Gelê Kurd wek îhtiyacên xwe dizane û ji xwe re dike armanc û wiha dibêje: "*Ev serê panzdeh salan e ku min di nav îhtiyacên xwe de, ji xwe re, du hedef kiribûn armanc. Min ji xeynî van herduyan, tu navgîneke dahatûya Kurdistanê temîn bike, nedît.*"[234] Ew yekitî ku ji bo her gelî, bi taybetî ji bo kurdan, pevgirêdana pêt û saxlem û hêmana jiyanê ye, gava ku bibe qesrek/koşkek, ew alayên eşîran û ew

[232] Kurdî, Kurd Teawun We Tereqqî Gazetesî, H,2/29,Teşrînî Sanî,1324/,12 Kanûna Ewel 1908, nql Dersên Civakî, Stenbol, Zehra, 2013, 363.
[233] Kurdî, *h.b.*, 357.
[234] Kurdî, *h.b.*, 363.

leşkeriya ku ji heqê her navdariyê tê der, dê bibe bingeheke/xîmeke dirêj û dê bibe alîkarekî saxlem.

"…*Û ew hîndekarî û perwerdehiya ku wê qesra yekîtî/tifaqê hevgirtinê ronahî dike yan jî, ew zanistên ku ji bo jiyana gelan, mînak ew ê xwîna ku reh û demaran de digere û weke kana/kaniya vê gaza hewayê ye, her yek ji wan alayiyên eşîran dê bibe mîna medreseyeke zanistan û dê bibin mîna fabrîqeyeke mezin a sanayiyê ku mirov jê re hejmetkar dimîne. Seyda hikumet, heke li gor qabiliyeta alayan, derseke baş a întîzamê bide, çiqas xweş û ya xwestinê ye wesselam*."[235](**bnr**. **Pêvek -16)**

### 1.1.1. Di Kuliyata Rîsaleyê Nûrê de Hevokên Kurdî

1- "Sirrê wehdet ji ezel girtiye hetta bi ebed"(bnr.1.236) 237

2- "Xweda mirov şaş dike, kaş neke; kaş dike, fahş neke; fahş dike, pirş neke; pirş dike, perîşan neke; perîşan dike, mişeweş û sergerdan neke!" [238]

3- "Ji şerê sehaban neke qalû qîl, lewra cenetî ne qatîl û hem qetil."[239]

4- "Navê gur bîne palander lê werîne."[240]

5-" Viz viz ji we hingvîn ji min."[241]

6- "Herkes temaşegehî husna te, ji her ca teşbîhî nigaran, bi cemala te dinazin"(bnr.2.[242]) [243]

Ji bilî van hevokan gotara, "Ey gelî kurdan" heye ku me ew di pêvekan de pêşkêş kiriye.

---

[235]Kurdî, *h.b.*, 364.
[236] Ahmedê Cizîrî, Dîwan, 46.
[237] Kurdî, "Maqaleyên Bedîuzeman". Dersên Civakî, 382.
[238] Kurdî, "Xutuwati Sîtte/Şeş Pêngav", Dersên civakî, 194.
[239] Seîd Nûrsî, "Mektubat", 75.
[240] Seîd Nûrsî, "Mektubat", 465.
[241] Seîd Nûrsî, "Muhakemat", 22.
[242] El-ikdul-cevherî fî şerh dîvanil Cîzîrî,c.1., 438.
[243] Said Nursi, "Sözler", r.271.

### 1.1.2. Çalakiyên Seîdê Kurdî di Warê Zimanê Kurdî de

Em ê li vê derê, belgeyeke serlêdana Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya ji bo rojnameyeke bi kurdî û tirkî beyan bikin ku ew belge di bin arşîva osmanî ya girêdayî Serokwezîriyê de ye. Mijarên rojnamayê ev in: siyâset-i şer'iye, ilim û hewadîsê rojane ne. Rojname serî de heftane paşê jî yê bi rojane bê çapkirin. Muraceat li Wezareta Zabtiyeyê re hatiye kirin ku ev rojname dê bi navê Marifet we Îttihadi Ekrad(Perwerde û Yekitiya Kurdan) bê weşandin.[244]**(bnr. Pêvek-17)**

### 1.1.3. Di Rojnameyan de Gotarên Seîdê Kurdî Yên Ku Tên Zanîn

| R Ê Z | NAVÊ ROJNAMÊ | DÎROK Rûmî-Mîladî | DESTNÎŞAN | SERNAVÊ MAQALEYÊ |
|---|---|---|---|---|
| 1 | Rehber-i Vatan (1/4) | 24.7.1324 6.8.198 | Meşhur Kürt hocası Molla Said Bediuzaman | Ve Şâvirhum Fil – Emr |
| 2 | Tercüman- ı Efkar | Dîrok nay zanîn | | |
| 3 | Îttîhad ve Terakî Gazetesi (14/3) | 6 Îlon 1908 | Mele Seîdê Meşhûr | Nameya ji alim, şêx û reîsên kurdan re hatiye nivîsandin/ Kürt alim, şeyh ve reislerine hitaben yazılan mektup |

244 http://www.risaletashih.com/index.php/tashih-cesitlemeleri/134-bediuzzaman-in-hayatindan-tesbitler.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 4 | Misbah (2) | 19.9.1324<br>2.10.1908 | Mele Seîdê Meşhûr | Fêkiyên çiya tehl be jî derman e. Dağ meyvesi acuda olsa devadır |
| 5 | Misbah(3) | 26.09.1324<br>10.10.08 | Kurdî Bediuzeman | Berdewama gotarê/Aynı makalenin devamı |
| 6 | Misbah | 26.09.1324<br>09.10.1908 | Bedîuzeman Kurdî | Encama nutkê û Musahaba nutkê/Musahabe-nutk-ı sabıkın neticesi |
| 7 | Misbah | 18.10.1324<br>01.10.1908 | Bedîuzeman Kurdî | Axaftina îlmiyeyê<br>İlmiyye-i ifade-i meram |
| 8 | Şûray-i Ümmet*(İttihad – Terakkicileri nâşır-ı efkârı)*<br>*(46-140)* | 6.11.1324<br>19.11.1908 | Bedîuzeman Kurdî | Derbarê alayiyên Hemîdiyan de Daxuyanî<br>Hamidiye alaylarına dair beyan-ı hakikat |
| 9 | Şark ve Kürdistan di pêş de ev gotar wek daxwazname pêşniyarê mabeyne kiriye.<br>*(Bu yazı gazetede neşirden beş altı ay evvel Mabeyne dilekçe olarak verilmiştir1)* | 1911.1324<br>02. 12.1908 | Molla Seîdê Kurdî | Kurd Disan Muhtac in<br>Kürtler Yine Muhtaçtır |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 10 | Şark ve Kürdistan (4 ve 5/3) (2) | 11zilkad 1326<br>5.12.1908 | Alimê Kurd<br>Kürd Alimi | Fêkiyên çiya tehl be jî derman e. Dağ meyvesi acuda olsa devadır(*) |
| 11 | Kürd Tea'vün ve Terakkî *(Ev gotar bi Kurdî hatiye weşandin)*<br>*(1/7)* | 22.11.1324<br>12.12.1908 | Mele Seîd | Şireta Bedîuzeman Seîdê Kurdî<br>Bediüzzaman Molla  Saidi Kürdî'nin nasayihi |
| 12 | Kürd Tea'vün ve Terakkî<br>(2/13) | 29.11.1324<br>12.12.1908 | Bedîuzeman Mele Seîdê Kurdî | Ey Gelî Kurdan/Ya Ma'şer'el-Ekrad |
| 13 | Kürd Tea'vün ve Terakkî  (Ev gotar û daxwaznam eya mabeyne ji hev cuda ne.)/*(Bu makale mabeyne sunulan ve aynı adı taşıyan makaleden faklıdır)* | 29.11.1324<br>12.12.1908 | Mele Seîdê Kurdî | Kurd Muhtacî Çi ne<br>Kürtler Neye Muhtaç |
| 14 | Kürd Tea'vün ve | 6.12.1324/19. 12.1908 | Mele Seîdê Kurdî | Bîranîna Diyanet û Xîtaba Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| | Terakkî *(3/2 9-31)* | | | Mebûsana re<br>Bedîuzeman Seîdê Kurdînin Mebusana Hitabı |
| 15 | Kürd Tea'vün ve Terakkî *(4/29-31)* | 6.12.1324<br>26.12.1908 | Mele Seîdê Kurdî | Xîtaba Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya Mebûsana re û ma'badî |
| 16 | Kürd Tea'vün ve Terakkî *(5/36-38)* | 6.12.1324<br>02.01.1909 | Bedîuzemanê Kurdî | Bîranîna Seîdê Kurdî ya Timarxaneyê |
| 17 | Kürd Tea'vün ve Terakkî *(5/38-39)* | 20.12.1324<br>02.01.1909 | Bedîuzemanê Mele Seîd el Kurdî | Hemberiya min a bi Şefîk Paşa re<br>Devri İstibddata Timarhaneden sonra Tevkifhanede Zabitiye Nazırı Şefik Paşa ile Muhaveremdir. |
| 18 | Kürd Tea'vün ve Terakkî *(6/43-44)* | 27.12.1324<br>09.01.1909 | Mele Seîdê Kurdî | Encama Natiki Sabikan<br>Natıkı Sabıkın Neticesi |
| 19 | Kürd Tea'vün ve Terakkî *(6/44)* | 27.12.1324<br>02.01.1909 | Bedîuzeman Seîdê Kurdî | Îfade Merama min |
| 20 | Volkan(70) | 26.02.1324<br>11.02 1909 | Bedîuzeman Seîdê Kurdî | Rastî<br>Hakikat |
| 21 | Volkan (73) | 01.03.1325<br>14.03.1909 | Bedîuzeman Seîdê Kurdî | Bîjî Şerîeta Ronakdar<br>Yaşasın şeriat-ı Garra |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 22 | Volkan(77) | 05.02 1325<br>18.02. 1909 | Bedîuzeman<br>Seîdê Kurdî | Fekiya Çiyê<br>Dağ meyvesi |
| 23 | Volkan(83) | 11.03.1325<br>24.03. 1909 | Bedîuzeman<br>Seîdê Kurdî | Fekiya Çiyê<br>Dağ meyvesi |
| 24 | Volkan(84) | 12.02.1325<br>25.02. 1909 | Bedîuzeman<br>Seîdê Kurdî | Fekiya Çiyê<br>Dağ meyvesi |
| 25 | Volkan(86) | 14.02.1325<br>27.02 1909 | Bedîuzeman<br>Seîdê Kurdî | Dengê Rastiyê<br>Saday-ı Hakikat |
| 26 | Volkan(90) | 18.02.1325<br>01.04. 1909 | Bedîuzeman<br>Seîdê Kurdî | Reda Wehman<br>Reddul-Ewham |
| 27 | Volkan(91) | 19.03.1325<br>02.04. 1909 | Bedîuzeman<br>Seîdê Kurdî | Reddul-ewham (Berdewama Jorê) |
| 28 | Volkan(97) | 23.03.1325<br>05.04. 1909 | Bedîuzeman<br>Seîdê Kurdî | Ronahiya Rastiyê<br>Ziyay-ı Hakikat |
| 29 | Volkan(99) | 25.03.1325<br>07.04 1909 | Bedîuzeman<br>Seîdê Kurdî | Ronahiya Rastiyê<br>Ziyay-ı Hakikat |
| 30 | Volkan(101) | 29.03.1325<br>11.04. 1909 | Bedîuzeman<br>Seîdê Kurdî | Lemaan-î Hakikat ve Îzale-î şubehat |
| 31 | Volkan(102) | 30.02.1325<br>12.04 .1909 | Bedîuzeman<br>Seîdê Kurdî | Lemaan-î Hakikat ve Îzale-î şubehat |
| 32 | Volkan(103) | 31.03. 1325<br>13.04.1909<br>Roja 31ê | Bedîuzeman<br>Seîdê Kurdî | Lemaan-î Hakikat ve Îzale-î şubehat |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| | | adarê (Meşhur 31 Mart günü) | | |
| 33 | Volkan(105) | 02.04.1325<br>15.04. 1909 | Bedîuzeman Seîdê Kurdî | Lemaan-î Hakikat ve Îzale-î şubehat |
| 34 | Volkan(107) | 04.04.1325<br>17.04. 1909 | Bedîuzeman<br>Seîdê Kurdî | Ji leşkerên Lêheng re<br>Kahraman askerimize |
| 35 | Volkan(105) | 02.04.1325<br>15.04.1909 | Bedîuzeman Seîdê Kurdî | Birayê min Derwêş Wehdetî Beg re<br>Biraderim Derviş Vahdeti Beye |
| 36 | Îkdam (5349) | 03.04.1325<br>16.04.1909 | Bedîuzeman Seîdê Kurdî | Ey Leşkerên Muvahîdîn Yên Namdar<br>Ey Şanlı Asakir- i Muvahiddin |
| 37 | Serbesti (151) | 04.04.1325<br>17.04.1909 | Bedîuzeman Seîdê Kurdî | Birayên Leşker re<br>Asker kardeşlerime |
| 38 | Mizan (128) | 04.04.1325<br>17.04.1909 | Bedîuzeman Seîdê Kurdî | Xitabê Leşkeran re<br>Asakire hitab |
| 39 | Mizan (129) | 05.04.1325<br>17.04.1909 | Bedîuzeman Seîdê Kurdî | Ey Leşkerên Muvahidîn<br>Ey asakir-i muvahhidîn |
| 40 | Mizan (129) | 05.04.1325<br>18.04.1909 | Bedîuzeman Seîdê Kurdî | Xitabên saziyan re<br>Cemiyetlere hitab |
| 41 | Serbestî (152) | 07.04.1325<br>20.04.1909 | Bedîuzeman Seîdê Kurdî | Xitabên saziyan re<br>Cemiyetlere hitab |
| 42 | Serbestî (154) | 07.04.1325<br>20.04.1909 | Bedîuzeman Seîdê Kurdî | Zabiteyên Gelerî re<br>Umum zabitlerimize |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 43 | Volkan (110) | 07.04.1325 20.04.1909 | Bedîuzeman Seîdê Kurdî | Xitaba Leşkerean re Asakire hitab |
| 44 | Volkan (110) | 07.04.1325 20.04.1909 | Bedîuzeman Seîdê Kurdî | Cemiyetan re hişyariyeke girîng Cemiyetlere ihtar-ı Mühim |
| 45 | Volkan | 07.04.1325 20.04.1909 | Bedîuzeman Seîdê Kurdî | Dengê Wijdan Sada-yı vicdan |

Bi tesbît û lêkolînên Abdülkadir Badıllı rêzkirina li gorî rêz û tarîxê ya makaleyên Bedîuzeman ên di rojnameyan de wekî li jêr in:[245]

(*) Ev makale dûre di tarîxa 11 Adar 1325/24 Adar 1909 û jimarên 83 û 84an de di Rojnameya Volkan de hate weşandin.

### 2.1.5.Gotara Bedîuzeman ya bi Kurdî û Girîngiya Wê

Girîngiya vê gotarêya herî mezin ew e ku bi zimanê kurdî hatiye nivîsandin û muxatabên wî ji serî hetanî dawiyê Gelê Kurd e. Yeke din jî ev e ku ji bilî vê gotarê deste me de nivîsên/pirtûkên wî yên kurdî nînin. Gotar ji bo gele kurd hem reçeteyeke him jî çareseriyê nîşanîwan dide; hem şîret e ji bo Gelê Kurd, ji aliyekî din ve jî di wêjeya Kurdî de pexşanek ji pexşanên pêşîn e. Di vî warî lêkolîner Malmîsanij wisa dibêje: "*Di Kurdî de, di zaravayê Kurmancî de, di nivîsîna pexşanê de ji çend mînakan yek jî ev e*."[246] Bedîuzeman Seîdê Kurdî di pêşiyê de dixwaze gelê Kurd bi hêvîdar bike û taybetiyên wan yên erênî wiha dide ber çavan: Yek ji wan taybetiyan "*Îslamiyet e*."[247] Gelê Kurd di vê rê de gelek bedel dane. Ya din "*Însaniyet e*"[248] Gelê Kurd divê xwe bi kirinên baş nîşanê dinê bide. Yek jî "*miliyeta*

[245] http://msmardin.com/2012/12/bediuzzamanin-kose-yazarligi-ve-gazete-cikarma-tesebbusu; A.Akgündüz,Arşiv Belgeleri Işığında Bedîuzzaman Saîd Nursî, cilt I.2013,îmak Ofset, 424-427.
[246] Malmîsanij, *Said Nursi ve Kürd Sorunu*, Doz Yayınları, İstanbul 1991, 79.
[247]Seîdê Kurdî, *Kurd Teavün ve Terakki Gazetesi*, Hejmar: 1, Rûpel: 7, 22 Teşrîn-î Sanî 1324,5 Kanûn 1908 1324,nql. Ji Dersên Civakî, Wesanxaneya Zehrayê, İstanbul 2013, 361
[248] Malmîsanij, *Said Nursi ve Kürd Sorunu*, Doz Yayınları, İstanbul 1991, 79.

*me ye*" [249] ku gelek meziyetên baş daye me. Em xwedî van cewheran in û pêwîst e ev taybetî ji aliyê Gelê Kurd ve bê parasitin.

Dema em li gotarê dinihêrin dibînin ku Bedîuzeman di serî de balê dikişîne ser "*tifaq*"ê ji bo ku bêtifaqî nexweşiya Kurdan a herî girîng e. Di vî warî de wiha dibêje: "*Di tifaqê de quwet, îttihadê de heyat, di biratiyê de se'adet/bextewarî, hikumetê de selametî heye. Kapika îttihadê û şirîta muhebbetê qewî bigrin da we ji belayê xelas bike*."[250] Herwiha ew, yekitiyeke bi hezkirin hatiye kelecandin ji gelê xwe dixwaze. Lewra dema yekitî çêbibe wê demê dikarin bibin xwediyê hukumetê ku tê de selametî heye.[251] Dema hikumet hebe, mirov bêxwedî nabe, wê demê digihije silametiyê. Bedîuzeman bale dikşîne ser sê dijminên wan û wiha dide rêzê: "*Yek feqîrtî ye, ya duyemîn cehalet û bêxwendinî ye, ya sêyemîn dujminî û îxtîlaf e*."[252]

Bi qasî pênc sed sal in ku di nava Gelê Kurd de geşedanên neyinî bi xwe re hin nexweşiyên din jî peyda kirine wek îletekî û wek kangirenekî Gelê Kurd dorpêç kiriye. Pêwîst e ev dijminatî bê rakirin û ev nexweşî bên tedawî kirin. Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji bo tedawiyê vê reçeteyê dide: "Me'arif û xwendin."[253] Ji bo tedawiya hemû nexweşiyên Gelê Kurd perwerdehiyê weke reçete dibîne û ji bo wê, daxwaza dibistanên herêmî û Medresetuzehrayê dike.

Ya ku di serî de ji wan re lazim e "*îtifaq û muhebbeta/hezkirina millî ye*."[254] Eger ev qabiliyet di nava Gelê Kurd de cih bigre, hizra yekitiyê bi perwerdehiyê bê dayîn wê demê di qada şaristaniyê de dikarin cihê xwe bigrin. "*Însan ê bi nefsa xwe şuxlên xwe bike*."[255] Bi sedsalan e şixul û rêvebiriyên Gelê Kurd bi gelemperî bi destê kesên din berdewam kiriye, sedemên wê jî her tim di navbera Gelê Kurd de îxtilaf hebûye. Bedîuzeman dixwaze wek sêfîl û belengazan hevîya xelqê nebin, şixul û rêvebiriya xwe bixwe bikin, kaniyan di nava xwe de ava bikin. Wê demê yê bê minet bin, lewra di rêvebiriyê de silametî heye. Çawa Bedîuzeman di despêka gotara xwe de bi bêtifaqiya gelê Kurd dest pê kir di dawiyê de jî wek çareserî peyama wî ev

---

[249] Seîdê Kurdî, *Qezeteya Kurd Teawun we Tereqqî Gazetesi*, 361.
[250] Kurdî, h.g., 361.
[251] Kurdî, h.g., 361.
[252] Seîdê Kurdî, *Qezeteya Kurd Teawun we Tereqqî Gazetesi,* r. 361.
[253] Kurdî, h.g., 361.
[254] Kurdî, h.g., 361.
[255] Kurdî, h.g., 361.

e: "*Xwendin, xwendin, xwendin û desthevgirtin, desthevgirtin, desthevgirtin.*"[256] Şîreta, tifaqeke ku bi perwerdehiyê hatiye çareserkirin, ji wan dixwaze.(**bnr**.**Pêvek-18)**

### 2.1.6. Şîret û Nesîhetên Seîdê Kurdî yên ji bo Serok, Rêber, Alim, Meşayîx û Kesayetên Kurdan re

Gelek nesîhet û şîretên Seîdê Kurdî ji serok û rêberên kurdan re heye. Her tim xwestiye gelê xwe bi her awayî şiyar û perwerde bike. Lewra Gelê Kurd bi gotina Bedîuzeman ev pênc sed sal e bi paş mayinê diçin, dixwaze bi vê rewşa nebaş wan şiyar bike. Berê wan bide qada şaristaniyê. Ew pêşiyê dixwaze alimên kurdan yên ku tesîra wan ser kurdan zêde ne di derbarê îxtilaf, azadî, heq û hiqûqên kurdan de şiyar bike.

#### 2.1.6.1. Şîret û Nesîhetên ji Alim û Meşayixan re

Bedîuzeman Seîdê Kurdî dema di navenda Osmaniyan, Stenbolê de dimîne alimên kurdan haya wan ji îstibdadê tuneye. Ew îstibdada ji azadî û misilmantiya ronak re astengdar e, dixwaze vê perdeya tarî ya ku li ser gel girtiye bi wasiteya alim û zanyarên kurd ve bidirîne. Pêşiya gel bi tîrêjên Îslamê bi destê aliman ronahî bike, lewra Gelê Kurd, îxtiyariyên wan piranî di bin bandora aliman de ne û wiha dibêje:

"*Gelî alimên ku warisê nebiyan in û gelî meşayixên kurdan! Ji ber ku ez li navendê me, ez we hişyar dikim ku di vî zemanê axir de, wan ewrên tarî yên îstîbdadê, ew ulwiyet û husna heqîqî ya Îslamê, ji pêşiya çavan rapêçabû û veşartibû. Hetta wisan kiribû, mîna ku Îslamiyet, di çavê biyaniyan de li hember pêşveçûn, edalet û hurriyetê, kelem û asteng be hatiye nîşandan. Haşa sume haşa! Lewra ew azadî/hurriyet, wekhevî û edaleta serdema pêşî ya Îslamê, ji vê re delîlekî eşkere û zelal e ku ev şerî'eta pak û ronak vê nîşan dide. Jixwe ev wekheviya di îbadetan de vê diselmîne, temamê wan mafên azadiyê, edaletê û wekheviya mafan, bi carekê, tevî wan pevgirêdan, rabite û pêdiviyan di xwe de dihewîne. Çimkî ji ber ku şerîet, ji kelamê ezelî hatiye, dê biçe ebedê. Çawa ku enbiya, qayde û prensîban bi wehyê saz*

[256] Kurdî, h.g., 361.

*dikin û muctehîd, bi îctîhadê hukman derdixin, hûn jî li gor pêdiviyên demê, wan hukmên edlî bi keys bikin*."[257]

### 2.6.1.1.Şîret û Nesîhetên ji Serok û Rêberan re

Têkiliyên Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji her tebeqeyên kurdan re hebûye. Di serdema Stenbolê de ji ber ku li derveyê welêt bûye rewşa wan çêtir dîtiye. Ji bilî wan deman, di nav eşîran de digeriya û têkiliyên gel û serokên wan bê maf û dadî didît. Hin serokên Gelê Kurd, wek mînak; reîsê Eşîra Mîran, ji bo zilm û zordariyên wan li hemberî wan tekoşîn dikir. Lewra Meşrûtiyetê çawa bandor dabû ser selteneta osmaniyan wisa jî serokatiya axa û began jî dihejand. Ji bo vê rewşa nûjen ew dixwaze serok û rêberên Gelê Kurd jî xwe nûjen bikin û wek berê bi rêvebiriya xwe bi darê zorê bi kar neynin, bi edalet û mirovahiyê serokatiya xwe berdewam bikin.

"*Heta niha hûn tabi'ê padîşah û ew hêz û cebra ji ber wê kûvîtî û hovîtiya gel ku mehkûmê li paşmayîn û parçebûyînê ye, we pêdivî dît ku hûn ji bo gel bi kar bînin. Vê gavê jî padîşah, dîsan îmam e. Tabi'iyê bikin, da ku ew, bi wê marîfet û edaleta ku mezherê imrê ebedî ye, gelê xwe îdare bike. Hûn jî wisan bikin; da ku hûn bigihîjin xelasiyê. Li şûna qewet, zor û cebrê, aqil û edaletê bi kar bînin û di ciyê tirsandinê de muhebbetê li ser lingan bigrin, da ku riyaset û serokatiya we berdewam bike. Kurtebirî û dawiya gotinê, mezinê me, ew kurkê axatiyê ku wisan zêde bi heşmet bû, ji gelê xwe re bexişand. Hûn jî wî ebayê kevn ê ew axatiya ku kêç û spî ketinê, bi kincekî edaletê re biguherînin*."[258]

### 2.6.1.2.Şîret û Nesîhetên ji bo Kesayetên Kurdan

Bedîuzeman kesên Kurd diwekîne şêran lê ew şêrên dest û piyên wan girêdayî. "*Gelî ferdên Kurd ên ku mîna şêran girêdayî ne*!"[259] Kurd bi zordestiya desthilatdaran û zorbetiyên di nav xwe de hatine girêdan. Pêwîst e herkes ji hev re tehemulê bike, xwe di nava gelê xwe de bihelîne û hîmeta/xebata xwe ji bo gelê xwe serf bike. Dema mirov ji gelê xwe re hezyar/hezkar bû wê demê him mirov him jî gelê mirov dê pêş de here. Qesta Bedîuzzeman ew e ku hindî Gelê Kurd yekitiya xwe

[257] Kurdî, "Nutuq", *Dersên Civakî*, 31-32.
[258] Seîdê Kurdî, "Nutuq", *Dersên Civakî*, 31-32.
[259] Kurdî, b.n., 31-32.

saz neke yê bindest be. Pêwîst e Gelê Kurd yekitiya xwe qahîm bike, wê demê ew ê ji dîltiyê azad bibin.

"*Heta niha hûn ji du aliyan ve hêsîr bûn. Yek jê, hûn bi wan teklîfên zalimî yên wê hukûmeta zordest ve, aliyê din jî, hûn bi wan xesb û talankirinên xedar ên hin zaliman ve girêdayî bûn. Niha, di pey vê şoreşa mezin de, hûn azad in. Bi şertê ku hûn îtaeta wan berpirsiyariyên adil ên hukûmeta meşrûtî ya meşrûî bikin û bi awayekî menfî êrîşî ser mafên xelkê nekin, her yek ji we, di alema xwe de mîna padîşahekî ye. Heta ku ji destê we tê, selteneta şexsî muhefeze bikin û bi teşebbusa şexsî, ji vê îttihada millî û ji meşrûtiyetê re, bi her awayî xizmet bikin. Lewra rizgarî û jiyana me ya mutleq û belkî hemû milletê Îslamê û osmaniyan, bi vê îttîhada millet ve qaîm e.*"[260]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji bêxîretî, îxtilaf û xemsariya Gelê Kurd gilîdar e û wiha dibêje: "*Çavê xwe vekin, sibeh hat. Tim hişyar bin. Ew kesên ku xwedî wan fikrên xerabûyî ne, bila ji îxtîlaf û hovîtiya we îstîfade nekin*."[261] Lewra ev xemsariya wan dê di pêşerojê de bibe sedema xetereyên mezin. Dixwaze kurd xemsariya xwe şiyar bibin lewra ger şiyar nebin yê: "*Zeman jî, dê şimaqê li we bide û bi vî awayî dê îxtîlaf û keşmekeşiyê bavêje.*"[262] Derve wasiteya zilm û zordariyên mezin, îxtilafa nav xwe de biavêjin. Lê Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji wan dixwaze ku Gelê Kurd yekitiya xwe çêbike. Ger kurd xwe neparêzin wê demê belkî kurdîtiya xwe lekedar bikin. "*Tiştê ku ez dixwazim ew e ku hûn, namûs û heysiyeta kurdîtiyê biparêzin.*"[263] Çareseriya yekitî û serkeftina Gelê Kurd di perwerdeyê de dibîne. "*Ez mizgîniyê didim ku di demeke nêzîk de, li temamê Kurdistanê, dê ew medreseyên munderîse (ku ji holê hatine rakirin), ji nû ve bên îhyakirin û li wan ciyên ku tune ne jî, dê medreseyên nû bên avakirin*."[264] **(bnr.Pêvek-19)**

Bedîuzeman Seîdê Kurdî hin caran ji aliyê hin serokên kurdan ve tê sucdar kirin: "*Dibe ku Bedîuzeman jî doza serokatî û mezintiyê dike?*" Lê Bedîuzeman Seîdê Kurdî bi gotin û kirinên xwe hîç xwestekên wisa nîşan nedayê û di derbarê van tawanbar kirinan de wiha dibêje: "*Heke sedema tevgera ferdî, îxtîlaf, bixwepesinîn,*

---

[260] Kurdî, "b.n., 31-32.
[261] Seîdê Kurdî, "Nutuq", *Dersên Civakî*, 31-32.
[262] Kurdî, "b.n., 31-32.
[263] Kurdî, b.n., 31-32.
[264] Kurdî, b.n., 31-32.

*meyla li ser axatiyê, îstîxdamkirin û xîzmetkirina bi gel, xapîn û danexapandin, di wê kurdîtiya sun'î de bê nîşandan, hûn şahid bin, ji wê kurdîtiyê ez îstîfaya xwe didim*."[265] Lewra ya Bedîuzeman Seîdê Kurdî dixwaze tiştên ji bo jiyana hemwelatiyan çi pêwîst be wî dixwaze. Di derbarê van meseleyan de baldariyên xwe nîşan dide û dixwaze kurdiyeke saf, paqij û bêgemar di jiyana xwe de nîşan bide. Dixwaze serok û rêvebirên Gelê Kurd jî wisa kurdîtiyê lekedar nekin. Ji bo vê mijarê wiha dibêje:

> "*Îca bi kurdîtiya sirûştî ya ku unwana cesaret, wêrekî, sedeqet û diyanetê ye, îftîxar dikim. Çawa ku di zemanê îstîbdadê de ez ji bo kurdîtiya sirûştî ketim timarxaneyê. Gelî kurdino! Min timarxane qebûl kir. Îca ji bo ku ez kurdîtiyê nehetikînim, min îradeya padîşah û meaş û diyarî û îhsana wî ya şahane qebûl nekirin. Serkeftin, ji bo hevalên niyetxalis e*."[266] **(bnr. Pêvek-20)**

Bedîuzeman Seîdê Kurdî, di gotara xwe ya di pirtûka "Dîwana Herba Urfî" de hatiye weşandin de ji bo şiyarbûn û fikreke ku netewîtî pê geş bibe dibêje: "Ev pêncsed sale razana we bes e."**(bnr. Pêvek-21)** Kurd, di avakirina nasnameya xwe de li gorî miletên din paşve mane. Ew ên wek kurdan, niha li wan derbas bûne, ew jî di aliyê tunebûna fikreke milletiyê ye. Pêwîst e mirov hişyariyeke miletperweriyê bixe nava kurdan. Bedîuzeman Seîdê Kurdî di seyahateke xwe de ji bo kurd şiyar bin wiha dibêje: "Milletek, ji cahiltiyê hiqûqa xwe nizanibe, mirovên miliyetperwer jî yê ji bo xwe bike zorker"[267] Gotinên Bedîuzeman yên di derbarê kurdan de gelek balkêş in. Ev gotara hanê wek manîfestoyekê ji bo miletê kurd nivîsiye, hişyariyê di derbarê îxtilaf, feqîrî, bêxwedîbûn, nezanîn û hwd. nexweşiyan dide rêzê. Ji bo wan nexwaşiyan çareser bikin wiha dibêje: dermanê wan nexweşiyan bi çekên fen, sen'etê êrîş bikin û yekitiya xwe çêbikin. Ji zimanê xwe xwedî derkevin. Wê demê hûnê wek milletên din di qada şaristaniyê de mezin bibin."

Seîdê Kurdî bi gelên din dide zanîn ku fedekariya herî mezin di navbera kurdan de heye. Çawa gelek kesên kurdan, xwe gelek caran ji bo eşîra xwe feda dike, wisa jî dikare ji bo gelê xwe xwe feda bike. Ev fikra netewîtiyê ya derbasî biyaniyan

---

[265] Mela Seîdê Meşhûr, "Nutuq", *Dersên Civakî,* 36.
[266]Mela Seîdê Meşhûr, b.n., 36.
[267] Zinar, *h.b.*, 168.

bûye, bi rastî ew zêdetir di Gelê Kurd de hebûye. Bedîuzeman Seîdê Kurdî di derbarê vê meselê de wiha dibêje:

"*Hem bi wê fikra millî ku biyaniyan ew ji me girtiye, ferdekî wan, mîna milletekî, bi qîmet dibe. Çimkî qîmeta mirovekî, bi qasî himmeta wî ye. Himmeta kê milletê wî be, ew kes, bi tena serê xwe, milletekî biçûk e.*"[268]

Di Munazeratê de di diyaloga bi eşîrên kurdan de, kesek Bedîuzeman Seîdê Kurdî re wiha dibêje: "Dibêjin, em çawa bikin? Serok, rêvebir, paytext û serekanî di destê tirkan de ye, xebat û tekoşînên me vala ne/pûç in" wisa difikirin. Di derbarê pêşerojê de bê hêvî ne. Lê belê Bedîuzeman Seîdê Kurdî wek wan nafikire, wek rêberekî rê nîşanê wan dide. Fikra desthevgirtine, kolektîvîzmê û milliyetperweriyê derdixe pêş, ger gotina wî bikin kes nikare tu zirarê bide wan.

"*Gelî Kurdan! Heke beg, axa hetta qendera şêxên we jî, pişta xwe bidin qewetê (xwe bi qewetê piştrast bibînin) û şûrên wan tûj be jî, bêguman teqez dê bikevin. Hem jî musteheq in. Heke pişta xwe bidin aqil û di ciyê cebrê de muhebbetê bi kar bînin, hestên wî, ger tabiê fikran bin, ew dê (bi paş de)nekevin, dibe ku bi pêş ve biçin.*"[269]

Seîdê Kurdî dibêje ku, "*giliyê xwe, ji xwe bikin(bila şikayeta we, ji we bi xwe be). Heke hûn her qebehetî biavêjin ser hikumat û tirkan, hûn dê zehf bên xapandin.*"[270] Wek belengazan hêviya kesî nebin, kar û xebatên xwe pêwîst e bixwe bikin. Bedîuzeman dibêje: "*Ger hûn bixwe çavkaniyan çêbikin pêwîstiya tirkan nîne*." Dixwaze çavkanî û serekanî jî, di destê wan de hebe, ji bo mihtacî kesî nebin, bê minet bin.

"Gelî kurdan! Dibînim ku li bal me kanî tune ye. Ji ber wê yekê em, aveke genî ku ji derên dûr tê, vedixwin. Seîdê Kurdî dixwaze kurd bixwe xîret bikin û bixebitin. Bibin xwediyê fikra milliyetê bi marîfet û fezîletê bidin destê xwe. Kunganekê biavêjin di nava gel de kaniyan tijî bikin, hewceyên kaniyên

[268] Seîdê Nursî , "Xutbeya Şamê", *Dersên Civakî,* 58.
[269] Seîdê Kurdî, "Munazarat*", Dersên Civakî* , 87.
[270] Kurdî, b.n., 92.

derve nebin. Divê wisa nebin dê daîma bibin parsek, parsektî jî, pere nake. Pêwîste mirov nebe parsekê xelkê dibe jî bila bibe yê nefsa xwe."”[271]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî di pirtûka Dîwana Herba Orfî de dîsa di derbarê taybetiyên başbûna gelê xwe de wiha dibêje: “*Ku em kurd in, tên xapandinê; lê belê kesî naxapînin. Ji bo jiyanekê tenezulê derewan nakin*.[272] Muhyiddîn Zinar, di gotara xwe ya bi navê “Di Pêncî Saliya Wefata Bedîuzeman Seîdê Kurdî” de nêrînên Bedûzeman ên derbarê fikra milliyetperweriyê de wiha dide:

> “*Tiştên miletan tîne holê; ziman, çand, dîrok û welat in. Bedîuzeman van muteber dibîne, ji bo geşedana wan dixebite. Misilmantî desturê nade tu sîyaseta ku tiştên millet pê têne meydanê piçûk bibîne. Bedîuzeman dibêje ku, ziman jî “pîvana tekamulbûn û hijayiya miletekî ye.” Û “neynika hessiyata millî ye.” Nûrsî milliyetê jî “dîn, ziman, welat û munasebeta navbera wan dibîne, ger her sê yek bin ew milletekî bi hêz e, ger yek ji wan kêm be cardin bikin nava daîreya milliyetê*.” [273]

## 3. BEŞA SÊYEM

### 3.1. PROJEYA MEDRESETUZEHRAYÊ

#### 3.1.1. Wateya Medresetuzehra

Mederese, di perwerdehiya gelên misilman de ciyekî gelekî girîng girtiye. Ji hatina Îslamiyetê li Kurdistanê di nav van xwendegehan de perwerde bûne, çand û zimanê xwe bi van saziyan parastine û heta îro anîne. Di sedsala nûjen de saziyên perwerdehiyê li gorî Ewropayê hatine guherandin. Vê pergalê bi xwe re gelek pirsgirêkên perwerdehiyê anîne. Di vê demê de kurd li gorî dinyayê paşde mane. Bedîuzeman jî wekî rewşenbîr û alimekî kurd ev kêmasiya kurdan dît û xwest vê kêşeyê çareser bike. Li gorî xwe projeya Medresetuzehrayê anî rojevê. Seîdê Kurdî rastiya Medresetuzehrayê wiha tîne zimên: “*Ev Medrese li cem aqilan dibistaneke herî bilind, li cem dilan medreseyeke ekmel, di nezera wijdanan de zawiyeyeke herî pîroz e.*”[274] Bedîuzeman yekitiya medrese û dibistanan diparêze û Medresetuzehrayê

---

[271] Seîdê Kurdî, b.n., 93.
[272] Kurdî, “Dîwana Herba Urfî”, *Dersên Civakî*, 159.
[273] Zinar, *Di Pêncî Saliya Wefata Bedîuzeman Seîdê Kurdî*, 165.
[274] Seîdê Kurdî, “Munazarat*”,Dersên Civakî*, 143.

diwekîne lebatên mirovan û dibêje divê ew ji hev neyên veqetandin. Ji bo vê yekitiyê Bedîuzeman Seîdê Kurdî di jiyana xwe de pirr hewl dide ku ji bo yekitiyekê ava bike. Bedîuzeman di sala 1908an de dikeve nava hewldanan ji bo vekirina dibistanan daxwaznameyekê ji desthilatdarên Osmanî re pêşniyar dike. Dixwaze ku Dewleta Osmanî li Kurdistanê sê dibistanan (darultalîm) ava bike û di van dibistanan de bi tenê perwerde bi kurdî bê dayîn.

Bedîuzeman Seîdê Kurdî di destpêka Munazeratê de di derbarê Medresetuzehrayê de wiha dibêje: "*Parzemîneke biezemet a bextreş, dewleteke bi nav û deng a bêsiûd, qewmekî hêja yê bêxwedî*."[275] Di nav vê pirtûkê de projeya Medresetuzehrayê reçeteyeke ku, xilasiya pêşeroja Netewa Kurd dide nîşandan. Di derbarê vê projeyê de Osman Tekîn wiha tîne zimên: "*Medresetuzehra reçeteyeke perwerdehiyê ya Îslamî ye ku ji bona kesên di navbera perwedehiya dibistanên sekuler, modernîst û muhafazakar de mane û ew ê di wan waran de dijîn*."[276]

Medresetuzehra her çendî bi pratîkî/cîsmanî nehatibe avakirin jî, Bedîuzeman dixwest ku bi fermî weke mektebeke modern bête damezirandin. Lê îro bi milyonan kes wek pergala "Bologna"[277] divê di her temenî de mirov di Medresetuzehrayê de perwerde bibin. Projeya Medresetuzehrayê ew model e ku ilmên dînî û fenî bi sê zimanên rojhilata navîn (erebî, kurdî û tirkî) weke zanîngehekê bi hev re bê xwendin. Bedîuzeman xwestiye ku vê pirsgirêkê bi vê projeyê çareser bike û wiha gotiye: "*Bi hezar salan e ev nexweşiyên di dil û wijdanên gel de, di ramanên gel de fitne û fesadî bi tenê bi dermanên Qurana Pîroz û bi projeya Medresetuzehrayê were tedawîkirin.*"[278]

Bedîuzeman ji bo perwerdehiyê di herêma Kurdistanê de bide avakirin fikr û ramanên xwe wiha tîne ziman: "*Xwedayê dilovan fikrek da ruhê min, Asya çiqas ji Afrîkayê mezintir e ger zanîngeheke ewqas mezin jî di parzemîna Asyayê de hebe. Erka vê zanîngehê ew di nava netewên misilmanan wek; ereb, hîndû, îranî, kafkasî, tirk û kurd de nijatperestiyeke menfî ji holê rake*."[279] Ji ber ku Xwedê di Qur'ana

---

[275] Seîdê Kurdî, "Munazarat", *Dersên Civakî,*75.
[276] Osman Tekin,"Bediüzzaman Said Seîdê Nursî nin Bir Eğitim Modeli Olarak Medresetüzzehra", *Munazarat Sempozyumu I*, Merak Yayınları, Ankara 2013, 570.
[277] Gürbüz Aksoy,"Yüksek Öğretimdeki Yeni Gelişmeler ve Bediüzzaman", *Munazarat Sempozyumu I*, Merak Yayınları, Ankara 2013, 593.
[278] Said Nursi, *Kastamonu Lahikası*, 21.
[279] Said Nursî, "Emirdağ Lahikası ll.",Tenvir Neşriyat, İstanbu, 1991, 196.

pîroz de wiha ferman dike: “Misilman bi tenê birayên hev in.”[280] Wek esasiyeke Qurana Pîroz bê înkişafkirin. Di vê medreseyê de zanistiya felsefê û ilmên dînî wê bi hev re aşitiyê bikin. Ev projeya Medresetuzehra wê Şaristaniya Ewropayiyan, bi rasteqiniya misilmantiyê re hevnas bike. Ne tenê bi şaristaniya Ewropayiyan re, wê bi neteweyên Asya û Afrîkayê re jî hevnasînê ava bike. Di vî warî de Bedîuzeman Seîdê Kurdî wiha dibêje;

“*Di Anatolyayê de ehlê mektep û ehlê medrese bi hev re tam alîkar û tifaq bikin. Ji bo wê di navenda Kurdistanê de, him Hîndîstan him Erebistan, him Îran, him Kafkas him jî di navenda Tirkîstanê de bi wateya Medresetuzehrayê, bi uslûba Camî'ul Ezherê darul funûnek him dibistan, him jî wek medreseyekê bête avakirin, wek zanîngeh tam pêncî pênc sal e çawa bi heqîqetên Rîsaleyên Nûrê re xebitîme wisa jî ji wê re (Medresetuzehrayê) xebitîme.*”[281] Camîûl Ezher: Li Misrê Zanîngeheke bi nav û deng e. Di heyama “Dewleta Fatimiyan” de ji aliyê serleşker Cewher ve, bi mîladî di sala 972yan da hatiye avakirin. Li gor “Mezhebê Şi'iyan” perwerdehî dikirin. Di dewra Eyyûbiyan(1169-1250) de ji aliyê Selaheddînê Eyyûbiyê Kurdî ve; perwerde, li ser “Mezhebê suniyan” hate sazkirin. Ji bona ku, li gor “Çar Mezheban” perwerde bê kirin, ji her mezhebekî re avahiyên xweser hatin çêkirin.[282]

Camîul Ezherê, ji bo avakirina Medresetuzehrayê bandor li ser Bedîuzeman Seîdê Kurdî kiriye. Lê belê modela ku Bedîuzeman Seîdê Kurdî difikirî ji modela Camî'ul Ezherê pêşdetir bû. Ji ber ku li Camî'ul Ezherê hew zimanê erebî hebû, lê Bedîuzeman Seîdê Kurdî dixwest, di Medresetuzehrayê de bi sê zimanan perwerdehî bête dayîn. “Medresetuzehra bi tenê dibistan, medrese û tekya nîne. Di jiyanê de hersê heman avûhewa ye.”[283] Medresetuzehra ji bo tiştên nebûyî, çareseriyek e “mebesta xeyalan e” di hemû jiyana wî de, di sed sala dawîn de, di nav bager û bahozên sê serdeman de, ajandaya kesayetiyeke nehejiyayî û neguherî ya Seîdê Nûrsî ye.[284] Medresetuzehra bi tenê projeyek nîne, modelek e. Di vê modelê de “*aqil,*

[280] Hucûrat, 49/10
[281] Tekin, *h.g.*, 449,452.
[282] Adilê Etmanî, *h.b.*,r. 191.
[283] Benek, “Medresetüzzehra*”Said Seîdê Nursî nin Eğitim Felsefesi Medresetuzehra*, xxvı.
[284] Benek, *h, b.*, xxvı.

*muhekeme, mantiq, îsbat, şerh, şîrove, tefekkur, "unsuril eqîde", belaxat, azadî û komxebatî heye.*"[285]

Seîdê Kurdî Medresetuzehrayê wekî nexweşxaneyekê xeyal dike û dixwaze nexweşiyên misilmanan bi taybetî jî yên Gelê Kurd tedawî bike. Dibîne nijadperestî di nava misilmanan de ajal/geş dibe, biratiya misilmanan ber bi nebaşiyê ve diçe. Ji bo nijadperestiya di navbera misilmanan de tedawî bike, diviya ilmên dînî û ilmên fennî bi hev re bihatana xwendin. Di vê zanîngehê de şagirtên perwerde dibin divê bi ramanên biratiyê, bêne perwerdekirin. Di dinya misilmanan de paşveçûn, xûrafe, xizanî, nezanî, baxnazî, zordestî, baweriyeke ne rasteqîn derketibû holê. Bedîuzeman Seîdê Kurdî hemberî pêşveçûna Ewropayê dixwest cewherên misilmantiyê dîsa derxe holê. Bedîuzeman Medresetuzehrayê diwekîne gerdûnê û her quncekî wê wek medrese, tekya, dibistan, salona komcivînê, meclîsa gelerî û wek qesreke nûranî dibîne ku biryarên di vê medreseyê de tên dayîn dê pêşeroja misilmanan û Gelê Kurd rewneqdar bike.

"*Heke Îslam, bê wekandin; menzeleke wê dibistan, xaneyeke wê medrese; quncikekî wê, zawiye; salona wê jî dibe cihê komcivîna giştî! Ji bo yek kêmasiya yekê temam bike, weke meclîseke şûrayê di şiklê qesreke qewî ya nûranî de, xwe bide nîşandan. Çawa ku neynik, li gor xwe rojê nîşan dide, ev Medresetuzehra jî, wê qesra Îlahî, dê li hember derva temsîl bike*."[286]

Medresetuzehra projeyeke zanistî û akademiyeke navnetewî ye. Projeyeke ji rêzê nîne projeyeke gerdûnî ye, alternatîfeke dijberî rojavayê nîne. Ahmet Yıldız di vê derbarê de wiha dibêje: "*Medresetuzehra projeyeke teraqî, şaristanî, zanistî, Kurdistanî, Osmanî û erdnîgariya misilmanan e*"[287]. Lewra di fikr û ramanên misilmanan de bi taybetî di nava Gelê Kurd de 500-600 sale bêxîretiyeke mezin heye. Bedîuzeman dixwaze wan hişyar bike. Muhammed Salar di derbarê felsefeya Medresetuzehrayê de wiha dibêje: "*Medresetuzehra ne tenê zanko ye, bi xwendina hezaran xwendevanan jî nîne." Medresetuzehra di perwerdehiyê de nûjenî û vejîn e, di Rojhilata Navîn de bingeha aşitiyê ye.*"[288] Medresetuzehra di alema misilman de

---

[285] Benek, *h.b.*, xxvı.
[286] Kurdî, *"*Munazarat*",Dersên Civakî*,137.
[287] Ahmet Yıldız, "Medresetüzzehra Nedir?" *Seîd Nursînîn Eğitim Felsefesî Medresetuzehra*, Wesanxaneya Merak, Ankara 2013, 15-23.
[288] Muhammed Salar, "Bir Eski Said Projesi: Med-Zehra"*Seîd Nursînîn Eğitim Felsefesî Medresetuzehra*, Merak Yayınları, Ankara 2013, 185.

perweredehiyeke şopdar nîne wek “*akademiya Eflatûnan, Îbnî Sînayan, Bîsmarkan, Dekartan û Teftezaniyan fikrên wê li ser saziyeke entellektuel hatine avakirin*.”[289] Bedîuzeman dixwaze di Medresetuzehrayê de rengên cuda, zimanên cuda, gelên cuda di nava baxçê jiyanê de neşv û nema bibin. Ev projeyeke gelemperî ye di vî warî de. “*Zanistî, irfan, zena’et, karbeşî û pisporî ye, bi taybetî xilasbûna Rojhilat û Kurdistanê ye, xilasbûna temamî welat e, bi taybet projeyeke zarûret û îstîqametê ye*.”[290] Bi nêrîna Safa Mursel: “*Projeyeke azadîxwaz, hevpar, zelal, sivîl, hemukesyar, di aliyê siyasî de meşrutiyethez e. Di gelemperiya misilmanên Osmanî de, bi taybetî wek mizgîniyek e, ronî û rast ji bo kurdan agahdariyek e*.”[291]

Bi kurtasî Medresetuzehra ev e ku; Bedîuzeman dê bi uslûb û metodeke nûjen di vê zanîngehê de Qur’ana Pîroz şîrove bike û esasên Îslamê bide nasîn.

Ya duyem jî ew e ku; sê nexweşiyên mezin ên Kurdan hene; -xizanî, cehalet, îxtîlaf- ku ew dixwaze di nava Gelê Kurd de hêza wan bişkîne, pevçûnên ku di nava wan de didome û wana feqîr dihêle tedawiya wan bike û pêşeroja Gelê Kurd bi vê projeya xwe ronî bike.

### 3.1.9. Armanca Medresetuzehrayê

Bedîuzeman halê kurdan yê perîşan didît û pê xembar dibû. Dema li Wanê niştecî bû, kêmasiyên perwerdeyê didît. Herêma Kurdistan bi her alî ve paşde mabû. Ev rewş dil û hişê niştimanperwerên kurd daxdar dikir. Ûbeyt A. Kudat vê rewşê wiha şîrove dike; “*di serê sedsala 19. de alema misilmanan di her alî de têkdiçû. Sedemên vê têkçûnê kêm kesan teşhîs kiribû, ji wan yek jî Bedîuzeman bû. Wî rizgarî di “çekan” de nedidît, di “pênûs/xwendinê” de didît. Lewra tişta ku dibû guherîneke şaristanî bû. Bedîuzeman Seîdê Kurdî, bi taybetî di nava netewa kurd de, sê nexweşiyên gelên misilman tesbît kiribû. Dixwest wan nexweşiyan tedawî bike. Wî bi taybetî dijminên nava kurdan teşxîs kiribû, ji bo wan sê dijminan sêderman jî amade kiribûn û pêşkeşî gelê kurd kiribû. Paşê ev armancên xwe bi pergal, wek projeyeke*

---

[289]Kurdî,”nutuq”, *Dersên Civakî*, 21.
[290] Erdoğan Çelebî,”Sivil Toplum Kuruluşları Perspektifi Bağlamında Bediüzzamanın Medresetüzzehra Eğitim Modeli”, *Said Nursî Eğitim Felsefesî Medresetuzehra*, Merak Yayınları, Ankara 2013, 609-610.
[291] Safa Mursel,”Kürt Sorunu Bağlamında Münazarat Analizi”, *Munazarat Konferansı*, Merak Yayınları, Ankara 2011, 69.

*perwerdeyê bi navê Medresetuzehra amade kiribû.*"[292] Seîdê Kurdî wiha dibêje; "*Ji îlankirina Tenzîmatê hetanî roja îro di navbera mekteb, medrese û tekyayê de cudatiya fikir û ramanan berdewam dike. Û di navbera zanista dînî û felsefeyê de jî cudatî hene ku ew cudatî ancax; di bernameyên dibistanan de zanistên dînî, di bernameyên medreseyan de zanistên fenî bête cîhkirin, da ku ew di tekyayan de pêşiya xurefeyan bigire. Ji bo ku nexweşî ji holê rabin çareserî bi projeya Medresetuzehrayê ye.*"[293]

Çima Medresetuzehra? Wê demê rewşa kurdan li gorî miletên cînarên wan (ereb, faris, tirk û ermen) nebaş bû. Ev jî rewşenbîrên wek Bedîuzeman zehf daxdar û xembar dikir. Bedîuzeman di sala 1908an de dema li Stenbolê bû ji azadiyê re dîntî dihate gotin, dema kirinên wî yên ji bona miletê wî wek cînayet dihate dîtin, ev nêrînên nebaş ew qet ji riya wî venedigerand, bilaeks wî ji bo perwerdeya kurdan tekoşîn li paytextê Osmanî dikir. Hamza Yilmaz dibêje, Bedîuzeman erdnîgariya ku têde dijiya pirsgirêkên îxtilafa nava kurdan di bê perwerde hîştin û kuştina wan, paremayin û halên wan yê perîşan de didît. Ji bo yekitî û bextewariya kurdan temîn bike di sala 1908an de diçe dersaadetê û daxwaznameyekê dide Dîwan-i Humayûnê.[294] Bedîuzeman Seîdê Kurdî dixwest ku belengaziya kurdan ya bi sedan salan e berdewam dike bi projeya Medresetuzehrayê bê çareserkirin.

> "*Min li Kurdistanê, halê kurdan ê perîşan didît. Min fêm kir ku bextewariya me, dê bi fenên nû yên medenî çêbe. Pêwîst e ku rêyeke wan ilm û fenan a bi silamet, bi destê aliman çêbe û kaniyeke wan jî, bila medrese bin. Sal û nîvek e, ez li vir ji bo neşra perwerdeya li Kurdistanê dixebitîm. Piraniya Stenbolê vê yekê dizane.*" [295]

Armanca Bedîuzeman ew bû ku dibistanên nû û projeya Medresetuzehrayê bi rêvebiran bide pejirandin wan di Kurdistanê de bide vekirin.

---

292 Ubeyd A. Kudat, "Bediüzzamanın Üç Daru't Talimi ve Medresetüzzehrada Dil" *Kovarar Ortak Zemin*, 14.

293 Osman Tunç, "Said Seîdê Nursî nin Medresetüzzehra Projesi", *Di 50 Saliya Wefata Wî de Sempozyûma B. Seîdê Kurdî*, Wesanxaneya Nûbihar, Stenbol 2011, 196-197.

294 Hamza Yılmaz, *Tarîhî Seyriyle Medresetüz-Zehra*,Tenvîrneşriyat.com.tr.2015.

295 Kurdî, *"*Dîwana Herba Urfî*", Dersên Civakî*, 157.

Ger tevdîr neyê girtin wê rewşa Gelê Kurd ji aliyê dilnexwazên wan ve bê sûîstimalkirin. Ji bo vê rewşê Ahmet Demir wiha dibêje; "*nezanî û tevliheviyeke nebaş di ayendeyê de/pêşerojê de li hêviya gelê Kurd be*."[296] Ji aliyê perwerdeyê de kurd paş de diman, cînarên wan pêşde diçûn. Ramazan Balcı wiha dibêje; "*Dema îlankirina Fermana Islahatê de bi alikariya Dewleta Emerîka bi sedan dibistan ji ermenan re vekiribûn. Bi saya vê perwerdeyê ermen pêşde çubûn kurd jî paşde mabûn*."[297] Bedîuzeman wek rêvebir û serokên kurdan yên ji osmaniyan xwestinên madî û rojane dixwestin nebû, wî dizanî ku xilasbûna Netewa Kurd bi guherînên radîkal dê çêbe ew jî tenê dikare bi perwerdehiyê çareser bibe. Çawa ku Metin Aktaş jî dibêje; " *ji aliyekî zorbetiya desthilatdarên osmaniyan ji aliyê din di herêma Kurdistanê de ew axa û beg û şêxên pişta xwe dabûne Dewleta Osmanî û zilm li gel dikin. Wî dixwest li hemberî van neyêniyan tev bi projeya Medresetuzehrayê pêşeroja Gelê Kurd xilas bike*."[298]

M. Alî Bulut wiha dibêje; *Bedîuzeman dixwest xîreta xwe ji bo qewmê xwe serf bike, qesta wî ew zanistên erênî yanî ulumi cedîdeyê bîne Kurdistanê. Di dawiya serdema osmaniyan de her milletek ji xwe re li riyekî digeriya, Bedîuzeman jî dixwest ji Milletê Kurd re rêya zanistê û şaristaniyê veke. Ya di nesîbbûna şaristaniyê de gava yekem azadî ye, gava duyem jî perwerde ye. Ya ku Bedîuzeman û hempayên wî ji hev cuda dike girîngiya dayîna perwerdeyê û azadiya şexsî ye. Perwerde û ronakbîrî nebe pêşdeçûn jî nabe."*[299] Bedîuzeman dixwest bi rêya şaristanî û perwerdeyê di nava Gelê Kurd de guherîneke şaristanî çêke. Metin Aktaş jî dibêje; "*Di Rojhilatanavîn de kesên bi darê zorê dibin desthilatdar ancax bi darê zorê diçin*."[300] Bedîuzeman dixwaze bi taybetî di nava Gelê Kurd de paşê jî di nava gelên Rojhilatanavîn de bi projeya Medresetuzehrayê, di şûna zorbetiyê de guherînên şaristanî çêbibin.

---

[296] Demîr, *h.b.*,105.

[297] Balcı, "Medresetüzzehranın Tarihsel Kimliği Üzerinde Bir Araştırma Denemesi" *Bedîuzeman Seîd Seîdê Nursî 'nin Eğitim Felsefesî Medresetuzehra,* Merak Yayınları, Ankara 2013, 481.

[298] Metin Aktaş, "Said-i Kurdi Kürtlerin Gandisi", *Kovarabîr*, Hejmar 8, Zivistan, Stenbol, 2008, 108-109.

[299] M.Alî Bulut, "Medresetüzzehraya İhtiyaç Duyulan Şartlar", *Bedîuzeman Seîdê Seîdê Nursî Felsefesî Medresetuzehra*, Merak Yayınları, Ankara 2013, 680-681.

[300] Aktaş, *h.b.*,108-109.

Bedîuzeman Seîdê Kurdî jî dixwaze qenciyên Meşrûtiyetê di nava gel de bên zanîn. Di vî warî de Abdülkadir Menek wiha dibêje; "*Bedîuzeman dixwest berjewendiyên Meşrûtiyetê û rindiyên azadiyê bi Gelê Kurd bide zanîn.*"[301]

Osman Tunç wiha dibêje; *Divê bi tenê ji aliyê çand û civakî ve li projeya Medresetuzehrayê neyê nêrîn. Ev proje ji bo bextewarî, aşitya gel jî projeyeke polîtîk û stratejîk e.*[302]

Armanceke projeya Medresetuzehrayê ew e ku nijadperestiyê di nava Gelê Misilman de îzole bike, di navbera gelan de aştiyeke mayînde çêbike. Lewra divê nijadperestî milletên misilman ên Erebistan, Hindîstan, Îran, Qafkas, Tirkîstan û Kurdistanê ifsad neke. Funûnê felsefeyê û ya dînî divê aşitiyê bi hev re bikin. Şaristaniya Ewropayê bila rastiniyên misilmantiyê re musalaha bikin. Û di Anadoluyê de bila ehlê mekteb û medreseyan ji hev re bibin alîkar û yekitiya xwe çêbikin.[303]

Di serdema ku Bedîuzeman li Stenbolê bû ji bo pêşeroja Kurdan du armancê wî hebûn. Di vî warî de Bedîuzeman Seîdê Kurdî wiha dibêje; "*Ev serê panzdeh salan e ku min di nav îhtiyacên xwe de, ji xwe re, du hedef kiribûn armanc. Min ji xeynî van her duyan, tu navgîneke dahatûya Kurdistanê temîn bike, nedît*."[304]

Yekemîn; "Yekbûna neteweyî" ku çareseriya van nexwaşiyan di perwerdehiyê de dibîne. Duyemîn; "*Ew e ku tevî wan ilmên/zanînên dînî, ew fenên lazim ên dewr û serdema me, li her aliyî ve bên perwerdekirin*"[305] Lewra bi nêrîna wî perwerdehî dê coş û kelecana kurdan cardin derxe holê. Seîdê Kurdî wiha dibêje; "*ku roniya hîndekarî û perwerdehiyê, tevî wê hêza germ a kurdan zindî bibe*."[306]

Armanca wî ew bû ku Medresetuzehrayê bi taybetî ji bo Gelê Kurd, bi gelemperî jî ji bo pirsgirêkên misilmanan girîng bû. Hinek ji ber wan sedeman Bedîuzeman di Xutbeya Şamê a Mizgefta Emewiyan de wiha pêşkêşî civateke gewre dike.

[301] Menek, *h.g.*, 510.
[302] Tunç, *h.b.*, 196.
[303] Nursi, *Emîrdağ Lahîkası*, 450.
[304] Kurdî, "Kurd Muhtacî Çi ne?", *Dersên Civakî*, 363.
[305] Seîdê Kurdî, *h.b.*, 363.
[306] Kurdî, *h.b.*, 363.

Yekem: Di nav me de hêşînbûn û vejîna bêhêvîtiyê bê rakirin.

Duyem: Di jiyana civakî û ya sîyasî de mirina rastiyê bê sererastkirin.

Sêyem: Ji neyartiyê re hezkirin were tedawîkirin.

Çarem: Nezanîna bi wan hevgirtinên nûranî ku ehlê îmanê bi hev ve girê didin were sererastkirin.

Pêncem: Îstibdada/despotiya ku mîna nexweşiyên cure bi cure yên mîna sarî/şofî belav dikin bêne betalkirin.

Şeşem: Di nava hîmmetê de xwe bi berjewendiyên şexsî ve girêdan ji holê were rakirin.[307]

Ger Medresetuzehra bigêhêje armanca xwe dê ev nexweşî tedawî bibin, him gelê Kurd him jî misilmanên din dê xilas bibin. Bedîuzeman Seîdê Kurdî wiha dibêje; "*ji neyartiyê re hez kirin*.[308]" Dema ev nexweşî di nav eşîrên kurdan de rabe, heke kurd ji netewa xwe hez bikin ew ê jî wek miletên din di dinyayê de di rêzdariyê de cih bigirin. Aşitiyek di nava Gelê Kurd de çêbibe û di nava wan de yekitiyek û bextewariyek hebe ew ê bandorê bide tevaya Rojhilatanavîn. Herêma Kurdistanê di navenda Rojhilatanavîn de bi wasiteya projeya Medresetuzehrayê wê bibe sedema aşitî û aramiyê. Abdülkadir Menek jî armanca Medresetuzehrayê wiha tîne zimên; "*armanceke Medresetuzehrayê ew e ku di Rojhilatanavîn û di alema mirovahiyê de dê bibe sedema aşitiyê*."[309]

Di nava millet de bêxîretî, sefahet, bêhêvîtî û bi şuxilên beredayî re mijûlbûn wek nexweşiyekê derketibû ku Bedîuzeman dixwest bi Medresetuzehrayê wan tedawî bike. Her milletek hest û qabiliyetên wan cuda cuda ne, gava ew bên geşedan, wê çaxê dê bigihêje aramanca xwe. Bedîuzeman dibêje; "*Ew edetên millî ku ji bo her qewmî, qudreta esîl a hebûnê ne û li gor wî zimanê neteweyî û li gor qabiliyeta fikran divê dest bi teşebbusan bike.*"[310]

Bedîuzeman Medresetuzehrayê ji pirsgirêkên sedsalane re wek reçete dibîne û ji bo civateke nû perwerde bike wê projeyê dişopîne.

[307] Kurdî, "Xutbeya Şamê", *Dersên Civakî*, , 41.
[308] Kurdî, *h.b.*, 41.
[309] Menek, *h.b.*, r. 511.
[310] Kurdî, "Nutuq", *Dersên Civakî*, 25.

Armanceke Medresetuzehrayê ew bû ku “*Doktîrîneke perwerdeyê ye ku ew ê neslekî cedîd têde perwerde bibe û di pêşerojê de civakê bihev re bimeyine.*”[311] Lewra di medreseyan de bi pergaleke kevneşopî û hin nexweşiyên sed salane perwerde dihate kirin. Çawa di aliyê siyasî, aborî, civakî, exlaqî û perwerdehiyê de kêmasî gelek hebûn, bandorên nerênî ên li ser civakê di mederseyan de jî xwe nîşan dida. Ji pergalên demode û rizî zor bû mirovên saxlem derketana. Metin Aktaş dibêje; “*fikreke Bedîuzeman jî ew bû; kesên bi rihê desthilatdaran perwerde bibe bi wan kesan pergaleke nû, ji bo civakê jî jiyaneke nû ne mumkun e.*”[312]

Armanceke Seîdê Kurdî jî ew e ku rikdariya di navbera ehlê medresê û ehlê dibistanê de ji holê rabe. Ew wiha dibêje; “Divê ku têde fenên nû, bi ilmên medereseyê re bên kelijandin.” Ji bo çi tiştekî wiha dixwaze? “Ji sefseteya ku ji ber çar qiyasên fasîd hasil bûye, xelaskirina muhekemaya zihnê û îzalekirina xeletiyên ku melekeya feylesofî, li şopdarên zarokî dike.” Di berdewema vê gotinê de xwestina xwe tam zelal dike û çareseriyê dibêje; “*Ronahiya wijdanê, ilmên dînî ne, fenên medenî ne. Bi hevkelijandina herduyan rastî dertê holê. Bi wan herdu aliyan xîreta xwendevanan dubaskî dibe. Heke nebe ji ya pêşî hişkebawerî; ji ya duduyan, hîle û guman dertên.*”[313] Bedîuzzeman dixwaze yekitiya dil û hiş çêbe û dixwaze xwendevan du baskî bibin. Lewra her du bask ji hev biqetin dê bê pergalî çêbe û wê demê yekitiya wîjdan, ruh, çand û yeknetewîtî jî çênabe. Bedîuzeman ji bo xilasbûna gelên misilman pêwîstiya zanistên fenê û kirinên hişane dibîne û herwiha gotina wî “*Ji ber wê yekê, di ayendeyê de ku dê aqil, ilim û fen têde hikum bike*”[314] girîng e.

Serdema Bedîuzeman têde jiyaye gorî medreseyan mekteb nûjen vedibûn û derketibûn pêş. Di gelek cihên osmaniyan de di navbera ehlê medrese û mektebiyan de dijberîtî hebû. Lewra gotinên Bedîuzeman bihata şûnê wê di navbera mekteb û medreseyan de wê demê mirovên baş bigihiştana, lê belê saziyên dewletê de hemberî nûjen kirina medreseyan berxwedaneke dijberî nîşan da û ev proje negihişte armanca xwe. Lewra ne tenê di serdema osmaniyan de di serdema Komara Nû de jî kêlijandinek çênebû û di aliyê perwerdeyê vê pirsgirêkê berdewam kir. Di dema Komara Nû de di perwerdeyê de serkeftinek wisa balkêş çênebûye. Di dema

---

[311] Akgün, *h.b.*, 414.
[312] Aktaş, *h.b.*, 110.
[313] Kurdî, *“*Munazarat*”, Dersên Civakî*, 134-135.
[314] Kurdî, *“*Xutbeya Şamê*”, Dersên Civakî*, 44.

osmaniyan de, di perwerdeyê de zêdeyî dijberîtiya zanistên nûjen hebû, serdema Komara Nû de jî dijberîtiya ilmên dînî hebû. Di herdu deman de zanistên fenî û dîni bi hev re nehatine pevxistin. Çareya wê, di projeya Medresetuzehrayê de heye. Tişta ji medreseyan re pêwîst e ilmên dînî û zanistî ye, lê mederse bibûn cihê gengeşiyên meseleyên dijberî û Îsrailiyatan. Xebatên zanistî zêdetir, zanistên teqlîdî bandor dabû ser mederseyan. Seîdê Kurdî wiha dibêje; "*Bila ew ên zahirperest pê bawer bin, xebata wan vala ye. Hetanî niha bi sefseteyên awamperestane em nezan hîştin. He jî hez dikin me nezan bihêlin ku ji nezaniya me îstifade bikin. Nebûye û nabe jî; lewra divê mederse dîsa jiyandar bin*."[315]

Armancên Medresetuzehrayê, Gurbuz Aksoy di çend xalan de şîrove dike:

- Medresetuzehra, dê cehaleta gelemperî rake, kesên zana têbigihîne.
- Dê çanda herêmî û gelemperî/cîhanî nêzî hev bike.
- Dê mirovên pozîtif difikirin û ew ên asoya wan berfireh bên perwerdekirin.
- Di perwerdeyê de dê pergalî bê sazkirin.
- Perwerde divê bigihije her derê.
- Divê hawirdoreke azad ji bo perwerdehiyê çêbibe.
- Vîzyona vê zanîngehê ew e ku projeyên navnetewî yên zanistî amade bike.
- Ew ê bawernameyên ku di qada navnetewî de bên pejirandin bide.
- Dê girîngiyê bide hevbeşiyê.
- Ji aliyê ziman ve; dê zimanê zanistê yê fermî û heremî bi hev re di perwerdeyê de bi kar bîne.
- Bi wesîleya Medresetuzehrayê dê çandeke bikalîte geş bibe.
- Weke vîzyon; hiş bi alîkariya wijdan, dê bibe xwediyê perwerdeyeke navnetewî, zanîngeheke wisa dê bê saz kirin.[316]

Armanceke wî jî ew bû ku bi projeya Medresetuzehrayê pêşeroja alim, rewşenbîr, zanyar û ronakbirên kurdan hilde bin garantiyê ku ew jî dê bi Medresetuzehrayê çareser bibe. Bedîuzeman dixwest ku ayendeya Gelê Kurd û

[315] Nursî, *Muhekemat*, 45.
[316] Gürbüz Aksoy, "Türk-Kürt Birlikteliği Çevresinde Medresetüzzehra", *Münazarat Konferansı*, 215-217.

alimên Gelê Kurd temîn bike. Di navbera, misilmanan de nijadperestî çênebe û herkes bi zimanê xwe perwerde bibe. Ya din jî dixwest zimanê xwe kurdî wek zimanên gelên din bi wesîleya Medresetuzehrayê bixe zanîngehan û kurdî wek zimanekî akademîk cihê xwe bigre.

"*Ev medrese, çawa ku dê bi nîşandana encamên baş bi ronîkirina giştî û bi xizmetkirina ji Îslamê re li bal hişmendan bibe dibistaneke herî kemilî, di çavê wijdanan de jî, dê nûnertiya zawiyeyeke herî pîroz bike. Çawa ku mederse ye, ji ber ku wisa jî dibistan û tekya ye, nezir û sedeqeyên ku alîkariya netewî ya Îslamê ne, dê qismek jê, ber pê ve biçe.*"[317]

Li gorî me ya herî giring ev fikra Seîdê Kurdî ji bo Medresetuzehrayê di derbarê perwerdeyê de dixwaze bi wesitaya medreseyê maarîfê bixe Kurdistanê. Bedîuzeman Seîdê Kurdî wiha dibêje; "Bi kurtebêjî divê di ayendeyê de alimên kurdan were temînkirin û bi riya medreseyê, fen û zanistên dînî bikevin Kurdistanê û li Kurdistanê ev zanist werin belavkirin. Û xweşiyên Meşrûtiyetê ji wan re jî bête dayin û ew jî bikaribin jê sûd bigrin."[318] Bi yekitiya dîn û fenê wê fikr û ramanên azad derkeve holê. Bi alikariya fikr û ramanên azad aqil û wijdan yê kesayetiyên serkeftî û azad mezûn bide. Di vê modelê de mirovên xweyî îdeal dê bigihêjin. Di wir de dê perwerdeyeke zanistî hebe, îdeolojî, slogan û cudatî hwd. tunebe.[319] Çareya bêtifaqî, bêhevitî û neheqiyên desthilatdaran ancax bi projeya Medresetuzehrayê dê bê çareserkirin. Bi sed salan e ku kurd ji her alî ve parave mane, armancek jî ew e ku kurd bigihijin heqên xwe. Bedîuzeman dîsa wiha dewam dike: "*Bi vî awayî kurd, hem dê edaletê heq bikin hem jî dê ji medeniyetê re musaîd bibin û dê cewherê xwe yê fitrî nîşan bidin*."[320] Bedîuzeman hevîdar e dê bi projeya Medresetuzehrayê bi her alî ve derman bike. Dê eşîrên kurdan bi mantiqeke leşkerî bi rêkûpêk perwerde bike. Lê belê şupheyên wî di derbarê desthilatdaran de hene.

"*Ew hîndekarî û perwerdehiya ku wê qesra yeîkîtî/tifaqê û hevgirtinê ronahî dike yan jî, ew zanistên ku ji bo jiyana gelan, mînake wê xwîna ku reh û demaran de digere û weke kana/kaniya vê gaza hewayê ye, her yek ji wan alayiyên eşîran dê bibe*

---

[317] Seîdê Kurdî, "Munazarat*", Dersên Civakî*, 136

[318] Kurdî, b.n., 137

[319] Nurettîn Abut, "Bölgesel ve Eğitimsel Bir Eğitim Projesî Med-Zehra", *Seîdê Seîdê Nursî nin Eğitim Felsefesi Medresetüzzehra,* Merak Yayınları, Ankara 2012, 100-105.

[320] Molla Seîdê Meşhur, *h.b.*, 360.

*mîna medreseyeke zanistan û dê bibin mîna fabrîqeke mezin a sanayiyê ku mirov jê re hejmetkar dimîne. Hikumat, heke li gor qabiliyeta alayiyan, derseke baş a întîzamê bide, çiqas xweş û ya xwestinê ye wesselam*."[321]

Bi sed salan e ku di Kurdistanê de medreseyên qedîmî hene lê belê xwe nûjen nekirine. Bedîuzeman bi riya projeya Medresetuzehrayê dixwaze pêşeroja Kurdistanê nûjen bike. Bedîuzeman Seîdê Kurdî wiha dibêje; "*Li van cihan jî, ew ilmê ku ji qedîmî zeman ve ye di medreseyan de tê xwendin û pêre jî ilmê fenê yê dewra me divê bê hînkirin. Ji xeynî van, îhyakirina hin medreseyên din jî, bêguman dê bibe wesîle ku heyata maddî û manewî ya rojên pêş a Kurdistanê, temîn bike*."[322] Medreseyên qedîmî li Kurdistanê hebûn lê belê li gorî nêrîna Bedîuzeman di bingehên wan de kêmasî hebûn. "*Bi vî awayî, dê xîm û bingeha marîfetan bê danîn*."[323]

Bedîuzeman dixwest Medrese û Mekteb bi zanistên dînî û fenî bi hev re bên zeliqandin. Ji bo vê meczê xebateke girîng dike. Dema her du zanistên dînî û fennî tev bên xwendin wê demê rastî dê derkeve holê û dê pêşeroja kurdan ronî bike. Ew nexweşiyên di nava millet de; durûtî çevnebarî, xurefe û hwd. dê tedawî bibin. Bedîuzeman Seîdê Kurdî wiha dibêje; "*Ronahiya wijdanê, ilmên dînî ne. Nûra aqil/hiş, fenên medenî/şareza ne. Bi hevkelijandina herduyan, rastînî derdikeve holê. Bi wan her du aliyan xîreta xwendevanan bi per û bask dibe. Gava ku ji hevdu veqetin, ji ya pêşî hişkebawerî/teessub; ji ya duduyan, konetî/bîlaşibhe dertê*."[324]

Medrese gelek ji armancên xwe dûr ketibûn. Bedîuzeman dixwest medreseyan nûjen bike û projeya Medresetuzehrayê ji bo yekitî, bextewarî û leşkeriyeke ku kurd pê serfiraz bibin pêwîst dibine û dibêje; "*Yekemîn çareya vê ev e ku ew cihên wan alayiyên eşîran û ew deriyê bala yê leşkeriyê, bi dibistan û perwerdeyan bê tijîkirin û ev medreseyên ku ji bo wan, weke kaniya bextewariyê ne; lê mixabin ku ji nava wan hatine rakirin, careke din, divê werin zindîkirin û tevî*

[321] Molla Seîdê Meşhur, *h.b.*, 360.
[322] Molla Seîdê Meşhur, *h.b.*, 360.
[323] Molla Seîdê Meşhur, *h.b.*, 360.
[324] Seîdê Kurdî, *"*Munazarat*",Dersên Civakî*, 135.

*ilmên dînî, ew zanistên nûjen ên ku lazim in, bi destê wan alimên kurd, bi dersekê werin dayîn.*"[325]

Bedîuzeman "Medrese di nava ramanên skolastizmê de noq bûye, divê cardin rabe ser piyan, ew xebatên neql, şerh, xaşiye xilas bike. Rêke eqil, nûjen, hereketeke tecdîdî bi wasiteya Medresetuzehrayê çareser bike."[326]

Bedîuzeman bi vê projeyê dixwaze "aqil û neqil", dîn û zanistî", "medrese-mekteb û tekkeyê" bigihîne hev, dijberîtiyê di nav wan de rake da ku hêzê bidine hev û sînerjiyek çêbibe.[327]

Armanceke Medresetuzehrayê ya sereke ew e; nijadpersetiya ku di navbera misilmanan de ya di serdema Emewiyan de dest pê kiriye û hetanî niha hatiye rake û wê nexweşiyê tedawî bike. Lewra vê nijadperestiyê zirarek mezin daye netewên Rojhilata Navîn. Gelê kurd di nava çar dewletên misilman de gelek caran rastî nijatperestiyê hatiye, hêvî heye ku Medresetuzehra ji wan re bibe çare. Piştî hilweşandina Dewleta Osmanî, Dewleta Tirkiye li ser xîmê nijadperestiyê hatiye avakirin, ji bilî milletê tirk tu milet nehatiye pejirandin. Çiqas taybetiyên gelê din hebûne yan rakiriye yan jî hatiye tepisandin. Bedîuzeman jî ev rewşa tunekirina miletê kurd dîtiye û ji bo çareseriyê projeya Medresetuzehrayê dixwest bi rêvebiran bide qebûlkirin. Bedîûzeman çawa di Medresetuzehrayê de pirzimanî; erebî, kurdî û tirkî dixwest wisa jî di nava dewletê de pirmiletî jî dixwest. Ne tênê di navbera misilmanan de, bi cînarê kurdan yên qedîm ermenan re jî dostanî û aşitî dixwest. Bedîuzeman Seîdê Kurdî wiha dibêje "*Bi awayekî qet'î ji we re dibêjim ku bextewarî û selametiya vî memleketî, bi hevgirtin û dostbûna bi ermeniyan ve girêdayî ye; lê belê ne dostaniyeke ku we bixe zelîliyê; belkî digel muhefezekirina îzeta netewî, dirêjkirina destê aştiyê ye.*"[328] Projeya Medresetuzehrayê pirrengî, pirzimanî û pirmiletî û pirdengiyê dihewîne. Medrestuzehra dê bibe dermanê nexweşiya nijadperstiyê ya ku misilmanan îfsad dike. Pirsgirêkên ku îro têne serê mirovahiyê yên heremî, netewî û navnetewî, bi feraseta Medresetuzehrayê dê çareser bibe.

---

[325] Kurdî, "Kurd Muhtacî Çi ne?", *Dersên Civakî,* 363.
[326] Mehmet Îpçîoğlu, "Medresetzzehranın Tarihsel İzdüşümü" *Seîdê Seîdê Nursî 'nîn Eğîtîm Felsefesî Medersetuzzehra*, Merak Yayınları, Ankara 2013, 43.
[327] Zübeyr Akçe, "Medresetüzzehra İhtiyacının Tarihsel Kökleri" *Seîdê Seîdê Nursî ' nîn Eğîtîm Felsefesî Medersetuzzehra*, Merak Yayınları, Ankara 2013, 61.
[328] Seîdê Kurdî, "Munazarat*", Dersên Civakî*, 105.

Bedîuzeman dixwaze fikir û ramanên Meşrûtiyetê bi wasiteya Medresetuzehrayê bikeve nava Milletê Kurd, lewra di nava millet de; çi tişt ji aliyê Ewropayê ve were jêre dijberiyek hebû. Dema Meşrûtiyet di nava gel de bingeh girt wê demê pêşdeçûn û geşedana Milletê Kurd dê hêsan bibûya. Seîdê Kurdî wiha dibêje: "Divê ji bo belavkirina xweşiyên Meşrûtiyetê, deriyek bê vekirin. Belê, li ba kurdan, qesteke ku Meşrûtiyet pê biêşe bibe tune; lê belê heke ev kirin xweş neyên dîtin, sûd jê nayê girtin. Ew jî bêhtir bi zirar e. Nexweş, gava zen bike ku derman bi jehrî ye, helbet wî dermanî bi kar nayne."[329] Bedîuzeman dema bi Siltan Reşat re derdikeve seyehata Balkanan ji projeya Medresetuzehrayê re wî îqna dike. Serdar Şengul wiha dibêje; "*di vê projeyê de tişta ku mirov jêre baldar be ew e: di vê projeya perwerdehiyê de "rêvebirî, jiyana civakî û feraseta dînî pêwîst e bi hev re be girtin*."[330]

Bedîuzeman wek muxatab rêvebiran, xawasan û elîtê dewletê, bi taybetî rêvebirên Îttihad Terakiyê digire, dixwaze pirsgirêka herî girîng di derbarê Medresetuzehrayê de agahdar bike. "Li hemberî; hikumat û giregiran û Îttihada Terakiyê, pirsgirêkek min a girîng heye." Belê Mele Seîdê Kurdî di vê pirtûka Munazeratê de pêşiyê bi eşîrên kurdan re paşê jî esil mûxatab/birêvebiran re diaxive û gazî wan dike. "Em" "ewam/gel" û "ehlê medreseyan" ji we mafên xwe dixwazin.

Di van gotinên Bedîuzeman de gilî û gazinde hene lewra texmîn dike ku ew ê dîsa wî guhdar nekin, daxwazên wî paşve biavêjin, bi dilsarî lê nêzîk bin yan jî dê li gorî kêfa xwe bikin. Dîsa dibêje; "*Em ji we dixwazin ku kirinên we bila gotinên we tesdîq bikin. Qusûrên kesên din, ji xwe re nekin uzir û kar û xebatan paş de neavêjin. Xizmetkirina ji me re ya ku; li ser we wacib e, di wê de bêxîretiyê nekin*."[331] "*Perçeyek kêfa xwe terk bikin, kêfa me bipirsin!*"[332] Ew ji dilsarî û dijberîtiya rêvebiran gilîdar e, bi caran ev daxwaz ceribandiye lê nehatiye şûnê.

Seîdê Kurdî di xîtaba xwe ya ji mebûsan re kiriye de wiha dibêje; "*Xweşmêriya hetanî niha bi çek û şûran xwe nîşan dida lê mirovahî êdî bi hişmendî û*

---

[329] Kurdî, *b.n.*, 137.
[330] Şengül, *h.b*., 211.
[331] Seîdê Kurdî, "Munazarat*", Dersên Civakî*, 133-134.
[332] Kurdî, *h.b*., 134.

*funûnê xwe nîşan dide.*"[333] Lewra çareserî bi projeya Medresetuzehrayê dibîne, bi pêwistiya kurdayetiya xwe, dixwaze rêvebirên dewletê îqna bike.

Bedîuzeman wek rewşenbîr, alim û zanyarekî Kurd astengiyên pêşiya Medresetuzehrayê tehlîl dike, nexweşiyên kesane an jî yên civakî li dijî perwerdehiya nûjen dibîne. Kirinên Gelê Kurd dibîne ku ew ji xwendinê zêdetir meyla wan ser aliyê çekan de berdewam dikir. Dema perwerdehî kêm bû di navbera wan de jî îxtilaf derdiketin. Dijminên Gelê Kurd ji van îxtilafên wan tehrîk dikirin û di nav de berjiwendiyên xwe pêşde dibirin. Bedîuzeman jî ev kêmasî didîtin, wek çareseriyekê wiha digot; "*Ji ber ku ez kurd im ez dê li ser kurdan tiştekî du tiştan bibêjim. kurdên me, ji wan xet û nivîsên li ser şûrên xwe hînî perwerdehiya zanînan bûne. Ji ber çar sedeman, ji hîndekarî û perwerdeya nûjen vediciniqin.*"[334] Hin Îsraîliyat û xurafe bi çavê awam, ji wan werê jî ew ji misilmantiyê tên. Ya din jî tiştên fenî ber çavê gel bi teqlîdî ye ew jî hemberî perwerdeyê mirovan ditirsîne. Bedîuzeman astengiya di hişê kurdan de ya li hemberî perwerdehiyê bi çar xalan rêz dike:

1- **"**Hin meseleyên fenî hene ku ew, bi hinek ji wan çîrok û teşbîhat û Îsraîliyatên ku hinek ji mirovên awam, bi awayekî teqlîdî û xetayî, ew weke eqîde û heqîqet û ji Îslamiyetê fêm kirine re li hev nakin."[335] Hin kesên ku di derbarê dîn de ketine dafikên şek û şupheyan, ew gotin û kirinên gel ew ji aliyê perwerdehiyê de dilsar kirine.

2- "Ew e ku hin ji ehlê fenê û ehlê mektebê, hema wisan bi ser de çavê xwe li wan heqîqetan gerandiye û bi awayekî teqlîdî, ji aliyê zahirî ve hînî çend tiştên dînî bûne û bi eqîdeyeke zarokiyane, didin ber wê fîlozofiya xwe ya ku ji wan ilmên fenê hîn bûne û muhakeme dikin û bi wî awayî ketine dafika wê kemîna şik û gumanan."[336] Kurd çavkaniya bi herî fezîlet û başiyê di medreseyan dibînin. Û ew wisa difikirin ku perwerdeya fenê û perwerdeya nûjen dê bitenê wan xirab bike. Ji vê projeyê re tu pêwîstiyê nabînin.

---

333 Seîdê Kurdî, "Xîtaba Bedîuzzeman Seîdê Seîdê Kurdî ya Li Meb'ûsan" *Kurd Teawun we Tereqqî Gazetesi*. Hejmar: 4, Rûpel: 29-30, 13 Kanûna Ewil 1324, 26 Berçile/Berfanbar 1908, 374.
334 Kurdî, *h.b.*, 374.
335 Kurdî, *h.b.*, 374.
336 Seîdê Kurdî, *h.b.*, 374.

3-“Ew awa û rêbaz in ku ne mîna awayê wan medreseyên ku ew (kurd) ji xwe re (wan medreseyan) weke kana her kemalî dizanin.”[337] Di alema misilmanan de û bi taybetî di nava kurdan de çi tişta ji aliyê ecnebiyan bihata, wan digotin qey zirarê wê ji dîn re heye.

4- “Ew e ku ew fen, ji aliyê xwe yê zahirî ve ji wan welatên biyanî/ecnebî tên.”[338] Ji bo tirsa kurdan ji ilmên nûjen bişkê wek mînak di Alayiyên Hemîdî de xweşmêriya xwe dîtin. Projeya Medresetuzehrayê bi navê medreseyê, zanistên nûjen bixe nav kurdan û perwerdeya bi pergal bête pejirandin. Bedîuzeman ev nexewşî tesbît kiribûn û dixwest bi rêya pergala Medresetuzehrayê çareser bike.

Armanceke Medresetuzehraye ev e : “*Di alema mirovahiyê de bi taybetî pêşveçûna ilmên fenê bi bandora fenê lêkolîna rastiyan zêde bûye. Çiqas rasteqînî hebe ewqas ev nexweşiyên maddî û menewî yê kêm bibin. “Ji aliyê mahiyet û qabiliyetan de her tişt girêdayî ilmê ye.*”[339] Armanceke Medresetuzehrayê jî ew e ku pêşeroja hemû gelên Rojhilatanavîn hilde bin garantiye û di van mijaran de ehlê hemiyetê hişyar bike.

### 3.1.2.Teşebusên/Rahijên Avakirina Medresetuzehrayê

Teşebbusên/rahijên Mela Seîdê Kurdî ji bo avakirina Medresetuzehrayê, ji dema Dewleta Osmanî heta avakirina Komara Tirkiyeyê dewam kiriye. Di 1907ê Mijdarê de Bedîuzeman tê Stenbolê. Di vî warî de her çiqas bi daxwazname teşebusê Mabeyna Evdilhemîdê II. dike jî bersiva wî, timarxane û zindan e.

Di sala 5ê Gulana 1908an de Mela Seîdê Kurdî daxwaznameyekê dide rêvebirên demê, fikr û ramanên xwe yên di derbarê perwerdehiyê de binpê nekin beyan dike û di rojnameya Şark ve Kurdistanê de(2 Kanûn 1908) bi sernavê “*Kurd Dîsa Muhtac in*” diweşîne.[340] **(bnr. Pêvek-22)** Paşê ev daxwazname bi versiyoneke din, salek şûnde bi heman sernavî bi kurdî û tirkî di ”*Kurd Teawun we Tereqqî*

[337] Kurdî, *h.b.*, 374.
[338] Kurdî, *h.b.*, 374.
[339] Seîdê Nursî, Sözler, 450.
[340] Molla Seîdê Meşhur, “*Kurd Dîsa Muhtac ın”*, Şerq ve Kurdistan Gazetesî, Hejmar: 1, 19 Teşrîn-î Sanî 1324, 2 Berçile/Kanûna Ewil 1908, nql. *Dersên Civakî*, 359.

*Gazetesi"* de tê weşandin.[341] Armanca Seîdê Kurdî ya çûyina Stenbolê perwerdehî û guherîna medreseyan bû. Ji ber ku êdî medreseyan bersiva xwendevanan nedidan. Rê û rismên medreseyan demode bibûn, pergaleke wisa pêwîst bû ku him bersiva hiş him jî bersiva dil bida. Bedîuzeman Seîdê Kurdî hez dike di Kurdistanê de ji bo perwerdehiyê, seferberiyê bide destpêkirin. Bi wesîleya Darutalîm û Medresertuzehrayê di Kurdistanê de ji bo perwerdehiyê bingehekê çêbike. Di serdema Evdilhemîdê II de, li Kurdistanê hin dibistan vedibin. Lê belê bi zimanê tirkî perwerde dibûn û zarokên kurdan jî ew fêhm nedikirin. Ermen, tirk, ereb, faris di her alî de ji kurdan derbas dibûn û bêperwerdehiyê kêşmekêşiyek di nava kurdan de çêdikir. Bedîuzeman dixwest ev sedemên paramayîn û kêşmekêşî ji holê rabe û di nav eşîran de bi zimanê dayikê perwerdehî dest pê bike. "*Di vê cîhana medeniyetê de û di vê esra pêşveçûn û pêşbaziyê de, mîna birayên din, ji bo kurd jî bikaribin bigihîjin pêşveçûnan, bi xîreta hikumatê, li bajarok û gundên Kurdistanê, hin mekteb/dibistan bêne avakirin û vekirin. Ew zarokên ku bi zimanê tirkî dizanin, feyde dibînin û zarokên kurdan ji marîfet, ilim, hînbûn û perwerdehiyê mehrûm dimînin. Ji xeynî van, îhyakirina hin medreseyên din jî, bêguman dê bibe wesîle ku heyata madî û manewî ya rojên pêş a kurdan rizgar bike û dê pêşeroja wan temîn bike…*"[342] "

Di van dibistanan de bi kêm pêncî xwendevan pêwîst e û divê, aboriya wan jî ji aliyê hikumatê ve bê dayin. Ger ev xwestina wî neyê şûnê, dê di ayendeyê de xetereyên mezin li hemberî kurdan çêbibe. Ew jî ehlê dûrendîş gelekî daxdar dike.[343]

Di navbera Bedîuzeman Seîdê Kurdî û Wezîrê Karê Hundir Şefîk Paşa de hevdîtin çêdibe. Piştî van zehmetî û meşeqqetan li ser vê mijarê, nirxandin çêdibe. Lê belê tu encam dernakeve.[344] Piştî hevdîtina wan desthilatdaran, berê Bedîuzeman Seîdê Kurdî didin timarxane û zindanê.

Daxwaznameya ku di 1908an de Seîdê Kurdî pêşniyarî Dîwan-i Humayûnê kiriye mijara wê ew e; ji bo zarokên kurdan perwerdehiya seretayî, navendî/"darutalîmê" û projeya Medresetuzehrayê ye, lewra mijara vê daxwaznameyê Medresetuzehra tenê nîne.[345]

---

341 Seîdê Kurdî, "Meqaleyên Bedîuzeman", Dersên Civakî, 363.
342 Molla Seîdê Meşhur, "Kurd Dîsa Muhtac ın*", Dersên Civakî*, 359-360.
343 Molla Seîdê Meşhur, "Kurd Dîsa Muhtac ın*", Dersên Civakî*, 359.
344 Kurdî, "Dîwana Herba Urfî*", Dersên Civakî*, 174.
345 Badıllı, h.b., 147-148.

Naveroka Darutalîmê perwerdehiya bi zimanê kurdî ye li hemû erdnîgariya Kurdistanê de. Seîdê Kurdî ji bo van dibistanên/darultalîmên heremê hatine vekirin ji rêvebirên demê re spas dike, lê nerazîbûna xwe wiha jî tîne ziman: "*li bajarok û gundên Kurdistanê, hin mekteb/dibistan hatine avakirin û vekirin. Lê belê ji van mekteban, tenê ew zarokên ku bi zimanê tirkî dizanin, feyde dibînin. Zarokên kurdan ku bi zimanê tirkî nizanin, tenê wan medreseyên ku ciyê ilmê ne, weke ciyê kemilînan dibînin. Îca mialimên/mamosteyên wan jî, bi zimanê kurdî nizanin. Ji ber vê yekê, ev zarokên kurdan, ji marîfet, ilim, hînbûn û perwerdehiyê mehrûm dimînin.*"[346] Ew navendên qedîmî yên Seîdê Kurdî ji bo "Darutalîmê" pêşniyar dike ev der in: Yekem: li hêla Beytuşebabê ku ev der, navenda eşîrên Ertûşê ye, Duyem: di navbera Motkan, Balikan û Sasonê de, Sêyem: li Wanê ku ev der jî, di navbera Sîpkan û Heyderan de ye, bê avakirin.[347] Lewra ev cihên Seîdê Kurdî ji bo Darutalîmê dixwaze wek bajarok û gundên eşîran in, lê cihên ji bo Medresetuzehrayê dixwaze di Kurdistanê de bajarên qedîmî ne. Mirov wisa mulaheze dike bi Darutalîmê li gundan ber bi navenda bajaran seferberiya perwerdehiyê dest pê bike. Ji bo navendan projeya Medresetuzehrayê difikire.(Wan, Bedlîs, Diyarbekir)

Cudatiya dibistanên "Darultalîm" ê ji Medresetuzehrayê ev in:

Yekem: dibistanên Darutalîm ji bo biçûkên kurdan ji amadekarî seratayî, navendî pêk tên û zimanê wan jî xwerû kurdî ye.

Duyem: Pêşeroja zimanê kurdî bi wesîleya Darutalîmê dê bikeve bin garantiyê.

Sêyem: Ev dibistan dê di van esrên pêşbaziyê de li hemberî cînarên wan yê gelê kurd perwerde bike.

Çarem: Di Kurdistanê de yê bibe bingeha zanistên nûjen û di vî warî de dê Medresetuzehrayê îhya bike.

Pêncem: Di warê madî û menewî de dê metirsiyên pêşiya kurdan berteref bike.

---

[346] Seîdê Kurdî, H.g., 359.
[347] Kurdî, H.g., 359-360.

Şeşem: Him di navbera kurdan dê tifaq û aşitiyê, him jî di navbera kurd û cînarê wan de aşitiyekê pêk bîne.

Heftem: Bi wesîleya van qonaxan kurd ê cewherên xwe yên sirûştî di qada şaristaniyê de pêşniyar bikin.

Bedîuzzaman di sala 1911an de, bi serok, alim û gelê xwe re, fikr û ramanên xwe yên di derbarê perwerdehî û Medresetuzehrayê de parve dike. Ew nêrînên ku wî ji gelê xwe re parve kirine, cara yekem di pirtûka wî “Munazerat”ê de cih girtine. [348] Ji bo ku daxwazên wî bêne cih, cara duyem diçe Stenbolê û bi lijneya Siltan Reşat re diçe seyahata Rûmeliyê. Li vê dere beşdarî merasîma darulfûnuna Kosovayê dibe. Piştî merasîmê bi Siltan Reşat re diaxive û ji bo projeya Medersetuzehrayê wî îkna dike. Dîsa vedigere Wanê, ji bo projeya Medresetuzehrayê, bi hinek aliman re, di 1ê Îlonê 1912an de daxwaznameyekê pêşniyarî Walîtiya Wanê dike.[349]**(bnr. Pêvek-23)** Walîtiya Wanê wê daxwaznameyê, hewaleyî Nezareta Hundir dike û Nezaret, di 6ê Pûşpera/Hezîran 1913an de wê daxwaznameyê dibersivîne. Bersivek erênî dide û dibêje ev piroje bira binavê “Medreseya Aliyeyê Reşadiye” were vekirin. Ev biryara erênî waliyê Wanê Tehsin Paşa kêfxweş dike û ji bo alîkariya aboriyê Nezareta Hundir re telgrafekê dişîne. [350] **(bnr. Pêvek-24)**

Ji aliyekî dinve jî xebatên Ebdurrezaq Bedirxan dibe sedemên lezgîniya Tehsîn Paşa di vî warî de. Ebdurrezaq Bedirxan di nav kurdên Xoyê de, ji bo ku xwendewarî belav bibe, dibistanekî vedike; rojname û kovareke bi zimane kurdî derdixe, alfabeya kurdî sererast dike. Ji bo ku xortên kurdan, bi armanca xwendinê bişîne Rusyayê[351] di sala 1913an de, bi alîkariya Waliyê Xoyê Emîr Emced, nameyekê ji Tebrizê re dişîne ku ew name li ser “netirsiya kurdan ji dewleta Faris” bûye. Di nameyê de dixwest ku çavdêriya hemû hoste û karkerên ku di karên avabûna dibistanê de dixebitin, bê kirin.[352] Ev dibistan bi alîkariya fransiyan tê avakirin. Berî vekirina dibistanê nimêj tê kirin; mela û cemaet ji bo cih anîna vî karî

---

[348] Seîd Kurdî, “Munazarat”, *Dersên Civakî*, 134.
[349] BEO (Başbakanlık Osmanlı Arşivi), DH. İD, 84/20.2013
[350] BEO, 4191.314292.02
[351] Celîlê Celîl, *Jiyana Rewşenbirî û Siyasî ya Kurda*, Weşenxaneya Jîna Nûrûp, Uppsala,1985, r. 137
[352] Celîlê Celîl, *h.b.*,140.

û ji bo ku Xweda ev nîmet daye wan, zarokên kurdan ku perwerde bibin û dîn û diyaneta xwe nas bikin spasî, hemd û senayên xwe ji Xwedê re pêşkêş dikin.[353]

Ev dibistana Xoy wek dibistanên Ewropayî xwediyê naverokeke dewlemend bûye û di vê dibistanê de dersên weke dîrok, matematik, coxrafya û meşandina dar û dezgehan (rêvebiriya karmendiyê) di dewleta Rusyayê de dihate xwendin. Ji bo ku zarok hinî hinek pîşeyan bibin, beşên pîşeyên wekî; xeretxane, hesinkarî, terzîtî û çêkirina çekan(çeksazî) tê de hatibûn vekirin û hemû tedarik û aletên hewcedariyê jî, ji bo wan hatibûn amade kirin.[354] Vebûna dibistanê, eleqeyeke mezin di nav kurdan de dîtiye, dengvedaneke wisa berfireh daye ku ev weke buyereke balkêş ketiye nav rojnameyên tirk û ermeniyan û ev jî bûye tirs û ketiye dilê rêvebirên wan dewletan.[355]

Ji ber tirs û endîşeya vekirina vê dibistanê, Waliyê Wanê Tehsîn Paşa, nameyekê ji Babê Alî re rêdike ku têde behsa tehlîkeyan dike, ya yekem; behsa Şîîtiyê kiriye û bal kişandiye bandora xeternak a Îran û Ûris ya li ser kurdên li nav tixubên osmaniyan, ya duyem jî ew e ku li gorî rêvebirên osmaniyan; Ebdurrezaq Bedirxan, bi xebatên xwe yên berfirehkirina xwendinê û vekirina dibistanan ve dixwaze Kurdistaneke serbixwe ava bike. Pêwîst e, ji bo ku berê gelê kurd nekeve aliyê Ebdurrezaq, Îran û Ûris ve, divê bi lezgînî Darulfunûneke Îslamî/Medresetuzehra bê vekirin.[356] **(bnr. Pêvek: 25)**

Walî Tehsîn Paşa, telgrafeke din dişîne û Wezereta Hundir pê agahdar dikeû diyar dike bi avakirina darulfununê/Medresetuzehrayê ji bo alimên kurdan çiqas girîng e û ji bo mesrefa aboriya wê projeyê çi divê[357]. **(bnr. Pêvek:26)** Bersîvdayîna vê telgrafê dereng dikeve. Waliyê Wanê Tehsîn Paşa xemgîniya xwe û ya gel tîne ziman.[358]**(bnr. Pêvek:27)** Bersîva ku tê dayîn û daxwaznameya Waliyê Wanê bi telgrafeke ji aliyê Wezîrê Hundir Talat Paşa ve tê erêkirin. Telgrafê, behsa sedemên

---

[353] Celîlê Celîl, *h.b.*, 142.
[354] Celîlê Celîl, *h.b.*,143.
[355] Celîlê Celîl, *h.b.*, 144.
[356] BEO, 4184.313747.02
[357] BEO, 86.8.6
[358] Ahmet Akgündüz, Arşiv Belgeleri Işiğinda, B.S. Seîdê Nursî , cilt l., r. 834 İmak Ofset, İstanbul 2013, BOA (Başbakanlık Osmanlı Arşivi), DH.İD,1331-1329/1913

erêkirina projeya darulfununê, xebatên Ebdurezaq Bedirxan û Smaîl Axa kiriye û di derbarê mesrefên aboriya vê projeyê de jî tê de agahdarî hebûne.[359]**(bnr. Pêvek:28)**

Piştî erêkirina vê projeya Medresetuzehrayê, li Wanê, li navçeya Artemêtê, di devê Gola Wanê de; çawa li Xoyê dema dibistana kurdan bi merasîmê, bi destê walîtiyê hatibû vekirin, wisa jî bi navê "Medreseya Aliyeyê Reşadiye" (Medresetuzehra) bi merasîmekê, bi beşdarbûna Bedîuzeman Seîdê Kurdî, Walî Tehsîn Paşa û hinek alimên Kurd ve, xîmê wê medreseyê tê avêtin. Waliyê Wanê Tehsîn Paşa, bi telgrafekê, spasiya xwe ji Siltan Reşat re dişîne.[360]**(bnr. Pêvek:29)** Celîlê Celîl jî vê rewşê wiha neqil dike: *"Ev dibistana Xoyê bû sedem, tirkên Ciwan dest avêtin bang û propagandayan û gelek pere amade kirin ji bo vekirina dibistanên kurdî. Ji bo ku, dibistanek li navçeya Artemêtan (nahîyek e ku girêdayî bajarê Wanê ye û tirkan navê wê niha kirine Edremit.) nêzikî gola Wanê bê vekirin, 17.500 lire fon jê re tê tehsîskirin û ji bilî vê 2.500 lire jî hatiye tehsîs kirin ku di gundên Kurdistanê de dibistan bên çêkirin*."[361]Di vî warî de Caner Kutlu jî wiha dibêje; "*Wê serdemê, Wan ji aliyê osmaniyan ve di çarçoveya "Şark Islahat Planı" de wek bajarekî pîlot hatibû hilbijartin. Lewra wê demê serjimara kurd û ermenan wek hev bû*."[362] Osmaniyan dixwest di herema Kurdistanê de bandora wan berdewam bike. Ew jî bi alikariya kurdan dibû. Lewra her tim reqebeta Osmanî, Îran û Ûris ser erdnîgariya Kurdistanê hebû. Wê demê Îran û Ûris li devera Ûrimiyê dibistaneke wek Medresetuzehrayê vekiribûn. Ev rewş dibe sedema erêniya osmaniyan di derbarê mafê kurdan de, ji bo pêşiya bandora Îran-Ûris bigre. Osmaniyan jî di herêma Kurdistanê de 10 ruştiye û 125 îptidaî vekiribûn lê perwerdehiya wan dibistanan bi kurdî nebû, ew jî feyde nedida zarokên kurdan. Ermenan jî bi alîkariya Emrîka û dewletên Ewropayê dibistan vekiribûn. Lê "*dibistanên ermenan nûjen bûn*."[363]

Mirov di gotinên Celîlê Celîl û name û telgrafên waliyê Wanê Tehsîn Paşa de dibîne ku sedemên erêkirina Mederestuzehrayê yên herî girîng ev in: Xebatên Ebdurrezaq Bedirxan yên li Îranê kirine û tehlike dîtina mezheba şiîtiyê û reqabeta navbera mezhebên sunîtî û şîtiyê. Tirsa rabûna qontrol û otorîteya osmaniyan ya li

---

[359] Akgündüz,*h.b.*,179.13.20
[360] BEO, 86.8.6.
[361] Celîlê Celîl, *h.b.*, 144.
[362] Caner Kutlu,"Medresetüzzehra Merkezinde Eğitim Felsefesine Giriş", *Seîdê Seîdê Nursî 'nin Eğitim Felsefesî Medresetuzehra*, Merak Yayınları, Ankara 2012, 573-574.
[363] Kutlu, *h.g.*, 574.

ser kurdan e. Di wê serdemê de daxwazên kurdên başûr jî xeternak dihatin dîtin. Evdiselam Berzanî, li Başûrê Kurdistanê bi serokê eşîrên kurdan re civînek çêkiribû. Dixwest di herêma Kurdistanê de zimanê kurdî bibe zimanê fermî, rêvebirên mulkî yên kurdîzan bên hilbijartin, dadgeh li gorî şerîeta Îslamê bêne damezrandin û cirma dewletê ji bo îmar û dibistanên nû bête xerckirin. Ji bo van daxwazan di navbera Evdilselam Berzanî û Osmaniyan de pevçûn derdikeve. Di dawiyê de Evdilselam Berzanî li parêzgeha Musilê tê darvekirin"[364]

Di sala 1914an de, Herba Cihanê ya Yekem derdikeve û projeya Medresetuzehrayê nagihije mirazê xwe. Projeya ku Kurdên Îranê bi serokatiya Ebdurezaq Bedirxan bi cih anîbûn, hildiweşe û komel û dibistan tên girtin û ew jî nîvco dimîne. Daxwazên Kurdên Başûr jî bûye sedemê bi darvekirina Evdiselam Barzanî. Bi vî awayî hersê xwestekên gelê Kurd nagihijine encamê û careke din kurd bi xeyalşikestî dikevine nav plan û projeyên nû.

Em ê li jêr li gorî kronolojîk hemû rahijên Bedîuzemanî yên ji bo avakirina Medresetuzehrayê nîşan bidin.

#### 3.1.2.1.Rahija Yekem

Di Mijdara 1907an de Bedîuzeman diçe Stenbolê. Di warê perwerdehiyê de bi daxwaznameyê teşebusî Mabeyna Evdilhemîdê II. ji bo vekirina Darutalîmê û Medresetuzehrayê dike. Seîdê Kurdî di sala 1911an de di derbarê perwerdehiya Medresetuzehrayê de di qada Kurdistanê de bi eşîran re hevdîtinan pêk tîne û xebateke wek fizîbîlîte çêdike. Piştî vê xebatê fikr û ramanên xwe û yên gel bi hev re dikelijîne, cara yekem di derbarê Medresetuzehrayê de pirtûka "Reçetet–ul Ewam/ ….el Ekrad/ "Munazerat"ê diweşîne. [365] Bedîuzeman rahija projeya Medresetuzehrayê cara yekem bi gelê kurd re dike û bi erêkirina gel, destê xwe bi hêz dike û wisa pêşniyarî rêvebiran dike.

[364] Barzanî, *h.,b.*, 24.
[365] Badıllı, "h.,b.", 280.

### 3.1.2.2.Rahija Duyem

Di sala 1911an de, Seîdê Kurdî, bi Siltan Reşat re hevdîtinekê çêdike. Bîst hezar zêran ji Siltan Reşat distîne ku li Wanê di navçeya Artemêtê de xîmê Medresetuzehrayê dayne. Di sala1913an de Bedîuzeman xîmê Medresetuzehrayê li wê derê datîne. Lê belê Şerê Cîhanê yê yekem, derdikeve û ev proje nîvco dimîne. Bedîuzeman vê pêvajoyê wiha tîne zimên: "*Di dema desthilatiya Îttihadiyan de ez bi Siltan Reşat re çûme Kosavayê, li wir tesîseke Darulfunûn ya Îslamî dihate çêkirin. Min jî li wê derê ji Îttihadiyan re got; Kurdistan zêdetir hewcedarê Darulfunûneke wiha ye. Wê demê soz dan min, lê herba Balkanan derket û Darulfunûn hate dagirkirin. Min jî, ji wan re got, ger wisa ye, 20 hezar zêran bidine Darulfunûna Kurdistanê. Wan jî daxwaza min pejirandin. Ez çûme Wanê bi hezar lireyî li kêleka Gola Wanê di Navçeya Artemêtê de bi beşdarbûna gelek kesan xîmên wê hate avêtin. Lê belê Şerê Cîhanê derket û ev proje nîvco ma*."[366]

### 3.1.2.3.Rahija Sêyem

Di sala 1922an de, Bedîuzeman Seîdê Kurdî bi israra waliyê Wanê yê berê û mebûsê wê demê Tehsîn Beg diçe Enqerê û ji bo projeya Medresetuzehrayê bi rêvebiran re hevdîtinan çêdike. Vê daxwaza Bedîuzeman mebûsê Qeyseriyê Alim Efendî û mebûsê Wanê Haydar Vaner ji bo Medresetuzehra bê çêkirin teklîfekê (2/671) 2yê Adarê sala 1923yan de pêşniyarî meclîsê dikin.[367]**(bnr.Pêvek:30,31)** Lê ev teklîfa bi qasî du sal nîvî di lijneyê de tê sekinandin dûre di 15ê Kanûnê 1925an de vedigerînin meclîsê û ev teklîf tê feramûşkirin.[368] **(bnr. Pêvek: 32)**[369] Bedîuzeman di derbarê vê mijarê de wiha dibêje: "*Pênc şeş sal şûn de ez çûme Enqerê, dîsa ez ji bo vê heqîqetê xebitîm. Ji dused mebûsan 163 kesan ev xwestina min pejirandin û destnîşan kirin û ji bo avakirina medreseya min, 150 hezar bankanot hate texsîskirin. Dûre medrese hatin qedexekirin. Min û desthilatdaran li hev nekir, dîsa ev daxwaza min nîvco ma...*"[370]

---

[366] Said Nursi, *Emirdağ Lahîkasi*, 317, 430.
[367] Akgündüz,*h.b.*,2.671;2.671.
[368] Badıllı, *H.,b.* ,450-451.
[369] Akgündüz,*h.b.*,6.9.339
[370] Said Nursi, *Tarihçeyi Hayat*, 288; *Emirdağ Lahikası*, 431.

### 3.1.2.4.Rahija Çarem

Piştî ku Partiya Demokrat tê îqtîdarê(1950), serokomar Celal Bayar, wezîrê karê perweredehiyê Tevfik İleri, bi hin şagirtên Beddîuzeman re dikevin têkiliyan. Piştî van têkiliyan ji bo avakirina Medresetuzehrayê, 60 milyon tê texhsîs kirin. Bedîuzeman bi vê rewşê kêfxweş dibe. Celal Bayar di derbarê Medresetuzehrayê da wiha dibêje: "*Ji bo Wanê ku tesîseke ilm û îrfanî, di sala pêşiya me de, tê mûçe bête cuda kirin û ev kar wê dest pê bike*."[371]

Di derbarê vekirina Medresetuzehrayê de fikrên Bedîuzeman Seîdê Nûrsî nayê pirskirin ew jî nerazîbûna xwe tîne zimên û dibêje; "*ev pêncî û pênc sal e, min jiyana xwe di vê riyê de serf kiriye. Ez hertim bi baldarî ji bo vê meselê xebitîme, pêwîst e fikrên min bihata pirskirin. Hûn li Emerîkayê û li Ewropayê di derbarê vê meselê de dişêwirin, helbet ez jî mafdar im gotinekê bibêjim. Bi sernavê vê miletê hemiyetkar, em ji we hêvîdar in*."[372]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji bo girîngiya Medresetuzehrayê bê zanîn, bi destê şagirtên xwe ji Wezerata Perwerdehiyê re nameyekê dişîne. Şagirtên wî vedigerin û ji wî re dibêjin me daxwaza we ji wekîlê lijneyê re got. Ew jî bersiva şagirtên xwe wiha dide: "*Ez nexweş nebûma, ez ê jî, ji bo vê meselê biçûma wilayetên Şerqê. Ez bi ruh û canê xwe Wekîlê Maarîfê pîroz dikim. Him ev pêncî û pênc sal e, ez ji bo avakirina Medresetuzehrayê dixebitim. Yek Wanê, yek li Diyarbekirê û yek jî li Bedlîsê bê avakirin. Ger li van cihan nebû li Wanê tenê be jî bila bê avakirin. Bi vê armancê berî meşrûtiyetê hatime Stenbolê, meşrûtiyet derkete holê ew mesele miyeser nebû. Ji we tu hêviya min nema. Ez vê daxwaza xwe ji bo welat û ayendaya milet, ew ciwanên fedakar û xwendavanên zanîngehê re û ji daîreya perwerdehiyê re erz dikim.*"[373]

Çiqas desthilatdar û rêvebir biguherin jî, yek tişt naguhere ku ew jî daxwaza Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya Medresetuzehrayê ye. Heta dawiya temenê xwe di her demê de, li her cihî û di her pêwendiyên xwe de ew xwestin aniye zimên. Lê belê çiqas xwestiye jî negihîştiye vê xeyala xwe.

---

[371] Said Nursi, Emirdağ *Lahikası*, 317-318.
[372] Said Nursi, *h.b.*, 452.
[373] Said Nursi , *h.b.*, 430-431.

Li gorî Bedîuzeman, Medresetuzehra "bi avzêma manewî, li Ispartayê hatiye avakirin û Risaleyê Nûr li vir vejiyaye. Wî, Rîsaleyên Nûr wek Medresetuzehraya manewî bi nav kiriye. Nûrsî di wê heviyê de ye ku rûyê Medresetuzehrayê yê berçavî/maddî wê ji aliyê şagirtên wî ve bê avakirin.[374] Lê belê li hember vê projeyê car caran astengên dijwar derketin û Seîdê Nûrsî di vî warî de negihişte armanca xwe.

Piştî wefata Bedîuzeman hin rahij ji bo Medresetuzehrayê çêbûn. Yek ji wan ew e ku Weqfa Zehrayê li Wanê xwest vê daxwaza Bedîuzeman bîne cih. Serokê Weqfa Zehrayê Îzeddîn Yıldırım beriya ku were şehîd kirin di wesiyeta xwe de ji bo avakirina Medresetuzehrayê wiha dibêje: "*Ew avahiya Wanê ya Zehrayê ji bo armanca ustad were cî, me dest pê kiribû, xîret bikin û xilas bikin*."[375] Ji bilî van heta niha tu teşebus ji bo projeya Medresetuzehrayê çênebûye.

### 3.1.3.Bername û Naveroka Medresetuzehrayê

Bedîuzeman di hinek Medreseyên Kurdistanê de perwerdehiyê dibîne. Yek ji wan jî li Bazîdê Medreseya Mela Mihemedê Celalî bû. Wê demê medreseyên di Kurdistanê de pirtûkên rêzê dihatin xwendin. Bedîuzeman her pirtûkekê dersekê, du dersan dixwîne û ev rewş bala Seydayê wî dikişîne. Ji ber vê rewşê seydayê wî jê dipirse: "*Tu çima wiha dikî?*" Bersiva Bedîuzeman balkêş e: "*Taqeta min nagihêje ez hemû pirtûkan bixwînim. Lê belê ev pirtûk qutiya mucewheratan e, mifteya wan jî di destê we de ye. Daxwaza min ew e ku di nava van qutiyan de çi heye hûn nîşanê min bidin. Ez fêm bikim ku ev pirtûk behsa çi dikin. Wê demê ji min re kîjan baş be ez ê wê bixwînim*."[376] Birastî taqeta Bedîuzeman digihije xwendina pirtûkan û mirov jê fêm dike ku Seîdê Nursî dixwaze him di hişê seydayê xwe de pirsnîşanekê bihêle, him jî ev pergala bi salane dikişîne biguhere û bi pergaleke nû medreseyan, cardin vejîne.

Bedîuzeman Seîdê Kurdî li nava eşîrê Kurdan xebateke wek fîzîbîlîte ji bo Medresetuzehrayê dikir. Bedîuzeman Seîdê Kurdî ramanên di derbarê Medresetuzehrayê de di pirtûka xwe ya bi navê Munazeratê de wiha aniye zimên.

---

[374] Said Nursi, Tarihçe-*i Hayat*, 282.
[375] Osman Tekîn, *Îzettîn Yıldırım*, İstanbul, Gündönümü Yayınları, 2013, 10.
[376] Abdurehman Nursî, Bedîuzemanin *Hayatı*, Weşanên Nûbiharê, çap 4,18.

**Yekem:** "*Medrese, digel ku navê nas û menûs û balkêş û şewqengîz e û îtîbara wê heye jî, ji ber ku heqîqeteke mezin digre nava xwe, divê bi wî navê mubarek ê medreseyê ku rexbet lê tê kirin û meyla merivan lê vedike, bê binavkirin.*"[377]Seîdê Kurdî bixwe jî kurdek bû, bajar, navçe, gundên Kurdistanê û çand û psîkolojiya kurdan dizanibû. Lewra kurd ji Ewropayê çi bihata bi şubhe lê mêze dikirin, ji bo zanistên nûjen dibistan û zanîngeh li Kurdistanê were qebûl kirin bi navekî medreseyê projeya xwe pêşniyarî Gelê Kurd dike.

**Duyem:** **"***Divê ku tê de fenên nû, bi ilmên medreseyê re bên kelijandin û derckirin û zimanê erebî wacib, kurdî caîz û tirkî jî lazim were kirin.*"[378] Bi sê zimanê qedîm perwerde çêbibe. Erebî zimanê dînî û di nava misilmanan de wek zimanekî gelemperî dihate qebûl kirin. kurdî zimanê gelê Kurdistanê ye, lê belê ji aliyên desthilatdarên Îttihad û Terakiyê ve hatibû qedexekirin. Bedîuzeman dixwest kurdî, wek zimanên din serbest bibe û di zanîngehan de weke zimanekî akademîk bê pejirandin. Tirkî jî zimanê dewletê bû û ji bo têkiliyên gel û dewletê hêsane bibe. Lewra nezanîna zimanê tirkî gelek caran dibû sedemên xeletiyan û kurd dema tirkî bizanîbin wê bikaribin heq û hiqûqên xwe biparêzin.

**Sêyem:** "*Ji mamosteyên kurd ên dubaskî ku kurd bi wan bawer in, an jî ji bo hînbûnê, divê ji wan kesên ku bi zimanê kurdî aşîna ne, weke mamoste bên hilbijartin.*"[379] Bedîuzeman dixwest mamosteyên Medresetuzehrayê him dîndar bin, him jî pisporê zimanê kurdî bin. Ger ev projeya Medresetuzehrayê were qebûl kirin dê têkiliyên wan bi gel re hêsan bibe. "*Baweriya Seîdê Nûrsî ew bû ku ji bo mamoste û xwendekar hînî hev bibin û di navbera wan de atmosfereke germ çêbibe, divê di zanîngeh û medereseyên Kurdistanê de yan mamosteyên Kurd yan jî mamosteyên ku bi Kurdî dizanin bên erkdarkirin.*"[380] Bedîuzeman dixwest, hikumet teşebusa rêvekirina li ber tore û zimanê netewî yên ku sedemên hebûna her qewmî ne veke. Mirov bi vê gotinê fêm dike ku ji bo hînbûna zimanê kurdî saziyên fermî tunebûne.

---

[377] Seîdê Kurdî, "Munazarat*", Dersên Civakî*, 134.
[378] Kurdî, b.n.,134.
[379] Kurdî, b.n., 135.
[380] Mamoste Qedrî, "Seîdê Nursî û Ramanên Wî yê Derbarê Ziman û Perwerdehiya Seîdê Kurdî"*Kovara Zendê*, İstanbul, payîz 2006, 79.

**Çarem:** "*Divê bi qabiliyetên kurdan re îstîşare bê kirin û wek zarokan saftiya wan li ber çava bê girtin. Lewra gelek kinc hene ku ji bejnekê re rindin; lê belê ji bejneke din re ne rind in. Perwerdekirina zarokan, an bi darê zorê, an jî bi wî awayê ku meriv kêfa xwestekên wan pêk bîne tê cih.*"[381] Bi vê gotina Bedîuzeman dibêje êdî li Stenbolê rêvebirî û serokatiya Gelê Kurd nayê îdarekirin. Pêwîst e rêvebiriyeke hevpar were qebûl kirin. Lewra îro jî ew pirsgirêk berdewam dikin hin jî bi fikrên qabiliyetên kurdan re îstişare baş nayêne kirin, yan jî tê piştguhkirin. Ew jî dibe sedema nakokiyan. Hevdîtinên bi pêşengên kurdan re têne kirin, bi gelemperî ji bo yekbûna di bin per û baskên Netewa Tirk û dewletê de tên xwestin, ew jî çareseriyekê nayîne.

**Pêncem:** "*Bi temamî, di tetbîqkirina awayê karbeşiyê de, ku destpêk û dawiya her beşê ji hev diyar bibe û di her beşê de pispor derkevin*."[382] Pêwîst e bernameyên beşan, ji hev cuda bin, armancên wan her çibe jî, di dawiya van bernameyan de pispor werin têgihîştin. Lewra cudatiya beşan kivşe be, tevlihevî tunebe, xwendevan dê bizanibin çi bikin, ger xwendekar di wê mijarê de enerjiya xwe serf bikin. Lê divê derbarê her karbêşê de hinekî agahdar bin. Ji bo ku fikr û ramanên xwendevanan nêzî hev bibe ev perwerdehî lazim e da ku di pêşerojê de yekitiya Gelê Kurd ava bibe.

**Şeşem:** "*Ji medreseyê re dîtina fonekê/aborî û ji xwendekarên wê re jî peydakirina hatineke ku pê debara/meîşeta xwe bikin. Hem jî divê ev medrese, hempayê dibistanên bilind ên fermî be û divê ku îmtîhanên medreseyê, mîna îmtîhanên fermî, bi encam bin da ku yên jê mezûn dibin, betal û bêşixul nemînin*."[383] Lewra di vir de gotina Bedîuzeman zelal in, pêwîst e mafên dibistan û zanîngehên fermî çawa ye, ya Medresetuzehrayê jî wisa be. Lewra xwendevan divê bikaribin pêşiya xwe bibînin û nekevin endîşeya aborî û pêşeroja xwe. Heke xwendevan wek berê bin, wê demê di fermiyetê de giraniyeke wan çênabe. Dema di bawernameyan de patronaj tunebe di qada navnetewî de nayê pejirandin.

---

[381] Seîdê Kurdî, "Munazarat", *Dersên Civakî,* 135.
[382] Kurdî, b.n., 135.
[383] Kurdî, b.n., 135.

**Heftem:** "*Divê ku Darulmualîmîn/fakulte bilind bi awayekî demî ji vê medreseyê re navend bê qebûlkirin ku întîzam û fînansekirin ji wê fakulteyê derbasî vê medreseyê bibe, îca fezîlet û diyanet jî, ji vê medreseyê derbasî wê fakulteyê bibe. Bi vê hevbandoriyê medrese û "Darul Mualîmîn" hevdu bi per û bask bikin û bibin dubask."*[384] Bedîuzeman di pêşiyê de dixwaze Medresetuzehra bi tercubeya fêrgeha mamostetiyê dest pê bike. Medrese wê feydeyê bide Darulmûalîmînê, wê kêmasiyên hevdu temam bikin. Dema têkiliyên wan bi hev re çêbibin wê demê di navbera medrese, tekke û mekteban de dijberîtî çênabe û alîkarî çêdibe. Lewra Darulfunûn pêşde hatibû vekirin, di aliyê perwerdehiyê de xwedî tecrube bû.

**Heştem:** **"***Divê ew perwerdehiya ferdî ku li Kurdistanê rûniştîye, bê guherîn û bibe perwerdehiya polî û komî*."[385] Bi hûrgilî di bin serenavên din de wê bi berfireh li ser taybetî, şert û mercên Medresetuzehrayê bê sekinandin. Pêwîst e rêbaza perwerdehiyê bê guhertin. Lewra di Medreseyên Kurdistanê de kevneşopiyeke bi sed salan berdewam dike êdî ji feydeyê zêdetir zirarê dide perwerdehiyê. Kadri Yıldırım di vî warî de wiha dibêje: "*Çawa ku tê zanîn di Mederseyên Kurdistanê de hejmara xwendekaran çiqas dibe bila bibe, rêbaza perwerdehiyê wekî yek bi yek dihate şopandin û hê jî wiha ye. Ango mamoste dersa xwendekaran yek bi yek dide. Ew jî gelekî zeman digire. Bedîuzeman dixwaze ders bi "xelqe/daîreyî" bê tetbîqkirin*."[386] Ev pergala medreseyan belkî di sêrî de feydeyên wê hebûn, lê di nava medrese û muderîsan de paşê bûye sedema tehekûmê û tehekkûma seydayan derdikevin pêş û kabilyetên xwendevanan jî kor dibin. Cihê tahakûm têde hebe, di wir de pînedûzî, durûtî, mixenetî dertê. Di derbarê zanistê de paşveçûn berdewam dike. Ji bilî van şertan, di Rîsalayên Nûr de di cihên cuda cuda de, di derbarê Medresetuzehrayê de Bedîuzeman fikr û ramanên xwe tîne zimên.

Naverok û bernameya Medresetuzehrayê pêwîst e ji zana, rewşenbîr, alim û Gelê Kurd bê pirskirin û wisa pêşkêşî xwendevanan bê kirin. Bernameya Medresetuzehrayê heke bê gotina Gelê Kurd bê çêkirin tu feyde nade, dibe ku zirarê jî bide wan.

---

[384] Seîdê Kurdî, "Munazarat", *Dersên Civakî,* 135.
[385] Kurdî, h.b., 136.
[386] Mamoste Qedrî, *h.b.*, 79.

Bedîuzeman di derbarê projeya Medresetuzehrayê de dixwest, beşên cuda cuda bêne avakirin û bernama wan bi pergalî bê tijî kirin, întizamek pê re hebe û bi yek bernameyê perwerde çêbibe. "*Heke weke bi heqiqî bên bikeyskirin, bi rêya yekkirina medreseyan, dê kaniyeke girîng biherikîne ser vê hewzê.*"[387] Pêwîst e, bernameyek bê sazkirin ku çarçoveya wê bi zanistî be. Medresetuzehra ji bo nûjenkirina medreseyan bi taybetî Medreseyên Kurdistanê, projeyeke girîng e. Bedîuzeman Seîdê Kurdî hez dikir, modeleke nû saz bike. Di derbarê naveroka Medresetuzehrayê de wiha dibêje: "*Li kêleka hiş/aqil dibistaneke herî bilind, li kêleka dil medreseyeke herî bêhempa, di nezera wijdanan de jî wê bibe zaviyeke herî pîroz. Him dibistan, him medrese, him jî wê bibe dergah.*"[388]

Bedîuzeman Seîd Kurdî bernameya Medresetuzehrayê di Rîsaleyên Nûr de nîşan dide. Hin taybetiyên Medresetuzehrayê ev in:

1. Mertebeya mirovahiyê ya herî bilind, marîfetullahê bide qezenç kirin.[389] Perwerdehiya zanistî û fenî bi nêrîna Bedîuzeman dê Xwedê bi xwendevanan bide naskirin.

2. Qur'ana Pîroz bi tenê seba xwendinê neyê bikaranîn. Di Qur'ana Pîroz de çiqas tiştên baş hebin ji wana sûd bê girtin.[390] Lewra di sedsalên dawî de xwendineke teqlîdî di mederseyan de berdewam dikir, di bernameya Medresetuzehrayê de xwendineke rastî/tehqîqî dê were cî.

3. Cudatiya dinya û axiretê bê rakirin, nehêle di mirovan de du kesayetî çêbibe. Her du jiyanan bi hev re bijîn, mirovahî li ku tê û ku de diçe bê zanîn.[391] Di sedsalên dawî de di medreseyan de dijberitiyeke mektep-tekke-mederseyan hebû. Di qismekê de şek şuphe, qismekî de jî baxnazî hakim bû. Di Medresetuzehrayê de bernameyeke ku bingeha xwe ji Îslamê û zanistên nûjen digre bê dayîn.

4. Cudatiya medrese, dibistan û dergahan bi dawî bibe û wê yekitiya aqil û dil çêbibe.[392] Ehlê zanistên dînî û ehlê mekteban rêyekê din dişopandin, Medresetuzehra dê yekitiya wan çêke.

---

387 Seîdê Kurdî, "Munazarat*", Dersên Civakî,* 136.
388 Kurdî, b.n., 143.
389 Seîdê Nursî, Mektûbat, 258.
390 Seîdê Nursî , "Sünuhat"*, İçtimai Dersler,* 255-257.
391 Seîdê Nursî , "Lemeat*",İçtimai Dersler,* 411.
392 Seîdê Kurdî, "Meqaleyên Bedîuzeman", *Dersên Civakî,* 389.

5. Bi esil re mijûl bûn û bi pey qalik neketin.[393] Di sed salên dawî de kûrahî perwerdehiya zanistan kêm bibû û xwendineke bi rû ve berdewam dikir. Pêwîste ev pergala berevajî bibe.

6. Ne mehkûmên pirtûkan bin, lê hakimên wan bin.[394]
7. Ji bo bêxîretî û heznekirin bête rakirin hewceye munazara, pirs û bersîv bên çêkirin.[395]
8. Mentiqa rexnegiriyê geş bibe û ji rexnebûyinê re vekiri û pirsjêkirî dê çêbibe.[396]
9. Monoton/dûzahengî, westarbûn/sabîtbûn jê dûr bikeve.[397]
10. Zanista ku jê neyê hezim kirin, hewceye neyê dayîn.[398]
11. Tiştên batil/pûç neyê teswîr kirin, ji bo ku hişên şagirtan tevlihev nebe.[399]
12. Bi pirr zimaniyê "erebî, kurdî û tirkî."[400] Perwerdehi di Medresetuzehrayê de çêbibe.
13. "Zarokên ku elîfbayê nasnakin dayîna ji wan re dersa felsefeye tiştekî sathî(rûve) ye, pêwîste li gorî asta wan were dayîn."[401]
14. Ilmên dînî di temenên piçûk de neyê dayîn, paşê dê zor dibe.[402]
15. Zulum li kesî neyê kirin û mirovên ku li dijî zulmê ne bên perwerdekirin.[403]
16. Ew dijbertî û nexweşiyên di navbera gel de bi biratî û uxuwetê geş bibe.[404]
17. Li gorî pêwîstiya rewşa mirovan têbigihîştîn çêbibe.[405]

18. Perwerdeya takekesî/ferdî biguherîne perwerdeya nûjen bi pergal bê dayîn. Ji cure cure mamosteyan ders bê girtin. Ji her mamosteyekî aliyekî baş bê girtin. Ger bixwaze şagirt pêşde here wekî mozhingivê be,(çawa moza hingiv cure cure kulîlkan polenan hildide) divê xwendevan jî wisa bin.[406]

---

[393] Nursî, Muhakemat, 10,43.
[394] Nursî, "Dîwana Herba Urfî", *İçtimai Dersler,* 182.
[395] Nursî, *h.b.*, 182.
[396] Nursî, *h.b.*, 182,184.
[397] Nursî, *h.b.*, 182,184.
[398] Nursî, Mektubat, 535.
[399] Nursî , *h.b.*, 535.
[400] Nursî , "Munazarat*",* *İçtimai Dersler,* 141.
[401] Nursî ,"Şuaat",*İçtimai Dersler,* 374; Seîdê Nursî , "Yaşasın Şeriatı Ahmedî", *İçtimai Dersler,* 536.
[402] Nursî, "*Emirdağ Lahikası",* 24.
[403] Nursî, "Hutbe-i Şamiye*", İçtimai Dersler,* 61; Seîdê Nursî , "Divan ı harbi Örfi", *İçtimai Dersler,* 157.
[404] Nursî, Mektubat, 301,309.
[405] Nursî , "Divan-ı Harbı Örfi*", İçtimai Dersler*, 184.
[406] Seîdê Nursî , "Münazarat", *İçtimai Dersler,* 142.

19. Li gerdûnê bi çavê maneya herfî li cîhanê bi çavekî hesabê Xwedê binêre, modeleke wisa çêbibe.[407]

20. Mirovên kamil yên heq û hiqûqên her tiştî didin, ne yeknesak yên bi hevseng/hevkêş(denge) xwedî kesayet bêne perwerde kirin.[408]

21. Di şûna hêz de maf û dad ji xwendevanan re bibe paldank.[409]

22. Di şûna berjewendiyên xwe de, ji xwe re fezîlet û hezyariyê bike armanc û bingeh. [410]

23. Ji bo yekitiyê li şûna nijatperstiyê; dîn, welat û hev pîşeyî derkeve pêş. Wekhevî, biratiyeke rasteqîn geşedan bide, aşitî jî bi rastî çareser bibe. [411]

24. Di şûna pevçûnê de alîkariyê ji xwe re bikin armanc.[412]

25. Di şûna hewa û hewesên pûç de tiştên Xwedê dixwaze, di wê rê de ruh bikemilîne û bigihije asteke bextewariyê.[413]

26. Mirovekî ehlê hemiyet/niştimanperwer hîç nekeve bêhêvitiyê, çi astengî derkeve pêşiya wî divê bi ser keve û bigihêje armanca xwe.[414]

27. Ew mamosteyên ku sedsala nû dişopînin, fikr û ramanên wan vekirîne bila bên erkdarkirin.[415]

28. Di jiyana pratîk de misilmantiyê bijîn.[416]

29. Miletek nezan be û mafê xwe jî nizanibe, ehlê welatperwer jî dibe ku zordariyê lê bike. Pêwîste xwendewan di vî warî de bêne ronîkirin.[417]

30. Şixulên xwe bi hikmetî bikin, di jiyana xwe de demogojiyê nekin.[418]

31. Di hiquqê de wekhevî çêbibe, mafê wekhev nebin, ew ne maf e, bê musawatî ew ne edalet e. Di hiquqê de şah û geda yek in. Bi vê fikrê xwendevan bên perwerdekirin.[419]

---

[407] Nursî, Mesnevi *Nuriye*, 54.
[408] Nursî, Sözler, 531.
[409] Nursî , "*İçtimai Dersler"*, 404,405; "*Sözler",*164.
[410] Nursî ,"Lemeat", *İçtimai Dersler, r.*404,405; Seîdê Nursî, Sözler, 164.
[411] Nursî , *h.b.*, 404,405;164.
[412] Nursî , *h.b.*, 404,405;164.
[413] Nursî , *h.b.*, 404,405;164.
[414] Kurdî, "Münazarat", *İçtimai Dersler*, 87.
[415] Nursî , "Hutbe-i Şamiye*",İçtimai Dersler*, 42.
[416] Kurdî, *h.b.*, 42.
[417] Nursî , "Münazarat"*, İçtimai Dersler*, 86.
[418] Nursî , "Münazarat*", İçtimai Dersler,* 110; Seîdê Nursî , *"İşaratul Îcaz"*, 318,569; Seîdê Nursî , "Nutûq", *İçtimai Dersler*, 33.

32. Ji holê rakirina, "*dema ku ez mirim li dinyayê çi dibe bila bibe, hezdikî bila tofan rabe, dema ku ez ji tîbûnê mirim, bila dilopek şilî nebare, an jî bila ez têr bim kî ji birçîbûnê dimre bila bimre ji min re çiyê*." [420] Ev proje dê van nexweşiyan ji nava civakê rake û nexweşiyên wan tedawî bike.

33. Wê mirovan ji şopgeriya korekor dûr bixe.[421]

34. Ji nûjeniyê re fikrekî vekirî, kirinên xwe li gorî sedsalê bike.[422]

35. Wekî kêmxwera/parazit serpişta kesî, di bin perê kesî û di bin siya kesî de nebe. Nebêje, tu bixebite ez bixwim, divê wek mirovên bi rûmet werin perwerde kirin.[423]

36. Di civaka Misilmanan de bi taybetî di medresan de cudatiya aqil û neqil zêde zirar gihandiye mirovan. Van herduyan bi hev re mecz bike/bikelijîne û yekitiya wan çêbike, bixe bin xizmeta gelê xwe. [424]

37. Mirovên dilovan, rêzdar, mirovên ku helalî û heramiyê dizanin bigihîne, mirovan ji serseritiyê dûr bixe û bibe wesîleya başîtiyê.[425]

38. "*Derew gotineke kufrî ye*." Ji derew û derewkariyê mirovan dûr bixe û li gorî vê bête perwerde kirin.[426]

39. Ji bo heq û hiqûqên mirovan azad be û azad bifikire.

40. Cîhada vê demê mûhabbet û hezkirin e û bi tirs nîne. Lewra li tirsê dûr, li fermiyetê dûr, bi dil û can, hezyar û mirovane bi evîndariya mirovahiyê were perwerde kirin.[427]

41. "*Em ehlê hal in, amedeyên pêşerojê ne/ayende ne, bi teswîr, bi xeml fikrên me nayê xapandin, em delîl dixwazin*." Yanê bi peyvên xweş em mirov nayên îknakirin, isbat û delîl pêwîst e. Lazim e xwendevanan wisa bên perwerdekirin.[428]

---

[419] Seîdê Nursî , "Nutuk", *İçtimai Dersler*, 32; Seîdê Nursî , "Münazarat", *İçtimai Dersler,* 107; Seîdê Nursî , "Divana Herba Örfî", *İçtimai Dersler*, 169; Seîdê Nursî , "Hakikat Çekirdekleri", *İçtimai Dersler*, 223; Seîdê Nursî , "Lemeat", *İçtimai Dersler*, 271.

[420] Bediüzzaman Said Kurdi, "Bediüzzaman Kurdinin Fihriste-i Maksadı ve Efkarının Programıdır*", İçtimai Dersler,* r.539*;* Seîdê Nursî, Mektubat, 536.

[421] Seîdê Nursî , "*Hutbe-i Şamiye", İçtimai Dersler,* 45.; Seîdê Nursî , *Muhakemat*, 35.

[422] Nursî, *h.b.*, 45; 35.

[423] Nursî, "Hakikat Çekirdekleri*", İçtimai Dersler*, r.217; Seîdê Nursî, Metubat, 536.

[424] Nursi, *Sözler,* r. 577; Seîdê Nursî , "Bediüzzaman Kurdinın Fihriste-i Maksadı ve Efkarının Programıdır", *İçtimai Dersler,* 539; Seîdê Nursî, Muhekemat, 14.

[425] Said Nursi, Kastamonu *Lahikası*, 140.

[426] Nursi, *Sözler,* 378; Seîdê Nursî ; "Hakikat Çekirdekleri", *İçtimai Dersleri*, 214; Seîdê Nursî, Mektubat, 42,43.

[427] Seîdê Nursî , "Münazarat", *İçtimai Dersler,* 86; Seîdê Nursî, Sozler, 248.

[428] Said Nursi, *İşaratül İcaz*, 33.

42. " Îktîsat, ji herkesî re ferz e.", "Musrîfî sefahet e, sefahet jî deriyê sefaletê ye." "Ez hez dikim tabiyê savadê ezem bim/ jiyaneke hevpar bi komî(civakî)." Xwarin û vexwarinê, razan û axaftinê di jiyana mirovan de her tiştên fuzûlî bê dûr xistin li gor van xwendevan bêne perwerde kirin.[429]

43. Mirovek tişta qabiliyeta wî pêre hebe terk bike, tişta bi destê wî neyê wî şixulî bike, dijî xilqata şerî'etê ye û bê îtiatiyeke mezin e. Li gorî qabiliyeta kesan perwerde bê kirin.[430] Pêwîst e mirov qabiliyetên mirovan re çi musaît be wê bidê, goşt nede hespê, gihayê jî nede gurî. Ji kîre çi lazim be, wê bidê wî.

44. "*Fitrat, tiştên ne fitrî be û ne layiqên mirovan be red dike û diavêje*." Seîdê Kurdî di gotineke xwe de evha dibêje û vê xwestinê ji mirovan dixwaze ku fitrata xwe neguherînin lê xwe ber bi başiyê ve bikşînin."[431] Osman Tekin di derbarê naveroka bernameya Medresetuzehrayê de, wiha dibêje: " *Ji bo çareseriya pirsgirêkan rêgez û bingehên gelemperî kivş kiriye lê belê bernama mufredata perwerdeyêji yên piştî xwe re Kulliyata Rîsaleyên Nûr wek referans hiştiye*.[432]

45. Perwerdehî mirovên fikirazad têdigihîne. Li gorî Bedîuzeman azadî ew e ku; "*mirov ne zirarê bide xwe, ne jî bide mirovên din*."[433] Pêwîst e, xwendevan wiha bêne perwerde kirin. Bila kes tehekkumê li ser tu kesî neke, mafên herkesî bê mihefeze kirin û herkes di xelqeya meşrû de serbest be.

46. Projeya Medresetuzehrayê bi tenê zanistî û dînî nîne. Dijberî rêvebiriyeke despotîk e, hemberî mêtîngeriyê ye û serkeftineke dinyewî tenê naxwaze; li her tiştî bi çavê maddî nanihêre û modeleke piralî ye.[434]

47. Li gorî Bedîuzeman Seîdê Kurdî, îman çiqas ronakdar be, mirov ewqas azad dibe. "*Ez bê nan dijîm, bê azadî najîm*", lewra di fikr û ramanan de serbestî tunebe ilm û îrfan geş nabe, wê demê azadî jî geş nabe. Pêwîst e di Medresetuzehrayê de perwerde li ser vî fikrî bê dayîn.[435]

---

[429] Said Nursi, *Lemalar*, 185*;* Seîdê Nursî , *"*Lemeat*", İçtimai Dersler,* 424; Seîdê Nursî , "Tarihçey-i Hayat'ın Zeyli", *İçtimai Dersler*, 595*;* Seîdê Nursî, *Mektubat*, 540.
[430] Said Nursi, "*Muhakemat"*, 47.
[431] Nursi, *Sözler,* 378; Said Nursi ; "Hakikat Çekirdekleri", *İçtimai Dersleri*, 214; Seîdê Nursî, *Mektubat*, 42,43.
[432] Osman Tekin, http:/www.Zehra. com.tr/bediuzzaman-said-Seîdê Nursî -ve-egitim-modeli-olarak-medresuzzehra_h111228.html. pêwendî: 23.11.2015.
[433] Said Nursi, "*Emirdağ Lahikası"*, 430-431.
[434] Şengül, *h.b.*, 215.
[435] Said Nursi, Tarihçe-*i Hayat*, http://www.yeniasya.com.tr/risaleyinur/tarihceyihayat/ # 718/z.

48. Li gorî Bedîuzeman, perwerde divê him bi ferdî him jî bi kolektîfî bandorê nede ser fikr û ramanên xwendevanan. Pêwîst e xwendevan dualî bin. Lewra xwendevanên Medresetuzehrayê him warê dînî de him jî warê fenî ji zanistên pozîtîf û civakî de zana bin. Ya hişên me ronahî dike zanistên fenî ne, ya dilê me ronahî dike zanistên dînî ne, herdu bibin yek heqiqet derdikeve holê, lewra dema ku bi ramanên azad geşahiyê bide, dê şexsên weke Eflatûn, Îbnî Sîna, Bîsmark, Dekart û yên wek Taftazanî di Medresetuzehrayê de derkevin holê.[436]

### 3.1.4. Di Medresetuzehrayê de Zimanê Perwerdehiyê

Medrestuzehra bi serê xwe projeyeke taybet e, pêwîst e bi vî çavî bê nirxandin. Seîdê Kurdî sed sal berê projeya Mederestuzehrayê pêşkêşî gelê kurd û rêvebirên dewletê kiriye. Bedîuzeman projeya Medresetuzehrayê li ser hin esasan ava dike û ji wan esasan yek jî pirzimaniya wê ye. Lewra di vî warî de wiha dibêje : "*Zimanê erebî wacîp, kurdî caîz, tirkî lazim e.*"[437] Lê di vê mijarê de gelek caran peyva caîzê xelet hatiye fêmkirin û şîrovekirin. Bi kûrahî li ser nehatiye hizir kirin, bi awayekî konjekturel hatiye fikirîn, bi nêrîneke îslamî û însanî li meselêyê nehatiye mêze kirin. Pêwîst e bi çavekî objektîf ev mesele bê nirxandin. Çawa Bedûzeman jî dibêje; *"ehlê heqîqetê ger wek xewas/xweznebar be'*[438] di bin tesîra deman de nebîne, pêwîst e bikeve kûrahiya rabirdûyê, bi mêzîna hiş bipîve û çavkaniya her tiştî bibîne. Lewra Nûrsî di gotinên xwe yên derbarê perwerdehiya Medresetuzehrayê û yên di Risaleyên Nûr de, dibêje, bibin ehlê rastiyê. Divê ev tişt ji aliyê şagirtên wî ve baş bê fêmkirin.[439]

Mirov mêze dike yên ku xwe wek şagirtên Rîsaleyê Nûr didin naskirin di derbarê Medresetuzehra û zimanê kurdî de xebateke wan a berçav tune. Dabeşkirina zimanên perwerdehiya Medresetuzehrayê tê çi wateyê û sedemên wê dabeşkirinê ev in: wacîbbûna erebî ew e ku erebî zimanê Qur'ana Pîroz e. Seîdê Kurdî dixwaze Qur'ana Pîroz baş bê fêm kirin, wateya wê bê zanîn. Kurdî caîz/serbest e, lewra zimanê kurdî serdema Seîdê kurdî de bi gelemperî qedexe bû, loma Seîdê Kurdî dixwast ew serbest be û ya din çawa berê de jî zimanekî medreseyan kurdî bû dîsa

[436] Seîdê Kurdî, "Munazarat", *İçtimai Dersler,* 142.
[437] Kurdî, "Munazarat*", Dersên Civakî,* 141.
[438] Said Nursî. "www.yeniasya.com.tr/risaleinur/sozler/#714/z
[439] Nursi, *Şualar*, 637.

dixwaze berdewam bike. Tirkî jî zimanê dewletê bû ew jî lazim e. Hinek ji bo vê caîziya kurdî dibêjin hebe jî dibe nebe jî dibe. Ev fikr xelet e, şaş e, lewra nêrînên Seîdê Kurdî yên derbarê zimanê kurdî de di mijara; "Li Gorî Seîdê Kurdî Girîngiya Zimanê Zikmakî" de derbas dibe û tê dîtin bê Bedîuzeman van nêrinan çawa bêwate dike. Di mijara "caîz"iya kurdî de hinek ji wan gotinên balkêş ev in: Osman Tekin: "*Jixwe di erebî de wateya caîzê "esasî/kanûnî, fermî, dibe makul*."[440] Adil Yilmayan di derbarê vê mijarê de wiha dibêje:

1. "*Mela Seîdê Kurdî; ev parvekirina zimanan, herçiqas di dema dûgela Osmanî de, di nêzikî 1910an de çêkiribe û seranser rast gotibe jî; divê pirsgirêka ziman û parkirina wan careke din bi şêweyeke hemdemî bê şîrove kirin û çareserkirin.*

2. *Seîdê Kurdî, ev parvekirina zimanan, ji bo zimanê Zanîngeha Medresetuzehrayê pejirandiye. Lê di mijara zimanê kurdî de ji "seretayî", hetanî "zanîngehê" her wiha di hemû warên perwerdehiyê de, çawa di serê wê pirtukê û di çend gotarên xwe de gotiye, divê li Kurdistanê, perwerde û amojkarî, bi zimanê zikmakî yê kurdan bê bikaranîn. Lewra her giha li ser koka xwe hêşîn dibe. Herwiha jî, li gor suneta Xwedê, axaftina bi kurdî ji her kurdekî re ferz e.*

3. *Mela Seîdê Kurdî, di vê parvekirinê de van xalan dihizirîne:*

*a) Wê demê, bi piranî endamên Partiya Îttihad û Terakkiyê "rihperestên tirk" bûn. Wan dixwastin ku hemû netewên din, di bin bandora osmaniyan de bêne bişavkirin/asîmîle kirin. Bedîuzeman digel vê projeya medreseyê dixwast pêşiya vê zilma hanê bigre, da ku ji Cîhana Îslamê hemû bi hev re serbikeve.*

*b) Ji bo ku çaraliyên Cîhana Îslamê xwendekar bêne Kurdistanê, ku Kurdistan jî mîna welatên din bê nasandin û pêşve biçe.*

*c) Di zanîngeha Medresetuzehrayê de wacîbkirina zimanê erebî, ji ber ku erebî di navbera misilmanan de zimanekî hevpar û zimanê Qur'an û Hedîsan e. Ev jî jibona alim û mamosteyan wacib e. Tirkî, sedema ku zimanê dugela fermandar bû, lazim e ku bihata zanîn. kurdî, ji xwe zimanê heremê bû, ji ber vê xwendekarên zanîngehê, divê bi kurdî jî bizanîbin*."[441]

---

[440] Tekin, *h.g.*, www.zehra.com.tr. pêwendî: 03.04. 2015

[441] Etmanî, "*Wergera Munazerata Bedîuzzeman Seîdê Kurdî"*, Wesanxaneya Nûbiharê, Çapa Yekem, Stenbol, 2012, 193.

Hevpariya zimanan, netewan nêzî hev dike, bi wê biratiya wan ava dibe. Dema herkes bi zimanê xwe perwerde bibe, wê çaxê biratiya gelan yê qewî bibe. Maruf Özülkü jî wiha dibêje: " *Sê zimanê qedîm yên erdnîgariya Rojhilatanavîn û parzemîna Asyayê ku erebî, kurdî û tirkî ne, tev bên xwendin tiştekî pir girîng e. Dema herkesek bi zimanê xwe perwerde bibe wê demê nijadperestî çênabe. Cudatiya zimanan dewelemendiya çanda dewletekî ye. erebî ji bo zimanê Qur'anê ye, nesleke bi gotina Qur'anê bê perwerde kirin, tirkî ji bo fermiyetê pêwîst e, kurdî jî zimanekî medreseyê ye. Lêwra zimanê dayikê hestên mirovan yên netewitiyê derdixe pêş*."[442] Hevpariya zimanan aşitî, wekhevî û xwenasiya gelan e. Ziman hebûna miletekî ye. Xwestina erebî ji bo baldariya gelê ereb bikişîne ser Medresetuzehrayê, damezirandina zanîngeha Medresetuzehrayê di Kurdistanê de rêza duyemîn de perwerdeya bi zimanê kurdî, nîşan dide ku gelê kurd bê xwedî nîne. tirkî ji zimanên birayên xwe qebûl dikin. Yanê hin nêrînên kêm hene ku dixwazin gotina caîzbûnê biçûk bikin. Ev kes bi tenê ji bo Medresetuzehrayê difikirin. Mela Reşît Herîtî vê nêrînê rexne dike û rexneyên xwe wiha tîne zimên:

"Hin kes jiyan û nêrîna Bedîuzeman fêm nakin, lewra di dibistan û zanîngehan de kurdî nebûye zimanê fermî. Lê belê ne wisa ye, ji bo Medresetuzehrayê mebesta caîzbûnê serbestî ye. Lewra wê serdemê kurdî qedexe bû wek tirkî, erebî serbest nebûye. Dema ew daxweza perwerdeya zimanê kurdî dike, kurdan zimanê kurdî sedî sed zanîbûn. Dibe "caîz" bûna Bedîuzeman di maneya ferzê de be. Bedîuzeman dixwest desthilatdar, kurdî di warê perwerdehiyê de wek erebî û tirkî meşrû/serbest (caîz) bikin."[443]

Mela Feyzî Güzelsoy di derbarê pirzimaniyê de wiha dibêje:

"Kurdî jî caîz e dibêjê, lewra zimanê dayikê Xwedê daye, axaftina wê wek şîrê dayikê helal e. Lewra caîzbûn wek wacibê şer'î ye, peyveke Îlahî û semawî ye ji bo wê sedemê di rêza duduyan de ye. Mirov di maneya hebûn û tunebûnê de jî dê bifikire ku ev dijî heqîqetê ye. Ev maneyên wiha him li dijî Îslamê him jî li dijî rihê Qur'anê ye û li dijî fêmkirina Ustad e jî. Di vir de baş tê fêm kirin ku Bedîuzeman di

---

[442] Maruf Özüklü, "Mektep- Medrese-Tekke Ayrışması Karşısında Bediüzzamanın Eğitim Felsefesi: Medresetüzzehra", *Seîdê Seîdê Nursî 'nîn Eğitim Felsefesî Medresetuzehra*, Merak Yayınları, Ankara 2012, 176.
[443] Veysî Încî -Reşît Hiritî, "Di Hevaîna Medresên Şerqê û Mekteban de Giringiya Medresetuz-Zehrayê" *Seîdê Seîdê Nursî 'nin Eğitîm Felsefesî Medresetuzehra*, Merak Yayınları, Ankara 2013, 707.

Kurdistanê de zimanê perwerdehiyê di rêza yekem de zimanê kurdî paşê jî zimanê Tirkî dibine."[444]

Pêwîst e mamosteyên dibistan û zanîngehan û kesên di birokrasiya dewletê de karmend in, zimanê kurdî jî bizanibin da ku têkiliya wan û hemwelatiyan xweştirîn be û karmend jî xwe hemwelatî hîs bikin. Di vî warî de Ahmet Keleş dibêje: "*Mamosteyên di zanîngehên heremê de erkdar in bi taybetî yên tirk, hînbûna kurdî ji wan re mecbûrî be, ji bo ku têkiliya wan bi Gelê Kurd re baştir bibe.*"[445] Lê niha ne mamosteyên tirk, yên kurd jî zimanê kurdî nizanin û bi gel re bi tirkî diaxivin ku pêwîst e ew jî têkiliyên xwe gel re bi kurdî bikin.

Di modela Medresetuzehrayê de di her beşê de sêzimanî heye, ne ku ji bo beşekê tenê ye. Pêwîst e ev qonaxa girîng bê zanîn. Lê di warê pirzimaniyê de astengî hene, yek ji wan astengiyan ev e: yekem; qanûna "YÖK"ê pêwîste bê guherandin. Ya duyem: dewlet jî hişê xwe yê di derbarê tirsa dabeşkirinê de biguhere, ji xwe û gelê kurd bawer be, astengiyên pêşiya zimanê kurdî rake û wan jî wek hemwelatiyên eslî bibîne. Bi tespîta Emrullah Beytar: "Di dinyayê de, ji bo pirzimaniyê mînak hene. Bi qasî 430 sal e netewên Îswiçrê bi aşitiyê jiyana xwe bi hevre derbas dikin. Mînkakeke din netewên Belçîkayê ye ku ew bi sê zimanan yekitiya xwe berdewam dikin. Ji aliyê Rojhilat jî Pakîstan bi 30-35 zimanan yekitiya xwe berdewam dike."[446] Lê di makezagona Tirkiyeyê de ji bilî zimanê tirkî tu zimanên din nayên naskirin. Ev rastî di makezagona Tirkiyeyê de wiha derbas dibe: "Zimanê dewletê bi tenê tirkî ye."[447] Mederesetuzehra di warê pirzimaniyê de projeyeke xweserane ye, ne ku ji bo zanîngehên heremê yê lewra zanîngehên din dikarin bi kurdî, tirk, erebî û zimanekî din bi xwerû perwerdehiyê bikin. Lê wekî projeya Medresetuzehrayê; di dunyayê de mota mot tu bibêjî di hemû beşan de perwerdehiya pirzimaniyê heye, ji aliyê me ve nayê zanîn. Lê niha hin mînakên di warê duzimanîyê de di hin beşan de hene wek; Zanîngeha "Ortadoğu", Oksford, Akdenîz û bi gelemperî zanîngehên herema Kurdistana Başûr bi kurdî, erebî, îngilizî perwerdehiyê dikin ne ku di her beşî de..

---

[444] Molla Feyzî Güzelsoy, "Bediüzzaman Said Seîdê Nursî nin Medresetüzzehra Projesi" *Osmanlıdan Günümüze Kürtler*, Bingöl Unîversitesi Yayınlari, 2013, 34-35.
[445] Ahmet Keleş, "Bediüzzaman ve Münazaratı Bir Asır Sonra Yeniden Okumak Veya Anlamak", *Münazarat Konferansı*, Merak Yayınları, Ankara, 2013, 22.
[446] Beytar, *h.b.*, 199.
[447] www.anayasa.gen.tr. pêwendî: 03.05. 2015

### 3.1.5.Beş û Binbeşên Medresetuzehrayê

Bedîuzeman Seîdê Kurdî di pirtûka xwe ya bi navê “Munazerat” de, beş û binbeşên Medresetuzehrayê pêşniyarî berpirsyaran dike ji bo ku beş bi beş îhtisas têde bê kirin wiha dibêje; “*Ji bo ku xwendevan bibin pispor hewceye ku di ketin û derketina beşan de hevnasin çêbibe û rêziknameya parvekirina karan bê kêmasî were tetbîqkirin*.”[448]

Di zanîngehênên îro de beş û binbeşên ku hene, Bedûzeman sed sal beriya niha ji bo Medresetuzehrayê fikriye û teklîf kiriye. Bedîuzeman dixwaze di Medresetuzehrayê de binbeşî hebe, lewra divê zanistên li gorî şaxên îhtisasê cuda cuda ava bibe. Hewce ye di navbera beşan de riyên ketin û derketinê hebin. Lewra dema şaxên zanistan jihev cuda bin wê demê bi hêsanî pispor wê ji van beşan mezûn bibin.

Bedîuzeman dixwaze ku dersên beşan hevpar bin. Lewra dema ders hevpar bin wê demê hiş, ruh, nêrîn, fikr û raman jî yê wek hev bin. Ger dersên hevpar tunebe wê demê dijberîtî, baxnazî, şek û şuphe dê çêbin. “*Yê hişên me ronahi dike zanistên fennî ne, yê dilê me ronahî dike zanistên dînî ne, herduk bibin yek heqiqet derdikeve holê*.”[449] Ev teklîfa hanê dê çawa di ders û beşan de cih bigre, Bedîuzeman bi hurgilî ser vî mijarê nasekine, tenê çarçove ji vê modelê re çêkiriye û hurgiliyên wê ji rêvebir û berpirsyaran re hîştiye. Abdulkadîr Menek di vî warî de wiha dibêje; “*Bi tesbîta min Medresetuzehra di asta zanîngehê de ye lê belê hewceye wek Ezherê divê têde dibistana navîn û dibistana amadehiyê jî hebe. Hebûna Darulmûallîmîn ciyê gihîştina mamosteyan e, xwendevanên Medresetuzehrayê dê “Formasyona Mamostetiyê” ji wir werbigrin. Yên ji van beşan mezûn dibin wek pisporan bên erkdarkirin*.”[450] Hevpariya medrese-teke-mekteb wek “meclîseke şûra”[451] yên rindiyên hev li hev werbigirin, ji hev re bibin alîkar û kêmasiyên hev temam bikin. Her beşek di Medresetuzehrayê de di mirov de lebatekê û hestekê temsîl dike. Di vî warî de Marûf Özkülkü wiha dibêje ; “*mekteb; hiş, Mederse; wijdan û tekke jî dil e*.” Ji bo mirovan çawa him dil him hiş him jî wîjdan pêwîst be û hev re alîkar e, ev tişt ji bo civatan jî wisa pêwîst e. Lewra wê demê kêmasiyên civatê temam dibe.

448 Seîdê Kurdî, “Munazerat”, *Dersên Civakî*, 134-135.
449 Kurdî, b.n.,142.
450 Menek, *h.g.*, 67.
451 Menek, *h.g.*, 67.

Bedîuzeman dixwaze bi projeya Medresetuzehrayê bi taybetî Medreseyên Kurdistanê û hemû alema misilmanan nûjen bike. Bi pergaleke nû gel ji kevneşopiyan û kêmasiyan xilas bike. Ew, di projeya Medresetuzehrayê de bi tenê zanîngehê nafikire. Di vî warî de Huseyîn Kara wiha dibêje; "Ev proje bi tenê zanîngeheke çar sal ji xwe re nekiriye armanc, perwedehiya jiyana mirov hemû hildide nav xwe, lewra projeyeke "şaristanî û jiyanî ye."[452] Hin caran wateya "Şube" xelet tê fêmkirin lewra bi gotina Nurettin Turgut; "di serdema îro de 'şûbe' beş an jî qisim nîne her yek tê wateya fakulteyekî, lewra di wan salên 1913-14yan de li Stenbolê di Darulfunûnê de, ji fakulteyan re "Şûbe" dihate gotin."[453] Bedîuzeman ji bo Medresetuzehrayê dibêje "alî/bilind na, alî/herî bilind e" ev gotineke balkêş e, lewra ev jî işaretî mastirê dike. Ev gotin ne gotinek e ku ji devê wî pekiyayî ye. Seîdê Kurdî di pirtûka Munazeratê de wiha dibêje; "*beşên di navbera herduyan de ji hev re ketin û derketin.*"[454]. Di warê derbasbûna beşan de Gürbüz Aksoy wiha dibêje; "*Di pergala derbasbûnê de ne bi tirsê lê bi îdeal û şefqatê derbasbûn pêwîst e. Wekî din di zanîngehan de temen girîng nebe û zanebûna berbiçav çêtir e. Wekî ku îro jî te bikaranîn, pergala dersên bi kredî were bikaranîn xwendevan dê zûtir mezûn bibin.*"[455] Lewra dema Bedîuzeman di medreseya Mihemed Celalî de xwendiye, hemû pirtûk nexwendine û ji her pirtûkekê hin mijar xwendiye û wî xwestiye ku ji demê teserûf bike. Yek jî, dema mamoste hakimê pirtûkan bin ew ê ilmê wek mifteyekê bikarin bidin xwendevanan. Medresetuzehra wek zanîngeheke parzemînî be û beşên wê li deverên din hebin. Bo nimûne, di dewletên cuda yên Ewropayê de bi pergala "Bologna"yê zanîngeh bi hev re hatine girêdan, wekî wê Bedîuzeman ev pergal ne herêmî belkî bi hişekî "zanîngeheke parzemînî"[456] fikiriye. Bedîuzeman di medreseyan de dixwaze bi perwerdehî disîplîn berdewam bike lewra bixwe jî di Medreseya Xorxorê de wisa hereket kiriye. Bedîuzeman Seîdê Kurdî dixwaze bi pirojeya Medresetuzehrayê van nerênî û îxtilafên di navbera tekke-mekteb-mederseyan de rake. Ew jî bi pergaleke sazî û bi rêkûpêkî pêwîst e. Lewra mirov çiqas dijberî hev be dîsa muhtacî hev e.

[452] Hüseyin Kara, "Üç Kitabın Birlikte Okunduğu Medeniyet" *Seîd Seîdê Nursî 'nin Eğitim Felsefesî Medresetuzehra*, İstanbul, Merak Yayınları, 2013, 243.
[453] Nurettin Turgay, "Medresetüzzehra İdeali ve Elezher Üniversitesi *Seîd Seîdê Nursî 'nin Eğitim Felsefesî Medresetuzehra,* Merak Yayınları, Ankara, 2013, 367.
[454] Turgay, *h.g.*, 367.
[455] Gürbüz Aksoy, *h.g.*, 222.
[456] Aksoy, *h.g.*, 594.

"*Ew ehlê medrese, ehlê tekiya û ehlê mektebê ku kom û firqe û beşên wê artêşa ilm û îrfana Îslamê ne, bi îfrat û tefrîtê û bi dalalet û cahiliyê, hev û din tawanbar kir û ji ber vê yekê jî, ew exlaqê Îslamî, ji binyada xwe ve hejiya û ew ahenga pêşveçûnê xera bû. Îca ji ber wan fikrên ku li hev nakin û ew meşrebên ku ji hev û din cihêrengî ne jî, rewş ne baş dibe, divê û zerûrî ye ku ev îxtîlaf werin rakirin û yekîtî û hevgirtinek di navbera fikran de pêk bê û meşreb û rewişt, nêzî hev û din werin kirin. Çawa ku deriyên qesreke ku tê de fabrîqeyeke mezin heye, gava vedibin, ji hev û din re vedibin û li hev dinihêrin û ji yek amancekê re xîzmetê dikin; eynî wisa jî, ew mekteb, medrese û tekiya, bi hevxurtkirina têkiliyan, di wê qesra bilind a Îslamê de, her yek ji wan, divê ku mîna odeyekê be ku deriyê wê, ji ya din re vekirî ye û salona wê jî, divê ku hikumet bi xwe be. Da ku her yek ji wan, kêmahiyên wan odeyên din temam bike û bi vî awayî jî, karbeşî bê pêkanîn. Îca ew têkiliya hevxurtkirinê wiha ye: Di wan dibistanên bilind de, ew heqîqetên Îslamî, bi tevî delîlên wan, divê werin xwendin û li medreseyan, di ciyê wan rîtamên filozofên berê de, ew zanistên pêwîst ên şaristaniyê, divê bi derskî werin dayîn û li tekyayan jî, ew alim û zanayên ku di branşa xwe de pispor in divê werin bicîkirin*.[457]

Li gorî Seîdê Kurdî divê di projeya Medresetuzehrayê de fakulteya amostetiyê wek navend bête pejirandin. Lewra Bedîuzeman zankoyên mamostetiyê li gorî Medreseyan pispor û bi pergal dibîne û ji medreseyan re wek mînak nîşan dide.

"*Divê ku fakulteya bilind a mamostetiyê, bi awayekî demdemî ji vê mederseyê re navend were pejirandin de ku pergal û finanskirin ji wê fakulteyê derbasî vê medreseyê bibe; îca fezîlet û diyanet jî ji vê medreseyê derbasî wê fakulteyê bibe. Bi vê hevbandoriyê ew, hev bi per û bask bikin û bibin dubaskî*."[458]

Di erdnîgariya Rojhilata Navîn de bi taybetî di Kurdistanê de rewşa medreseyan zêde baş nebû û medreseyan xwe nûjen nedikirin. Xebatên perwerdehiyeke kolektîfî tunebû, Bedîuzeman dixwest bi wasiteya Medresetuzehrayê perwerdeyeke kollektîf li herêma Kurdistanê saz bike. "Divê ew perwerdehiya ferdî ku li Kurdistanê rûniştî ye, biguhere, bibe perwerdehiya polî û komî."[459] Di mederseyan de ew edetên bi sed salan berdewam dike êdî pêwîst e rabe. Lewra him

[457] Seîdê Kurdî, "*Fîhresteya Amanc û Bernameya Wan Fikrên Bedîuzzeman Seîdê Kurdî ye*", 389-390.
[458] Kurdî, "Munazarat*"*, *Dersên Civakî*, 135.
[459] Seîdê Kurdî, "Munazarat*"*, *Dersên Civakî*, 135.

serjimara xwendevanan zêde bûne him jî yek û yek, rû bî rû gelek zemanên mirovan hildide. Pêwîst e ev rewş bê guherandin.

### 3.1.6.Deverên Projeya Medresetuzehrayê

Bedîuzeman bi berfirehî armanc û avakirina Medresetuzehrayê di Munazeratê de tîne zimên. Carna di heremên Kurdistanê de wek xebatên fizîbîlîte hin xebatan dike. Di pêşiyê de ji bo van sê cihan dibistanên wek Darutalîmê pêşniyar dike. "*Yek jê, li hêla Bêşebabê ku ev der, navenda eşîrên Ertûşê ye, ya din, di navbera Motkan, Balikan û Sasonê de, yek jî jê, li Wanê ku ev der jî, di navbera Sîpkan û Heyderan de ye, bê avakirin.*"[460]

Bedîuzeman bilî deverên ji bo darutalîm dixwest, çend deverên girîng ên ji bo projeya Medresetuzehrayê ev in: "*Him ev pêncî û pênc sal in, ez ji bo çêbûna Medresetuzehrayê dixebitim û yek li Wanê, yek Diyarbekirê û yek jî li Bedlîsê li sê cihan, lê qe nebe, li Wanê bête ava kirin.*"[461] Bedîuzeman di pirtûka Munazeratê de navnîşanên Medresetuzehrayê dide ber çavan. "Bi navê "Medreseya Zehra" ku hevala Camî'eya Ezher e, medreseyeke gelek bala ku zanîngehê jî digre nava xwe, li Bedlîsa ku di hikmê navenda Kurdistanê de ye û li du hevalên wê jî ku du hêlên wê "Wan" û "Diyarbekir" in, em divên ku ev medrese bên avakirin." Bedlîs jî di dîroka Kurdistanê de bajarekî qedîmiye di nava xwe de gelek zanyar û rewşenbîr derxistine. Diyarbekir;  ew jî di serdema Merwaniyan û Osmaniyan de bajarekî qedîm e û li ser siyaset û çanda gelê Kurd bandoreke mezin çêkiriye. Wan di herêma Kurdistanê de di ciyekî stratejîk de bû, cînarê Îranê û nezî Dewletên Ereban, paytexta Ûrartûyan û bi şopên Merwanî û Selçûqiyan li herêmê navendeke şaristaniyên dîrokî bû. Ji bo van sedemên zanistî, şaristanî, qedîmî, û coxrafî Bedîuzeman dixwest Wanê ji projeya Medresetuzehrayê re bike bingeh û mînak.

Dîsa Hemzeyê Miksî dibêje, armanca Bedîuzeman ya herî mezin ew bû ku li Kurdistanê sê mederseyan weke zanîngehekê veke: "*Yek li Wanê, yek li Bedlîsê, yek jî li Dîyarbekirê.*"[462] Hemzeyê Miksî dide zanîn ku xwestina Bedîuzeman ya ji bo zanîngehan ji aliyê hikumata Stenbolê ve bi çavekî erênî nehatiye dîtin. Bedîuzeman carna wisa gumandar dibe, wisa hêvî dike ku ji bilî Medresetuzehrayê, medreseyên

460 Kurdî, *Dersên Civakî*, 360.
461 Said Nursi, *Emirdağ Lahikası*, 430-431.
462 Müküslü Hamza, *h.b.*, 6.

hatine girtin jî dê ji nûve vebin. Lê ne mederseyên berê Medresetuzehra nehat vekirin û hê jî venebûye. “*Ez mizgîn didim ku di demekê nêz de wê li hemû Kurdistanê medreseyên wendabûyî bêne sazkirin û deverên ku medrese lê tunebin wê medrese bên avakirin.*”[463]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî di sala 1911an de bi Siltan Reşat re hevdîtinekê dike. 20 hezar zêr ji Siltan Reşat distîne û li Wanê li Navçeya Artemêtê di sala1913yan de xîmê Medresetuzehrayê datîne. Şerê Cîhanê yê yekem derdikeve, navber dikeve vê projeyê. Mele Seîdê Kurdî vê pêvajoyê wiha tîne zimên;

“*Dema desthilatiya alîgirên Îttihadiyan de ez bi Siltan Reşat re çûme Kosawayê, li wir tesîseke Darul Funûnê ya Îslamî dihate çêkirin. Min jî li wê derê ji Îttihadiyan re got; Kurdistan zêdetir mihtacî Darulfunûneke wiha ye û navenda Alema Îslamê de ye. Wê demê ji min re we’ed kirin. Paşê jî herba Balkanan derket. Cihê wê hate dagirkirin. Min ji wan re got wisa ye van bîst hezar zêran bidine Darulfunûna Kurdistanê, wan jî daxwaza min pejirandin. Ez çûme Wanê, bi hezar lireyî li kêleka Gola Wanê li Navçeya Artemêtê min xîmê Medresetuzehrayê avêt. Şerê Cîhanê derket dîsa ev projeya parave ma*.[464]

Di vî warî de di sala 1922an de Mele Seîdê Kurdî wiha dibêje:

“*Pêncî û şeş sal şûn de ez çûme Enqerê dîsa ez ji bo vê heqîqetê xebitîm. Ji dused mebûsan 163 kesan ev xwestina min pejirandin û destnîşan kirin. Ji bo avakirina medreseya min 150 hezar banqanot hate tehsîskirin. Lê hezar caran mixabin medrese hatin qedexekirin. Min û desthilatdaran li hev nekir, dîsa ev daxwaza min ma cî de*.”[465]

Bedîuzeman, li Kurdistanê bi taybetî di deverên wekî Wan, Bedlîs û Diyarbekirê de ji bo medreseyên Mederestuzehrayê bên damezirandin, bi israr di her têkilî û derfetan de tîne rojevê. Lewra Projeya Medresetuzehrayê projeyeke Îslamî û Kurdistanî ye ku ji bo pêşeroja Gelê Kurd ji aliyê Bediuzeman Seîdê Kurdî ve hatiye pêşkêşkirin. Ciyên ji bo projeya Medresetuzehrayê hatiye hilbijartin di erdnîgariya Kurdistanê de him qedîmî ne him jî stratejîk in.

---

463 Mela Seîdê Meşhur, “Nutûq*”, Dersên Civakî*, 35.
464 Said Nursi, *Emirdağ Lahîkasi*, 317,430.
465 Said Nursi, Tarihçe-*i Hayat*, 288; *Emirdağ Lahikası*, 431.

Ciyên Mederestuzehrayê yên ku Bedîuzeman di pirtûkên xwe de aniye zimên bi kurtasî evin:

1-Bi navê “Medreseya Zehra” ku hevala Camî-ul Ezher e, medreseyeke gelek bala ku unîversiteyê jî digre nava xwe, li Bedlîsa ku di hukmê navenda Kurdistanê de ye û li du hevalên wê jî ku du hêlên wê “Wan” û “Diyarbekir” in, em divên ku ev medrese bên avakirin!..”[466]

2-Ji bo li Wanê tesîseke ilm û îrfanê, di sala pêşiya me de, dê mûçe bête cuda kirin û ev kar dê dest pê bike.[467]

3-Him ev pêncî û pênc sal e, ez ji bo avakirina Medresetuzehrayê dixebitim. Ji bo ku ji wan yek li Wanê, yek li Diyarbekirê û yek jî li Bedlîsê bê avakirin. Ger li van cihan nebû li Wanê tenê be jî bila bê avakirin.[468]

4-Hemû hêz û hîmmeta xwe, ji bo ilm û irfanê, xasma bo neşra mearîf û perwerdehiya li Kurdistanê serf dikir. Hetta ji bo vekirina sê çar medreseyên wek unîversîteyan, li Wan û Bedlîs û Diyarbekirê, hate Stenbolê. Her çiqas li ser xebitî jî, lê çi heyf ku xêncî hepisxane û tîmarxaneyê tu tiştek bi dest nexist.[469]

Bedîuzzeman wek Camîul Ezherê dixwaze li Bedlîs û Wanê jî bi navê Medrsetuzehrayê darulfunûnekê veke.[470]Ji bo vekirina unîversîteyeke mîna Camî-ul Ezherê û bi navê Medresetuzehra(Zanîngeha Zehra)yê li Wanê, her çiqas fermana padîşah derket jî, lê xêncî xîmê wê, tu tiştek çênebû û herba umûmî qewimî. [471]

Her çiqas qada bikaranîna Medresetuzehrayê herêma Kurdistanê be jî lê muxatabê Medresetuzehrayê Kurdistan, Erebistan, Tirkîstan, Îran, Qafqas, Hindîstan û temamî coxrafiyaya misilmanan e.

### 3.1.7.Mamosteyên Medresetuzehrayê

Bedîuzeman Seîdê Kurdî di Munazeratê de gazî desthilatdar, hikumat û bijarteyên sereke dike, ji bo pêşeroja alim, zanyar û mamosteyên kurdan hilde

[466]Seîdê Kurdî, “Munazarat*”, Dersên Civakî,* weşanxana Zehra, Stenbol, 2013, 134.
[467] Said Nursi, *Emirdağ Lahikası*, Zehra Yayıncılık, İstanbull, 2013, 318.
[468] Said Nursi, *Emirdağ Lahikası*, Zehra Yayıncılık, İstanbul, 2013, 430-431.
[469]Seîdê Nursî, Tarhçe- *i Hayat* Zehra Yayıncılık, Stenbol, 2013, 431.
[470] Said Nursi, Tarihçe-*İ Hayat*, http://www.yeniasya.com.tr/risaleinur/tarihceihayat/#79/z pêwendî: 22.02.2016.
[471]Said Nursi, *Tarihçe- i Hayat*, Zehra Yayıncılık, İstanbul, 2013, 432

garantiyê. Desthilatdaran ji bo vê alikariya mamosteyan mecbûr dibîne û wan hişyar dike. Dema hişyariyê dide; cara pêşîn di navbera 1909-1910an de, desthilatdarên wê demê Îttihad Terakî ne, lê belê ev xwestina wî ya projeya Medresetuzehrayê tu demê nehatiye şûnê. Ji berê heta îro xwestinên gelê Kurd desthilatdaran piştguhên xwe avêtine carcaran bi zimanekî nerm piştguh kirine carnan jî bi zora hêz û çekan tepisandine. Kefa wan çawa xwestiye wisa hereket kirine. Bedîuzeman jî wiha gazî desthilatdaran kiriye;

*"Gelî tebeqeya bijarteyan! Em awam û ehlê medreseyê, heqê xwe ji we dixwazin. Divê gotinên we, kirinên we tesdîq bikin û hûn, qusûrên xelqê jî, ji xwe re, weke mazeret nebînin û karûbarên xwe neavêjin ser hev û di wê xizmeta xwe ya ku li ser we wacib e, divê hûn zexeliyê nekin û wan tiştên ku ji ber kêmahiya/xeletiya we ji dest çûne, divê hûn, careke din telafî bikin û li halên me guhdarî bikin û em dixwazin ku li ser pêdiviyên xwe, em bi we re îstîşareyê bikin û hûn hinekî terka kêfa xwe bikin û li halê me bipirsin. Em dixwazin ku hûn îstîqbala Gelê Kurd û alimên Gelê Kurd temîn bikin. Heqê me ye ku em jî, para xwe di maneya îttihad û teraqiyê de bigrin. Em tiştekî ku li ba we pir sivik; lê belê li ba me pir mezin e dixwazin."*[472]

Ew dixwaze ku mamosteyên Medresetuzehrayê; Ew, kesên wisa bin ku kurd ji wan bawer bin, ew kes kî ne? Ne bi tenê ilmên dinî, yên fenî jî bizanibin, kurdî bizanibin û di derbarê zimanê kurdî de pispor bin ku ew bên hilbijartin. Lewra mamoste aşînayê ziman nebin, wê demê di hişê wan de alozî çêdibe û mebest nayê şûnê. Bedîzeman wiha dibêje: "*Ji alimên/zanyarên kurd ên dubaskî ku kurd bi wan bawer in, an jî ji bo hînbûnê divê ji wan kesên ku bi zimanê kurdî aşîna ne, weke mamoste bên hilbijartin*."[473]Bedîuzeman taybetiyên mamostayan jî rêz dike: Dixwaze mamoste lêkolîner, belîx, rêber, zana bin û di şûna tehekumê de xwedî formasyon bin. Heke wisa bin xwendevan ji wan feyde digirin. Ne tenê ji bo mamostetiyê, pêwîst e ji her şixulî xwe re bi maharet bin. Ji bo girîngiya mamosteyan bide nişan de wiha dibêje: "Profesorê hikumateke dijmin dema were vî welatî ehlê perwerdeyê, ji bo zanebûn û zanistê pêwîste jê re hurmet bigrin û wî ziyaret bikin."[474] Lazim e mamoste di warê ilm û mearîfetê de têr û tijî bin, wek

---

[472] Seîdê Kurdî, "Munazarat", *Dersên Civakî*, 134.
[473] Seîdê Kurdî, "Munazarat", *Dersên Civakî*, 135.
[474] Said Nursî, *Lemalar*, 415

çirayekê derdorê xwe ronî bikin û civak jî bi wan ronî bibe. Pêwîste mamosteyên Medresetuzehrayê kesên xemdar nebin û kesên xembir bin.

Bedîuzeman di derbarê taybetiyên mamoste û zanyarên Medresetuzehrayê de wiha dibêje; "*Ew waiz û xetîb ku murşîdên giştî ne, hem divê bibin alimên lêkolîner da ku bi delîlan bikaribin îqna bikin. Lewra ew teswîr û bi xemilandina vegotinê, ew tiştên ku tên îdîakirin, ji wan lêkolînerên heqîqetê re bê feyde ye û hem jî divê lêkolînerekî xwedî hîkmet be da ku tiştekî, bi tirsandin an jî bi rexbetê, tiştekî ku hîna ji wê girîngtir e, ji wêsiviktir neke û ji qîmetê danexîne û bi vî awayî, ew hevdeng û pîvana şerîetê xera nekin û hem jî divê ku ew alim, di warê hîkmetê de jî xwedî belîxiyê bin da ku ew, wan gotinan bibêjin; ku li gor rewşa heyî bin û miwafiqî pêdiviyên dem û dewranê bin û li gor teşxîsa nexweşiyê bin.*"[475]

Di medreseyan de xwendevan bi salan li ber destê mamosetyekî û duduyan perwerde dibûn. Nêrînên cuda nedidîtin, mehkûmê mamosteyekî bûn. Ev tişt jî xwendevan di cihê wî de dizivirand. Di demên berê de şagirtan ji yek, du, sê mamosteyan ders werdigirtin, îcazet distandin. Lê di modela Medresetuzehrayê de wekî "Model Zanîngeh" herî hindik xwendevan dê ji bîst mamosteyan dersê bigirin. Yek xwendevan yê di nava xelqeya bîst mamosteyî/ê de perwerde bibe. Nûrsî jî "*ew edetê mustemîre/berdewam dike, li ferdan derkeve bibe xelqe û daîre.*"[476] Nexweşiyek di navbera mamosteyên mederese, mekteb û tekeyê de hebû. Her tim hev tawanbar dikirin. Dema xwendevan ji Medresetuzehrayê mezûn bin, wê mastir/lisansa bilind bikin û di Medresetuzehrayê de bibin mamoste. Ew çavnebarî û tawanbariya di navbera mamosteyan de dê rabe. Bedîuzeman wiha dibêje; "*Lewra her yek ji wan, li ser pîşeya xwe ketiye teessûb/hişkebaweriyê û li hemberî pîşeya yên din ji aliyê sethiyê/kufrê ve îfrat û tefrîtê dike û yek yekî bi kufrê; yek jî yekî bi cahiliyê tawanbar dike.*"[477] Bedîuzeman gengeşiyê li ser mamosteyan dike. Sedema wê "Yên zîrek çûne mektebê", dewlemendan jî tenezulê aboriya Medreseyan nekirine. Zarokên dewlemendan li xwe nedianîn herin malekî zexîrê bixwazin, ji xwe re wek piçûkxistin didîtin. Lewra Bedîûzeman jî wek wan ratip û zexîre berhev

---

[475] Seîdê Kurdî, *"*Fîhresteya Amanc û Bernameya Wan Fikrên Bedîuzzeman Seîdê Kurdî ye*", Dersên Civakî,* 390-391.
[476] Seîdê Kurdî, "Munazarat", *Dersên Civakî*, 136.
[477] Seîdê Kurdî, "Munazarat", *Dersên Civakî*, 137.

nekiriye, bi van kirinên xwe zarên dewlemendan tesdîq kiriye."[478] Wê demê mamosteyên jêhatî di mederseyan de derneketin. Ji bo vê divê lome li mamosteyên medreseyan neyê kirin.

Di Herêma Kurdistanê de bandora alim, şex, seyîd û axayan hebû û li hin ciyan bandora axayan zêdetir ser gelê devera wî hebû. Bandoran axayan belkî li ser êla wî tenê hebû lê ya şêx û seyîdan bi wasiteya murîdên wan li her aliyê Kurdistanê xwe nîşan dida. Mînak: şêxên neqşibendiyan, qadiriyan û hwd. Dema medreseyên Kurdistanê xwe nûjen nekirin hin şêx û seyîdan bi îstibdata ilmî bandor dane ser gel. Dema Bedîuzeman di nava eşîran de danasîna meşrutiyetê/azadiyê dike hin kes jê dipirsin; "*Li hember merivekî mezin, li hember weliyekî yan jî li ber şêxek û alimekî mezin em, dê bi çi awayî azad bin?*"[479] Di 1909an de li herêma Kurdistanê ev pirs rewşa gelê Kurd bi gelemperî ji aliyê perwerdehiyê ve berçav dike. Saftiyeke wek zarokan, bê şek û bê şuphe teslîmbûneke safiyane ev rewş dibe sedemên zilm û zordariya ser wan. Bedîuzeman jî dixwaze bi wasita mamosteyên Medresetuehrayê wan ji vê xewa giran şiyar bike. Seîdê Kurdî bersiva pirsa wan ya di derbarê mamoste şêx, alim û seyîdan de wiha dibêje; "*Nîşanên welîtî, şêxîtî û mezinahiyê, tewazû û nefsbiçûkî ye; ne muretî û zordestî ye. Nexwe yê ku quretî dike, mîna wî zarokê ku xwe bi darê zorê li şêxîtiyê girêdide ye. Hûn jî, bi çavê mezinan li wan nenihêrin.*"[480] Dema perwerdehiyeke azad di medrseyan de hebe şah û geda, mamoste û xwendevan dê wek hev bin. Wê demê mamoste ji xwe re zanistê nakin wasiteya zordariyê. Lewra hin xetayên şêx û meşayixan derdikevin nêçîra dîn û aboriyê, ew jî dibe sedema nêrîneke nebaş.

Bedîzeman wiha dibêje; "*qabiliyeta îstinbata meseleyê ku bi nêrîna li kitêbê pêk tê, xistine şûna melekeya ilmê û di navbera telebeyan de, munazereyan nakin û pirs û bersivdan, ji ber ku kêm e, hin hal û rewşên wekî dilsarî û kêmferasetî û teralî derketine holê.*"[481] Mijar bi tenê meseleyên dînî ne û nêrîna zanistên di derbarê kaînatê de çi ye nizanin ku wê demê baxnazî çêdibe. Bedîzeman di derbarê vê mijarê de wiha dibêje; "*Bi awa û usûlên ilmên din ên derheqê kaînatê de ku mirov şaş û*

[478] Kurdî, b.n., 138.
[479] Kurdî, b.n., 101.
[480] Kurdî, b.n., 101.
[481] Seîdê Kurdî, "Dîwana Herba Urfî", *Dersên Civakî*, 169-171.

*metel dihêlin.*"[482] Ew dixwaze mamoste bi metoda munazarayê ders bidin. Lewra di navbera xwendavanan de munazara, pirs-bersiv hebin wê demê qabiliyetên wan yên ilmî derdikevin pêş. Pêwîst e xwendevan xwe azad bibînin, çi pirs were hişê wan dê bikaribin pirs bikin. Dema mirov azad be wê demê ji her alî ve geşedanê çêbibe. Pêwîst e di perwerdeyê de motîvasyon û rûmetdarî hebe, wê demê xwendevan bi dil û can tê girêdan. Medrese divê bi mekteban re bikaribin pêşbaziyê bikin. Bedîuzeman di pirtûka Nûtûqê de dibêje, divê mamoste di derbarê pîşeya xwe de zana bin, belaxatê wan baş bin, wisa zana bin ku rastiyan xira nekin. Seîdê Kurdî wiha dibêje; "*ku bi lêkolînan gihîştine rastiyan da ku îsbat û îqna bikin. Hem divê xwedî hîkmeteke wisa hûr, kûr û dûr bin ku wê muwazeneya şerîetê xera nekin.*"[483] Di vê sedsala dawî de kes li pey xurefeyan û gotinên bêbingeh naçe. Bedîuzeman wiha dibêje; "*Lewra biserketina li hember medeniyan bi îqnakirinê ye; ne bi zorpêdayîna mîna wan hovan e ku ji gotinan fêm nakin*."[484] Pêwîst e mamosteyên Medresetuzehrayê pergalên perwerdehiya dinyayê her tim bişopînin, ji metod û teknîkên nû alîkariyê bigrin, di parzûna pergala Medresetuzehrayê re derbas bikin û wisa hildin.

Mamoste pêwîst e zanistên xwe bi xwendevanan bide hezmkirin. Zanistên bêbingeh û belavok nede xwendevanên xwe. Dema mamoste wisa neke ew nagihêje armanca xwe.

Mamoste û xwendevanê Medresetuzehrayê dema bên girtin, taybetiyên wan girîng in. Mehmet Akif Yazıcı di wî warî de dibêje: "*Mamosteyên bên girtin ji wan re kirîter pêwîst in, xwendevan jî wisa. Divê lijneyek bête damezirandin û ew wisa bên girtin*."[485] Di nêrîna Bedîuzeman de, divê di navbera Mamoste û xwendevan de têkiliyeke rêber, bira û heval hebe. Bedîuzeman wiha dibêje: "*Ez jî hevalê we yê dersê me*."[486] Ev gotin di gelek cihên Rîsaleyê de derbas dibe. Pêwîst e mamoste xwendevanan bîne heyecan û coşê. Ew, di xwendevanan de tunebûna munazarayê û pirs-bersîvê şewqa wan dikuje, bêxîretiyê çêdike. Ji bo xwendevan baş bigîhijin,

---

[482] Kurdî, b.n., 169-171.

[483] Seîdê Kurdî, "Nutûq*"* , *Dersên Civakî*, 24.

[484] Seîdê Kurdî, "*Heqîqet*", Rojnameya Volkan Hejmar: 70, Rûpel: , 326 Şubat/Sibat 1324, 10 Adar 1909, *Dersên Civakî*, 382.

[485] Mehmet Akif Yazıcı,"Medresetüzzehranın Lisans Üstü Boyutu ve Kısa Vadede Gerçeleştirilebilecek Öneriler" *Seîdê Nursî'nın Eğitim Felsefesî Medresetuzehra*, 728.

[486] Said Nursi, *Emirdağ Lahikası*, 712

bibin hakimên zanistê divê di nava xwendevanan de îhtisas û pisporî wek mijareke herî girîng bê zanîn. Selamî Yuksel jî ji bo pisporiya mamosteyan wiha dibêje; "*dema dersên fenî û dînî tê dayin di vê qadê de pêwîst e bernameya pisporên dersan girîng bê zanîn û wisa bê amadekirin*."[487] Nepêwîst e mamoste her tiştî bizanibe, jixwe hêza kesekî jî nagihîje her tiştî. Mirovên ku bixwaze dest biavêje her tiştî, nagihêje armanca xwe. Bedîuzeman jî ji bo xwendevan û mamosetyan dibêje: "*Him jî rastiyeke dîrokî ye, mirovek di aliyê gelek fenan de nikare bibe xwedî zanîn û nabe pispor jî, lê mirovek tenê dikare çar û pênc fenan de bibe pispor. Lewra dest avêtina her tiştî bêîmkanbûna her tiştî ye*."[488]

Bi nêrîna Bedîuzeman, divê mamoste qabiliyetên xwendevanan çibe, wan li gorî wê perwerde bike. Wê demê qabileyetên xwendevan wê înkişaf bike, mirov wê feydeyekê jê bistîne. Mamoste, xwendevanan wisa perwerde nekin, dê xwendekar dilsar bin, dê ew qabiliyetên wan kor bibe. Pêwîst e mamoste di jiyana xwe de van rastiyan bijî, lewra mamoste tiştê neke divê nebêje, heger bibêje wê demê tesîrê nade ser xwendevanan. Seîdê Nûrsî di vî warî de wiha dibêje; "*Mirov nefsa xwe islah neke nikare yên din islah bike*."[489] Taybetiyên mamosteyan ew e ku ew, hakimê zanistê bin. Di zanistê de xwedî ilmekî kûr be, paşeroj û pêşerojê rind bizanibe û berbiçav bike. Bedîuzeman; "*Taybetiyên heqîqetnasan xweznebarî ye, divê di bin tesîra demê de nemînin, bikevin nava kûrahiya paşerojê, bi pîvana terezuyê bipîvin û çavkaniya her tiştî bibînin.*"[490] Bedîuzeman işaret dike ku di dawiya dawî herkesê bizivire ser zanistê. Nûrsî xilasbûna mirovahiyê di perwerdehiyê de dibîne û wisa dibêje; "*Helbet mirovahî di dawiya demê de dê biherike nava ilm/zanist û funûnê. Yê timamî hêza xwe ji zanistê bigire. Desthilatdarî û hêz dê bikeve destê zanistê.*"[491] Nexweşiyeke Medresyan ew bû ku di navbera mamoste û xwendevanan de "îlmî îstîbdat" hebû.[492] Hin aliman ilmên xwe wek darê zorê li ser serê xwendevanan bi kar dianîn ew jî dibû sedema durûtiyê. Lewra sedemên esil "îstibdada siyasî"[493] bû û

[487] Selami Yuksel, "Din ve Fen İlimlerinin Birlikteliği Bağlamında Medresetüzzehra", *Kovara Ortak Zemin*, Gaziantep, 2012, 13.
[488] Said Nursi, *Muhakemat*, 26,
[489] Said Nursi, "Sözler", http://www.erisale.com/#content.tr.1.362 pêwendî:13.07.2015
[490] Said Nursi, "Muhakemat", 37, http://www.erisale.com/ #content.tr.13.37 pêwendî: 13.07.2015
[491] Saiddê Nursi, Sözler, 357. http://www.erisale.com/ #content.tr.1.357
[492] Ekrem Akman, "Takdis Edilen Kurum ve Sıfatların İstibdat Aracına Dönüşmesi Karşısında Bediüzamanın Tavrı", *Munazarat sempozyumu I*, Merak Yayınları, Ankara 2013, 840-481.
[493] Akman, *h.b.*, 480.

îlankirina Meşrûtiyetê belkî bibûya dermanê van nexweşiyan. Bedîuzeman jî gelek ji meşrûtiyetê hêvîdar bû ku bi rêya azadiyê ev “ilmî îstîbdat” û “îstibdadê siyasî” di jiyana gel de rabe. Bedîuzeman dema behsa îstibdada ilmê dike dixwaze medrese ji lîka hukemayên berê xilas bibe, bi sed salan pêşiya zanyarên misilman de wek sirekî astengiyek bû. Lewra îstibdada îlmê û îstîbdada mamosteyan dibe sedema teqlîdkariyê. Seîdê Kurdî wiha dibêje; “bi min di meseleyên dînî de, pêkutiya/zordariya ilmî ye ku xîmê teqlîdê daniye û pê îxtîlafan deraniye û kiriye ku firqeyên/komên dalaletê/xurufî yên mîna Mutezîle, Cebriye, Murciye û Mucessîme yan ji Îslamiyetê bizên/derkevin.”[494] Ekrem Akman jî dibêje; “*Îro jî dewlet ji bo îdeolojiya xwe belavî her aliyî bike bi wasiteya zanîngehan û mamosteyan vê îdeolojiya xwe dimeşîne*.”[495] Ji bo van sedeman Bedîuzeman naxwaze aboriya Medresetuzehrayê ji aliyê dewletê ve bê dayin. Lewra dema miaşên mamosteyan bi wasiteya weqif û xebatên wê nebe dê bikeve bin tesîra dewletê, wê demê jî “ilmî îstîbdat” û “îstibdadê siyasî” dîsa dê bibe hakimê medrese û dibistanan. “*Zaroka îstibdada siyasî û bavê teqlîdê îstibdada ilmî ye*”.[496] Yan her çi hebe sedemên wê zordarî ye. Ji bo di medreseyan de ilmî îstibdat çênebe ev tişt pêwîste; heke meşrûtiyeta ilmê, digel heqiya xwe bê damezrandin mamosteyên medreseyan di mederseyan de bi metoda meşrûtiyetê perwerdehiyê berdewam bikin, zanisteke azad, siyaseteke azad, civakeke azad wê di jiyana mirovan de bijî. Sedemên xirabûneke medreseyan jî ew bû ku danûstana diyariyan di navbera xwendevan û mamosteyan de çêdibû ew jî wek bertîl dihate bikaranîn. Lewra hin mamosteyan zanista xwe dikirin wasiteyê aboriyê. Bedîuzeman jî ji bo heysiyeta zanistê ji zanyaran mihefaza bike diyariyên kesî nepejirandiye. Sedemên wê jî bi çend qonaxan rêz dike ; “*Ew zanyariyê dikin aletê berjewendiyê xwe. Bêminetiyê bi kirinên xwe nîşan bide, yên diyariyan didin ji bo riza Xwedê nadin, hêviya wan li tiştekî ye*.”[497] Pêwîst e mamosteyên Medrestuzehrayê herdem heysiyeta xwe û ya ilmê xwe mihafaza bike. Lewra mirov divê di jiyana xwe de û bi kirinên xwe bijî. Bedîuzeman wek dustûrekê ji bo mamoste û xwendevanan mînakekê dide; “*Ilim ‘ezîz e; naxwazim zelîl bikim. Hem jî dixwazim nîşanî we bidim ku beşek ji ehlê ilmê heye, tenezzulî dinyayê nake û*

[494] Seîdê Kurdî, “Munazarat*”, Dersên Civakî*, 86.
[495] Akman, *h.b.*, 481.
[496] Seîdê Kurdî, *“*Munazarat*”*, *Dersên Civakî*, 87.
[497] Nursî, *Mektubat*, 23-25.

*hunera ilmê, ji debara/meîşeta xwe re nake navgîn. Îca herçî telebe ye,ne mîna wan kesên parsek û kesên ku malê gel digerin e.*”[498] gotiye û di jiyana xwe de her tim wek dustûrekî bi kar aniye.

Pêwîst e mamosteyên Medresetuzehrayê bi rasthatî neyên hilbijartin, ji bo hilbijartina mamosteyan lijneyek bê sazkirin û taybetiyên lijneyê jî ev bin:

1. Xwedî ilmên dînî û zanistên nûjen bin
2. Xwedî edalet û heqnas bin
3. Zanayên beşa xwe bin, ji beşên din agahdar bin
4. Di warê pirzimaniyê de zana bin(erebî, kurdî û tirkî)
5. Bi giştî di warê perwerdehiyê de mastir û doktora kiribin
6. Kesên Kurd bin yan jî kurdnas bin, lewra projeya Medresetuzehrayê projeyeke Kurdistanî ye. (Bedîuzeman tu demî û di tu pirtûkên xwe de ji bilî Wan, Bedlîs û Diyarbekirê cihekî din negotiye.)
7. Ehlê hemiyet bin.

Li gorî Bedîuzeman divê Mamosteyên Medresetuzehrayê bi kurtasî wiha bin:

1. Çanda di nav de dijî û ya derdorê bizanibe.

2. Him dema tê de dijî him jî rabirdû/ayendeyê haydar be û wisa xwe bigihîne.

3. Ji zanista dînî û fenî haydar be, bi taybetî pisporê beşa xwe be.

4. Divê aşînayê zimanê kurdî be û zimanê erebî û tirkî fêm bike.

5. Bi xwendevanan re bi zimanê îqna û hezkirinê têkiliyên wî hebe û dersan wisa bide.

6. Heq û hiqûqên xwendevanan raçev bike.

7. Xwediyê asoyeke berfireh be.

8. Ji bo netewa xwe xwediyê fikreke erênî be, dijî nijadperestiyê be.
9. Xwe di meqamê zanisteke erênî de bibîne, têkiliya xwe û xwendevanan berdewam bike.

---

[498] Seîdê Kurdî, “Munazarat”, *Dersên Civakî*, 124.

10. Xwediyê fikreke azad be û bi fikr û ramanên xwe di çarçova îmanê de bijî.
11. Bi zanistiya xwe zordariyê/tahakumê neke.
12. Bi mamosteyên hevalê xwe re projeyên zanistî amade bike.
13. Ji dinyayê haydar be, têkiliyên wî bi zanîngeh û mamosteyên cihanê re hebe.
14. Ilm û hikmet li ku hebe bişopîne û wek malê wendabûyî lêbigere.
15. Mehkûmê pirtûkan nebe hakimên wan be.
16. Di nava zanebûna xwe de bihele û dilnizm be.
17. Xwediyê fikreke vekoler be.
18. Wek sefîlan li hêviya kesî nebe û şixulê xwe bixwe bike.
19. Divê ehlê rastiyê be lê her rastiyê li her cihî nebêje.
20. Li dijî xurefeyan be, kirinên xwe di parzûna hiş û dil re derbas bike.
21. Rêber be, xwedî edalet be.
22. Gotinên wî ji hiş û dilan re ronakdar be.
23. Xemdar nebe û xembir be.
24. Xwedî empatî be.
25. Mamosteyekî biewle/emîn be û wisa bijî.
26. Hestên wî li pey hişên wî be.
27. Mamosteyekî xwedî me'rîfet be.
28. Xwedî armanc be, bizanibe çi dike.
29. Mamosteyekî xwedî heya be.
30. Gotinên xwe bipêje, paşê bibêje.

### 3.1.8.Aboriya Medresetuzehrayê

Ji bo çareseriya aboriya Medresetuzehrayê Bedîuzeman Seîdê Kurdî di kitêba xwe ya Munazeratê de wiha dibêje: "*hemiyetperwerî/welatperwerî û xîretkêşi*"[499]di nava kurdan de geş bibe. Di nava Milletê Kurd de welatparêzî û xîret hebe di derbarê aboriyê de tu tengasî nayê kişandin. Lewra di nava Gelê Kurd de eşîretî, qebîle û bavkêşiya tiştên piçûk ji holê rabe û herkes tenê pêşdeçûna gelê xwe bifikire helbet ji tu aliyî ve pirsgirêk namîne.

[499] Seîdê Kurdî, "Munazarat", *Dersên Civakî*, 136.

Di Projeya Medresetuzehrayê de ji aliyê çareseriya yekitiya Milletê Kurd de cewherên mezin hene. Ew cewher jî encax bi hişyarbûna niştîmanperweriyê dê çêbibe. Bedîuzeman wiha dibêje; "*Peyre ev medrese, mîna dendikan bi potansiyelî dareke Tûbayê di xwe de dihewîne. Heke bi hemiyetperwerî/niştimanperwerî û xîretkêşiyê bê hêşînkirin, bi vê cureyê ew dê bi xwe, ji we re finansekî peyda bike û hewceyî kîsikê we yê vala nabe.*"[500] Pêwîste mirovên zana û zîrek bi zanebûn û zîrektiya xwe ji Medresetuzehrayê re xizmetê bikin. Bedîuzeman dibêje: "*Heke mirovên zîrek, zikata zekawetên xwe û mirovên dewlemend jî welew zikata zikatê be jî ji bo berjewendiyên gelê xwe xerc bikin, dibe ku gelê me jî, di rê de bigihîje gelên din.*"[501] Bi ya me mifteya aboriya Medresetuzehrayê di vê hevokê de ye.

Bedîuzeman ji bo ku Medresetuzehra aboriya xwe vegerîne di şûna alikariya bi biminetê de şertekî misilmantiyê, 'zikat'ê pêşniyar dike. Lewra dema ev şert bê şûnê, roj were wê bi xizmet û kirinên xwe, ev aş dê bê minet bigere. "*Zekat e. Lewra em (Kurd) Şafiî ne. Piştî demekê ew "Medresetuzehra", bi wan xizmetên xwe yên ku dê ji Îslam û mirovahiyê re bike, bêguman dê hin zekatan heq bike. Nexasim zekata zekatê jî bes e. Ev medrese, çawa ku dê bi nîşandana encamên/fekiyên baş bi ronîkirina giştî û bi xizmetkirina ji Îslamê re li bal hişmendan bibe dibistaneke herî kemilî, di çavê wijdanan de jî, dê nûnertiya zawiyeyeke herî pîroz bike. Çawa ku mederse ye, ji ber ku wisa jî dibistan û tekiya ye, nezir û sedeqeyên ku alîkariya netewî ya Îslamê ne, dê qismek jê, ber pê ve biçe."*[502] Di Mezhebê Şafiî de, li herêmekê heya xizanên/feqîrên wan hebin, ji wê herêmê zikat derxistina derve heram e. Ji ber vê yekê, Dugela Osmanî(xelîfetî bû) bi sedemên xizaniya Kurdistanê divê zikat nebirana derve, ango Stenbolê. Bedîuzeman Seîdê Kurdî dibêje "*Dûgela Osmanî ev tişt nekiribûya dê Kurdistan ji vê xizaniyê rizgar bibûya.*"[503] Servet Özdemir wiha dibêje; "*Divê hatinên sedeqe û neziran piçûk neyê dîtin lewra niha jî THK(Saziya Hewa ya Tirk) û hin weqfê din di nav dîndaran de postê qurbanê bi navê sedeqe û neziran berhev dikin û bi milyaran dahata wan çêdibe.*"[504]

---

[500] Kurdî, b.n., 136.
[501] Kurdî, b.n., 122.
[502] Kurdî, b.n., 135,136.
[503] Etmanî, *h.b.*, 199.
[504] Seîdê Kurdî, "Munazarat", *Dersên Civakî*, 428.

Di warê aboriyê ve di navbera Zanko û Medreseyan de pêwîst e danûstan hebe û ji hev re bibin destek(dema ev projeya di nava gel de hate girtin) êdî hewceyiya wê bi kesî namîne. “*Ji bo wê pevguherîn û danûstana navbera Medrese û Fakulteyên ku behsa wan hat kirin, ji ber ku bi fakulteya Mamosteyan re îmtîzac/hevgirtin dike, hatinên fermî yên ku ji Zankoya Mamosteyan re tên dê hinekî berfireh bibe û bê parkirin û bi awayekî demdemî û bi deyndarî heke derfet hebe dê ji Medreseyê re jî bê dayîn. Piştî demekê dê êdî pêdiviya wê pê nemîne û ew deynên ku ji Zankoya Mamosteyan kiriye, dê bi paşve bide*.”[505] Aboriya Medresetuzehrayê bi zikat, sedeqe, nezir û hinek alikariyên din yên xêrxwazan û hemiyetperweran dê bê çareserkirin. Dê cihên Medresetuzehrayê wek kampusan berfireh û gelek şaxên wê jî hebin. Bi hezaran xwendevan, mamosteyên wê, kelûmelên perwerdeyê û ji wan hemûyan re butçeyek pêwîst e. Lewra bi gotina Bedîuzeman bi fedakariya mamosteyan Medresetuzehra dê bi halê xwe yê samîmiyane xizmetê bike û di nava gel de dê bê qebûl kirin û mineta wê dê ji kîsikê kesî tunebe. Medresetuzehra bi projeyên xwe yên zanistî dikare di nava dewletên navnetewî de bibe nimûne û bi van projeyên xwe dikare qismek dahatên xwe yên aboriyê temîn bike.

Di dinyayê de gelo mînakên wek Medresetuzehrayê hene yan na? Di vî warî de Gürbüz Aksoy wiha dibêje; “*Di hinek zanîngehên Emerîka de, zanîngeh çavkaniyên xwe yên aboriyê bi xebat û projeyên xwe berdewam dikin. Ji bo vê yekê ji aliyê rêvebirî û aboriyê ve serxwebûna wan zêde ye. Di modela Medresetuzehrayê de ev rewş heye*.”[506] Dema di zanîngehan de serxwebûneke aboriyê hebe wê demê rêvebiriya zanîngehê jî bê minet dibe. Bê minetî jî dê bibe sedema fikr û ramanên azad. Ji bo zanisteke azad pêwîstiya aboriyeke bê minet heye, wê demê xwendevanên azad di vir de dê bên perwerde kirin ku ew ê jî civakeke azad saz bikin. Ji bo aboriyeke bêminet pêwîst e pergalên nû bên sazkirin. Lewra belkî car heye zikat û sedeqe tiştên din tene ji bo projeyên mezin têrê nekin. Ji bo sîstemeke wiha Gürbüz Aksoy wiha dibêje: “Divê nirxên xwecihî û çandî bi nirxên gerdûnî re bên hevgihandin, bi civakê re pirên bihêz bên avakirin da ku tevlêbûneke bihêztir a geşepêdana herêmî û neteweyî pêk bê, di her temenî de xwendevan bên.”[507] Wek

---

[505] Kurdî, b.n., r. 136.
[506] Gürbüz Aksoy, “Türk-Kürt Birlikteliği Çevresinde Medresetüzzehra”, *Münazarat Konferansı,* 218.
[507] Gürbüz Aksoy, ***h.g.***, 219-220.

nimûne Dewleta Birîtanya îro ne tenê aboriya zanîngehan, aboriya dewletê jî bi piranî li ser zimanê îngilîzî dizivire. Di her aliyê cihanê de ji bo ziman hîn bibin civanên zanîngehan diçin bi salan jiyana xwe li wê derê derbas dikin. Wê demê dewleta Birîtanyayê bi zimanê xwe re çand, teknolojî û her tiştê xwe difroşe dinyayê.

Heke pergaleke baş ji bo Medresetuzehrayê bê çêkirin ew jî dikare aboriya xwe bi rehetî temîn bike. Bi modela Medresetuzehra pergaleke zanistî bê sazkirin ew ê bibe sedema xilasiya Gelê Kurd. Lewra Wan-Diyarbekir-Bedlîs sê navendên Kurdistanê yên dîrokî ne, dema Medresetuzehra geş be li wan deveran dê ji her aliyê Kurdistanê, ji her aliyê dinyayê bi taybetî jî ji aliyê alema misilman xwendevan werin di van zanîngehan de perwerde bibin, hevnas bibin, hêzeke kolektîf û hişekî kolektîf di navbera wan de çêbibe û ev navend dê bibin wek Dawos û wê biryarên aboriyê li wir bên girtin. Biryarên siyasî û civakî li van navendan dê bê girtin ew jî dê ji her alî ve di heremê de bibe sedemên geşedanan. Bi taybetî ji aliyê aboriyê ve dê tu minet jî nemîne û dê perwerdeya Medresetuzehrayê hêsantir bibe.

### 3.1.10.Nav û Statûya Medresetuzehrayê

Zehra peyveke mêza ye ku wekî welûd û lêzêdebûnê dikare bê fêmkirin û mirov dikare wê biwekîne kaniyekê. Peyva Zehrayê di ferhengê de tê wateya, Kulîlk, ronakdar, biriqandin, geşedan, mezinbûn, derketina holê û hwd. [508] Wekî din jî navê keça Pêxember e(eleyhîselam).[509]

Bedîuzeman Seîdê Kurdî xwestiye wek zanîngehên fermî bi statû be û bi qîmet be. Ezmûnên wê jî dê wek yên fermî bin lê belê Bedîuzeman nexwestiyê wê bike bin bandora dewletê. Li gor wî, Medresetuzehra bi destûr û bi alîkariya dewletê bê damezirandin, paşê dema pêş ket û xwe xwedî kir ew ê îhtiyaca wê li dewletê nemîne.[510]

Ya tê zanîn Medresetuzehra projeyeke zanîngehê ye. Lê belê Bedîuzeman dixwaze di nava navê wê de “Medrese” hebe. Serdar Şengul dibêje; Bedîuzeman ji

---

[508] Mutçali, *Arapça-Türkçe Sözlük,* 364.
[509] Tekin, *h.b.*, www.zehra.com.tr/bediuzzaman-said-Seîdê Nursî -ve-egitim-modeli-olarak-medresetuzzehra_ h111228.html
[510] Seîdê Kurdî, “Munazarat*”*, *Dersên Civakî,* 141.

bo mederseyan nêrînên wî yên klasîk tunene, dixwaze zanistên dînî û fenî bi hev re mecz bike. Û di navbera wan de cardin aşitiyê çêbike.[511]

Medresetuzehra çiqas di karên xwe yên hundirîn de serbest be jî, lê pêwîst e bawernameyên wê di yên fermî de di yek astî de be û di her karî de denk be. Bedîuzeman Seîdê Kurdî wiha dibêje; "Ji medreseyê re dîtina fonekê/aborî û ji xwendekarên wê re jî, peydakirina hatineke qût ê aboriya xwe bikin. Him jî divê ev medrese, hempayê dibistanên bilind ên fermî be û divê ku ezmûnên medreseyê, mîna ezmûnên fermî, bi encam bin da ku yên jê kuta/mezûn dibin, betal û bêşixul nemînin."[512] Bedîuzeman dixwaze ev zanîngeh projeya Medresetuzehrayê îfa bike, bi navê "Medrese" bîne şûne. "Bi navê "Medrese" yê bê navkirin ku ev nav ji ber ku hem nasyar, hogir, kêşîndar, dilxwazînger û rûmetdar e, hem ji bona ku heqîqeteke mezin jî di xwe de dihewîne û rexbetan şiyar dike, divê bi vî navî bê binavkirin."[513]

Ew medreseyên li herêma Kurdistanê hatine rakirin û yên niha berdewam dikin çiqas şixulên aborî û fermî hene divê ji aliyê weqfan ve û Wezerata Perwerdehiyê ve were dayîn ku ji bo pêşeroja âlim/zanyar û Gelê Kurd bikeve bin garantiyê. "Tayîna feqî û telebeyan ku li cem wan herî zêde girîng ew e, ji aliyê Mearîf û Ewqafê/Weqfan ve bê dayin."[514]

Abdulkadir Menek wiha dibêje: "*Medresetuzehra û dibistanên fermî dengî hev bin lê pêwîst e "taybet" be. Wiha difikire ku asteke fermî lê belê serbixwe be*."[515] Ji bo ev proje, bibe projeyeke gelemperî pêwîst e ji aliyê bawernameyan de mora dewletê lêbikeve û ji aliyê aboriyê de azad be. Dema ji aliyê aboriyê de azad be, bê minetî di nava xwendevan û mamosteyan de dê hebe û wê demê fikr û ramanên azad yê geş bide. Erdoğan Çelebî wiha dibêje; "*him dewlet dikare vê projeyê hilde serxwe him jî teşebusên taybet jî dikare hilde serxwe. Ew jî hevpariyeke dewlet û weqfê ye ku dikare wek modelekê were qebûlkirin. Lêbelê bi makezagona dewletê damezirandina dibistan û zanîngehên taybet nabe*."[516]

---

511 Şengül, *h.b.*, 214.
512 Seîdê Kurdî, "Munazarat", *Dersên Civakî,* 135.
513 Kurdî, b.n., 134.
514 Seîdê Kurdî, "Xîtaba Bedîuzzeman Seîdê Seîdê Kurdî ya Li Meb'ûsan" , *Dersên Civakî,* 374.
515 Menek, *Said Nursi 'nin Eğitim Felsefesî Medresetuzehra*, 69.
516 Erdoğan Çelebi, Sivil Toplum Kuruluşları Perspektifi Bağlamında Bediüzzamanın Medrestüzzehra Eğitim Modeli", *Said Nursi'nin Eğitim Felsefesî Medresetuzehra*, 618.

Di derbarê Têkiliya Medresetuzehrayê û YÖKê de Mehmet Akîf Yazıcı wiha dibêje; "*Medresetuzehra û YÖK, têkiliya wan û di dersên Dîroka Înqilabê de pirsgirêk hene. Lewra pêwîst e qanûna Tewhîd û Tedrîsatê bê guhertin. Hilbijartina xwendevanan ku ew bi sîstema OSYMyê tên girtin înîsiyatîfekê nade rêvebiriya zanîngehê, mamosteyên zanîngehê jî ne li gorî şert û mercên Medresetuzehrayê ne*."[517] Îro jî mirov dibîne ku hin dibistan û zanîngehên bi qesta Medresetuzehrayê vebûne hene, lê ji aliyê bername, mamoste û hilbijartina xwendevanan de kêmasiyên wan hene. Di pergala perwerdeya îro de şert û mercê Medresetuzehrayê nayê şûnê. Lewra belkî hin dibistan û zanîngehên taybet û weqfan hebin jî lê belê şûna modela Medresetuzehrayê nagirin.

[517] Yazıcı, *h.g*,, 726.

**ENCAM**

Bedîuzeman Seîdê Kurdî kesayetiyekî çalak û bi bandor e. Di medereseyên Kurdistanê yên klasîk de, li bajêrên cuda cuda perwerde dibe û xwendina xwe ya eslî li cem Mela Mihemedê Celalî werdigre. Di jiyana wî de ya herî girîng bêminetya wî ye, bi îsbat nîşanî me daye ku zikat dîyarî/xelat yên gel û rêvebiran ji bo şerefa ilmê muhafaza bike qebûl nekiriye. Her tim di xebatên xwe de riza Xwedê û menfeata gel ser berjewendiyên xwe yên şexsî re girtiye. Di xebatên civakî û siyasî de bi nêrîneke gelemperî fikiriye, xwestiye rizgariya gelan bi rêbazeke mirovî û îslamî bibe.

Di jiyana Seîdê Kurdî de gelek bajaran cih girtine ku ji van yên herî bi bandor Wan û Stenbol in. Têkilîyên wî bi rêvebirên dewletê re cara yekem li bajarê Bedlîsê, bi Walî Ömer paşa re çêdibe û du sal paşê diçe Wanê, bi qasî 20 salî li Wanê dijî. Bingeha fikr û ramanên wî yên di derbarê perwerdeyê, civakê û sîyasetê de li bajarê Wanê dikemîle. Di dema pewredehiya mederseyan de kêmasiyên wan dibîne, ji bo çareseriya dibistanan, îhyakirina medreseya û nexweşiyên di nava gelê kurd de çareser bike di 1907an de diçe Stenbolê. Bi rêvebirên dewletê re hevdîtinan dike û pirsgirêkên gelê kurd bi daxwaznameyekê pêşniyarî wan dike, paşê jî wek gotarekî di rojnameyan de diweşîne. Bedîuzeman, li Stenbolê bi giregirên dewletê re muxatab/hevrû dibe, rastî rûyê dewletê yê eslî tê, xeyalên wî yên husnuzanî dişkên. Daxwaza wî ya ji bo projeya perwedehiyê(Darutalîm û Medresetuzehra) ji aliyê rêvebiriya Evdilhemîdê II. ve bi bertîlê, timarxane û zîndanê ve tên bersivandin, lê belê ew menfeatên şexsî hîç qebûl nake.

Ji bo sedmên nexweşiyên nava gel desthilatdarên Stenbolê dibîne, ji bo tedawiyê dikeve nav çalakiyan. Aliyekî xebatên sîyasî û perwerdehiyê bi rewşenbîrên kurdan re dike û aliyên din hişyariyan dide feqîr û hemalên kurdan. Di nava gelek cemiyet, qulûp û komelên kurdewar û îslamî de xebatan dike. Di gelek rojnameyan de gotarên wî yên derbarê pirsgirêkên civaka kurdan tên weşandin û ji bo merîfet û îttihada ekrad/yekitî û perwerdehiya kurdan daxwaznameyekê bona rojnameyeke bi kurdî-tirkî dide. Têkiliyên wî bi kurdan tenê re nîne, bi rewşenbîrên Osmanî re jî heye. Li Stenbolê dikeve nava hin

çalakiyên siyasî ku ji bo desthilatdariya gel di warê “huriyet/meşrutiyet”ê pêk were, ev der jê re dibe qada tekoşîna fikr û ramanên wî.

Bedîuzeman wek alimekî misilman, bi taybetî ji xizmeta îmanê re hetanî dawiya emrê xwe xebat kiriye. Mijarên berhemên wî; mijarên îmanî û xizmeta dînî, mijarên civakî û siyasî ne. Em zêde ser fikr û ramanên wî yên di derbarê gelê kurd û perwerdehiyê de sekinîn lewra mijara tezê me ev bû. Di teza me de çavkaniya sereke pirtûka “Munazerat”ê ye. Hin kesan xwestine derbarê binemal û kurdîtiya wî de gengeşiyan derxin lê di rîsaleyên xwe de kurdîtiya xwe bi misogerî aniye ziman.

Di serdema Komara Nû de ava wî û rêvebirên dewletê di cewekî de neçûye û dûrî siyasetê sekiniye. Her dem ji bo xizmeta îmanê û projeya Medresetuzehrayê xebat kiriye. Di derbarê ziman de, gelê kurd hişyar dike û xebatên Xelîl Xeyaliyê Motkî ên di derbarê ziman de girîng dibîne û pêşniyarî gelê kurd dike. Zimanê kurdî diwekîne dara Tûbayê ya behiştê lê dixwaze ku gelê kurd li zimanê xwe xwedî derkeve. Rabûn û hebûna Milletê Kurd di qada şaristaniyê de ancax bi perwerdehiyê mimkun dibîne, ew jî divê bi pergal be û bi rêk û pêk be. Li gor wî hestên milliyetperweriyê yên erênî û hezkirina netewîperweriyê dê di nava Gelê Kurd de çêbibe, wê demê ew ê ji aliyê dijminên wan ve neyên pelçiqandin. Ew ê di derbarê heq û hiqûqên xwe de dê şiyar bin. Ji aliyê fen û hunerê ve dê pêş de herin û ew ê di qada şaristaniyê de cihên xwe bigrin. Gotara wî ya “Ey gelê kurdan” di vî warî de mînakeke girîng e.

Bedîuzeman ji bo nexweşiyên gelê kurd ên wekî; “feqîrtî, cehalet û bêxwendinî, îxtilaf û edawet/dujmînî”yê çareser bike rahijên/teşebusên wî çêdibin. Ew ji boçareseriya pirsgirêkên tevgera musbet û modela perwerdeyê pêşniyar dike.Hizr û xebata Bed3iuzeman a di perwerdeyê de bi du projeyan dertê pêş, yek; Darutalîm,a din Medresetuzehra ye  Seîdê Kurdî ji bo zarokên kurdan di dibistanên dewletê de bi zimanê xwe bikaribin perwerde bibin perwerdeya  bi zimanê dayikê pêşniyar dike û ji bo vê daxwaznameyê dide rêvebiriya Dewleta Osmanî. Herwiha ji bo xwedina bilind pêşniyariya wî modela Medresetuzehra ye ku hem ji bo Alema Îslamê hem jî ji bo Miletê Kurd wekî modeleke çareseriyê ye.

Bedîuzeman ji b ovan projeyên xwe bîne pê, Pêşiyê bi gel re paşê jî bi rêvebirê Dewleta Osmanî û Komara Nû re hevdîninan dike. Di vî warî de têkiliyên waliyê Wanê û rêvebirên dewletê bi telgiraf û nameyan diçin û tên. Di serdema Osmaniyan de erêkirina pojeya Medresetuzehrayê mirov di van name û têlgirafên Walî de fêm dike ku hin sedemên wê hene. Ji van sedeman ya yekem; reqebeta navbera Osmanî, Îranê û Ûris e. Ya duyem: xebatên Ebdurezaq Bedirxan, Smaîl axa yên ji bo serxwebûna Kurdistanê ne. Li aliyekî din sedemek jî xebatên Ebdulselam Barzanî yên li Başûrê Kurdistanê ne.

Cihên ku Bedîuzeman ji bo projeya xwe pêşniyar dike; li Wan, Bedlîs û Diyarbekirê ne. Di nav van bajaran de bi taybetî ji bo bajare Wanê gelek xebatan dike. Di warê aboriyê de; di serî de "*hemiyetperwerî/welatperwerî û xîretkêşi*", zikat, sedeqe û nezir, paşê bi xebat û projeyên xwe yên zanistiye ew medrese dê xwe fînanse bike. Di warê navê wê de "medrese" pêşniyar kiriye lewra di wê serdemê de ev nav ji bo gelê kurd navekî mubarek bû û ancax kêleka ilmên dînî zanistên fenî bi vî awayî dikaribû bi Gelê kurd bida pejirandin. Statûya Medresetuzehrayê; di warê fermiyetê de dê zanîngehên dewletê re hevdeng be û di xebatên xwe yên perwerdehî û aborî de bi wasiteya weqfekî bîne cih. Bername û naveroka Medresetuzehrayê; di çarçoveya fikr û ramanên Rîsaleyên Nûrê de ilmên dînî û zanistên fenî tev bête xwendin û îhtiyaciyên demê bên raçevkirin.

Projeya Medresetuzehrayê; bingeha pêşeroja Gelê Kurd e, bi pirojeya Medresetuzehrayê nexweşiyên civaka kurdan dê yekem; bi mearîf û xwendinî, duyem; bi tifaq û muhebeta/hezkirina milî û sêyem; bi 'herkes şixulê xwe bixwe bike lê li kesî hêvî nebe' bên dermankirin. Medresetuzehra ji bo çand, aborî, îxtilaf, paşvemayîn û têkiliyên kurdan ên bi miletên din re reçeteke perwerdehî, polîtîk û stratejîk bû ku he jî wekî derfetekî disekine. Bi wê pirojeyê xurafe û Îsraîliyatên ketine nava civakê jî dikarin bên tedawîkirin.

Ji bo xeyala xwe ya projeya Medresetuzehrayê xwe amade dike, alîkariyê ji desthilatdarên demê, serok û rêberên kurdan dixwaze, lê mixabin ev daxwaza wî ya dîrokî hê jî nehatiye cih. Di aliyê din de, divê fikr û ramanên Bedîuzeman ji bo meseleya kurdan baş bê tehlîl kirin, baş bê zanîn û bi samîmî bê nirxandin. Ji

serdema osmaniyan bigre heta îro nêrîna li Gelê Kurd bi gelemperî bi hişekî ewlehiyê hatiye kirin. Pêşiyê divê ji vê meselê re nêrîneke însanî bê dîtin.

Medresetuzehra dema bê ava kirin, pêşeroja zanyar, alim û mamosteyên kurd dê bikeve bin garantiyê. Bi wasiteya Medresetuzehrayê zanistên fenî, dê di herêma Kurdistanê de bête pejirandin û kurd dê tama azadiyê bibînin. Him zanistên fenî, him jî zanistên dînî dê tev bên xwendin, dê di navbera mekteb û medreseyan de dijberîtî rabe, dîn û fen dê di bin banê yek dibistanê de bêne dayîn.

Perwerdeyên ku zirarê didine gel, dê di parzûna Medresetuzehrayê re bên derbaskirin û paşê bêne ber xwendevanan û saftiya gelê kurd ya nezanînê, dê bi wesiteya Medresetuzehrayê ji holê rabe. Medresetuzehra dê nezanînê rake, dema nezanîn rabe wê demê dê feqîrî û îxtilaf jî di nava gelê kurd de rabe û ew ê ji bindestî û nezaniyê rizgar bibin.

Bi felsefeya Bedîuzeman heke Medresetuzehra bê damezirandin, pêşeroja Gelê Kurd dê ronî bibe û bi pirzimaniyê; nijadperestî dê bê şkandin û dê biratiya gelan tesîs bibe. Ger ev daxwazên wî neyên şûnê dê him di hundir de him jî di aliyên derve de Gelê Kurd bê îstîsmarkirin. Bedîuzeman di sedsala dawî de, ji bo kurd û tirkan mînakeke girîng e. Seîdê Kurdî ji bo welatê kurd û tirkan wek dîrokekê ye.

Wisa xuya dike ku Medresetuzehra zanîngeheke di hundirê xwe de azad, ji derve ve jî girêdayî perwerdeya dewletê ye.

**LÎSTEYA PÊVEKAN**

**1.** Nasnameya Bedîuzeman Seîdê Kurdî/Nûrsî

**2.** Hevpeyvîna Bedîuzeman û doxtor/nûjdar

**3.** Şîret û Nesîhetên Bedîuzeman li Hemalan Kiriye

**4.** Hevpeyvîna Bedîuzeman bi Şefîk Paşa re

5\. Kurte Jiyana Bedîuzeman Seîdê Kurdî

**6.** Dîwana Herba Orfî

**7.** Xutbeya Şamê

**8.** Rupelek ji munazaratê "Kostantiniye, Matbaa-i Ebû'z-Ziya, 1329/1911"

**9.** Berga Muhakematê ya teksîr hatiye çapkirin

**10.** Bergên Nûtuqê (1908)

**11.** Bergên Îşaratul Îcazê (1334/1918): Navê wê eslî ev"*İşârâtu'l-İ'câz Fî Mezanni'l-Îcâz*")e

**12.** Tariçe-î Hayat (Dîroka jiyana Wî) 1877-1960 Ya Abdurrahman Nursi nivîsye

**13.** Nokta/Nuqte Berga nuqteyê û dsetxeta Ceylan Çalışkan 1337/1919

**14.** Mînaka Elifbaya Xelîl Xeyalî wek tablo bi tîpên Erebî û Latîn

**15.** Serdema Meşrûtiyetê de Daxwaznameya ji bo Perweredeya Zorokên Kurdan hatiye dayin

**16.** Gotara Bedîuzeman Kurd Mihtacî Çi ne?

**17.** Daxwaznameya ji bo rojnameya *Marifet Ve İttihâd-ı Ekrâd*

**18.** Gotara Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya navdar

**19.** Telqînên Ku Ji Ulema, Meşayix Û Serok Û Ferdên Kurdistanê Re, Derbarê Meşrûtiyetê De Hatine Kirin

**20.** Gelî Kurdino

**21.** Encamname

**22.** Gotara Bedîuzeman Ya Kurd Dîsan Muhtac in

**23.** Telgirafa Bedîuzeman û Miftiyê Wanê ya ji bo Medresetuzehrayê

**24.** Telgirafa Walî Tahsîn Paşa ya ji bo çêkirina Medereseyê

**25.** Pêwîstiya çêkirina medreseyê û Metirsiya Ebdurezaq Bedirxan

**26.** Pêwîstiya çêkirina medreseyê û gîringiya medreseyê ji bo alimên Kurda

**27.** Derengbûna çêkirina medreseyê û xemgîniya gel

**28.** **N**ameya pêwîstiya çêkirina Medrese-î Aliye û metirsiya Abdurezaq Bedirxan

**29.** Xîm avêtina Medrese-î Ali Reşadiye û dia ji bo Padişah

**30.** Bi pêşniyariya mebûsê Qeyseriyê Alim Efendî teklîf û destnîşanên mebûsan ji bo çêkirina Darul Ûlûm-i Îslamiye


**31.** Bi pêşniyariya mebûsê Qeyseriyê Alim Efendî û teklîfa Qanûnê

**32.** Pêşniyariya lijneya encumena ya pêşkêşî TBMM ê hatiye kirin.

YÖK watermark

**PÊVEK:**

**Pêvek-1:** Nasnameya Bedîuzeman Seîdê Kurdî/Nûrsî
Maliye Nezareti, Evrak-I Nakdî Ve Levâzım Müdüriyeti Şurâ-Yı Devletin Gayr-I Devâirden Mesalih-İ Şahsiyeye Dair Verilen Mazbataya Mahsus Varakadır
Kıymeti Beş Kuruştur



Devlet-İ Aliye-İ Osmaniye Tezkeresidir

İsim ve şöhreti: Bediüzzaman Said Efendi.
Pederi ismiyle mahall-i ikameti: Müteveffa Mirza Efendi.
Validesi ismi: Müteveffiye Nuriye Hanım.

Tarih ve mahall-i veladeti: 1295 (bin iki yüz doksan beş) ve 1293 (bin iki yüz doksan üç).
Hizan Kazası, Nurs Karyesi.
Milleti: Müslim.
San'at ve sıfat ve intihab selahiyeti:Darü'l-Hikmeti'l-İslamiye azasından.
Müteehhil ve zevcesi olup olmadığı: Mücerred.
Derecat ve sınıf-ı asliyesi:

Eşkâli, Sicil-İ Nüfusa Kayıd Olunan Mahallli
Boy: Orta. - Göz: Ela.
Sima: Buğday.
Alamet-i farika-i sabite: Tam.
Vilayeti: İstanbul.
Kazası: Beyoğlu, Rumeli, Boğaziçi.
Mahalle ve Karyesi: Sarıyer. - Sokağı: Fıstıklı Bağlar.
Mesken Numarası: 18/11.
Mesken Nev'i: Yabancı.
Esas kaydı: Bitlis Vilayeti, Hizan Kazası, Nurs Karyesi.

Balâda isim ve şöhreti, hal ve sıfatı muharrer olan Bediüzzaman Said Efendi, Devlet-i Aliye-i Osmaniye tebaiyetini haiz olup ol suretle ceride-i nüfusta mukayyed olduğunu mü'şir işbu tezkere ita kılındı.

— 26 Eylül 1337 —
Nezaret-i Umur-ı Dâhiliye

**Pêvek-2:** Hevpeyvîna Bedîuzeman û doxtor/nûjdar

Maceraya min a bi doxtor/nûjdar re ku li tîmarxaneyê qewimî

"Ey tebîb efendî! Ez ê bêjim, tu guhdarî bike. Derbareyê dînbûna xwe de, ez dê delîlekî din jî, bidim destê te: Bersivdayina beriya pirsê! Bawer im dilê te dixwaze tu guh bidî gotinên dînekî entîke. Dixwazim ku muayena min bi awayê muhakemeyê bibe. Bila wijdana te jî, bibe hakem. Fizûlîtî ye ku mirov dersa tibê bide tebîb, lê xalên ku alîkariya teşxîsa nexweşiyê bikin, wezîfeya nexweş e. Hem jî, ji bo ku îstiqbal, we derewîn dernexe, bawer im tu yê luzumiya bi guhdariyê bibînî. Rind bala xwe bidin van her çar xalan: (Piştî wê, ev sûretê hin şîroveyê min in ku dîsa dema li timamarxaneyê bûm, min kiribûn.)

A Pêşî: Ez li çiyayên Kurdistanê mezin bûme. Divê hûn hal û hereketên min ên hur û tund, bi mêzina Kurdistanê bikişînin; bi teraziya Stenbolê ya medenî nemêzinînin. Ku hûn wisa bikin, ew çax hûnê bendekî bikşînin navbera me û Stenbola ku kaniya seadeta me ye. Hem jî, lazim tê ku piraniya kurdan jî, sewqê tîmarxaneyê bin. Lewra, exlaqên ku li Kurdistanê herî zêde di rewacê de ne: cesaret, îzzeta nefsê, selabeta dînî û wekhevbûna dev û dil e. Ew tiştê ku di medeniyetê de, jê re dibêjin nezaket, li ba wan, şelafî û çaplûsî ye.

A Duduyan: Hal û exlaqê min jî, wekî cil û bergên min, ne mîna yê xelqê ye. Lazime ku hûn, heq û rastiya rewşê çi be, wê bikin mîheng. Hin exlaqên xirab ên ku ketine rewaca dem û dewrana alemê û bûne urf û edetê dinyayê, nekin wekî pîvan. Ez wekî fîxan û fîzara mirin û temirînê nabêjim: "Çi ji min re, bila kesên din lê bifikirin". Bîlakîs dibêjim ku: "Ez misilman im, ji hêla Îslamiyetê ve, ez ji aliyê manewî memûr im û mukellefê bi sedaqetê me. Ez dê qest û cehd bikim; da ku tiştekî ku ji gel û dîn û dewletê re kêrhatî ye, pêk bînim."[518]

[518] Kurdî,h.b., r. 169

**Pêvek-3:** Şîret û Nesîhetên Bedîuzeman li Hemalan Kiriye

Gelî hemalan!

Ez vê fikrê di dilê we de tov dikim. Çimkî dilê we xalî ye û xera bnebûye. Rûhê vê beyta:

أَتَانِي هَوَاهَا قَبْلَ أَنْ اَعْرِفَ الْـهَوَى * فَصَادَفَ قَلْبًا خَالِيًا فَتَمَكَّنَا.

(Hîna berî ku evînê nas bikim, ez rastî evîna wê hatim. Wê dilê min vala dît û ew tê de bi cî bû.)

dê ji we tecellî bike. Ez guhdarîkirina bi guhan navêm; bi dilê xwe lê guhdarî bikin. Sê cewherên me yên gelek hêja hene. Şerîet, namûs û xîret ji me dixwazin ku em wan biparêzin.

Ê pêşî, Îslamiyet e ku bihayê wê, xwîna bi milyonan şehîdan e.

Ê duduyan, mirovahî ye û yê ku mirovan dike siltanê temamê alemê, ew e.

Ê sisiyan, milliyeta me ye ku rabite û pevgirêdaneke me ya hevgirtinê ye û bi wan ên zemanê berê ku bi berhemên xwe zindî ne re yekîtiyê ye. Îca ji xeynî van jî, sê neyarên me hene, me mehû dikin:

Ê Yekê: Feqîrî: Tenê çil hezar Kurdên hemal ku li vê derê ne, delîlên zindî ne ji vê re.

Ê duduyan, cehl. Ji vê re delîl ew e ku çil hezar, di vî zemanê tereqqiyê ku rojname, perwerdekarê fikran in de, çil mirov nizanin rojnameyekê bixwînin, îsbata vê ye.

Ê sisêyan, hevkişkişandin û circirandin e: Niha tevî ku em xwediyê çar sed hezar betlê hêja ne û qeweteke me ya wiha gelek mezin heye jî, ji ber wê sedema vê ixtîlafa hundirîn, mehf dibe. Niha ji me re, sê şûrên almastî lazim in; da ku ew, wan sê cewherên me biparêzin û wan sê neyarên me mehf bikin.

Yek ji wan, Îttîhada millî ye.

Ê diduyan, keda mirovan e.

Ê sisiyan, muhebbeta millî ye. Ku em vê qewweta xwe ya gelek mezin, bixin bin emrê hikumetê, ji ber ku dê li hember derve serf bike, em dê xwe misteheqî edaletê bikin û wê hingê, di bergîdana wê de, em dê ji hikumetê, edalet û wî heqqê xwe yê ku ji gelek zemanî ve li cem wan gihiştiye hev û kom bûye bixwazin. Em, dê vê qewet û wêrekiya xwe, ji van pederên me yên bişan ên Tirk ku ev serê şeşsed salî ye, ala tewhîdê li hember temamê alemê, îlan kiriye û ji ber ku wan, ji îstîbdadê re bi awayekî şedîd îtaet kiriye û wan, terka wan edetên millî kiriye û pîr û kal bûne re, pêşkêş û diyarî bikin. Îca di muqabilê vê de, em jî, dê ji aqil û marîfetên wan îstîfade bikin û em ê esaleta xwe jî nîşan bidin.

*Mahasil:* Tirk, aqilê me ne û em jî ji wan re wek quwetê ne. Îca em bi hev re hîna nû dikarin bibin însanekî kamil. Em dê bi serê xwe tiştekî nekin. Lewra em dê bi ezma xwe dersa îbretê bidin milletê din jî. Hem ewladê baş gere wiha be. Hem eger me di zemanê îstibdadê de batmanekê îtaet kiribe, niha hezar qat îtaet û îttîhad ferz e. Lewra niha em dê sirf menfîetê nîşan bidin. Lewra ev hikumata meşrûtî, hikumeta meşrûî ya heqîqî ye.

Elhasil: Di îttîfaq û yekbûnê de qewet heye. Di îttîhadê de jiyan heye. Di biratiyê de seadet heye. Di îtaeta hukumetê de, selamet heye. Niha zerûrî ye ku em xwe hişk bi benê metîn ê îttîhadê û şirîta muhebbetê ve bigrin.[519]

[519] Kurdî, h.b., r.27-28

**Pêvek-4:** Hevpeyvîna Bedîuzeman bi Şefîk Paşa re:

Nazirê Zaptiyeyê got: “Padîşah li te silav kiriye. Ji te re meaşekî hezar qurişî jî girêdaye. Paşê dê bike bîst-sî panot.”

Min bi bersivî got: Ez ne parsekê meaş im. Hezar panot be jî, ez nikarim qebûl bikim. Ez ji bo xwe nehatim, ji bo gelê xwe hatim. Hem jî, vî tiştê ku hûn dixwazin bidin min, para dengnekirinê ye, bertil û ruşwet e.

Nazir: “Tu fermana padişah bi paş ve vedigerînî? Vîn û ferman nayête redkirin.”

Min bi bersivî got: Red dikim. Da ku bila padîşah bixeyîde, gazî min bike, ez jî rastiyê bêjim.

Nazir: “Encama vê yekê dê ji te re ne bi xêr be!”

Bi bersivî min got: Heke encam avêtina behrê be jî, dê ji min re qebreke fireh be. Heke bêm îdamkirin, ez dê di dilê gelê xwe de bijîm. Jixwe gava ez hatim Stenbolê, min heyata xwe di bergîdana ruşwetê de anî. Çi ji destê we tê bikin û texsîr jî nekin! Ez vê yekê jî ji dil dibêjim, dixwazim gelê xwe bi kirinên xwe hişyar û îqaz bikim ku întîsaba bi dewletê, ji bo xizmetê ye, ne ji bo girtina meaş e. Hem jî mirovekî mîna min, xizmeta wî ya ji millet û dewletê re, bi nesîhetê ye. Ew jî bi tesîra baş, pêk tê. Ew jî, bi hesbetten lîllahê, çê dibe. Ew jî, ji bêxereziyê; ew jî, ji bêbedeliyê; ew jî, bi terka menfîeta şexsî ye. Lewma ez mazûr im, ji girtina meaş.

Nazir: “Ew meqsed û daxwaza te ku belavbûna perwerdehiyê ya li Kurdistanê, di meclîsa wekîlan de, derdestê muzakereyê ye.”

Bi bersivî: Hûn perwerdehiyê bi paş ve dixin û meaş jî didin pêş. Gelo ev bi çi qaîdeyê ye? Hûn menfîeta min a şexsî, li ser menfîeta umûmî ya millet re digrin. Nazir hêrs bû û qehirî. Min got: Ez bi awayekî azad jiyame. Li çiyayên Kurdistanê yên ku warê huriyeta mutlaq in, mezin bûme. Hêrs û hiddet, bi kêr nayê ji bo min. Xwe nafîle newestînin. Min sirgûn bikin. Bila Fîzan be, bila Yemen be, razî me. Hûn jî ji pînedûzî û pînekirinê xelas dibin. Ez jî ji êşandina ketina ji bilindahiyê, xilas dibim.

Nazir: “Di vê gotinê de qest û mebesta te çi ye?”

Min bi bersivî got: We perdeyeke bi navê nîzamê ku wekî pelê cixareyê zirav e, li hemberî ev qas fewerana fikr û hestan, avêtiye ser her kesî. Hemû kes di binî de û wekî miriyê muteherrîk, bi zordariya we, dinale. Ez ecemî bûm, bi ser de ketim, neketim binî. Wekî şiklê kincê min, exlaqê min jî giran bû. Carekî li Mabeynê qelişî. Li Şîşliyê ez ketim mala Ermeniyekî, li wir qelişî. Ketim Şekercîxanê, li wir jî qelişî. Ez ketim timarxaneyê. Niha jî ketim nezaretxaneyê. Elhasil hûn jî nikarin ewqas pînekariyê bikin, ez jî diêşim.

قَدِاتَّسَعَ الْـخَرْقُ عَلَى الرَّاقِعِ*

Hem jî ez gava li Kurdistanê bûm, min we baş dizanibû. Vê rewşê, sir û meqsedên we, rind hînî min kirin. Bi taybetî timarxaneyê vê metnê, ji min re rind şerh kirin. Hem jî ji bo van rewş û halan, sipas dikim. Lewra min li cî û meqamê sûîzenê, husnîzen dikir.[520]

*Qelş, ji pîne mezintir hat.

[520] Kurdî,h.b., r. 174-175

**Pêvek -5:** Kurte Jiyana Bedîuzeman Seîdê Kurdî/Nûrsî

Kronolojıya Jiyana Bedîuzzeman Seîdê Kurdî

1877-Seîdê Kurdî li Parêzgeha Bedlîsê Navçeya Hîzanê û gundê Norsê/Nûrsê ji dayik bûye.

1885-Temen 9. Seîdê Kurdî li mala bavê xwe derbasî Medresa Taxê dibe, li vê derê demeke hindik dimîne û vedigere Nûrsê.

1891-Temen 14. Mela Seîd, Cenabê Pêxember di xewna xwe de dibine, diçe Bazîdê, tehsîla xwe ya esil li vê derê, li cem Mihemed Celalî distîne.

1892-Navlêka Bedîuzeman di vê demê de jêre tê gotin.

1893-Temen 16. Di navbera Bedlîs û Sêrtê de tê û diçe, demekê li Tilloyê dikeve înziwayê.

1894-Şêx Evdilqadir Gêlanî, di xewna xwe de dibîne û diçe Mêrdîn û Cizîrê, li nav êla Mistefa Paşa. Ji bo zilm û zordariya Mistefa Paşa hişyariyê didê. Yekem car têkiliya wî ji siyaseta Misilmantiyê û meseleyên civakî re çêdibe.

1895-Ji Mêrdînê diçe Bedlîsê, bi qasî du salan dibe mêvanê parêzgar.

1897-Bi vexwendina Waliyê Wanê Hesen Paşa re, dibe mêvanê wî û bi qasî 80-90 pirtukan ji ber dike.

1900-Wezîrê Îngilistanê yê mêtîngeriyê di rojnameyan de di derbarê Quranê de daxuyaniyeke nexweş belav kiribû. Ev daxuyanî Bedîuzeman zehf xemgîn dike û wiha dibêje: “Ez ê isbat bikim û nîşanî dinê bidim, wek rojek(taveke)arişî Quran venamire û nayê vemirandin.”

1907-Divê, di navenda gelên Misilman de bi taybetî di herêma Kurdistanê de zanîngehek bi navê Medresetu’z-Zehrayê bê damezrandin û bi sê zimanan -Kûrdî, Erebî û Tirkî- perwerdehî bê dayîn. Ji bo çareseriya perwerdehiya Kurdistanê bi projeya Medresetuzehrayê diçe Stenbolê û daxwaznamekî dide Evdilhemîdê duyemîn.

1908-Alîgiriya Meşrûtiyeta meşrû'a dike.

1909- Seîdê Kurdî tê darizandin. Di derbarê 31ê Adarê de, parastina xwe ya bi navê "Dîwana Herba Orfî" dide.

1910-Ji darizandina Dîwana Herba Orfî beraet dike. Ji Stenbolê vedigere Kurdistanê û bajêrê Wanê. Li Kurdistanê bajêrê Colemêrgê, eşîr bi eşîr digere; ji wan re di derbarê azadiyê, meşrûtiyetê û jiyana civakî de hevpeyvîn û nirxandinan dike.

1911-Hatina Şamê li mizgefta Emewiyê. Pirsgirêkên Misilmanan yên civakî rewş, çare û reçeteya nexweşiyên Misilmanan bi navê Xutbeya Şamê belav dike.

1913-Dîsa Wan û dîsa Medresetu'z-Zehra. Li peravê Gola Wanê, li navçeya Artemêtê xîmê Medresetuzehrayê datine.

1915-Wekî fermandarê Alayên Siwarî yên dilxwazên Kurd, bi

Ûris re pevçûnan dike.

1916-Di pevçûna şerê Ûris de dîl dikeve û du salan dîl dimîne.

1918-Li Qostirmayê firar dike. Di 17ê Hezîrana 1918an de Mele Seîd, ji Warşova, Wiyana û Sofyayê re tête Stenbolê.

13 Tebax 1918 - Endamtiya Dar'ul Hîkmetê dike.

1919- Ji aliyê Siltan Wehdettin ve payeya "Mahreçê" digire.

1920-Li hemberî Îngilizan û dagirkirina wan a Stenbolê de, "Hutûwatê Sitte" tê weşandin.

1921-Bedîuzzaman Seîdê Kurdî li hemberî Dêra Angilîkan bersivê dide.

1922-Bi vexwendina damezrînerê Komara Tirkiyeyê M. Kemal, li Stenbolê derbasî Enqerê dibe.

1922-9ê Mijdarê. Di Meclisê de, ji bo Bedîuzzaman Seîdê Kurdî xweşamedî/xêrhatin tê çêkirin.

1923-17ê Nîsanê. Li Enqerê gumana xwe dibire, dizivire Wanê.

"1925-1927-Li Wanê tarewgeh(nefyî) dibe. Seîd Nûrsî li Wanê- Stenbol-Bûrdûr û Ispartayê demekî binçav dimîne. Şûn de Exrîdir, ji wê derê jî derbasî

Barlayê dibe û binçavî berdewam dikin. Di serî de pirtûkên bi navê Sozler, Mektûbat, Lem'alar qismek ji Kuliyata Risaleyên Nûr têne nivîsandin.

1934-Ji Barlayê Bedîuzeman Seîdê Kurdî dibin Spartayê.

1935-27ê Nîsanê. Wezîrê Karên Hundir Şukrî Kaya û Fermandarê Giştî ê Cendermeyan tên Spartayê û Mele Seîdê Kurdî ji bo girtîgehê dibine Eskîşiherê. Mele Seîdê Kurdî, ji bo şîrovekirina ayeta tesetturê/nixûmandinê 11 heyvan diavêjine girtîgehê.

1936- Li dadgehê bera'et dike.

1936-27ê Adarê. Li Bajêrê Kastamonuyê mecbûrê rûniştinê dibe. Sê mehan li qereqolê dimîne, şûnde di maleke hemberî qereqolê de niştecih dibe. Pirtûka xwe ya bi navê "Kastamonû Lahîkasi" dinivîse.

1943-20ê Îlonê. Bedîûzeman binçav dikin, berê wî didin Enqerê, Sparta û ji wir jî tînin Denizliyê.

1944-Li dadgeha Denizliyê tête darizandin.

1944- 15ê Hezîranê. Li dadgeha giran bera'eta Mele Seîd Kurdî têtê dayin. Di dawiya meha Tebaxê ya 1944an de bi fermana Enqerê, Seîd Nûrsî li Emirdaxê bi mecbûrî îkamet dike.

1948-23yê Çileyê. Li Emirdaxê di nîveka zivistanê de, bi şagirtên xwe re diçe Dadgeha Afyonê.

1949-20ê Îlonê. Li dadgeha Afyonê bera'et dike.

1949-20ê Mijdarê. Mele Seîd dîsa li Navçeya Emirdaxê di binçavê de ye.

1952-Çile. Ji bo Pirtûka bi navê "Gençlik Rehberî/Rêbera Ciwanan" li Stebolê te darizandin.

1952 -5ê Adarê. Mele Seîd li doza Rêbera Ciwanan bera'et dike.

1953 –Avrêl, Mele Seîd li navçeya Emirdaxê têtê binçav kirin.

1953-Gulan, sê mehan li Stenbolê rûdinê û bi Patrîk Athenagoras re hevdîtinekê dike. Piştî hijdeh salan tê Navçeya Barlayê.

1956-23yê Gulanê. Risaleyên Nûr a ku heşt salan darizandina wê berdevam dike, bera’et dike.

1957-1958. Kuliyata Risaleyên Nûr û Dîroka Jiyana Bedîuzzaman Seîdê Kurdî tête çapkirin.


1960-23ê Adarê. Roja çarşemê, Bedîzeman Seîdê Kurdî diçe ber dilovaniya Xwedê. Li dergaha Cenabê Îbrahîm Pêxember tête veşartin.

1960-12ê Tîrmehê. Cûntaya Leşkeriyê gora wî vedike û termê wî bi helîkoptereke leşkerî dibe ciyekî nediyar. [521]

[521] Abdulkadir Badıllı, Bediüzzaman Said Seîdê Nursî, MufassalTarihçeyi Hayat, Tîmaş Yayınları, İstanbul,1990, B.S.Seîdê Nursî, Tarihçeî Hayat, Weşanxaneya Zehrayê, Stenbol 2013; Evdirehman Seîdê Nursî, Bedîuzemanin Hayati, weşanxaneya Kentê, Stenbol 2011.

**Pêvek- 6**: Bergên Dîwana Herba Orfî:

(Çapa Yekem) (1909(h.1327)Aliyê Ahmet Ramîzê Lîceyî hatiye çapkirin.( Birinci Baskı: İki Mekteb-i Musibetin Şehadetnamesi Yahud Divan-ı Harb-i Örfî ve Said-i Kürdî, Muharriri: Bediüzzaman, Tabı'ı: Kürdîzade Ahmed Râmiz, İstanbul, İkbal Matbaası, Vezirhanı, 1327.)



ایکی مکتب مصیبتک شهادتنامه‌سی

یاخود

دیوان حرب عرفی : وسعید کردی

محرری

بدیع الزمان

طابعی

کردی زاده : احمد رامز


استانبول

اقبال ملت مطبعه‌سی

وزیر خانی

١٣٢٧

Çapa Duyem: 1910(h. 1328) Cudatiya çapa duyem “İfade-i Naşir” Ahmet Ramîz lê zêde kiriye.(İkinci Baskı: İki Mekteb-i Musibetin Şehadetnamesi Yahud Divan-ı Harb-i Örfî ve Said-i Kürdî, Muharriri: Bediüzzaman, Naşiri: Kürdîzade Ahmed Râmiz, İkinci Tab’ı, İstanbul, Artin Asadoryan ve Mahdumları Matbaasında Tab’ Olunmuştur, 1328)


ایکی مکتب مصیبتك شهادتنامه‌سی

یاخود

دیوان حرب عرفی : وسعید کردی

ناشر

کردی زاده : احمد رامز

ایکنجی طبعی

استانبول

آرتین آصادوریان ومخدوملری مطبعه‌سنده طبع اولنمشدر.

١٣٢٨

297.75
956.0743

1081

**Pêvek-7:** Xutbeya Şamê**:**

Rupela Yekem ya bi xetê erebî hatiye çapkirin (Üstad'ın 1911'de İstanbul'da "Matbaa-i Ebû Ziya"da bastırdığı "Devâü'l-Ye's" ilâveli Arapça El-Hutbetü'ş-Şamiye'nin kapağı ve ilk sayfası)



الخطبة الشاميه
دواء اليأس
لبديع الزمان

هذه محاورة تكلمت بها مع ابناء العرب فى صورة الخطبة فى الجامع الاموى وذيلها ملاحظة فى مسئلتين مهمتين
سعيد

ايكنجى طبعى

قسطنطينيه
١٣٣٠
مطبعة ابو الضيا




الخطبة الشاميه


بسم الله الرحمن الرحيم

التحيات لله الذى قال (لاتقنطوا من رحمة الله) والصلاة على محمد الذى قال جئت لأتمم مكارم الاخلاق .. وبعده .. يا ايها الاخوان العرب .. ماقمت هذا المقام لارشادكم .. لانه فوق حدى .. بل مثلى معكم كمثل صبى ذهب الى المدرسة ثم رجع فى المساء الى ابيه فعرض درسه على ابيه .. ثم نحن الاكراد صبيان بالنسبة اليكم وانتم اساتذتنا.. ثم انى تعلمت من زماننا هذا ان الذى اوقفنا فى القرون الوسطى .. مع طيران الاجانب فى الترقى الى الاستقبال (ستة امراض) وهى حيات اليأس.. وموت الصدق .. ومحبة العداوة .. والجهل بالرابطة النورانيه .. والاستبداد المتنوع السارى .. وقصر الهمة على الشخصية... فاقول لكم ست كلمات هى الاساس (الكلمة الاولى) (الامل) ابشركم (على حسابى) معاشر المسلمين بان سعادة الاسلام .. وبالخصوص سعادة العرب الذين يتبعهم ترقى الاسلام .. فجرها الصادق قد تنفس.. وقد اقترب طلوع السعادة على رغم انف اليأس وانا اقول بحيث اسمع الدنيا بان الاستقبال للاسلامية ليس الا...ورضينا القسمة لنا الاستقبال .. فليكن للاغيار الماضى المشوش .. هذه دعوى لى عليها براهين اذكر من تلك البراهين هنا برهانا ذا مقدمات ونصفا.. هو ان الاسلامية تستعد حقيقة لان ترقى معنا ومادة .. اما الجهة الاولى فاعلموا ان التاريخ وهو اصدق شاهد على الحقيقة يرينا ان بنسبة قوة الحقيقة الاسلاميه يتمدن اهل الاسلام .. وبضعفها يتوحشون .. ويصيرون فى حيص بيص ... وسائر الاديان بالعكس من ذالك .. بضعفها التمدن .. بقوتها التوحش ... الى الآن هكذا مر الزمان ... وايضا

Berga Xutbeya Şamê ya Ahmet Nazîf Çapkiriye:



فرق كسور سنه اول اوقونيلمسه و ايكي دفعه
طبع ايديلان عربي
الخطبة الشامية نك
ترجمه سيدر
اوقونان و تأليف ايدن
بديع الزمان
سعيد النورسى





اللهم يا ارحم الراحمين
اكرم اعظمى حرمتنه بو نسخه يى بر
قلمله بشيوز نسخه يازان احمد
نظيفدن احسن قبول ايله قبول
ايله واونى و رفقالرينى مبارك
يار مجلسلرى جنة الفردوسده
مسعود ايله آمين وخدمت ايمانيه ده
دائما موفق ايله آمين آمين آمين
سعيد النورسى

Solda Ahmed Nazif'in yazdığı Hutbe-i Şamiye'nin kapağı

Sağda Ahmed Nazif'in yazdığı Hutbe-i Şamiye'nin son sayfasına Üstad'ın el yazısıyla eklediği dua


**Pêvek-8** Rupelek ji munazaratê “Kostantiniye, Matbaa-i Ebû’z-Ziya, 1329/1911”






Üstad'ın tashihatından geçmiş El Yazma Münazarat kitabının son sayfasıdır. Burada görüldüğü gibi, son kısmında "Said el-Kürdî, en-Nursî" yazılmıştır. Sayfanın sonunda ise Üstad kendi el yazısıyla "Kırk sene evvel yazılan bu seyahatname hatıraları, gerçi çok kusurları var, fakat antikalığı için ve Medresetü'z-Zehra'nın hatırı için bir kısım hakikatlerine nazar-ı dikkati celbetmek fikriyle kardeşlerime, Yeni Said'in talebelerine gösterdim. خذماصفادعماكدر kaidesiyle bakılsın."

**Pêvek-9:** Berga Muhakematê ya teksîr hatiye çapkirin




*Muhakemât*'ın yazıldığı tarih 1910'dur; ilk yazılışı Arapçadır. Kitap, adı geçen tarihte, aynı muhtevayla "*Reçetetu'l-Ulemâ*" (Âlimlerin Reçetesi) ve "*Reçetetu'l-Havâs*" (Seçkinlerin Reçetesi) isimleriyle iki defa basılmıştır. 1911 yılında ise, bizzat Üstad tarafından Türkçeye tercümesi yapılarak aynı yıl ve müteakip sene (1912) içinde iki defa tab edilmiştir. Tercümesi, "*Saykalu'l-İslâm*" (İslâm'ın Cilâsı) ve "*Muhâkemât*" adıyla neşredilmiştir. Bu tercüme, Arabî aslına göre daha tafsilâtlıdır. (Not: Muhâkemât'ın bir diğer ismi ise, yine Üstad'ın isimlendirmesiyle "*Muhâkemât-ı Bediîyye*"dir.)


Berga Muhakematê 1327/1912 hatiye çapkirin: (Matbu ve teksir Muhâkemât'ın ilk sayfaları. Her ikisinin kapağındaki yazı aynı olup, "*Marîz bir asrın, hasta bir unsurun, alîl bir uzvun reçetesi veyahut Saykalü'l-İslâmiyet veyahut Bediüzzaman'ın Muhâkemâtı , Kostantiniye, Matbaa-i Ebû'z-Ziyâ, 1327*" şeklindedir.



مريض بر عصرك
خسته بر عنصرك عليل بر عضوك
رچته‌سى
و ياخود صيقل الاسلاميت
وياخود بديع الزمانك
محاكماتى
قسطنطينيه
مطبعهٔ ابو الضيا
١٣٢٧

مريض بر عصرك، خسته بر عنصرك
عليل بر عضوك رچته‌سى
وياخود
صيقل الاسلاميت
وياخود
بديع الزمانك محاكماتى
قسطنطينيه ، مطبعهٔ ابو الضيا
١٣٢٧

Rûpelên Muhekematê yên yekem:




بسم الله الرحمن الرحيم
جمله تحيات . اول حاكم ازل و حكيم ازلى و رحمان لم يزلى يه اليقدركه: بزى اسلاميتله سرفراز و شريعت غراء ايله صراط مستقيمه هدايت ايتمشدر.

بسم الله الرحمن الرحيم
جمله تحيات اول حاكم ازل و حكيم ازلى و رحمان لم يزلى يه اليقدركه: بزى اسلاميتله سرفراز و شريعت غرا ايله صراط مستقيمه هدايت ايتمشدر.

Teksir Muhâkemât ile elyazma nüshanın birinci sayfaları. Her ikisinin Besmele'den sonraki ilk cümlesi, "*Cümle tahiyyât ol Hâkim-i Ezelî ve Rahmân-ı Lemyezelî'ye elyâktır ki, bizi İslâmiyyet'le serfirâz ve Şerî'at-ı Garrâ ile sırât-ı müstakîme hidâyet etmiştir*" şeklindedir.

**Pêvek-10:** Bergên Nûtuqê (1908)




İlk defa 1908 yılında Merhum Ahmed Râmiz tarafından
“İkbal-i Millet Matbaası”nda neşredilen “Nutuk” eserinin üst ve ara kapakları.
Kapaklardaki farklı tarihler, Rumî ve Hicrî tarihlere göredir.

Üst kapak:“İhtar: Hata-Sevâb Cedveli sonunda olduğundan, dikkat edilmesi.”, “Kitabhâne-i İctihâd”, “Bediüzzaman-ı Kürdî’nin Nutukları”, “Her hakkı mahfuzdur; tekrar tab’ı, Kitabhâne-i İctihâd sahibi Ahmed Râmiz Efendi’ye aittir.”, “Kitabhâne-i İctihad’ın mührü olmayan nüshalar sahtedir; taklid edenler, Kanun-i Esasi ile mes’uldür.”, “Desaâdet”, “Çemberli Taş – İkbâl-ı Millet Matba’ası, 1324”

Ara kapak:“Dersaâdet’te Kütübhâne-i İctihâd, Aded – 1”, “Nutuk”, “Naşiri: Kütübhâne-i İctihâd sahibi Ahmed Efendi”, “Her hakkı mahfuzdur; taklid edenler, Kanun-i Esasi ile te’dib edilir.”, “Dersaâdet”, “İkbâl-ı Millet Matba’ası”, “Çemberli Taş’ta Vezir Hânı derûnunda, Numro – 10”, “1326”

**Pêvek -11:** Bergên Îşaratul Îcazê (1334/1918): **(**Navê wê eslî ev“*İşârâtu’l-İ’câz Fî Mezanni’l-Îcâz*”e)




Evkaf-ı İslâmiye Matbaasında 1334(1918) baskısı yapılan Arapça Üstad’ın tashihinden geçmiş el yazma İşaratü’l-İ’caz /İşaratu’l-İ’caz Fî Mezanni’l-Îcaz tefsirinin kapak kısmı. Nüshalarından birinin, naşirlere ait bir sayfası (Süleymaniye Kütüphanesi, İzmirli İsmail Hakkı Kolleksiyonu, no: 157)

**Latinîzekirina Hüsrev Altınbaşak:**







Hüsrev Altınbaşak'ın hattıyla İşaratu'l-İ'caz'ın İlk latinize edilmiş İşaratu'l-İ'caz'ın 1958 baskılı nüshasının kapağı

**Pêvek- 12:** Tariçe-î Hayat (Dîroka jiyana Wî) 1877-1960 Ya Abdurrahman Nursi nivîsye :







Merhum Abdurrahman Nursî'nin kaleme aldığı
Üstad hakkındaki ilk biyografi çalışmasının üst ve ara kapakları

Dîroka jiyana Bedîuzeman ya Müküslü Hamza û Hüsrev Altınbaşak nivîsîne :





Merhum Müküslü Hamza Efendi'nin neşrettiği
İşaratu'l-İ'caz Fî Mezani'l-Îcaz eserinin
sonuna ilhak ettiği Tarihçe-i Hayat'ın
ilk sayfasının başlığı.



Merhum Hüsrev Altınbaşak'ın yazısıyla
Üstad'ın hayatından seçmeler kitabının ilk kapağı.
Bu kitap da bir çeşit Tarihçe olduğu için
buraya almayı uygun gördük.

Tarihçeya /Dîroka Jiyana Bedîuzeman ya Eşref Edip amade kiriye:




Eşref Edib'in derleyip hazırladığı Tarihçe'nin
1957 ve 1958 baskılı nüshalarının kapak resmidir.

**Pêvek-13:** Nokta/Nuqte Berga nuqteyê û dsetxeta Ceylan Çalışkan 1337/1919





İlk Matbu "Nokta Risalesi"nin Kapağıdır




Merhum Ceylan Çalışkan'ın Elyazması
Tashihli "Nokta Risalesi"nin Kapağı

**Pêvek-14 :** Mînaka Elifbaya Xelîl Xeyalî wek tablo bi tîpên Erebî û Latîn



٣٢

حرفين كردي

| لاتيني | عربي |
|---|---|
| Aa | آ |
| Bb | ب |
| Cc | ج |
| Çç | چ |
| Dd | د |
| Ee | أَ |
| Êê | إێ |
| Ff | ف |
| Gg | گ |
| Hh | هـ |
| İi | إِ |
| Îî | إي |
| Jj | ژ |
| Kk | ك |
| Ll | ل |
| Mm | م |
| Nn | ن |
| Oo | أۆ |
| Pp | پ |
| Qq | ق |
| Rr | ر |
| Ss | س |
| Şş | ش |
| Tt | ت |
| Uu | أُ |
| Ûû | أو |
| Vv | ڤ |
| Ww | و |
| Xx | خ |
| Yy | ي |
| Zz | ز |

| عربي | لاتيني |
|---|---|
| آ | Aa |
| ب | Bb |
| پ | Pp |
| ت | Tt |
| ث | S̄s̄ |
| ج | Cc |
| چ | Çç |
| ح | H̱ẖ |
| خ | Xx |
| د | Dd |
| ذ | Z̄z̄ |
| ر | Rr |
| ز | Zz |
| ژ | Jj |
| س | Ss |
| ش | Şş |
| ص | S̱s̱ |
| ض | Ḏḏ |
| ط | Ṯṯ |
| ظ | Ẕẕ |
| ع | ↄC |
| غ | Ğğ |
| ف | Ff |
| ڤ | Vv |
| ق | Qq |
| ك | Kk |
| گ | Gg |
| ل | Ll |
| م | Mm |
| ن | Nn |
| هـ | Hh |
| و | Ww |
| ي | Yy |

32


بِسْمِ اللّٰهِ الرَّحْمٰنِ الرَّحِيمِ

يا اللهُ يا فتّاحُ يا رزّاقُ يا عليمُ علّمني

ا ب پ ت ث

ج چ ح خ د

ذ ر ز ژ س

ش ص ض ط ظ

ع غ ف ڤ ق


ك گ ل م ن

هـ و (لا) ي

7

**Pêvek-15:** Serdema Meşrûtiyetê de Daxwaznameya ji bo Perweredeya Zorokên Kurdan hatiye dayin:

Meşrutiyet Devrinde Kürt Çocuklarınının Eğitimine Mahsus Mektep Açılmasına Dair Arşiv Belgeleri



Divanyolu Caddesinde Eski Şerefiye Caddesinde (Piyerloti Caddesi) Hâşim Efendi'ye Ait Hanede Kürt Çocuklarının Talim ve Tedrisine Mahsus Bir Mekteb-i İbtidâî'nin (İlkokul) Açılmasına İzin Verildiğine Dâir 15 Muharrem 1328/27 Ocak 1910 Ve 19 Muharrem 1328/31 Ocak 1910 Tarihli Arşiv Belgeleri.
BOA
DH.MM
60/2
19/M/1328
Dâhiliye Nezâreti Muhâberât-ı Umûmiye Dâiresi. Şûbe 4
Evrak Numarası: 3089
Müsevvidi: Nurî
Kaleme Vürûdu Tarihi: 17 Kânun-i Sânî Sene 1325
Tarih-i Tesvîd: 17 Kânun-i Sânî Sene 1325
Tarih-i Tebyîz: 18 Kânun-i Sâni Sene 1325
İstanbul Vilâyeti Vekâlet-i Behiyyesine

Kürd Neşr-i Maârif Cem'iyyeti tarafından Mekteb-i Meşrûtiyet nâmıyla, Kürt çocuklarının ta'lîm ve tedrîsine mahsûs olmak üzere Divân Yolu'nda Hoca Paşa mahallesinde Şerefiye caddesinde yüz yetiş beş numaralı hânede küşâdına

ruhsat i'tâsı istid'a olunan mekteb-i ibtidâî'nin te'sis ve küşâdında mahzûr olmadığı gibi, müdîr ve muallimlerinin İstihdâmı mâni bir gune halleri mâni-i istihdâm ahvâli bulunmadığı anlaşılmasına binâen, mezkûr hânenin vergisi ile rusûm-i sâiresi kemâ kâne mutasarrıfından istihsâli ve hîn-i küşâdında Maârif-i Umûmiye nizâmnâmesinin yüz yirmi dokuzuncu maddesi ahkâmına riâyet olunmak üzere ifâ-yı muktezası hususuna Şûrâ-yı Devlet karârıyla bi'l-istîzân irâde-i seniyye-i cenâb-ı Hilâfetpenâhî şerefsudûr buyurularak Maârif ve Mâliye nezâret-i celîlelerine teblîğ keyfiyet olunduğu bâ tezkire-i sâmiye izbâr buyurulmuş olmağla mucebince ifâ-yı mktezası bâbında..

Tebyîze

Hülâsa: Kürd Neşr-i Maârif Cem'iyyeti tarafından küşâd edilecek mektep hakkında.

Bâb-ı Alî

Dâire-i Sadâret

Tahrîrât Kalemi

3089

Dâhiliye Nezâret-i Celîlesine

Devletlu Efendim Hazretleri


Hoca Rüstem mahallesinde Mekteb-i Hukuk sokağında Nâfiz Paşa'nınn hânesini merkez-i idâre ittihâz eden Kürd Neşr-i Maârif Cem'iyyeti tarafından Mekteb-i Meşrûtiyet nâmıyla kürt çocuklarının ta'lîm ve tedrîsine mahsûs olmak üzere Dîvân Yolu'nda Hoca Paşa mahallesinde Şerefiye caddesinde yüz yetmiş beş numaralı Hâşim Efendi'nin taht-ı tasarrufundaki hânede küşâdına ruhsat i'tâsı istid'a olunan mekteb-i ibtîdâînin te'sîs ve küşâdında mahzûr olmadığı gibi müdîr ve muallimlerinin istihdâmı mâni bir gûne halleri bulunmadığı anlaşılmış olmasına binâen mezkûr hânenin vergi ve rusûm-i sâiresi kemâ kâne mutasarrıfından istihsâl ve küşâdında Maârif-i Umûmiye nizâmnâmesinin yüz yirmi dokuzuncu ahkâmına riâyet olunmak üzere mektep hâlinde isti'mâli zımnında ifâ-yı muktezası husûsuna Maârif Nezâret-i celîlesinden vukû bulan iş'âr üzerine Şûrâ-yı Devlet karârıyla bi'l-istîzân irâde-i seniyye-i cenâb-ı hilâfetpenâhî şerefsudûr buyurularak Maârif ve Mâliye nezâret-i celîlelerine tebliğât kılınmış olmağla nezâret-i celîlelerince de ifâ-yı muktezasına himmet buyurulması siyâkında tezkire-i senâverî terkîm kılındı efendim.

Fi 15 Muharrem Sene 1328 Fi 14 Kânûn-i Sânî Sene 1325


Sadrâzam

İbrahim Hakkı

Not: Tüm Yayın Hakları Mafuzdur.



*Dahiliye Nezâret Muhâberât-ı Umûmiye Dâiresinin Vilâyet Vekâletine Gönderdiği Tezkirenin Müsveddesi*



**Pêvek-16:** Gotara Bedîuzeman Kurd Mihtacî Çi ne?

Kurd Mihtacî Çi ne ?

Yekemîn: Îttîhada/yekbûna neteweyî.

Dûyemîn: Ew e ku tevî wan ilmên(zanînên) dînî, ew fennên lazim ên dewr û serdema me, li her aliyî werin tehsîlkirin. Îca ev ku hene, esas û bingeha wan û medreseya wan, ew alayiyên eşîran in. Li ser vê razê, ez bi awayekî bêperwa dibêjim: Ew kesên ku di nav eşîran de ne leşker in, divê ew jî mîna wan ên din/dî, bibin leşekerên netewî (leşkerên millî). Lewra leşkerî mîna tîrêjeke elektrîkê ye, di nav van eşîrên cur bi cur de, dê têkildariyeke kimyewî pêk bîne û dê bike ku ew fikir û ramanên wan ên cihê cihê, bigihîjin hev û dê bihêle ku ew cewherên wan û ew qîmeta wan a heqîqî/rasteqîn, derkeve holê. Bi ser de jî ew gihîştina wan, dê wisan bike ku roniya hîndekarî û perwerdehiyê, tevî wê hêza germ a Kurdan zindî bibe. Lewra koçerî, hêrsoktî û bêhikumetî/bêdesthilatdarî, dibe sedem ku bi zordestiya hikumatê/desthilatdaran, xîzanî û bêçaretî derkeve û ev feqîrî jî, zorê dide ku xerez û qesd li hember hev pevbiçin. Bi vî awayî, ji ber ku her dem gilîkirin, mîna olandana/dundengîbûna dengê mirinê, li navendê deng didin, ciyê ku desthilatdar/hikumet li wan şefqet bike, ew radibin xwe musteheqî şîmaq/sîlleya wê dikin. Li ser vê yekê, neyar û dijmin jî, bi vê kêfxweş dibin û ehlê xîretê jî ji nava serê xwe diqîrin û hêza wan a manewî, bi derba bêhêvîtiyê dişkê û dilê ehlê besîretê jî dişewitîne. Him jî digel ku xwedî hêzeke mezin a leheng û şervanên, bi qasî çil hezarî (40 000) ne jî, ji ber lihevnekirinên hundirîn, mehû dibin û ji ber wan tevliheviyên ku ji dijberîtiyê tên, ciyê ku dê merhemeta/dilovaniya bavîtiyê li wan bê kirin, wisan dibe ku ew buxza zalimî bi ser wan de bibare. Îca ji xeynî van jixwe wisan bûye ku kurdan, êdî ji wan zanistên nû ji perwerdehiya nûjen rikbar bûye.

1. Ji ber ku di zahirê xwe de, ji nav biyaniyan tên
2. Ji ber ku hin meseleyên fennî/zanistî, bi hin çîrokên Îslamî û bi hin dirûvpêdayînan re di nakokî û pevçûnê de ne. Jixwe wan mirovên awam, hin ji wan çîrok û teşbîhan, hema wisan bi ser de, weke eqîde û rastî di hişê xwe de qebûl kirine.
3. Ji ber ku ew, wê ûsula wan medreseyên xwe, weke kan û madena hemû kemilînan dibînin; lê belê îca van zanistan, ne li gor rêbaza mederseyan dibînin.
4. Hin ji ehlê dibistanê radibin, Îslamiyetê, hema tenê ji aliyê wê yê derve ve, ji ber şopandinê/bizarîkirinêye, weke baweriyeke zarokiyane dibînin û rêya zanistên fennî, ketiye meylkirineke feylesofî û gel jî, li hember wan, ketine nava wan fikarên tijî şik û guman. Îca ji ber vê yekê Kurd, ji wê hîndekarî û perwerdehiya nûjen, bi awayekî ji dil vediciniqin.


Yekemîn çareya vê ev e ku ew ciyên wan alayiyên eşîran û ew deriyê bala yê leşkeriyê, bi dibistan û perwerdehiyan bê tijîkirin û ev medreseyên ku ji bo wan, weke kaniya bextewariyê/seadetê ne; lê mixabin ku ji nava wan hatine rakirin, careke din/dî, nû ve divê werin zindîkirin û tevî ilmên dînî, ew zanistên nûjen ên ku lazim in, bi destê wan alimên Kurd, bi derskî werin dayîn.

Kurtebêjiya Peyvê: Ew yekitî ku ji bo her gelî, bi taybetî ji bo Kurdan, pevgirêdana pêt û saxlem û hêmana jiyanê ye, gava ku bibe qesrek/koşkek, ew alayiyên eşîran û ew leşkeriya ku ji heqe her navdariyê tê der, dê bibe bingehekî/xîmekî dirêj û dê bibe arîkeke saxlem. Û ew hîndekarî û perwerdehiya ku

wê qesra yeîkîtî/tifaqê hevgirtinê ronahî dike yan jî, ew zanistên ku ji bo jiyana gelan, mînake wê xwîna ku di reh û demaran de digere û weke kana/kaniya vê gaza hewayê ye, her yek ji wan alayiyên eşîran dê bibe mîna medreseyeke zanistan û dê bibin mîna fabrîqeke mezin a sanayiyê ku mirov jê re hejmetkar dimîne. Seyda Hikumet, heke li gor qabiliyeta alayiyan, derseke baş a întîzamê bide, çiqas xweş û ya xwestinê ye wesselam.*”* [522] Seîdê Kurdî

**Pêvek-17:** Daxwaznameya ji bo rojnameya *Marifet Ve İttihâd-ı Ekrâd*

Eslê daxwaznameya vê rojnameyê wekî li jêr e:



*(Mürâcaat ettiğine dâir 10 Muharrem 1327 / 20 Kânûn-i sânî 1324 [2 Şubat 1909]târihliBelge)BÂB-IÂLÎNEZÂRET-İ CELÎLE-İDÂHİLİYYE İdâre-*i *Matbû'ât Aded 1498*

Bedîüzzamân Saîd-i Kürdî Efendi Hazretleri tarafından takdîm edilip idâre-i çâkerîye havâle buyurulan 'arzıhâlde siyâset-i şer'iyye ve ulûm ve şuûn-i muhtelifeden bâhis olmak ve şimdilik haftada bir, ileride yevmî çıkarılmak üzere " Ma'rifet Ve İttihâd-ı Ekrâd " nâmıyla Türkçe ve Kürdçe bir gazetenin neşrine me'zûniyet i'tâsı istid'a edilmiş olmasıyla matbuât nizâmnâmesinin üçüncü ve dördüncü maddelerinin fıkra-i ûlaları ahkâmına tevfîkan müsted'î-yi mumaileyh

[522] B. Seîdê Kurdî , Kurd Teawun we tereqqî Gazetesî,h,2/29,Teşrînî sanî,1324/,12 Kanûna ewel 1908,nkl Dersên civakî, İstanbul, Zehra, 2013, r.359


hakkında muâmele-i lâzime ifâsıyla netîcesinin inbâsı husûsunun zabtiyye nezâret-i ‘aliyyesine emr u iş’âr buyurulması bâbında emr u fermân hazret-i men lehu’l-emrindir.

*Fî 10 Muharrem sene 327 ve fî 20 Kânûn-i sânî 324*

*Matbû’ât-ıDâhiliyyeMüdîri*

*MehmedTevfik*

*Fon Kodu: BOA.DH.MKT., Dosya No:2730, Gömlek No:76*



(Muâmelenin devâmı ile ilgili 24 K.sânî [1]324 târihli Belge.)

Dâhiliyye Mektûbî Kalemi

Evrak numrosu / 1498-21

21 K.sânî [1]324

Zabtiyye nezâret-i Behiyyesine

Di derbarê mijarê de belgeya duwem:

Ev daxwazname jî di derbarê heman rojnameyê de ye ku ji Wezareta Zabtiyyeyê re hatiye dayîn:

Zabtiyye Nezâret-i Behiyyesine

Siyâset-i şer’iyye ve ulûm ve şuûn-i muhtelifeden bâhis olmak ve şimdilik haftada bir, ileride yevmî çıkarılmak üzere “ Ma’rifet Ve İttihâd-ı Ekrâd ” nâmıyla Türkçe ve Kürdçe bir gazetenin neşrine me’zûniyet i’tâsı Bedîüzzamân Saîd-i Kürdî Efendi hazretleri tarafından verilen ‘arzıhâlde istid’a olunmuşdur. Matbuât nizâmnâmesinin üçüncü ve dördüncü maddelerinin fıkra-i ûlaları ahkâmına tevfîkan mumaileyh hakkında muâmele-i lâzimenin ifâsıyla netîcesinin inbâsı husûsuna himmet..

**Pêvek-18:** Gotara Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya navdar:

Ey gelî/gelê Kurdan!

Tifaqê de qewet, îttîhadê de heyat, di biratiyê de se'adet/bextewarî, hikumetê de selametî heye. Kapika îttihadê û şirîta muhebbetê qewî bigrin da we ji belayê xelas ke. Qenc guhê xwe bidinê, ez ê tiştekî ji we ra bibêjim:

Hûn bizanin ku sê cewherên me hene, hifza xwe ji me dixwazin.

Yek Îslamiyet e ku hezar hezar xûna şehîdan, bihayê wê dane.

Ya Duyemîn, însaniyet e ku lazim e em xwe nezera xelqê de, bi xizmeta eqlî, ciwanmêranî û însanyetî, xwe nîşanê dunê bidin.

Ya Sêyemîn, milliyeta me ye ku meziyetê da me; ê berê ku qenciya xwe sax in, em bi karê xwe, bi hifza milliyeta xwe, ruhê wan de şad bikin.

Piştî wê, sê dijminê me hene, me xerab dikin:

Yek feqîrtî ye. Çil hezar hemalê Stenbolê, delîlê wê ye.

Ya Duyemîn, cehalet û bêxwendinî ye ku hezar ji me da, yek "qezete"/rojname nikarin bixwînin, delîla wê ye.

Ya sêyemîn, dujminî û îxtîlaf e ku ev edawet, qeweta me wunda dike. Me jî mustehqî terbiyeyê dike û hikumetê jî ji bê însafiya xwe, zulim li me dikir.

Ku we ev seh kir, bizanin çara me ew e ku em sê şûrên elmas bi dest xwe bigrin; ta ku em her sê cewherên xwe ji destê xwe nekin, her sê dijminê xwe ser xwe rakin.

Şûrê ewil, mearif û xwendin e.

Ya duyemîn, îttifaq û muhebbta/hezkirina millî ye.

Ya sêyemîn însanê bi nefsa xwe şuxlên xwe bike û mîna sêfîlan ji qudreta xelqê hêvî nejke û pişta xwe nedetê.

Şîreta paşî, xwendin, xwendin, xwendin û desthevgirtin, desthevgirtin, desthevgirtin.[523]

Mela Seîd

[523] Mela Seîd, Şerq we Kurdistan Gazetesî* Hejmar: 1/ Rûpel: 22 Teşrîn-î Sanî 1324, nkl, Dersên Civakî, Îstanbul, Zehra, 2013,361

**Pêvek-19:** Telqînên Ku Ji Ulema, Meşayix Û Serok Û Ferdên Kurdistanê Re, Derbarê Meşrûtiyetê De Hatine Kirin

Gelî alimên ku warisê nebiyan in û gelî meşayixên Kurdan!

Ji ber ku ez li navendê me, ez we hişyar dikim ku: Di vî zemanê axir de, wan ewrên tarî yên îstîbdadê, ew ulwiyet û husna heqîqî ya Îslamê, ji pêşiya çavan rapêçabû û veşartibû. Hetta wisan kiribû, mîna ku Îslamiyet, di çavê biyaniyan de li hember pêşveçûn, edalet û hurriyetê, kelem û asteng be hatiye nîşandan. Haşa summe haşa! Lewra ew azadî/ hurriyet, wekhevî û edaleta serdema pêşî ya Îslamê, ji vê re delîlekî eşkere û zelal e ku ev şerîeta pak û ronak, -jixwe ev wekheviya di îbadetan de vê diselmîne- temamê wan mafên azadiyê, edaletê û wekheviya mafan, bi carekê, tevî wan pevgirêdan, rabite û pêdiviyan di xwe de dihewîne. Çimkî ji ber ku şerîet, ji kelamê ezelî hatiye, dê biçe ebedê. Çawa ku enbiya, qayde û prensîban bi wehyê saz dikin û muctehîd, bi îctîhadê hukman derdixin, hûn jî li gor pêdiviyên demê, wan hukmên edlî bi keys bikin.

Gelî serokên Kurd ên tebîetwêrek!

Heta niha hûn, bûn tabi'ê padîşah û ew hêz û cebra ji ber wê kovîtî û hovîtiya gel ku mehkûmê lipaşmayîn û parçebûyînê ye, we pêdivî dît ku hûn ji bo gel bi kar bînin. Vê gavê jî padîşah, dîsan îmam e. Tabi'iyê bikin; da ku ew, bi wê marîfet û edaleta ku mezherê imrê ebedî ye, gelê xwe îdare bike. Hûn jî wisan bikin; da ku hûn bigihîjin xelasiyê. Li şûna qewet, zor û cebrê, aqil û edaletê bi kar bînin û di ciyê tirsandinê de muhebbetê li ser lingan bigrin; da ku riyaset û serokatiya we berdewam bike. Kurtebirî û dawiya gotinê, mezinê me, ew kurkê axatiyê ku wisan zêde bi heşmet bû, ji gelê xwe re bexişand. Hûn jî wî ebayê kevn ê axatiyê ku kêç û spî ketinê, bi kincekî edaletê re pev biguherînin.

Gelî ferdên Kurd ên ku mîna şêran girêdayî ne!

Heta niha hûn ji du aliyan ve hêsîr bûn. Yek jê, hûn bi wan teklîfên zalimî yên wê hukûmeta zordest ve, aliyê din jî, hûn bi wan xesb û talankirinên xedar ên hin zaliman ve girêdayî bûn. Niha, di pey vê şoreşa mezin de, hûn azad in. Bi şertê ku hûn îtaeta wan berpirsiyariyên adil ên hukûmeta meşrûtî ya meşrûî bikin û bi awayekî menfî êrîşî ser mafên xelkê nekin, her yek ji we, di alema xwe de mîna ye padîşahekî. Heta ku ji destê we tê, selteneta şexsî muhefeze bikin û bi teşebbusa şexsî, ji vê îttîhada millî û ji meşrûtiyetê re, bi her awayî xîzmet bikin.
Lewra rizgarî û jiyana me ya mutleq û belkî hemû miletê Îslamê û Osmaniyan, bi vê îttîhada miletê, qaîm e. Çavê xwe vekin, sibeh hat. Tim hişyar bin. Ew kesên ku xwedî wan fikrên xerabûyî ne, bila ji îxtîlaf û hovîtiya we îstîfade nekin. Vê yekîtiya neteweyî ku bi şan e, bila nekin hedefê nexweşîneke fena. Çimkî wê gavê, temamê gel û Îslamiyet, dê li ser wê bibe dawedar. Zeman jî, dê şîmaqê li we bide û bi vî awayî dê îxtîlaf û keşmekeşiyê bavêje. Heke hûn namûsa xwe divên, berî ku hûn şîmaqê bixwin, gav bavêjin. Îca hûn vê jî baş bizanibin: Li hember vê medeniyeta ku êrîşî her aliyî dike, hûn nikarin li ser vê hovîtî û kovîtiya xwe bisekinin. Nebî hûn ji vê peyva wehşet û hovîtî û kovîtiyê bixeyidin. Lewra serê ewil, ez ji nefsa xwe re dibêjim. Jixwe qebehet ku heye, yê hukûmetê bi xwe ye. Tiştê ku ez dixwazim ew e

ku hûn, namûs û heysiyeta Kurdîtiyê biparêzin û di hêla xîzmetkirina ji bo meşrûtiyet û edaletê de, hûn jî bidin ser şopa wan Ernewûtên egît û qehreman. Di vê rewşa niha de, dê ji her kesî zêdetir ji seadeta me re xîzmet bike. Çimkî ji her kesî zaftir, me ji îstîbdadê zerar dîtiye. Tu dibêjî qey ji me xeyidîne; wan em sewqî zemanê berê dikirin. Ez mizgînî didim ku: Di demeke nêzîk de, li temamê Kurdistanê, dê ew medreseyên munderîse (ku ji holê hatine rakirin), ji nû ve bên îhyakirin û li wan ciyên ku tune ne jî, dê medreseyên nû bên avakirin. Wesselam. Bedîuzzeman

**Pêvek -20:** Gelî Kurdino

(Heke hûn, ji ber wê bêînsafiya zêde û ji ber wê tundî û îfrata ku di peyvên min de ne, li min bigrin, hûn dê bêînsafiyekê li bêînsafiyê zêde bikin; Çimkî ez yekî esebî me û hêrsokî me û heqîqetê jî, bi tu awayî ji tu tiştî re feda nakim.)

Ruhê komeleyan, di îttîhadê de ye. Îca mîzaca jiyanî ya hukûmetê, di hevgirtin û bihevdekelijandina komeleyan de ye. Heqîqeteke ew çend xweşik ku min ji bo raya me ya giştî ya ku perîşan e û di nava wan tebeqeyên xerezan de nû hişyar bûye, pêşkêş kiriye, ji ber ku qîmet pê nehatiye dayîn, wan kincekî wisan kirêt û çirkîn lê kiriye ku ez, ji ber fermana qet'î ya hemiyet û xîretê mecbûr im ku endam û heft azayên wê, bi qelaştina wê perdeya nezaketê nîşan bidim. Ez her azayî û her organî, di nav heqîqetekê de nîşan didim.

Heqîqeta Pêşî: Gava merivek derkeve dereceyekê û di paceyekê de li alemê temaşe bike, heke bejna wî kurt be, ji bo ku bigihîje wê dereceyê, ew dê xwe dirêj bike; heke dirêj be, dê xwe xwar bike. Eynî mîna vê, merivek, gava ku ji wê qîmet û qabiliyeta rutbe û hakimiyeta xwe re jêrdest be, ji bo ku xwe ji wê tefrîtê dûr bigre, dê xwe li kibr û quretiyê girêbide; lêbelê gava ku ew bi xwe, raserî wê rutbeyê be, îca ji bo ku xwe ji îfratê dûr bigre û bê astekê û wê mezinbûn û bilindbûna xwe nîşan bide, dê nefsbiçûkî û tewazû bike.

Heqîqeta Duduyan: Daxwaz û amanc û xerezên merivahiyê, ji ber ku bê sînor in û ji ber ku ev dunyaya teng û sînorkirî, nikare wan di xwe de bihewîne, di her karûbarî de, ew xerez û meqsedên zêde, diguvişin û bi xwe re jî dexesî û geremolî tînin û dibe sedem ku rê li ber wê meydana mucadeleyê ya jiyanê vebe. Îca axret, ji ber ku fireh e û wan daxwazên bêsînor di xwe de dihewîne, ji bo bicîanîna wan karûbarên axretî, -ka yek ji wan jî ew menfîetên giştî ne ku bi navê huqûqullah tê binavkirin- muzahemet tune ye. Ji vê re miqyas û pîvan, di karûbarên mîna wê zelaliya welîtiyê ku gelek hêja ye û kemaleke heqîqî ye û bi qasî sureyyayê mezin û ulwî ye de, hesed tune ye. Lêbelê, di wan rutbe û payeyên ku gelek bêqîmet in û wucûdeke maddî ji wan re tuneye û mîna ne serab û lewlewk û leylankan de û di wê xweşikî û qeweta ku zû diqede û derbas dibe de, hesed û dexesî gelek zêde ye.

Heqîqeta Sisiyan: Gava ew wekheviya di îbadet û mizgeftê de, weke prensîbekî esasî yê pîşe û meslegekê bê qebûlkirin, bi xêra wê hêza xîreta millî ku ji karûbarên axretî ye û bi alîkariya wan teşebbusên şexsî, ew muhebbetên cuzî, dê cazîbeyeke giştî ya wisan çêbike ku girseyeke mezin a mîna Kurdan, dê weke kureyê li hev bide zivirandin û gerandin. Lê belê, gava ku ew şeref û îtîbarên dunyayî esas bên girtin û ew wekheviya eslî bê îhlalkirin, mîna hêlîn û qula dûvpişkan, dê xerez û ez-ezîtî, dest bi întîşar û zêdebûnê bikin. Îca tiryak, derman û îlaca vê jî, dîsan ew wekhevî ye. Çimkî enaniyet û ez-ezîtiya her kesî heye.

Ne bi neslê, ne bi salê ye
Ne bi cî û meqam e, ne bi malê ye
Begê min, mezinatî bi kemalê ye
Ev beyta ha, ji vê rasteqînî û heqîqetê re şahid e.

Heqîqeta Çaran: Nexweşek, li ber hekîm, di sê rewşan de ye. Rewşa pêşî: Çavê xwe digre; tu tiştî nabêje, hekîm jî qet girîngî pê nade. Geh derman didê; geh jehrê. Mîna rewşa gel a di îstîbdadê de.

A duduyan: Nexweş, bi xwe alîkariyê dike; da ku hekîm, nexweşîna wî rast nas bike û wan dermanên ku hekîm dide wî, bi awayekî baş bi kar tîne û wan tiştên ku ji jiyana wî re lazim in dixwaze û hekîm jî, ji ber ku çavê nexweş vekiriye, mecbûrî îhtiyat û baldariyê dibe. Mîna wê pîşeya ku ez di komeleyan de dixwazim.

A sisiyan: Nexweş, bi çavekî wisan li hekîmê xwe dinihêre, hema hema eynî mîna ku hekîmê wî, reçetenûs be dibîne û digel ku ew nexweş e jî, bi zewqa hekîmfiroşiyê, ew nexweş bi xwe dixwaze ku dermanan bikire û çêbike û bi kar bîne û ji ber bêmahirî û bêbehretiya xwe, dibe mezherê vê raza\

إِثْمُهُ أَكْبَرُ مِنْ نَفْعِهِ

(Guneh û zirara w, ji feydayê wî mezintir e.)

Lewra bi şîrînahiya hakimiyetê, serxweş dibe. Mîna pîşeya komeleyên a niha yan jî, rewşa wan a bê.

El fezleke û kurtebirî: Gel, nexweş e, hikumat jî hekîm e. Digel ku em di dema herî fena de nefsê teslîm dikin, di dema herî bimenfîet de, ne karê wan kesan e ku menfîeta giştî, ji xwe re dikin amanca sereke û bi awayekî îttîhamî û xweserane tevbigerin. Hêz û qewet, bila di qanûnan de be, gava ne wisan be, ew îstîbdad, tê payîkirin.

Heqîqeta Pêncan: Heke ji wê şeref, heysiyet û rutbeya farazî ya ku kana îstîbdadê ye û îstîbdad tê de hêşîn dibe, hawar bê xwestin û îstîdamkirina gel û xatir û zordestî tevî alîkariyê bê kirin û girêdan, ha ev ku heye, axatî bi xwe ye. Li Yildiza ku dayika axayan e, wî Siltan Hemîdê ku bavê axayan e, - 1 - Guneh û zerarê wê, ji feydeya wê zaftir e dest ji axatiyê berda. Îca ka li ku ma, ew kelmêşên dî... Îca ew axatiya hurriyet û medeniyetê, ew e ku xwe bispêre nefs û kemala xwe û îqtîdara xwe bi kar bîne û ji gel re xizmetê bike.

سَيِّدُ الْقَوْمِ خَادِمُهُمْ

(Pêşengên gel ewe ku ji wan re xizmetê dike)

ji vê re dustûrekî tetbîq û pêkanînê ye. Yê ku bi awayekî şedîd doza hemiyetê/gelparêziyê dike, ji wê hemiyeta ku li teqwiyekirina wê dixebite, di gumanê de ye.

Heqîqeta Şeşan: Hin komele hene, ji ber ku encama îttîhada/yekîtiya gel e, komeleyeke tabiî ye û muhkem/saxlem e. Ji bo îxtîlafa Kurdên me yên şêr, ji ber ku komeleya me, sun'î û destpêka îttîhadê ye, gelek zêde muhtacî îhtiyat, tedbîr, niyeta xalis, fedakarî, (hetta ruh jî... ka li ku ma ew ez-ezîtiyên...) mahirî, jîrî, xwînsariyê ye. Çimkî bi îfrateke hindik, gelek asab û hissiyat tên coş û peroşê, nemaze ji mezinan... Îca di asasên wiha de, xeletiyeke hindik, mîna kesra ededî, di yekûnê de, dê bigihîje yekûneke mezin a guneyan. Hem jî, ji daîreya fireh a alîgirên hurriyetê re, ji ber ku ji bilî raya giştî, serpûşeke dî tune ye, ez bi awayekî qet'î, li dij wan rîwayetên şexsî me; reîsê me, ancax
hikumet e.

Heqîqeta Heftan: Komele ku ciyê xwedîtina raya giştî ye û mirêk û navenda hebûna qewmekî ye. Îca em ku xwedêgiravî aqil û merîfeta me, di qewet û cesareta me de civiyaye û tê de belav dibe, em dê hebûna xwe û qîmeta raya xwe ya giştî, bidin ber hebrik û reqîbê xwe û bi wan re muqayese bikin û bi vî awayî em dê wan daxînin jêr.

Ji me re lazim: Em dê bi Tirkan –ku wê qeweta wan a berê ku bi şan bû û mîna ku ji ber mezlûmiyetê wenda bûbû, întîzam daye aqil û marîfeta wan re yekîtî çê bikin. Ew bila berevaniya me bikin. Çimkî me gelek ucret daye wan. Yahû, heke te ji van heqîqetên xweşik fam kiribe, bala xwe bidê; bê ka bi şîroveyeke çiqas pîs, li hember xwestek û rexbeta giştî, sedd û bend kişandine. Mîna ku ez dê, di îttîfaqa Kurdan de, wisan bikim ku hin kesên ji xeynî wan bibin beg, wisan kelîmeyên bêaqilî dibêjim û mîna ku ez ji wan zatên ku bi tu awayî, digel ku di navbera min û wan de tu reqabetek tuneye jî, dihesidim û xerez dikim û ji bo xwe jî, wê navdariya ku ez jê aciz bûme û wê siyaseta ku ez wê çirkîn û kirêt dibînim dixwazim. Ha wan bi van kelîmeyên xwedipisinînî, qîmeta şexsê xwe nîşan da.

Ez, heta niha, di wê fikrê de bûm ku bi rêya muxalefetê, sulhê û wê;

1 - Mezin û efendiyê qewm, ew e ku ji gel re xizmetê dike. (Suyûtî, el Feth ul Kebîr: 2/ 168) aştî û lihevkirinê pêk bînim. Ji ber tirsa enaniyetê û ji bo ku ez li dij wê derkevim û bi emele

إِنَّ لِلْبَاطِلِ صَوْلَةً ثُمَّ تَضْمَحِلُّ.

(Serdemeke serdest a batilan heye; lê bele pey re dimehe, tune dibe û diçe)

min heqîqet, di nav sukûtbûnê de veşart. Îca a niha, ez wî stûyê wan xerezên ku li zeviya dahatuyê hatine danîn û a niha tam nayên dîtin; lêbelê bi tiştên zerarkir simbil dane, hewaleyî şîmaqa dem û zeman dikim.

مَنْ لَمْ يُؤَدِّبْهُ الْأَبَوَانِ أَدَّبَهُ الزَّمَانُ.

(Kesên ku dê û bavê wan, ew terbiye nekirine, zeman bi xwe wan terbiye dike.)

Heke sedemê tevgera ferdî, îxtîlaf, bixwepesinîn, meyla li ser axatiyê, îstîxdamkirin û xîzmetkirina bi gel, xapîn û danxapandin, di wê Kurdîtiya sun’î de bê nîşandan, hûn şahid bin, ji wê Kurdîtiyê ez îstîfaya xwe didim.

Îca bi Kurdîtiya sirûştî ya ku unwana cesaret, wêrekî, sedeqet û diyanetê ye, îftîxar dikim. Çawa ku di zemanê îstîbdadê de ez ji bo Kurdîtiya sirûştî ketim timarxaneyê. Min ji hekîmê wan kesên delîdîwane re got: Heke qeşmerî, melaqî, xwepêxweşkirin, libergerandina pisînganî, xwemizmizandina kuçikî, ji menfîeta şexsî re fedakirina menfîeta giştî, ji wan pêdiviyên aqil bê hesibandin, hûn şahid bin, ez ji wî aqilî îstîfaya xwe didim û ez bi dînîtiyê jî dipesinim.

Gelî Kurdino! Min timarxane qebûl kir. Îca ji bo ku ez Kurdîtiyê nehetikînim, min îradeya padîşah û meaş û diyarî û îhsana wî ya şahane qebûl nekirin. Serkeftin, hevalê niyeta xalis e.

مَنْ كَانَ لِلّٰهِ كَانَ اللّٰهُ لَهُ

(Ew kesê/a ku ji bona Xwedê ye, Xwedê jî ji bo wî/ê ye.)

wesselam, ma temmel kelam.

Mela Seîdê Meşhûr

**Pêvek-21:** Encamname

(Heke li vir, çend gotinan ji ehlê qewmê xwe rejî nebêjim, bawer im dê mijar netemam bimîne.)

Gelî Kurdeşêrên ku di serdema cîhangiriya Asûrî û Keyaniyan de leşkerên wan ên pêşdar û cengawer hebûn! Ev xewa we ya pênc sed salî bes e. Êdî şiyar bibin, sibe ye. Eger na, dê wehşet û xeflet, di çola hovîtî û wehşetê de, we talan bike. Hîkmeta îlahiya ku muessîs û avakarê qanûnên nûranî yên Îlahî ye û wekî têlên telgirafê, hemû alem rapêçaye û tê de şax vedaye û nîzama makîneya alemê ye ku jê re hîkmeta îlahî tê gotin, ji ûfqa ezelî, tiliya qederê rakiriye û li we ferman dike ku: Hêz û hemiyet û xîreta xwe ku bi îxtîlaf û bêtifaqiyê wekî ava belave ya dilop dilopî zayî bûye, bi fikra milliyetê bighînin hev û bikin yek. Cazîbe û berkêşiyeke umûmiya wekî cazîbeya zerreyên piçanok, pêk bînin û wihareng girseyeke mezin a wekî kurd, mîna kureyê bînin dewr û deweranê û li sazûmana roja şewketa Îslamê û Osmaniyê, mîna yê stêrkeke şemaldar û rewnaqdar, tevlî cazîbe û berkêşiya wê bibin û muwazene û ahenga umûmî biparêzin. Hem jî, ew “hurriyet”a ku pala xwe daye şerîetê û pêşî li neheqiya li xeyran digre û hêsîrî û bindestiya bin emrê nefsê, qedexe dike û wekî çiyayên Sîpan û Agiriyê, li ser girê dîharê çiyayên paşerojê rabûye piya, bi dengê bilind, li qewmekî wekî we xafil û jihevbûyî yê ku li geliyên pêşerojê yên herî kûr mane, wiha ferman dike: “Ji bo hucûma li ser cahilî û feqîrtiyê, dest bavêjin fen û sin’et û sîlehê. “Herne pêş! Û Êrîş!” Hem jî ew “heqîqeta” ku di bin tebeqeyan de perdedar û dîl û girtî maye û bi mehf û hilweşîn û qelişîna tebeqeya îstîbdad û zordestiyê, bi sivikbûna wê tebeqeya cehl û xefleta ku li ser milê wê ye, leq û livîn pêketiye û hêz daye xwe ku rabe ser xwe ku jê re tê gotin “qasidê heqîqetê”, ji her aliyî ve, ji we re radigihîne ku: Dem, dema avdana bi ava heyatê ya perwerdehiyê ya wan qabiliyetên we ye ku destê qederê di mahiyeta we de çandiye û seciyeyên we yên ku di mahiyeta mîlliyeta we de veşartî ne û muqedderata we derdixîne rû dinê. Yan na, dê hişk an jî pûç bibe. Hem jî ew “seydayê hewcehiyan” ku avakarê pêşketinan û bavê medeniyetê ye û jê re “hewcehî” tê gotinê, sîle û şîmaqa xwe rakiriye û li we hikim û ferman dike ku: An hûn ê di vê çola wehşet û hovane de, heyat û hurriyeta xwe bidin ber destê talan û şêlanê; an jî hûn ê li meydana medeniyetê, li trên û balona fen û sin’etê siwar bibin û paşeroja paşerojê û wan hal û rewşên îttîfaq û yekîtiyê, ji nû ve bi dest bixin û ber bi kabeya kemalatê ve bimeşin û bibezin. Hem jî “fikra we ya miliyetê” ku we mîna malbateke li newalên pêşerojê û deşt û çolên roja îro û li çiyayên paşerojê şax vedaye û bi tevî qehreman û egîdên dahî yên kurd ên mîna Rustemê Zal û Selahedînê Eyubî, li konekî rûniştî ne, her kesî bi şeref û heysiyeta ferdên din ve, şerefdar û rûmetbar dike û nimûneya hîssên payebilind e ku jê re milliyet tê gotinê, bi emrê qet’î li we ferman dike ku: Her yek ji we bibin neynika heyata hemû milet û parezvanê seadeta wan û bibin mînak û modeleke muşexxes a hemû gelê xwe. Ne ku wekî niha bi qasî mirovekî, bilakîs hûnê bi qasî miletekî mezin bibin. Lewra bi mezinbûna amanc û meqsedê re, xîret û himmet jî, mezin dibe. Û bi coş û kelîn û xeleyana xîreta millî re, exlaq jî dikemile û mezin dibe. Hem jî, ew meşrûtiyeta meşrû ya ku îradeya cuzî ya di hurriyetê de ku sebebê seadeta qewman e û bi temîna hakimiyeta millî, wezîfa buxara makîneya heyatê pêk tîne, ji bindestiya îstibdadê û zordestiyê xelas dike û bi haveynê meşwereta şer’î dide meyandinê ku jê re dibêjin “meşrûtiyet”, we dawetî meclîsa îmtîhanê dike: Dixwaze bibîne ku hûn kamil û balix bûne û îhtiyaca we ya bi wesayetê, tuneye. Xwe ji bo imtihanê amade bikin. Hebûna xwe, bi yekbûna xwe

bidin nîşandan. Û bi saya hemiyet û xîreta millî, fikir û wijdana xwe ya şexsî, wekî dil û eqlê muşterek ê miletê xwe nîşan bidin. Eger na, dê sifirê bide we, dê bawernameya hurriyetê, nede destê we. Belê, ew meyla axatiyê û fikra xweserane û enaniyeta di we her yekî de ku bûye sedema gengeşeya we ya li deşt û çolên pêşerojê, vêga dê vegere fikra îcadê, teşebûsa şexsî û fikra hurriyetê ya li qesra şadiya şaristanî û medeniyetê ya paşerojê. Heta dikarim bibêjim ku: Li gorî medreseyên xelqên din ên bêdeng û his, medreseyên we yên bi sewt û seda, rewşa meclîseke mebûsan a ilmî nîşan didin. Û ew vizeviza we ya semawî û rûhanî ya qiraet û xwendina Fatîheyê ya li pey mela, îma û nîşaneke qederê ye ku di mahiyeta we de, bi mezhebî, medreseyî û qewmî, sirra qabiliyeta meşrûtiyetê heye. Her wiha, teşwîq e, ji bo teşebûsa şexsî ya ku unwanekî dinê yê vê ayeta hanê ye:

Hem jî "cesaret û namûsa millî" ya ku sebeb û hamiyê her camêrî ûfezîletê ye, ferman dike ku: Çawa ku we heta niha rê û mecra ji mêjî, ber bi dil ve vekir û wihareng aqil mezc û tevlî nav qewetê kir û we ders û perwerdehiya xwe, ji devê şûrê tûj wergirt û di şecaet û cesareta maddî de, bi pêş ketin. Îcar jî, buhur û neqebeke ji dil, bal bi fikr û ramanê ve vekin; qewetê bişînin hewara aqil. Hest û hissan, bavêjin dû fikran. Da ku namûsa millî, li meydana medeniyeta mêraniya mêjî û hiş, paymal nebe. Divê şûrên we, ji cewherên fen û sin'etê, bêne çêkirinê. Hem jî zimanê we yê ku neynika çirûskên hîs û hestên mîllî ne û dara fêkiyên edebiyatê ye û cihikên ava heyata perwerdehiyê ye û mêzîn û mîhenga pîvana qîmet û kemilîna we ye û ber bi aliyê wijdana herkesî ve bi awayekî rasterast rê û menfez vedike û wihareng mîna baqê tîrêjê bi bandor e ku jê re "zimanê zikmakî" tê gotinê(ku ji ber îhmala we, gelek tevlihev maye û hin şaxên wê hatine tamandin) herçiqas xwediyê wê qabîliyetê ye ku bibe mezherê tecelliya dareke mîna dara Tûbayê, ji ber ku wiha hişk û perîşan bûye û ji edebiyatê ku zimanê medeniyetê ye, paşde maye, bi zarekî xemgîn, gilî û şikayetawe, li xîret û hemiyeta we dike.

Mora qederê ya di însan de, ziman e. Reng û rûyê însaniyetê jî, di rûpelê ziman de, neqş û xemla beyana xwe, dide der. Zimanê zikmakî jî, ji ber ku sirûştî û fitrî ye, lefz û kelam, bi xwe, berê xwe bêyî gazî û dawet, têne hiş û bîra meriv. Wihareng ji ber ku danûstendin, tenê bi maneyê re ye, lewma hiş nakeve nav dudiliyê û şaş nabe û ew ilm û agahiyên tên dikevin wî zimanî, mîna "neqşun ale'l-hacer/nexşên li ser kevir" daîmî dimînin. Û her çi tiştê ku bi wî kirasê zimanê millî bixuyê, ji meriv re nas û şîrîn tê.

Vaye, ez mîsaleke xîret û hemiyeta mîllî pêşkêşî we dikim ku ew jî, Xelîl Xeyalî Efendiyê Motkiyî ye ku çawa di her şaxê xîret û hemiyeta mîllî de li pêş e, di warê şaxa ziman de jî, "pêşengî"yê bi dest xistiye. Û alfabe û serf û nehwa ku esasên zimanê me ne, çêkiriye. Û heta ez dikarim bibêjim ku esra hemiyet û xîret û fedakarî û hîmaya jaran, îmtizac kirine û gihiştine hev û wucûda wê ya manewî çêkirine. Bi rastî jî, ji ber ku em di madena Kurdistanê de, rastî cewherekî xîretê yê wiha hatine, hêvîdar im ku dê gelek cewherên wekî wî, paşeroja me ronî bikin.

1 - Ji bo însan, ji bilî ked û xebata wî, tiştekî din, jê re tune ye. (Necm: 39) Vaye vî camêrî, nimûneyeke xîret û welatparêziyê ku hêjayî pêgirtin û lipeyçûnê ye, nîşan daye û ji bo zimanê me yê millî yê ku hewceyê kemilîn û pêşxistinê ye, xîm û bingehek daniye. Ez li ehlê hemiyet û xîretê tembîh û tewsiye dikim ku li dû rêça wî biçin û li ser bingeha wî ava bikin."[524]

Bedîuzzeman Seîdê Kurdî

---

[524] Kurdî, h.b., r. 176-179

**Pêvek-22:** Gotara Bedîuzeman Ya Kurd Dîsan Muhtac in

Şerq we Kurdistan Gazetesî*
Hejmar: 1
19 Teşrîn-î Sanî 1324
2 Berçile/Kanûna Ewil 1908

Kurd Dîsan Muhtac in


"Ehaliyê Kurdistanê, di nav miletê Osmaniyan de, xwedî ciyekî muhîm e. Hal û hewalê ehaliyê Kurdistanê, digel ku ji aliyê hukûmetê ve tê zanîn jî, ez dixwazim ku hin daxwazên wan ên li ser xizmeta muqeddes a ilmî, berepêş bikim. Di vê cîhana medeniyetê de û di vî esrê pêşveçûn û pêşbaziyê de, mîna birayên din, ji bo Kurd jî bikaribin bigihîjin pêşveçûnan, bi xîreta hukûmetê, li bajarok û gundên Kurdistanê, hin mekteb/dibistan hatine avakirin û vekirin. Eynî em şikir dikin. Lê belê ji van mekteban, tenê ew zarokên ku bi zimanê Turkî dizanin, feyde dibînin. Zarokên Kurdan ku bi zimanê Turkî nizanin, tenê wan medreseyên ku ciyê ilmê ne, weke ciyê kemilînan dibînin. Îca ew mialimên/mamosteyên wan jî, bi zimanê Kurdî nizanin. Ji ber vê yekê, ev zarokên Kurdan, ji marîfet, ilim, hînbûn û perwerdehiyê marûm dimînin. Îca ev ku heye, bi xwe re wehşet, keşmekeşî, tevlihevî, û şemateya dewletên Rojava, vedixwîne nava me. Bi ser de jî bela ku xelkê vê derê, di rewşa wehşet û teqlîda halê destpêkê de hatiye hiştin, rebenan ji tesîra metirsî, şik, guman û tirsan re dibin hedef.

Ew ên ku ji zemanê berê ve ji Kurdan bi paş de mabûn, îro ji halê wan ku di ciyê xwe de li paş mane, îstîfade dikin. Ev ku heye, dike ku ehlê xîretkêş, hûr û kûr biponijin. Ev her sê tiştên ha, di rojên pêş de, derbeyeke bidehşet ji Kurdan re amade dike. Lewra vê yekê, dilê wan kesên ku haya wan ji rojên pêş heye û xema îstîqbala/ayendeya xwe dixwin, daxdar û birîndar kiriye. Îca çareya vê: Ji bo numûneyêke xweş û ji bo ku bibe wesîleya halan/teşwîq û rexbetê, divê ku li çend ciyên cihê cihê yên Kurdistanê, sê ciyên perwerdehiyê werin avakirinû di her yek ciyekî de jî qet nebe pêncî telebe hebin û debara wan jî, bi xêra hukûmeta hêja, bê sêwirandin. Ev her sê ciyên perwerdehiyê, ev der bin baş e: Yek jê, li hêla Beytuşşebabê ku ev der, navenda eşîrên Ertûşê ye, Ya din, di navbera Motkan, Balikan û Sasonê de,

Yek jî jê, li Wanê ku ev der jî, di navbera Sîpkan û Heyderan de ye, bê avakirin. Li van ciyan jî, ew ilmê ku ji qedîmî zeman ve ye li medreseyan tê xwendin û pê re jî ilmê fennê yê dewra me, divê bê hînkirin. Ji xeynî van, îhyakirina hin medreseyên din jî, bêguman dê bibe wesîle ku heyata maddî û manewî ya rojên pêş a Kurdistanê, temîn bike. Bi vî awayî, dê temel û bingeha marîfetan bê danîn. Bi vê destpêka avakirina van ciyên perwerdehiyê û medreseyan, dê yekîtî û hevgirtin ciyê xwe bibîne û ew qeweta pir mezin a hukûmetê ku ji ber lihevnekirina navxweyî mahw dibe, dê careke din li destê hukûmetê vegere û bi vî awayî dê destê hukûmetê, li hember derve, bi qewet bibe û bi vî awayî Kurd, hem dê edaletê heq bikin hem jî dê ji medeniyetê re musaîd bibin û dê cewherê xwe yê fitrî nîşan bidin."

Molla Seîdê Meşhur

**Pêvek- 23:** Têlgirafa Bedîuzeman û Miftiyê Wanê ya ji bo Medresetuzehrayê


TELEGRAMME

تلغرافنامه

دولت علیهٔ عثمانیه تلغراف اداره‌سی

ADMINISTRATION DES TELEGRAPHES DE L'EMPIRE OTTOMAN

L'État n'accepte aucune responsabilité à raison du service de la télégraphie

| Retransmission ou Expédition تکرار کشیده ویا سوق | | | | RECEPTION | | | |
| --- | --- | --- | --- | --- | --- | --- | --- |
| No d'expédit. | Centre transmis à | Date تاریخ | Signature de l'employé مأمور امضاسی | Signature de l'employé مأمور امضاسی | Date | Reçu de | No d'ordre |
| ٤٥٦ | | H. M. | | | H. M. | | |

De — Pour


No — Mots — Date — H. — M.

Voie — Indic. Eventuelles — اشارت محتمله

DH.İD 84/20 12

DH.İD.00084.00020.012

**Pêvek-24:** Têlgirafa Walî Tahsîn Paşa ya ji bo çêkirina Medereseyê


T.C. BASBAKANLIK OSMANLI ARSIVI DAIRE BASKANLIGI (BOA)

TELEGRAMME تلغرافنامه

دولت علیهٔ عثمانیه تلغراف اداره‌سی

ADMINISTRATION DES TELEGRAPHES DE L'EMPIRE OTTOMAN

L'état n'accepte aucune responsabilité à raison du service de la télégraphie

Retransmission ou Expédition — RECEPTION


N° d'expédit. | transmis à | Date | Signature de l'employé | Signature de l'employé | Date | Reçu de | N° d'ordre

De ... Pour ... N° ... Mots ... Date ... H. ... M. ... Voie ... Indic. Eventuelles

OSMANLI ARŞİVİ BEO 4191 314292 2


BEO.004191.314292.002

**Pêvek-25:** Pêwîstiya çêkirina medreseyê û Metirsiya Ebdurezaq Bedirxan





BEO.004184.313747.002

**Pêvek-26:** Pêwîstiya çêkirina medreseyê û gîringiya medreseyê ji bo alimên Kurda





DH.İ.UM.EK.00086.00008.006


**Pêvek-27:** Derengbûna çêkirina medreseyê û xemgîniya gel


Van Valisi Tahsin Paşa'nın Medreset'üz-Zehra'nın Gecikmesinin Halk Arasında Olumsuz Tepkiye Yol Açtığıyla alakalı Telgrafı

**Pêvek–28:** **N**ameya pêwîstiya çêkirina Medrese-î Aliye û metirsiya Abdurezaq Bedirxan



**Pêvek-29:** Xîm avêtina Medrese-î Ali Reşadiye  û dia ji bo Padişah


T.C. BASBAKANLIK OSMANLI ARSIVI DAIRE BASKANLIGI (BOA)

TELEGRAMME تلغرافنامه

دولت علیهٔ عثمانیه تلغراف اداره‌سی


ADMINISTRATION DES TELEGRAPHES DE L'EMPIRE OTTOMAN

L'état n'accepte aucune responsabilité à raison du service de la télégraphie


OSMANLI ARŞİVİ
DH.İ.UM.EK
86 8 8

DH.İ.UM.EK.00086.00008.008


**Pêvek-30:** Bi pêşniyariya mebûsê Qeyseriyê Alim Efendî teklîf û destnîşanên mebûsan ji bo çêkirina Darul Ûlûm-i Îslamiye



**Pêvek-31:** Bi pêşniyariya mebûsê Qeyseriyê Alim Efendî û teklîfa Qanûnê



**Pêvek- 32:** Pêşniyariya lijneya encumena ya pêşkêşî TBMM ê hatiye kirin.



-9-1339 tarihli encümenin konunun genel kurulda görüşülmek üzere TBMM başkanlığına sunduğu yazı

## ÇAVKANÎ


ADIGUZEL, Abdullah: "Bediüzzamanın Eğitim anlayışın da Hürriyet", *Said Nursi Eğitim Felsefesi Medresetüz Zehra*, Merak Yayınları, Stenbol 2012.

AKCA, Mustafa: "Medresetuzzehra: Teorik Bir Yaklaşım", Merak Yayınları, Stenbol 2013.

AKÇE, Zübeyr: "Çima Medresetüz Zehra", *Said Nursi'nin Eğitîm Felsefesî Medresetuzehra,* Merak Yayınları, Stenbol 2012.

AKGÜN, İbrahim: "Munazerat ışığında "Yeni Hali İnşa İhtiyacı ve Kürtleri Bekleyen Görev", *Münazarat Sempozyumu*, Merak Yayınları, Ankara 2012.

AKGÜNDÜZ, Ahmed: "*Arşiv Belgeleri Işığında Bediuzzaman Said Nursi ve İlmi Şahsiyeti*" l.cilt, İmak Ofset, İstanbul 2013.

AKGÜNDÜZ, Murat: "Münazarat Yazıldığı Dönemlerde Osmanlı Medreseleri", *Münazarat Sempozyumu*, Merak Yayınları, Anakara 2012.

AKMAN, Ekrem: "Sıfatların İstibtad Aracına dönüşmesi Karşısında Bediüzzamanın Tavrı", *Münazarat Sempozyumu*, Merak Yayınları, Ankara 2012.

AKSOY, Gürbüz: "Türk Kürt Birlikteliğin de Medresetuzehra", *Münazarat Konferansı*, Merak Yayınları, Ankara 2011.

AKSOY, Gürbüz: "Yüksek Öğretimdeki Yeni Gelişmeler ve Bediüzzaman ", *Münazarat Sempozyumu*, Merak Yayınları, Ankara 2013.

AKTAŞ, Metin: "Saidi Kurdi Kürtlerin Gandisi", *Kovara Bîr,* Hejmar 105, 2008.

AKYOL, Taha: *Ama Hangi Atatürk*, Doğan Yayınları, Stenbol 2007.

ALAKOM, Rohat: *Unutulmuşluğun Bir Öyküsü: Saidi Kürdi,* Fırat Yayınları, Stenbol 1991.

ANTER, Musa: *Hatıralarım*, Aram Yayınları, Stenbol 2011.

ARMAĞAN, Servet: "Medresetüz Zehra ve Modern Üniversite Karşılaştırılması "*Said Nursi'nin Eğitim Felsefesi Medresetüz Zehra*, Merak Yayınları, Stenbol 2012

AYTEMUR Hüseyin Siyabend: *"Risale- i Nur'da Yapılan Tahrifat"*Hivda Yayınları, İstanbul,2015

AYYILDIZ, Orhan: "Medresetüz Zehra Projesine Universite Prespektifi", *Said Nursi Eğitim Felsefesi Mederesetüz Zehra*, Merak Yayınları, Stenbol 2102.

BADILLI, Abdulkadir: *Mufassal Tarihçeyi Hayat,* İthaki, İstanbul 2013.

BALCI, Ramazan. "Medresettuzehra Tarisel Kimliği", *Bedîuzeman Said Nursi Eğitim Felsefesi Medresetüz Zehra*, Merak Yayınları, Stenbol 2012.

BAYRAK, Mehmet: "Şark Islahat Planı", *Kürt Tarihi*, İstanbul 2013-2014.

BENEK, İsmail: "axaftina vekirinê" *Mederesetüz Zehra Sempoyomu*, Merak Yayınları, Stenbol 2013.

BEYTAR, Emrullah: "Anadil Resmi Dil", *Münazarat Konferansı*, Merak Yayınları, Ankara 2011.

BEO: Başbakanlık Osmanlı Arşivi Belgeleri, İstanbul,2016.

BİLGİ, Levent: "Munazerata Kürtler, Ayrılık veya Onurlu Birliktelik", *Münazarat Sempozyumu*, Merak Yayınları, Ankara 2012.

BİLİCİ, Mücahit: "Munazeratta Kürtlerin Özneleşmesi Hayvaniyet, İnsaniyet, Meşrutiyet" *Münazarat Sempozyumu*, Merak Yayınları, Ankara 2012.

BOZAN, Metin: "Asırlık Tartışma Adem-i Merkeziyet", *Münazarat Sempozyumu*, Merak Yayınları, Ankara 2012.

BULUT, M. Ali: "Medresetüz Zehraya İhtiyaç duyulan Şartlar", *Bediüzzaman Said Nursi Felsefesi Medresetüz Zehra*, Merak Yayınları, Stenbol 2012.

BULUT, Nurettin: "Bölgesel ve Eğitimsel Bir Eğitim Projesi Medresetüz Zehra", *Said Nursi Eğitim Felsefesi/Medresetüz Zehra Projesi*, Merak Yayınları, Stenbol 2012.

ÇELEBİ, Erdoğan: "Said Nursi Eğitim Felsefesi Medresetüz Zehra/Med Zehra çiye", *Said Nursi Eğitim Felsefesi Medresetüz Zehra*, Merak Yayınları, Stenbol 2012.

ÇELİK, Hüseyin: "Bediüzeman Ufku Görebilen Biriydi", *Münazarat Sempozyumu*, Merak Yayınları, Ankara 2012.

ÇETİNKAKAY, Murat: "Said Kurdi den Said Nursiye Bediüzzaman ve Milliyet", *Münazarat Sempozyumu*, Merak Yayınları, Ankara 2012.

DEMİR, Abdullah: "Said-i Nursi'nin Seyyidliği tartışmaları"" *www.zehra.com.tr/said-i-nursinin-seyyidligi,* 15.02.2014.

DEMİR, Ahmet: "Said Nursinin Eğitim Modelinde Kürt Dilinin Yeri ve Önemi", *Münazarat Konferansı*, Merak Yayınları, Ankara 2012.

ETMANÎ, Adil: *Munazerat*, Nûbihar, İstanbul 2013.

EKİNCİ, Mustafa: "Münazarat Ekseninde Milliyet Fikri Ve Demokrasi", *Münazarat Konferansı,* Merak Yayınları, Ankara 2011.

EMİNOĞLU, Nevzat: *Qewmekî Hêja û Bê Xwedî*, Nûbihar,2005.

EPOZDEMİR, Şakir: *Medreseyên Kurdistanê*, Çapxane Nûbihar,Stenbol 2015.

GÖLDAŞ, İsmail: *Endamtiya Cemiyetan*, Doz Yayınları, Stenbol 1991.

GÜZELSOY, *Molla Feyzi: Molla Feyzi'den Prof. Ahmet Akgündüz'ün 'Şecere'sine Müskit Cevap",* İlkehaber.com, 04, Perşembe 2013

http://www.yeniasya.com.tr/risaleinur/

http://www.zehraportal.com

IŞIKDOĞAN, Davut: "Medresetüz Zehra'nın Öğretim Elemanı", *Münazarat Sempozyumu*, Merak Yayınları, Ankara 2012.

IZADY, Mehrdad R.: *Kürtler*, Doz, Stenbol 2011.

İNCİ, Veysi: *Said Nursi Eğitim Felsefesi Medresetüz Zehra,* Merak Yayınları, Stenbol 2012.

İPÇİOĞLU, Mehmet: "Said Nursi' nin Eğitim Felsefesi Medersetüz Zehra", *Said Nursi' nin Eğitim Felsefesi Medersetuzzehra*, Merak Yayınları, Stenbol 2012.

İPEK, Yunus: *Munazeratin-Kimligi*, http://www.zehra.com.tr/munazeratin-kimligi_h111272. html adresinden alındı, 21 Ocak 2015.

KARA, Hüseyin: "Üç Kitabın Birlikte Okunduğu Medeniyet", *Said Nursi Eğitim Felsefesi Medresetüz Zehra*, Merak Yayınları, Stenbol 2012.

KARAKAŞ, Vehbi: "1911 Tarihli Kürt Reçetesinin Günümüz Kürt Meselesiyle İlgisi", *Münazarat Konferansı*, Merak Yayınları, Ankara,2011.

KAYA, M. Ali: "Bediüzzamandan Hamiyet ve İslam Milliyeti Dersi", *Münazarat Konferansı*, Merak Yayınları, Stenbol 2011.

KAYA, Muhyiddin: "Güzel Bir Fikir ve Sosyolojik Yetersizlik Kıskacında Bediüzzaman da Adem-i Merkeziyet Düşünce", *Münazarat Sempozyumu,* Merak Yayınları, Ankara 2012.

KELEŞ, Ahmet: *Bediüzzaman ve Münazarat Bir Asır Sonra*, Merak Yayınları, Ankara 2011.

KUDAT, Ubeyt. A: "B. Üç Darü't-Talimi ve Medersetüz Zehra da Dil", *Orat Zemin* , Hejmar;14. 2012.

KURDÎ, Bedîuzzeman Seîd: *Dersên Civaki,* Zehra, İstanbul 2013.

KURDÎ, Bedîuzzeman Seîd: *Dîwana Herba Urfî*, Zehra, İstanbul 2013.

KURDÎ, Bedîuzzeman Seîd: *İçtimai Dersler*, Zehra, İstanbul 2013.

KURDÎ, Bedîuzzeman Seîd: *Münazarat*, Zehra, İstanbul 2013.

KURDÎ, Bedîuzzeman Seîd: Xutbeya Şamê, Zehra, İstanbul 2013.

KUTLU, Caner: "Medresetüz Zehra Merkezinde Bediüzzaman’ın Eğitim Felsefesine Giriş", *Said Nursi’nin Eğitim Felsefesi Medresetüz Zehra*, Merak Yayınları, Stenbol 2012.

Malmisanij: *Xelîl Xeyalî*, Doz, Stenbol 1991.

MARDİN, Şerif: *Bediüzzeman Said Nursi Olayı*, İletişim Yayınları, Stenbol 1992.

MENEK, Abdulkadir: "B. Said Nursinin Hayatı Boyunca Peşinde Koştuğu İdeali Medresetüz Zehra, *Münazarat Sempozyumu"*, Merak Yayınları, Ankara 2102.

MENEK, Abdulkadir: "Kürtler ve Kürt Meselesi Tarih Süreç İçerisinde Genel Bir Bakış", *Bediüzzeman Konferansı/Yakın Tarih Ansiklopedisi*, Cilt,10, Merak Yayınları, Stenbol 2012.

MENEK, Abdulkadir: "Kürtler ve Kürt Meselesine Tarihi Süreç İçerisin de Genel Bir Bakış", *Münazarat Konferansı*, Merak Yayınları, Ankara 2008.

MENEK, Abdulkadir: "Medersetüz Zehranın Genel Çerçevesi", *Said Nursi Eğitim Felsefesi Medresetüz Zehra*, Merak Yayınları, Stenbol 2012.

MERİÇ, Cemil: *Jurnal*, İletişim Yayınları, Stenbol 1992.

MİKSÎ, Hemzeyê *Bedîuzeman Seîdê Nûrsî’nîn Tercumey-i Halînden Bir Hulasa*, http://www.risaletashih.com/index.php/musahhah-metinler/192-bediuzzaman-in-tercume-i-hali-mukuslu-hamza

MURSEL, Safa: "Kürt Sorunu Bağlaminda Kısa bir Munazart Analizi", *Münazarat Konferansı*, Merak Yayınları, Ankara 2011.

NURSİ Bediüzzaman Said: *Emirdağ Lahikası*, Zehra, İstanbul 2013.

NURSİ Bediüzzaman Said: *Kastamonu Lahikası*, Zehra, İstanbul 2013.

NURSİ Bediüzzaman Said: *Lemalar*, Zehra, İstanbul 2013.

NURSİ Bediüzzaman Said: *Mektubat*, Zehra, İstanbul 2013.

NURSİ Bediüzzaman Said: *Sözler*, Zehra, İstanbul 2013.

NURSİ Bediüzzaman Said: *Şualar,* Zehra, Stenbol 2013.

NURSİ Bediüzzaman Said: *Tarihçe-i Hayat,* Envar, Stenbol 2011.

NURSİ Bediüzzaman Said: *Tarihçe-i Hayat,* Zehra, Stenbol 2013.

NURSİ, Abdurrahman: *Bediüzzaman'ın Hayatı*, Kent, Stenbol 2011.

NURSİ, Bediüzzaman Said: "Mamosteyên Med Zehrayê", *Muhekemat,* Zehra Yayınları, Stenbol 2012.

NURSİ Bediüzzaman Said: *Sünuhat*, Söz Yayınları, Stenbol 2011.

NURSİ Bediüzzaman Said: "Altıncı Mesele", *Asayi Musa*, Tenvir Neşriyat, Stenbol 1990.

NURSİ, Bediüzzaman Said: "Yermi Birinci Söz" *http://www.erisale.com/#content.tr.1.362*, 13/07/2015

NURSİ, BediüzzamanSaid:"Muhakemat", *http://www.erisale.com./#content.tr.13.37*, 07 13, 2015

NURSİ, Bediüzzaman Said: *Diwana Herba Urfî*, Envar, Stenbol 2005.

NURSİ, Bediüzzaman Said: *Emirdağ Lahikası ll*, Envar Yayınları, Stenbol 1995.

NURSİ, Bediüzzaman Said: *Emirdağ Lahikasi*, Zehra, İstanbul 2013.

NURSİ, Bediüzzaman Said: *Mektubat*, Sozler Yayınları, İstanbol 2001.

NURSİ, Bediüzzaman Said: *Mesnevi Nuriye*, Zehra, İstanbul 2013.

NURSİ, Bediüzzaman Said: *Muhekemat*, Yan Yayınları, Stenbol 2007.

NURSİ, Bediüzzaman Said: *Sözler*, Söz, İstanbul 2010.

NURSİ, Bediüzzaman Said: *Sözler,* Zehra, İstanbul 2013.

ÖLMEZ, Adem: *Uzun Yürüyüş*, Nesil, Stenbol 2012.

ÖZDEMİR, İbrahim. *Münazarat Nasıl Bir Eserdir*, Merak Yayınları, Ankara 2011.

ÖZKÜLÜ, Maruf: *Mektep-Medrese-Tekke Ayrışması Karşısında BSN' nin Felsefesi Medresetüz Zehra,* Merak Yayınları, Stenbol 2012.

Qurana Pîroz û Meala Wê Ya Kurdî, Weşanxanaya Serokatiya Karûbarên Diyanetê, Ankara 2015

SAĞLAM, Bahaedin: *Kürtlerin Reçetesi Münazarat*, Weşanxaneya Klmn, Stenbol 2013.

SALAR, Muhammed: *Said Nursinin Eğitim Felsefesi Medresetüz Zehra*, Merak Yayınları, Stenbol 2012.

SEKBAN, M. Şükrü: *Kürt Sorunu,* Kamer Yayınları, İstanbul1998.

SÖNMEZ, Selim: "Bediüzemanın İstabul Hayatı", *www.koprudergisi.com*: Bahar, 2004.

ŞENGÜL, Serdar: "Teşebusên avakirina Med zehrayê", *Di 50 Saliya Wi de Sempozyûm a Bedîuzeman Seîdê Kurd*, Nubihar, Stenbol 2011.

TAN, Altan: *Değişen Ortadoğu da Kürtler,* Çira, Stenbol 2011.

TAN, Altan: *Kürt Sorunu,* Timaş Yayınları, Stenbol 2009.

TAŞ, Eşref: "Bediüzzeman Said Nursive II Meşrutiyet", *Münazarat Konferansı*, Merak Yayınları, Ankara 2011.

TEKİN, Osman: "Bediüzzaman Said Nursinin Eğitim Modeli Olarak Medresetüz Zehra", *Münazarat Sempozyumu*, Merak Yayınları, Ankara 2012.

TEKİN, Osman: "Medresetüz Zehra Eğitim Modeli", *www.zehra.com.tr*: 01.03.2015.

TEKİN, Osman: *İzettin Yıldırım,* Kent Yayınları, Stenbol 2012.

TUNCİL, Mustafa: "Münazaratın Sivil ve Özgür Toplum Öngörüsü", *Münazarat Sempozyumu*, Merak Yayınları, Ankara 2012.

TUNÇ, Bilal http://www.risaletashih.com/index.php/musahhah-metinler/192-bediuzzaman-in-tercume-i-hali-mukuslu-hamza

TUNÇ, Osman: *Çima Medresetüz Zehra,* Nûbihar, Stenbol 2011.

TURGUT, Nurettin: "Münazaratan Mesajlar", *Münazart Sempozyumu*, Merak Yayınları, Ankara 2012.

WELD, F. Mary: *Endamtiya Cemiyetan*, Etkileşim, Stenbol 2006.

WELD, F. Mary: *Rewşa Osmaniyan*, Etkileşim, Stenbol 2006.

www.anayasa.gen.tr.

XEYALİ, Xelil: *Elif Ba*, Hivda İletişim, Stenbol 2007.

YAZICI, M. Akif: "Medresetüz Zehranın Lisansüstü Boyutu ve gerçekleştirilebilecek Önerîler", *Said Nursi Eğitim Felsefesi Medresetüz Zehra*, Merak Yayınları, Stenbol 2012.

YILDIRIM, Kadri: "Seîdê Nûrsî û Ramanên Wî yên Derbarê Ziman û Perwerdehiya Kurdî de", *Zend*, Payîz 2006.

YILDIRIM, Kadri: *Temel Metinlerle Kürtçe, Kurmancî Lehçesî,* Avesta, Stenbol 2012.

YILDIZ, Ahmet: "Medresetüz Zehra Nedir ", *Said Nursinin Eğitim Felsefesi*, Merak Yayınları, Stenbol 2013.

YILMAZ, Hamza: *Medresetüz Zehra Projesi*, Tenvirneşriyat.com.tr., 12.07. 2015

YÜKSEL, M.http:// http://www.yenisafak.com/yazarlar/mufityuksel/bir-sulale-i-marufeye-nisbetim-yoktur-35509

YÜKSEL, Müfit: "Fen ve İlim Tartışmaları, Bir Tecdit Hareketî olarak Medresetüz Zehra", *Bediüzeman Said Nursi'nin Eğitim Felsefesi Medresetüz Zehra*, Merak Yayınları, Stenbol 2012.

YÜKSEL, Müfit: "Malbata Wî", www.yenisafak.com.tr: 02 22 2012.

YÜKSEL, Selami: "Din ve Fen İlimlerinin Birlikteliği Bağlaminda Medresetüz Zehra Projesi", *Ortak Zemin*, Hejmar 7, 2012.

ZINAR, Muhyiddin: "Endamtiya Cemyetan", *Di 50 Saliya Wefata Wî de Sempozyûm B. Seîdê Kurdî*, Nûbihar, Stenbol 2011.